# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

NRLS

NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

KOVAREKE DEMSALÎ JI NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK TÊ DERXISTIN HEJMAR (7-8) Zivistan – Buhar 2023




- Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî
- Tundirewî di navbera Şoreş û Desthilatdarîyê de
- Têkilîyên Bîrdozî û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP Û Komên Radîkal De
- Şam û Pirsgirêka Biryara Stratejîk
- Îran

Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Rakan Şêxî**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (7-8) Zivistan – Buhar – 2023**

## NAVEROK


**Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî .................................................... 5**

**Tundirewî di navbera Şoreş û Desthilatdarîyê de ................................. 45**

**Têkilîyên Bîrdozî û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP Û Komên Radîkal De**

**D. Celal Zênatî ........................................................................................ 62**

**Şam û Pirsgirêka Biryara Stratejîk**

**Hesan Qutub .......................................................................................... 93**

**Îran ......................................................................................................... 109**

## Gotina hejmarê

**Xwendevanên hêja:**

Di van her du mijarên di nav destên we de, ji bilî lêkolîna (Komara Islamî ya Îranî), lêkolînên din tev de nû ne.

Jixwe mijara yekem (**Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî**), li ser dîrok, giringî, wate û pirsgirêkên li ser wate û giringîya Newrozê li cem kurdan, lêkolînê dike.

Newroz bi xwe hembêzkirina hemû rengên mirovahîyê ye, ji ber vê yekê her dem Newroz li dij "Tundrewtîyê ye", lêkolîna duyem "**Tundrewtî di navbera şoreş û desthilatdarîyê de**" mijara tundrewtîyê bi hemû warên ku tê de tê bikaranîn zelal dike.

Jixwe ji werê ku tundrewtî tê de tê bikaranîn, warê desthilatê ye ku wê ji xwe re bi kar tîne, êdî lêkolîna bi navê " **Têkilîyên Bîrdozî Û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP Û Komên Radîkal** ", dîyar dike bê çawa dewleta tirk a dagirker komên çekdar ji bo berjewendîyên xwe bi kar tîne.

Rêjîma Sûrî jî ji parastina xwe, piştî "şoreşa gelan", stratejîeke ewlkarî û leşkerî bi kar anî, lêkolîna bi navê "**Şam û Pirsgirêka Biryara Stratejîk**", hewil dide ku vê stratejîyê bide têgihiştin.

Weke beşa berî dawîkirina lêkolîna "**Komara Islamî ya Îranê**", beşê dawî li ser rikberîya Îranê, Îran û mafên mirovan û doza kurdî, radweste.

**Sernivîser**

# Newroz û Wateyên wê yên Şoreşgerî

**(1 ji 2)**

## Pêşek

Bandoreke mezin ya dîyardeyên siruştê li ser hizirîn û refterên mirov heye û roleke mezin di sazkirina çandan de dilîzin li gor têgîna erdnîgarîya çandî[1]. Girêdaneke xurt ya çanda kurdî bi vê mijarê ve heye, heta wê radeyê ku dikarin kurdan û pêşîyên wan weke faktorên sereke yên avabûna erdnîgarîya çandî ya Kevana Berdar bihejmêrin. Cejna Newrozê ya kurdî û efsaneya wê nimûneya tekezkirî ya vê mijarê ne, çimkî Newroz çavkanîya herî sereke ye ku hebûna dîrokî ya kurdan li beşê bakur û rojhilatî yên Kevana Berdar pişt rast dikin. Her wiha şoreşeke civakî, sîyasî û çandî li hember hêzên tarîtîyê bi gewde dike di çarçoveya hevrikîya di navbera her du xwedawendan de "Ahormazda û Ahrîman". Her wiha weke "Sefer el-Tekwîn" yan jî "Qeset el-Xeliq" ya gelê kurd tê dîtin û piştre bû boneyeke olî ya girîng li nik êzdî û zeredeştîyan. Gava xort xwe diavêjin tor û bextê çîyayên Kurdistanê, naxwe li vir hişmendîyeke hevbeş ya wan hozan heye ku li çîyayan bicih bûn û etnîkeke xwedî çandeke dêrîn ku niha bi navê gelê kurd tê nasîn pêk anî. Rê û resmên Newrozê û sembolên wê yên efsanewî xwe vedigerînin destpêka berzbûna rûdêmên neteweya kurd ji hezarên salan ve ew jî piştî helandina çandî û civakî ya hozên medî, hûrî, mîtanî û gelên din yên dêrîn li rêzçîyayên Zagros û Torosê. Dixuye ku dijminê hevbeş û hevpêwendîya erdnîgarî û yekîtîya sîyasî, leşkerî û çandî ya civakên Kurdistanê alîkarîya avabûna neteweya kurd kirîye. Ev yek şîroveyeke qaniker dide seba cudahîya di navbera gelê kurd û gelê faris de.

---

[1] "Erdnîgarîya çandî zevîyekî şaxî di hundirê erdnîgarîya mirovî de ye… erdnîgarnasên ku xwe dispêrin vê kevneşopîyê dibînin ku çand û civak ji dîmanên xwe yên sirûştî û xwemalî bi pêş dikevin, lê her wiha ew wan dîmenên sirûştî pêk tîne. Ev rîakistona di navbera dîmenên sirûştî û mirovan de dîmeneke çandî diafirîne. Ev têgihiştin bingeha erdnîgarîya çandî ye…", Mewsûet eluxe el-erebîye; el-Cuxrafîya e-Seqafîye; lînk: https://mimirbook.com/ar/10c623910d2

Buhar, çîya, berf, agir, hesin û hwd hêmanên serke yên efsaneya Kawayê Hesinkar in ya girêdayî Cejna Newroza kurdî û dixuye ku girêdaneke xurt di navbera wê û pêşketinên çandî de heye; pêşketinên ku ji Serdema Kevirî yê nû ve û heta Serdema Hesinî li deverê çêbûne. Bi giştî û ji ber ku her du çand gelekî nêzîkî hev in, watayên Newroza kurdî û ya farisî têkilî hev bûn; bi taybet piştî ku mîrên faris û hin kesên medî li qiralê xwe yê medî "Astîyak" qulibîn û pergala ferdralîyên arî-medî ji nav birin ku ev qonaxeke pir giring e di vê çarçoveyê de. "Şahnameya" Ferdosî jêdereke sereke ye ji bo gelek xwînerên efsaneyên girêdayî Cejna Newrozê û bi rengê efsaneyeke farisî hatiye barkirin ew jî piştî ku ji hêla hin emperatorên faris ve bû boneyeke fermî, tevî ku ew bi xwe ya gelê kurd e. Naxwe bi vî awayî be Newrozeke farisî heye û ji Newroza kurdî cuda ye. Lewre pêdivî pê heye ku taybetmendîya çandî ya kurdî di çarçoveyeke sîmyolojî û semantîk[2] de were şîrovekirin. Ew jî bi rêya ronîkirina wate, sembol, rê û resim û kesayetên efsaneya Kawayê Hesinkar ya girêdayî boneya Newroza kurdî û xwespartina hin nerîn û lêkolînên pêwendîdar. Hêjayî zanînê ye em bibêjin ku jêder û çavkanîyên ku behsa Newrozê li gor rêbazeke zanistî yan tev li hûrgilîyên wê kiribin pir kêm in, lewre gelek kelem û astengî li pêş dahûrandin û şîrovekirina mijarên girêdayî vê lêkolînê hene.

Rastîyek heye dibêje ku Newroz û efsaneya Kawayê Hesinkar bi hev re beşeke giring in ji zargotina pêşîyên kurdan. Zargotina wan ji Seredema Kevirî yê nû ve dest pê dike heta bi Serdema Koletîyê û heta biserkeftina medan di Serdema Hesinî de û berzbûna rûdêm û nîşaneyên neteweyî yên gelê kurd. Heke ew bûyer û rewş di ber çavan re neyên derbaskirin, em nikarin rastîya Newrozê û Efsaneya Kawayê Hesinkar her wiha rê û resm û sembolên efsanwî yên girêdayî vê boneyê nas bikin. Çimkî şoreşa li dij Pergala Koletîyê û çîroka afirandina gelê kurd dihewîne, her wiha destpêka pêkhatina nexşeyeke nû ji erdnîgarîya sîyasî û çandî li beşê bakurê Kevana Berdar anku Kurdistanê dihewîne. Her wiha hîn jî bandora wê li ser bawerîya şer ya hevdem li cem gelê kurd heye û parastina wan ji gelên din re di nav de ereb, suryan, ermn û tirkman. Ev lêkolîn hewl dide li ra û

[2] Sîmolojî: Zanisra wateya sembol û nîşaneyên çandî ye..
Ji bo pêzanînên zêdetir li vê berhemê vegere: Rolat Bart, Ders e-SÎmolojîya; werger: Binebd el-Alî; Dar Tobeqal llneşr; Mexrib; çapa sêyem 1993.

rîşalên gelê kurd bixepêre û taybetîyên wekhev di navbera qiralê stemkar û hemû xwedawend û qiralên wan dewletan de ku deverin ji Kurdistana kevn dagir kirine û zarên wê kole girtine ji alîyekî ve û ji alîyekî din ve di navbera lehengê neteweyî yê efsanewî yê kurd Kawayê Hesinkar û fermandarê şoreşa Medî Keyaxsar de nas bikin. Her wiha em şewqê biavêjin li ser sembolîtîya şoreş, çîya û agirê pîroz di efsaneya kurdî de û bandora biserkeftina şoreşa medan di sazbûna forma dawîn ya efsaneyê de û dê agahî û ramanên li ser Newrozê di serdema nû de jî werin dayîn.

**Kurtedîroka gelê kurd**

Pêşîyên gelê kurd rastî pêngavên qirkirnê hatin û gelek paşmayên wan yên çandî hatin rûxandin. Ev pêngav ji hêla qiralên Bîlad e-Rafîdeyn, li gor neqşên ku şerên wan mezin dikin, pêk dihatin. Çimkî bo nimûne di neqşeke qiral “Aşûr Nasiryal” de ku pesnê êrîşeke xwe ya bi ser çîyayên Kurdistanê de dide wiha hatiye: “… min bi şûr 200 mêrên wan parçe parçe kirin û min ew qas dîl weke pez ajotin û min bi xwîna wan ew çîya sor kir…”[3] her wiha hin neqşên din jî di vê çarçoveyê de hene. Li milê din lêkoler “Wêl Dîyorant” amajeyê bi wê yekê dike ku farisan dest danî li ser çand û olên wan yên kevn û hozên wan kirin jêr serwerîya xwe ew jî piştî ku li pêşîyên kurdan li medan qulibîn ku dibêje: “… faris zimanê arî û alfebeya ku 36 tîpan pêk tê ji medan birin. Wan kir ku faris ji dêl lihên herîyê, pênûs û kaxezan bi kar bînin û stûnan di avakirnê de bi kar bînin. Her wiha zagona wan ya exlaqî birin û ola Zeredeşt..”[4] Di serdema îslamê de bi dehan şûnwarên wan yên şaristanî bi tawana gawirîyê hatin şewitandin û rûxandin, çimkî piranî kurdan êzdî û zeredeştî bûn û bawerî bi bawerîyên manewî û mizdekî dianînin. Ji ber ku berevanî li hember êrîşkaran kirin û berî ku îslam were rêjeyeke mezin ji kurdan xiristîyanî bûn û di çanda birtîya bawerîyê de ji suryan û ermenan helîyabûn û piştî ku netewdewlet di serdema nû de derket û erda Kurdistanê hate parvekirni, pêngavên paqijkirina nijadî û qirkirina çandî li dij kurdan pêk hatin û dîroka wan hat mandelekirin û ew bi gelên ku hatine deverê ve girêdan. Her wiha rê nedan

[3] Dr Ehmed Mehmûd el-Xelîl; Memlekt Medya; çapa yekem-2011; weşanên Sazîya Mukiryanî ya Lêkolîn û Weşandinê; Hewlêr; r 61.

[4] Wêl Dîyorant; Qiset el-Hedare/el-Şerq el-Edna; werger Mihemed Bedran; beşa duyem ji cilê yekem 1988; weşanên Dar e-CÎl- Beyrût; r 401.

ku deverên şûnwarî yên girêdayî dîroka gelkê kurd werin lêkolînkirin û şandeyên şûnwarnasî jî di bin çavdêrîya sazîyên ewlekarîya kar dikirin û berê merc li ser wan datanîn ka dê çi biweşînin. Sedema wê jî weke ku ji hêla gelek lêkolerên dîrok û şûnwarnasîyê ve tê nasîn ew e ku şande pabendî rênmayên pergalên ewlekarîyê bûn bi taybet li deverên ku guherîna demografî û asîmîlekirina çandî ji dehên salan der heqê kurdan de li dewletên ku welatên wan dagîr kirine. Lêkolerê dîrokî Dîyakov dibîne ku şûnwarên bajar û şaristanîya Medî ya dêrîn – pêşîyên kurdan- hîn jî di bin axê de ne.

Bi dehan lêkolînên rojhilatî û rojavayî li ser koka kurdan hene û her lêkolînek di vê çarçoveyê de hîpotezeke teybet pê pêşkêş kirîye[5]. Dixuye ku heta niha lêkolîner negihane encamekê ku hemû li ser li hev bikin û ev yek li nik lêkolerên kurd bi xwe jî dubare dibe. Vê gavê hêla ku pirsgirêkek di şîrovekirina dîroka kurdan de derkeve û bi vî rengî negihin dîtineke zanistî ya hevbeş. Nenaskirina ra û rîşalên etnîya kurd bi xwe arîşeyek û berhengarîyeke mezin e li pêş lêkolerên dîroka mirovî. Lewra pêwîst e pisporên erkolojîk, fîlolojîk, sîmasîyolojîk, sîmîylojîk, antrppolojîk, semantîk û etmolojîk ked xwe bikin yek da bigihin rastîya koka miletan.

Tevî vê yekê jî kurd nijadeke berz in û hestekî wan yê nasnameyeke taybet bi wan heye, nasnameyeke cuda ji nasnameyên gelên derdorê ji alîyê ziman, dab û nerît û çandê ve. Di milê çandê de faris gelê herî nêzîkî kurdan e û ji ber ku farisan nasnameya xwe ya neteweyî parastîye, ew jî ji ber ku ji 550 bz ve netewdewleta xwe ava kirine, piranîya lêkoleran ber bi wê hizirê ve diçin ku kurd pûxteya têkilekê ji hozên arî ne yên ku ji destpêka koçkirinên mirovan yên mezin ve di hezarsala pêncem û çarem de bz hatine deverê û niştecihên resen yên Çîyayê Zagrosê û beşê bakur yê Kevana Berdar in û çanda wan encama wê têkilê ye. Di lêkolînekê de bi navê “The

[5] Ji bo pêzanînên bêhtir li van pirtûkan vegere:
Mihemed Zekî Beg; Xulaset Tarîx el-Kurd we Kurdistan/ min eqdem el-isûr îla el-an; werger: Mihemed Elî Ewnî; çapa duyem-2005; weşanên Dar el-Şiûn el-Teqfîye el-Ame-Bexda; r 124.
Dr Umar Ebas Mehmûd; el-Qedîya el-Kurdîye/işkalîyet bîna dewle; çapa yekem; 2016; weşanên el-Erebî lilneşr we e-tewzî- Qahîre; r 24.

Origin of Kurds”[6] (koka kurdan) ku heta astekê nû ye, lêkoler, piştî ku xwe dispêre nûtirîn lêkolînên DNAyê yên entopolojîya mirovî, amajeyê pê dike ku pêşîyên kurdan niştecihên resen yên Kevana Berdar ya Bakurî ne ku di Serdema Kevirî ya Nû -Kevirî yê nû/9000-4500 bz/ de li wir jîyane. Lêkolerê dîrokê “Crnot Fîlhilm”[7] amjeyê bi helandina di navbera hozên arî hûrî û niştecihên resen yên bakurê Kevana Berdar de dike. Her wiha lêkoler Neîm Fereh dibîne ku “… tenê di Serdema Kevirî ya Nû de (Kevirî yê nû) yan jî di dawîya wê de, xelkên bilindîyên derdorê bi qefela berê xwe da başûrî Bîladenehreyn ku neçar bûn herin wê devera ku ji jîyanê re neguncav bû ew jî ji ber şert û mercên zehemt her wekî nemana xwarinê yan êrîşên dijminan …”. Hin lêkolîn amajeyê pê dikin ku piranîya zayendnasan li ser wê yekê li hev dikin ku dundeya kurdan ji koma arî tê ya ku niştecihên resen yên deverê hilandin ku li gor wan kurd ji dundeya albî ya koma arî[8] ne. tê zanîn ku kolandinên şûnwarî tekez kir ku mirovê pêşîn li şikeftên çîyayên Kurdistana kevn cîwar bûye. Çimkî li Çîyayê Zagrosê gundek bi navê “Cirmû”[9] hebû ku li jêr Çîyayê Zagrosê rojhilatî bajarê Kerkûkê yê kurd cih digirt. Ew jî ji ber ku mirovên destpêkê ji şikeftên Zagrosê berê xwe daye newal û çeman piştî ku qeşa û berf li dawîya Serdema Qeşayê helîyan. Ev jî sedema wê yekê nîşan dide bê çima Newroza kurdî girêdayî helîna berfê ye. Her wiha şûnwarên mirovê nendertal jî li şikeftên Kurdistanê – Şikefta Şanîdarê hatin dîtin ku vedigere zêdeyî 60 hezar salî[10]. Her wiha li Şikefta Zirzîyê nêzîkî kanîyên Çemê Zapê şûnwarên dawîya Serdema Kevirî ya Kevn hatin dîtin û piranîya wan amûrinên ku vedgerine 12000 salî. Li şikefta “Hezar Mêrd”ê nêzîkî Silêmanîyê bermahîyên Serdema Kevirî ya Navîn

[6] Ferdinand Hennerbichler; The Origin of Kurds; Szellörózsa ut 45, Mosonmagyaróvár, Hungary; 2012; Scientific Research; Link: https://www.researchgate.net/publication/265947486_The_Origin_of_Kurds

[7] Crnot Fîlhilm; Hûrî/ tarîxihim we hedaretihûm; werger Dr Farûq Ismaîl; çapa yekem 2000; weşanên Dar Cedel; Heleb r 47

[8] Dr Hisên Qsim el-Ezîz; Dîrasat en beid el-Isûl el-Kurdîye; Wşanxaneya Aras ya Çapkirin û Belavkirinê; Erbîl – Kurdistana Îraqê; çapa yekem 2012; r 56.
Dr Umar Ebas Mehmûd; el-Qedîye el-Kurdîye/işkalîyet bîna dewke; çapa yekem; 2016; weşanên el-Erebî lilineşir we e-tewzî-Qahîre; r 24

[9] Dr Neîm Fereh; Mûcez el-Şerq el-Edna el-Qedîm; weşanên Dar el-Fikir; bê jimara çapê û dîrok; r 157

[10] Malpera Hikûmeta Herêma Kurdistanê; Şikeft li Kurdistana Îraqê; dîroka weşanê: 12/4/2006: lînk: http://cabinet.gov.krd/a/d.aspx?a=17728&l=14

(10000 bz) hatin dîtin, ew jî komeke şûnwarên keviran bû ku mirovê nendetal[11] çêkiribûn û hin vedîtinên din.

Lêkoleran mîna ku guh daya koka kurdan girningî dane navê wan jî loma bi dehan hîpotez li ser navî derketin. Tê zanîn ku pêşîyên gelê kurd di çarçoveya erdnîgarîya Kurdistanê de weke yek gelî bi çend navan hatîye naskirin ew jî li gor serdem û şaristanîyên ku têkilî bi wan re kirîye. Çimkî sumeran navê niştecihên çîyayan yan jî yên hildikişin çîyê Kurd-da li wan kir û di serdema aşûrî, kildanî û farisî de bi navê gelê "mad/madî" hate naskirin. Li gor nerîna ramanger Ocelan aşûrîyan navê "Medya" li hûrîyan[12] kir. Li gor hin lêkoleran[13] navê Medya gûtî jî tev girtin. Kildanên babilî navê oman û manda[14] li wan kir. Hin ermen û grîkan navê "kardoî yan kardox" li wan kiriye. Bi vî rengî navê "kurd" ji serdema îslamî derketîye û heta roja îro. Her wiha bi dehan navên din hene di lêkolînên li ser gelê kurd de derbas bûne. Ji alîyekî din ve tu lêkolîn nînin ku gotina "kurd" li gor rêzikên zimanê kurdî lêkolîn bikin. Dixuye ku peyva "kurd" ji du beşan pêk tê "kur" û "erd". Ev jî divê pirsporên zimanê kurdî li gor etomlojîyê rayê vê peyvê nas bikin.

Bi gelemperî her wekî dîroka ereb, faris, tirk û hwd tiştekî destnîşankirî li dor dîroka gelê kurd nîne. Gumanên li ser lêkolînên dîroka kurdan, li ser dîroka wan gelan jî hene; bo nimûne mendelekirina têkilîya xurt ya di navbera kurd, medî yan hûrî yan mîtanîyan de her wekî mendelekirina di navbera ereb û kenanan de ye yan mendelekirina têkilîya di navbera hon û tirkan de yan menedlekirina têkilîya dinavbera faris û sasanîyan de ye. Dixuye ku netewdewletên wan gelan di serdema nû de hîpotezên girêdayî koka gelan li dîtaneyan veguhastine, ne tenê wiha lê belê gelên din yên di bin destê wan de, bi taybet gelê kurd, ereb kirine yan faris kirine yan tirk

---

[11] Dr Mûeyed Ebdilsetar; Kurdistan Mehd e-Neqla el-Hedarîye el-Ûla.. Cirmû yekem gundê çandinîyê; weşanên Mewqi el-Hîwar el-Mutemedin- hejmar: 3363- 12/5/2011: lînk: https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=258736
Amir Hina Fetûhî: el-Keldîyûn; çapa duyem, bê dîrok û jimara çapê

[12] Abdula Ocelan; Manifistoya Şaristanîya Demokratîk/Pirsa kurdî û çareserîya neteweya demokratîk; cilê pêncem/çapa sêyem; werger: Zaxo Şîyar; r.75.

[13] Arşak Safrastîyan; el-Kurd we Kurdistan; werger Dr Ehmed Mehmûd el-Xelîl; çapa dueym 2008; weşanên Weşanxaneya Serdem- Silêmanî/Herêma Kurdistanê; r 49.

[14] Dr Ehemd Mehmûd el-Xelî; Memleket Medya; çapa yekem – 2011; weşanên Mukiryanî ya lêkolîn û weşandinê; Hewlêr; r 187.

kirine, lê kurd nebûne xwedî dewlet yan statûyeke sîyasî demokratîk ya serbixwe ku taybetî, paşma û nasnameya wan ya neteweyî biparêze. Tevî vê yekê jî hîn jî çanda kurdî xurt e û xwe li ber pêngavên qirkirinê digire. Li gor ramangerê kurd Ocelan[15], kurdan çanda xwe parastîye çimkî di dîrokê de xwe dispêrin çandeke girêdayî demokratîya hozî ku di serdema Kevirî yê nûê de derkete pêş ku ne gengaz e guhartineke desthilatdarî tê de çêbe. Wisa xuya ye ku ev yek dibe kelem li pêş pêkanîna yekîtîya sîyasî û leşkerî di navbera civakên kurdistanî de li jêr yek fermandarîyê di çarçoveya dewleta navendî de. Dîroknivîsê grîkî Hîrodot[16] dibêje ku medan qiralên xwe hildibijartin û hemû hozan li ser Dîyako/Dîyoks li hev kiribû li gor romana Hîrodot/Kîqbad di jêderên farisî de/ serokê hozeke medî 727-675 b.z ji bo ku serkêşîya wan bike; çimkî Dîyako bi jîrbûn, jêhatîbûn û dadmendîya xwe navdar bû ku hozên çîyayî ji bo çarserkirina arîşeyan berê xwe dida wî.

Tevî ku gelek jêder û çavkanîyan behsa dîroka gelê kurd kiriye, rastîyeke rûniştî heye ku kurd li deverekê rûdinin ku navê wê Kurdistan e anku welatê kurdan. Kurdistan xwedî dewlemendî û samanên xwezayî ye; her wekî jêderên avê, wizayê û kanan her wiha gelek lawir û şînatî lê hene. Ev niştecî bi zimanekî ji malbata zimanên Arî diaxivin bi zimanê kurdî tê naskirin û li çar beşên sereke[17] leva dibin: Kurmanc, lor, gelhur, goran. Tiştê balkêş di erdnîgarîya kurdan de ku welatê wan çîyayî ye. Çend rêzeçîya li Kurdistanê hene her wekî rêzeçîyayên Zagrosê û rêzeçîyayên Torosê, çîyayên Emanos û Agirî (Ararat), çîyayên Gabar, Cûdî, Şengal, Mazî, Biradost, Kurd û Kurmanc li Efrînê û hwd. Her wiha jêderên du çemên herî giring Dicle û Ferat ku şaristanîyên mezin û dêrîn li ser beravên wan ava bûne, li Kurdistanê cih digirin.

Piranîya nerîn û lêkolînên civakî, dîrokî û antropolojî amajeyê pê dikin ku kurd gelekî şereker e û ji azadîyê hez dike û gelekî leheng û jîr û bedew in.

[15] Abdula Ocelan; Manifistoya Şaristanîya Demokratîk/Pirsa kurdî û çareserîya neteweya demokratîk; cilê pêncem/çapa sêyem; werger: Zaxo Şîyar; r.75.
[16] Hesen Kakî; Împeretorîya Medan ya Kurd/Destpêk û Dawî; bê weşanger û jimara çapê; r.43.
[17] Basîl Nîktîn; Kurd/kok, dîrok û cîwarê wan; lêveger û radekte û pêşkêşkirin: Selah Berwarî; weşanên Kovara Aso ya Çandî; bê jimara çapê û dîrok; r. 140.

Gelê kurd mîratgirê tekane ye yên gelên ne samî[18] ku berî 10000 salî b.z[19] li wan çîyayan cîwar bûne; her wekî gelê îlam, lûlû/lûlûbom, kutî/cûtî, hûrî, mîtanî, naîrî.sobaro, kasayî[20]/kaşî, xaldî/kaldî, orarato, manî û hwd[21]. Neqşîn asûrî, babilî, ekadî û sûmerî amajeyê pê dikin ku bi dehan qirlagehên bajaran yên civakên Kurdistana kevn[22] hebûn. Ev gel bûne yek û çanda wan bû yek û gelek çêbû bi navê gelê medî. Dîyakonov dibêje ku hozên medî dema ku hatine çîyayên Zagrosê, ketin nav kutî û hûrîyan de û qiralên asûrî navî naîrî[23] li gelê nû dikir.

Li hember çewisandina asûran disekinîn û yekîtîyeke konfedralî piştî sala 700î b.z damezirandin. Gelê kurd berdewamîya gelê medî ye ev jî li gor zanista zayendan ya nû ya ku gel wiha pênase dike: "Komeke mirovan e ku dibe ku di regez û cîwarê resen de jev cuda bin, lê bi saya yekîtîya niştinê, ziman, kevneşopîyên dîrokî û şaristanî di yeîneyeke homojen de têkelî hev bûne"[24]eynî rewşa piranîya gelên cîhanê. Wateya nijada dîrokî jî ya ku lêkoler "Gostav Lobon" derxistiye, piştgirîya vê boçûnê dike; Gustav dibîne ku nijad li ser faktorên çand û paşmaya hevbeş ya miletekî ava dibe. Çimkî dema ku gelên ji heman kokê yan kokên cuda lê xwedî bawerî û sazî û zagonên nêzîk bin bi dirêjahîya gelek sedsalan, ew gel bi hev re dihelin da ku nijada dîrokî pêk were ku xwedî pergaleke sincî, olî û sîyasî ye ku ji komeke mijar, hizir û hestên hevbeş[25] pêk tê. Ev têgih nêzîkî têgiha

---

[18] Gotina "samî", zanyarê alman Schlozer sala 1781ê ev nav li zimanên kesên ji dola Sam kurê Nûh kir her wekî Tewrat dibêje anku îbranî, asûr, babilî, ekadî, aramî, kenanî û ereb.
[19] Dr. Usama Ednan Yihîya; Dîroka Rojhilata Jêrîn ya Kevn/lêkolîn; çapa yekem 2015; weşanên Aşûr Banîbal – bexda; r.52.
[20]Mihemd Emîn Zekî Beg; Puxteya Dîroka Kurd û Kurdistanê/ji serdemên kevn ve û heta niha; werger: Mihemed Elî Ewnî; çapa duyem – 2005; weşanên Dar el-Şiûn el-Seqafîye el-Ame – Bexda
[21]Dr. Hesen Kerîm Elcaf; Ensîkopîdya DÎroka Îranê ya sîyasî/ji dîroka efsaneyî heta dawîya dewleta tahirî: cildê yekem 2008; weşanên: el-Dar el-Erebîya – Beyrût; r.21.
[22] Ji bo agahîyên pirtir li van jêderan vegere: Rafîde Ebdela Ebdisemed el-Qeredaxî; Kurdistan Îraqê di dîroka kevn de li gor jêderên mîxî ji hezarsala sêyem b.z heta 612 b.z – nameya doktorayê di dîroka kevn de li Zanîngeha Silêmanîyê, Fakulteya Zanistên Mirovî/Beşa Dîrokê – 2008.
[23] Heman jêdera berê; r 137.
[24] Sbtîno Moskanî; Şaristanîyên Samî yên Kevn; werger Dr. Seyid Yaqûb Bekir; weşanên Dar el-Rûqî – Beyrût – 1986; bê jimara çapê; r.49.
[25] Gostav Lobon; Saykolojîya el-Cemahîr; werger: Haşim Salih; çapa yekem 1991; weşanên Dar el-Saqî – Beyrût; r.27.

neteweyê ye. Bi vî rengî gotina ku gelê kurd nûnerê hemû gelên kevn e yên ku li Kurdistanê cîwar bûne, dîtaneyeke pir xurt e.

**Newroz di efsaneya kurdî de**

Efsane zargotina gelan in. Dr. Nebîl Selame[26] û li gor Ferhenga Larousse dibêje ku zargotin "komeke kevneşopîyan e di nav de efsane, zanîn, mezheb, bîr û nerîn û dab û nerît cih digirin". Ferhenga Royer wiha zargotinê dinasîne: "Veguhastineke neşênber ya mezheb û kiryarên olî û exlaqî ji serdemekê bo serdemeke din e; bi rêya gotina bilêvkirî". Bi giştî roleke giring ya zargotinê ji bo dîyarkirina taybetîya çandî ya gelan heye. Piranîya belgeyên nivîskî her wekî pirtûkên pîroz, çîrokên destaneyî û neqşên berê di koka xwe de romanên devkî bûn, ji nifşekî diçûn yekî din. Heke Newroz û efsaneya Kawayê Hesinkar bi wijdanê gelê kurd ve ne girêdayî ba û ji nifşekî neçûba nifşekî din, niha ji zû ve hatibû jibîrkirin; bi taybet ku ji mêj ve kurd tûşî pêngavên qirkirina çandî tên.

Efsane ku berî olan hebû gelek caran hin nîşan û sembolan di nava xwe de dihewîne alîkarîya mirovî dikin ku çand û dîroka gelan fêm bike. Efsane çand, dab û nerît û nirxan bi gewde dike, her wiha dîtina gelan bo jîyanê bi gewde dike û liv û tevgera sirûşt û dîrokê şîrove dike, li milê din cihêrengîya di navbera çanda gelan de dîyar û eşkere dike. Antroplog Bronsîlaf Malînofskî dibêje "… divê efsane wekî cureyekî peymana civakî were şîrovkirin anku wekî curekî ji cureyên şîrovekirina dab û nerît û reftarên komeke destnîşankirî…"[27]. Sembol û watayên efsaneyan, dîdevanên têkilîyên dîrokî û cografî yên di navbera çand û deverên çandan de ne[28].

---

[26] M. Dr. Sufyan Losîf; Semînera "Pîvanên Rêbazên Lêkolîna Dîrokî"; Zanîngeha Stêf2/Beşa Dîrok û Şûnwaran; Cezair.

[27] Şarlot SÎmor – Simêt; Ensîklopedîya Mirovnasîyê/têgih û konseptên entropoljîyayê; werger: bireke mamostayên civaknasîyê li jêr serperiştîya Mihemed el-Cewherî; çapa duyem 2009; weşaên Navenda Neteweyî ya Wergerê – Qahîre; r. 94.

[28] Devera çandî bi inglîzî "Cultural area" yan "Cultural sphere"ev têgih di entropoljî û cografîyayê de amajeyê bi devereke cografî ya girêdayî çalakîyeke mirovî ya yekgirtî yan gurêdayî komeke çalakîyan -dab û nerît, kevnşopî û nirx- dike ku êdî wekî çandeke yekgirtî têne naskiein. Bi piranî ev komên mirovan bi komeke etnîk ve û eredeke cografî destnîşankirî ve girêdayî ye, lê sînorên çanda wê di milê cografî de li cem sînorên dewleteke neteweyî yan dabeşkirinên rêveberî ku li gor paşxaneyên sîyasî yan aborî yên dewletê hatine avakirin ranawestin, lê belê heta bi sînorên deverên cîran derbas dike ku ev dever bi deverên bandora çandî … devera çandî tê naskirin; wîkîpedîya

Çanda kurdî jî weke hemû çandên din bi çîrokên metolojîyê mişt e. Weke efsaneya "Şahmaran" anku şaha maran û çîroka afrindina dinyayê di her du olên zerdeştî û êzdî de, her wiha efsaneya "Kawayê Hesinkar û Newrozê" û hwd.

Weke gelên din, çîirokên afirandinê yên taybet bi gelê kurd jî hene. Çimkî çîroka afriandinê ya zerdeştî ku hûrgilîyên biçûk tê de nînin amajeyê bi wateya Newrozê dike. Çîrok dibêje afirandin di encama rîaksyon û hevrikîya di navbera ronahîya ku başîyê dinimîne û tarîtîya ku xirabîyê dinimîne hatiye. Ahoramazda gîyan afirandiye û ji tevgera ronahîya rojê li ser erdê het tişt weke şînatî çêbûye. Piştî ku gîyan bi laş re bûye yek, ji teşeyê şînatîyê li teşeyê mirov hatiye veguhastin û bûne dê û bav û ji berhemên wan mirov çêbûn[29]

Jixwe tê zanîn ku maweyê ku şewqa rojê li erdê hiltê û maweyê mezinbûna şînatîyan di biharê de ye ku kurd di biharê de Newrozê pîroz dikin di heyama di navbera meha adar û nîsanê de. Sersala Avestayî ya Zeredeştî di heman dema Sersala Kurdî de ye[30] di "21ê adarê" de ku jivana Newrozê ye; giringtirîn cejnên zeredeştîyan. Efsaneyeke din ya zeredeştîyan heye dibêje ku cara pêşîn Newroz hate pîrozkirin, piştî wê gavê bû dema Xwedawend "Yîma"[31] hevsengîya xwezayî li dinyayê vegerand ew jî piştî ku şeytanan erd xirab û kirêt kiribûn û xelk ji xêrê û xwarin û vexwarinê bêpar hiştibûn. Lê "Yîma" li ser destê "Azdehak" tê kuştin. Tê têbînîkirin ku girêdaneke xurt ya vê mijarê bi efsaneya Kawayê Hesinkar re heye.

Çîroka afirandinê ya êzdî dibêje ku mirov ji têkilbûna her çar hêmanan[32] "ax, av, ba û agir" li ser Çîyayê Laleşê li Şingalê hatine afirandin. Li cem êzdîyan roja çarşemê, ya hefteya yekem ji meha nîsanê -nîvê yekem ji meha Newrozê- ew roj e ku Xweda afirandin bi dawî kiriye û wê rojê weke destpêka jîyanê dihesibînin. "Tawisê Melek" karûbarên jîyan û vejandinê bi rê ve birin, lewre ew roj bû sersala êzdîyan û êzdî wê weke cejnekê pîroz

---

[29] Dr. Xelîl Ebdirehman; Avesta/ Pirtûka Pîroz ya Ola Zerdeştî; çapa duyem 2008; weşanên: Rewafid ya Çand û Hunerê – Şam, r. 797-809.

[30] Heman jêdera berê; r. 25.

[31] Heman jêdera berê; r. 242.

[32] Dr. Kazim Hebîb; Êzdî/Ola Kevn ya ku li hember bobelatên dinyayê li ber xwe dide; çapa yekem 2003; weşanên Weşanxaneya Aras ya Çapkirin û Belavkirinê; Erbîl – Kurdistana Îraqê; r. 71.

dikin. Ev roj cejna rabûna Tawisê Melek e Xwedawendê dewlemendî û jîyanê û tê de qurbanîyan digurînin weke qerbûkirinekê ji dêl xwîna mirovan ve[33].

Bav û kalên gelê kurd tê anî der ku sirûşt di payîz û zivistanê de ji ber lêkirina berfê û lehîya çeman dimire û di bihar û havînê de li jîyanê vedigere. Dubarebûna vê gavê wateya pevçûna berdewam di navbera jîyan û mirinê de bêhtir rûnand ku vê jî bandor li pevçûna di navbera başî û xirabîyê de kir ku bandoreke wê ya pir mezin li bawerîyên olî yên bav û kalên kurdan hebû. Hatina biharê tê wateya biserkeftina Xwedawendê başîyê û tê wateya destpêka rojeke nû ku tê de dîsa jîyan tê afiradin û navê Newroz lê kirin. Li gor ola êzdî ya kurd ya kevn, ev biserkeftin bi destê firîşteyên Tawisê Melek pêk hat ku di serdemên kevn de li gor hin jêderan[34] navê Xwedawend Dûmûzî lê dikirin. Cejna Newrozê jî nîşana vejîna Xwedawend Dûmûzî[35] ye ku jîyana xwe careke din bi şûkirina Xwedawend Înana[36] nû dike; Înana bi xwe di çanda hûrîyan de Eştar yan "Şawişka"[37] ye.

---

[33] Sîgmond Froyd; Totem û Tabo; werger: Bû Elî Yasîn; çapa yekem 1983; weşanên Weşanxaneya el-Hîwar ya Weşandin û Belavkirinê – Latqîye; r. 197.
Dr. Xelîl Ebdirehman; Avesta/Pirtûka Pîroz ya Ola Zeredeştîyan; çapa yekem 2008; weşanên Rewafid ya Çand û Hunerê – Şam; r. 35
Dr.Neîm Fereh; Kurteya Dîroka Rojhilata Nizim ya Kevn/ sîyasî, civakî, aborî û çandî; weşanên Dar el-Fikir; bêjimara çapê û dîroka weşanê; r. 48.
Murşid el-Yûsif; Dûmûzî (Tawisê Melek); lêkolînkirina rayên ola kurdî ya kevn; çapa yekem 1999; bê weşanger; r.139.

[34]Murşid el-Yûsif; Dûmûzî (Tawisê Melek); lêkolînkirina rayên ola kurdî ya kevn; çapa yekem 1999; bê weşanger.

[35] Nebîl Zekî; el-Ekrad/Efsane, şoreş û şer; weşanên Kîtab el-Yewm 1991; bê jimara çapê; r. 10.

[36]Murşid el-Yûsif; Dûmûzî (Tawisê Melek); lêkolînkirina rayên ola kurdî ya kevn; çapa yekem 1999; bê weşanger; r. 46.

[37] Cirnot Fîlhlm; Hûrî/Dîrok û Şaristanîya wan; werger: Dr. Farûq Ismaîl; çapa yekem 2000; weşanger: Dar Cedel – Heleb; r. 101.





**Xwedawend Înana (Eştar)** **Xwedawend Dûmûzî (Tammuz)** [38]



Tawisê Melek (serokê firîşteyan di ola êzdî de)



Şahmaran
Şahamran – Şaha maran di efsana kurdî de

Heke em piranîya efsaneyên gelan yên cihêreng û jihevdûr bişopînin, em ê bibînin ku tiştekî hevbeş di navbera wan de heye, ew jî lehengekî

[38] Encyclopaedia Britannica; Tammuz/ Mesopotamian god; Link: https://www.google.com/search?q=%D8%A7%D9%84%D8%A5%D9%84%D9%87+%D8%AF%D9%85%D9%88%D8%B2%D9%8A+Tammuz&source=lnms&tbm=isch&sa=X&ved=2ahUKEwjepp2x97jtAhWSGuwKHT32CVQQ_AUoAXoECAUQAw&biw=1366&bih=568#imgrc=YS--lueNyv_zyM

sersuriştî ye gîyanwerekî efsaneyî dikuje û di encamê de gelek tê hebûnê. Di efsaneya Kurdî de navê Newrozê bi kesayeta Kawayê Hesinkar ve, bi çîyayên evraz, pêxistina agirê pîroz, kuştina Ajdeha[39] û piştr hatina gelê kurd ve girêdayî ye.

Bi kurtî efsane bi vî rengî ye: Dibêjin li devereke Kurdistanê, qiralekî stemkar û zalim "Ajdeha" hikim li gelekî dikir. Rojekê ji rojan li ser her du milên wî du mar şîn hatin û ew mar laşê wî pir diêşandin û ew hêrs dikirin. Hekîm û kahinên wan heyaman nikarîbû Ajdeha derman bikin. Yekî jê re got ji bo êşa te sivik bibe, divê her roj tu mejîyê du xortan bidî her du maran. Ajdeha bi ya wî kir û ferman da û bi vî rengî her roj du xort serjê dikirin û mejîyê wan didan maran ji bo êşa wî sivik bibe. Bi demê re dilê serjêker zîz dibe û bi tenê serê xortekî jê dike û berê xortê din dide serê çîyê û ji dêl mejîyê wî ve, mejîyê mehekê datîne

Di wê demê de kesekî xebatkar û jêhatî hebû, navê wî Kawayê Hesinkar bû. Şîretan li miletî dike ku zarokên xwe birevînin serê çîya. Piştî ku hejmara xortan zêde bû, Kawayê Hesinkar kirine serokê xwe û Kawa şoreş li dij qiralê stemkar pêxist û cilên xwe weke al hildan. Nîşana destpêkirina şoreşê û bi serkeftina wê pêxistina agirekî mezin bû. Bi rastî jî gel bi ya Kawayî kir û ji çîyayî daketin ku şerê artêşa qiralê zalim bikin. Di wê navê re Kawayê Hesinkar û çend xort derbasî keleha qiralî dibin û piştî şerekî giran di navbera wî û qiral de, bi çakûçê xwe serê qiral dişkîne û wî dikuje û piştre agirekî mezin li koşkê dike da ku biserkeftina şoreşê ragihîne.

Vê yekê di buharê de rû da; roja ku şev û ro dibine weke hev (21ê adarê) ku piştre hêdî hêdî roj dirêj dibin. Ew roj bû Roja Newrozê anku destpêka rojeke nû ji kurdan[40] re û jidayikbûna gelê kurd û bû cejneke neteweyî ya gelê kurd. Dibe ku efsane bûbe destaneyeke gelêrî û bi biserkeftina kurdan li jêr fermandarîya Kîkaws/Keyxisro/Keyaksar li ser serokên civaka koletîyê anku Împeretorêya asûrî û ketina bajarê Neynewayê bi gewde bûbe. Ev

---

[39] Ajdeha di zimanê kurdî de tê wateya dragon.

[40] Mihemd Emîn Zekî Beg; Puxteya Dîroka Kurd û Kurdistanê/ji serdemên kevn ve û heta niha; werger: Mihemed Elî Ewnî; çapa duyem – 2005; weşanên Dar el-Şiûn el-Seqafîye el-Ame – Bexda.
Basîl Nîktîn; Kurd/kok, dîrok û warê wan; radekte, lêveger û pêşkêşkirin: Selah Berwarî; weşanên Kovara Aso ya Çandî; bê jimara çapê û dîrok; r. 26.

efsane bi demê re li paşmayeke mirovî veguhezî û bi wijdanê civaka kurd ve hate girêdan û bû jêdera îlhamê ji bo fermandarên wan.

Di Efsaneya Kawayê Hesinkar de, lehengê neteweyî yê kurd, hin wate hene weke wan lêkolînan in yên ku hewl didan li koka gelê kurd bikolin û yên ku amaje dikin ku kurd ne ji mêrekî yan hozeke destnîşankirî hatine, lê belê ew puxteya niştecîyên şaristanîyên çîyayî yên pir hozî û pir çandî ne ku devera bakur û rojhilatê Kevana Zêrîn çandine û li hember êrîşan ji hawîrdor Kurdistanê li ber xwe dane. Lêkoler "Tûma Biwa"[41] piştrast dike ku erd û xak endamên êlên kurdan digihîne hev, lê ya ku êlên ereb digihîne hev mirovatî ye

Her wiha kesayetên di efsaneyê de xwedî nasnameyeke arî ne û di heman demê de xwedî nasnameyekê ne ku niştecîyên resen yên deverê dinimînin. Em ê di çarçoveya sembol û kesayetên efsaneyê di paragrafên bê de behsa vê yekê bikin. Hîpotezeke din heye dibîne ku arî ji Kurdistanê bi xwe ye ku lêkoler "Selewat Kolîyamov"[42] tekez dike ku hozên hindo – cermanî ji Asya Biçûk anku Kurdistana kevn ber bi bakur ve berî zayînê bi sê hezar salan koç kirine.

**Newroz û şoreşa medan li dij pergala koletîyê**

Med xeleka sereke di navbera kurdan û bav û kalên wan yên kevn de ne. Gelek lêkoler Cejna Newrozê û efsaneya Kawayê Hesinkar bi biserkeftina şoreşa medan li dij qiralê asûrî sala 612an girê didin. Heza medan ya rizgarîyê wê demê derket holê piştî ku serokeşîran doza "Dîyako" kir ku bibe qiralê wan ew jî ji ber zanebûna wî. Piranîya gelên niştecih li Kurdistana kevn tev li şoreşa medan[43] bû. Li gor kevaleke neqşkirî ya ku pêngaveke leşkerî ya qiralê asûrî "Şilma Nesr yê Sêyem" li ser hatiye tomarkirin; pêngava li dij deverekê bi navê Barsiwa li çîyayên Kurdistanê

[41] Tûma Biwa; Kurd; werger: Selah Irfan; weşanên Navenda Lêkolînên Kurdî "Kordoljî"/Silêmanîyê – Herêma Kurdistanê; 2010; r. 50.
[42] Selewat Kolîyamov; Aryaya Kevn û Kurdistana Sermedî (Kurd yek ji gelên herî kevnare); werger: Dr. Ismaîl el-Hesaf; çapa yekem 2011; weşanên Sazçya Lêoklînan û Belavkirinê Mukiryarnî – Hewlêr; r. 31.
[43] Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl; dîroka qiralgeha Mîtanî ya Hûrî; çapa yekem 2013; Weşanxaneya Mukiryanî ya Lêkolînan û Belavkirinê – Hewlêr; r. 268.
Dr. Hesen Kerîm el-Caf; Esîklopedîyaya Dîroka Îran ya Sîyasî/Ji dîroka efsaneyî heta dawîya dewleta tahirî; cildê yekem 2008; weşanger: el-Dar el-Erebîye llmewsuat – Beyrût; r. 21.

837 b.z[44] ji wê yekê mirov tê derdixe ku Medya ji 27 bajarokî yan hozê pêk dihat û hakimê her bajarokekî hebû ku xwe bi xwe karûbarên xwe bi rê ve dibirin, lewre li vir em dikarin tekez bikin ku Medya xwedî pergaleke fedralî bû.

Zehmet e ku bandora medan li ser Newrozê û efsaneya Kawayê Hesinkar were paşguhkirin; çimkî lihevkirinek di navbera dîmenên wekhev yên şoreşa medan li dij qiralê asûrî û sikîtîyan[45] û şoreşa Kawa li dij Ajdeha heye û Newroz biserkeftina her duyan e. Dibe ku ji ber vê yekê hin dibêjin ku efsaneya Kawayê Hesinkar ilhamek e ji biserkeftina medan li ser sembola koletîyê li ser qiralîya asûrî. Lêkolerên dîrokê[46] piştrast dikin ku medî metal ji çîyayê Kurdistanê bi taybet ji Zagrosê derdixistin, her wiha çandinî dikirin.

Dîroknivîsê grîkî Hîrodot[47] dibêje ku medan qiralên xwe hildibijartin û hemû hozan li ser Dîyako/Dîyoks li hev kiribû li gor romana Hîrodot/Kîqbad di jêderên farisî de/ serokê hozeke medî 727-675 b.z ji bo ku serkêşîya wan bike[48]; çimkî Dîyako bi jîrbûn, jêhatîbûn û dadmendîya xwe navdar bû ku hozên çîyayî ji bo çarserkirina arîşeyan berê xwe dida wî.

---

[44] Wil Diyorant; Çîroka Şaristanîyê/Rojhilata Jêrîn; werger: Mihemed Bedran; beşa duyem ji cildê yekem 1988; weşanên Dar el-Cîl ya Çapkirin û Weşandin û Belavkirinê – Beyrût; r. 399.

[45] Grîkan navê Sikît li wan kir, Scythia têkelek ji mexol û hozên hindo – ewropî ne ji Ewropayê Rojhilatê derbider bûne. Hesp xwedî dikirin û goştê wan dixwarin û şîrê wan vedixwarin, her wiha hesp bi xwedîyê xwe re dihat veşartin. Gelek Sikîtî di 800 b.z ji Orasya çûne başûrê Rûsyayê û wan şînatîya heşîşê derbasî Rojhilata Navîn kir. Sala 2013an hin amanên zêrîn ku dewsa efyon û qinebê bûn li herêma Stafrûbilê li başûrê Rûsyayê hatin dîtin. Siktî efyon û qineb vedixwarin… Ensîklopedîyay Erebî – Sikîtî
Lêkolerên Sûrî – Dîroka Marîcwana (qineb), bikaranîn destpêkê û çawa li dinyayê belav bûye.
Malpera televizyona Rûsyayê – RT.TV rapora Şûnwarnas: Siktî hişbir distandin.

[46] Wil Diyorant, Çîroka Şaristanîyê, Paşmaya Rojhilatê, Rojhilata navîn, Avabûna dewleta Medan û ketina wê, bê weşanger û jimara çapê.

[47] Hesen Kakî; Împeretorîya Medan ya Kurd/Destpêk û Dawî; bê weşanger û jimara çapê; r.41.

[48] Hin jêder amajeyê bi wê yekê dikin ku ji qata kahinan bû û dadmendî û stemkerî wekî hevdij didît. Bajarê Akbatana/Hikmetan/Amadan/Hemezan yê stratejîk ji bo qiralgeha xwe kire paytext ku Rêya Hevrîşimê tê re derbas dibû û li devereke çîyayî cih digirt. Berî ku medî werin navê bajar Ekasîya bû anku bajarê kasîyan/kaşîyan. Dîyako karî yekîtîyekê di navbera hemû gelên niştecih yên li Kurdistana Kevn de çêke û tu şer di navbera hozên arî

Medan gelek şoreş û reperîn li dij împeretorîya asûran pêxistin lê qiralên asûr karîbû piranîya wan şoreşan bişkînin. Asûran dîl weke kole û cêrî firotin, samanên medan dezîn û bajarên wan wêran kirin. Dema ku qiralê asûr Sergonê Yekem medî têk birin û Dîyako dîl girt, ew sergûnî Hemayê kir û piştre dîsa rê dayê ku vegere. Ji tirsa ku şoreşeke din li dar bixe, qiralê asûr ew vexwende ser xwarinê û ew kuşt û bajarê wî ji hêla sikîtîyan/sîtîyan[49] ve, miletekî qefqazî ye û xwînrêj in, hate dagirkirin û kesên ku ji mirinê rizgar bûn berê xwe dane çîyayên Kurdistanê.

Sedema hevaltîya di navbera sikîtî û asûran de, ku giha wê astê qiralê asûr Aşûrbanîbal keça xwe bide Madyas[50] qiralê sikîtîyan, ew e ku her du şaristanî sikîtî û asûr li ser kolegirtinê rabûne û berjewendîya hevbeş di navbera wan de şer û kolegirtina xelkê û dizîya samanên wan e. Sikîtî ewqasî hov û xwînî bûn heta wê radeyê ku mirov dikirin qurban ji bo xwedawendên xwe di serî de Xwedawend "Arîs" û dîl, kole û cêrî digurandin û xwîna wan bi ser komeke êzingan de dirijandin û piştre şûrên xwe tê de diçikilandin. Her wiha gava ku qiralekî wan dimir, ew bi cêrîyek, xizmetkarek, hilgirê nameyên wî, çend hespên wî û hin qedehên zêrîn[51] re vedişartin. Hîrodot dibêje ku kiloxên mirîyan weke amanên vexwarinê bi

---

de di serdema wî de dernektin. Hin prespektîfên ku karûbarên desthilatê bi rê dixin derxistin û gilîyên xelkê nivîskî bi rêya qasdên taybet werdigirtin..

Selewat Kolîyamov; Aryaya Kevn û Kurdistana Sermedî (Kurd yek ji gelên herî kevnare); werger: Dr. Ismaîl el-Hesaf; çapa yekem 2011; weşanên Sazçya Lêoklînan û Belavkirinê Mukiryarnî – Hewlêr; r.258

Hesen Bîrîna; Dîroka Îranê ya Kevn/ji Destpêkê heta dawîya serdema Sasanî; werger: Mihemed Ebdilminim- el-Sibaî Mihemed Sibaî; çapa yekem 2013; weşanên el-Merkez el-Qewmî ji bo Werger û Weşanê – Qahîre; r.131.

Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl; Qiralgeha Medan; çapa yekem 2011; weşanên SazîyaMukiryanî ya Lêkolîn û Weşanê – Hewlêr; r.34-38.

Dîroka Hîrodot; werger Ebdilîlah el-Melah; bê jimara çapê; weşanên el-Mecime el-Seqafî – Ebûdebî 2001; r.77.

Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl; Dîroka Qiralgeha Mîtanî ya Hûrî; çapa yeke 2013; weşanên Weşanxaneya Mukiryanî – Hewlêr; r.12.

[49]Hesen Kakî; Împeretorîya Medan ya Kurd/Destpêk û Dawî; bê weşanger û jimara çapê; r.44.

[50] Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl; Qiralgeha Medan; çapa yekem 2011; weşanên SazîyaMukiryanî ya Lêkolîn û Weşanê – Hewlêr; r.56.

[51] Ensîklopedîya Erebî - Sikîtî

kar dianîn û ji binî xwe bi avê nedişuştin[52]. Rêbaza qiralên sikîtî heman rêbaza qiralên asûr bû di milê xenîmeyên şerî de; xwîna kuştîyê yekem vedixwarin û serê dijminên xwe dibirin ji qiralê xwe re ji bo xenîmeyan bi dest bixin. Her wiha çermê serî jê dikirin û kesê ku gelek çerm pê re be mêr dihate hesibandin[53].

Şoreşa ku Dîyako pêxist bi mirina wî venemir, lê kurê wî Xiştrît/Frawrtîs, weke ku Hîrodot wî bi nav dike, rahişte ala wê û serkêşîya medan 675-653 b.z kir. Lê di şoreşekê de piştî şerekî giran jîyana xwe ji dest dide û kurê wî Keyaksar/Keyxisro/Kîkaws piştî wî serkêşîya medan kir û gelê medî ji nû ve li hev civandin. Keyxisro jî weke bavê xwe û kalkê xwe siwarekî jîr û jêhatî bû, karî ji nû ve artêşa medan li çîyayên Kurdistana Kevn bi rê bixe ku artêş li çend yekîneyên veqetandî leva kir; yekîneyên hilgirên riman, yekîneyên hilgirên tîr û kevanan û yekîneyên siwaran[54]. Piştî ku artêş bi rêk xist, şoreş li dij sikîtîyan çêkir û karî welatê xwe ji wan rizgar bike. Dûvre êrişê hêzên asûr kir û ew têk birin heta ku gihişte tixûbên Neynewayê, lê ji ber ku sikîtîyan ji paş ve êrîşî atêşa medan kir, neçar man bi şûn de vegerin.

Medî gihiştin wê qinyatê ku berî ku xwe ji qiralên asûran rizgar bikin, divê xwe ji qiralên sikîtîyan xilas bikin. Loma di sala 615 an b.z de karîn wan ji welatê Medyayê derêxin. Di wî maweyî de babilîyan bi serkêşîya Nabo Bolaser karî bajarê Babilê bi şoreşeke gelêrî ji asûran bistînin. Lewra qiralê medî bi qiralê babilî yê nû re bû hevbend, lê ji ber ku qiralê babilî di êrîşkirina Neynewayê de dudilî bû, medan bi tena xwe ji çîyayên Kurdistanê êrişê Neynewayê kir. Dema ku fişara medan li ser artêşa asûrî zêde bû û bajarê Asûr rizgar kirin û artêşa asûran li derveyî dîwarên Neynewayê têk birin, babilîyan ceger girt û wan jî êrişî asûran kir. Piştî ku artêşa babilî

---

[52] Ferhenga Pirtûka Pîroz, Daîret el-Mearif el-Kîtabîye el-Mesîhîye – şîroveya gotina Sikîtî.
[53] Selewat Kolîyamov; Aryaya Kevn û Kurdistana Sermedî (Kurd yek ji gelên herî kevnare); werger: Dr. Ismaîl el-Hesaf; çapa yekem 2011; weşanên Sazçya Lêoklînan û Belavkirinê Mukiryarnî – Hewlêr; r.313.
Çîroka Şaristanîyê, Paşmaya Rojhilatî, Rojhilata Jêrîn, têkelek ji neteweyan, gelên hindo-ewropî – Wil Dîyorant
[54] Heman jêdera berê; r.47
Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl; Qiralgeha Medan; çapa yekem 2011; weşanên Sazîya Mukiryanî ya Lêkolîn û Weşanê – Hewlêr; r.38.

gihişt, sê mehan Neynewa hat dorpêçkirin û hêzên hevbend nekarîn derbasî Neynewayê bibin.

Di sala 612an b.z artêşa medan karî bi mencenîqan rîyekê di dîwarên Neynewayê de veke û pirbûna ava Çemê Dicleyê di werzê biharê de ji ber hilandina berfê li ser çîyayên Kurdistanê alîkarîya wan kir ku rêya çem ber bi dîwarên Neynewayê[55] ve bidin û rêyek tê de vekirin û derbasî bajêr bûn û qiralgeha asûran têk birin û qiralê asûr Sîn Şarîş kon kurê Aşûr Banîbal[56] kuştin û navenda wî şewitandin. Dawî piştî ku artêşa medî û babilî pey asûran ketin heta bajarê heranê, qiralgeha asûran hilweşîya û sala 612an b.z împeretorîya Asûrî heta hetayê bi dawî bû. Piştî şoreşa medan, serdema civaka koletîyê ku sê hezar salan dom kir bi dawî bû.

Hingî împeretorîya Asûrî xurt û bihêz bû, bawerîyek li nik gelên bindest çêbû ku ne bi destê lehengên efsaneyî be, ev împeretorî têk naçe. Bi rastî jî piştî ku ev împeretorî bi destê medan bi fermandarîya Keyxisro bi dawî bû, efsaneya Kawayî Hesinkar û Cejna Newrozê nav û deng dane ku bi atîfeyeke şoreşgerane salane ji 2600 salî ve tê pîrozkirin. Di qiralgeha Medî de, ya ku li hember qiralgeha Asûrî bi ser ket, civaka koletîyê nebû ku bingeha wê Xwedawend – Qiral – Kahin be anku kes bi navê olê nedihat bindestkirin. Biserkeftina medan û rizgarkirna gelên bindest ji qiralên asûran bandoreke erênî ya mezin li niştecihên Kevana Zêrîn di nav de gelê asûr bi xwe kir.

Li gor hin jêderan, cotyar û gelê asûr piştgirîya hêzên hevbend yên bi serkêşîya Keyxisro dikirin, ew jî ji ber ku zîyan ji şantaj û eskerkirinê ji hêla qiralên[57] xwe ve didîtin. Heta bi nebîyên ibarnîyan weke Danyal û Nahûm ku li Neynewayê[58] dîl bû piştgirîya wan dikirin û biserkeftin wekî danekê ji Xwedayî û sizayekê ji qiralên asûran re didîtin. Ev biserkeftin qonaxeke giring bû di dîroka deverê de ku hêzine nû li Rojhilata Navîn ya kevn

[55] Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl; Qiralgeha Medan; çapa yekem 2011; weşanên Sazîya Mukiryanî ya Lêkolîn û Weşanê – Hewlêr; r.67.

[56] Heman jêdera berê; r.67.

[57] K. Matfîf û A. Sazonof; Şaristanîya Dêrîn ya Di navbera her du Çeman de; werger Dr. Hena Adem; weşanên Weşanxaney el-Mecid – Şam 1991; bê jimara çapê; r. 197.

[58] Hesen Kakî; Împeretorîya Medan ya Kurd/Destpêk û Dawî; bê weşanger û jimara çapê; r. 51.

Dr. Ehmed Mehmûd el-Xelîl; Qiralgeha Medan; çapa yekem 2011; weşanên Sazîya Mukiryanî ya Lêkolîn û Weşanê – Hewlêr; r. 68.

derketin ji hêla grîk, faris, roman û hwd ve nedihat nasîn û olên Bîladi-Rafîdeyn yên kevn winda bûn ku piştgirên civaka koletîyê bûn.

Em dikarin wateya şoreşê di serkeftina medan û danûstandina wan a baş bi gelên derdorê re bibînin; ew jî li gor hevrûkirina reftarên wan bi yên qiralên aşûrî, babilî û akadî yên ku berîya wan bûn, her wiha reftarên qiralên farisî û babilîyan ku piştî wan hatin, tê xuyanîkirin; ku ew jî mîna berdewamîya desthilatdarîya Xwedawendê -rahib- qiral xwe didin dîyarkirin, nemaze danûstandina wan a bi şoreşên ku li dijî wan derketin re ku heyanî roja îro jî didomin, dîyar dibe. Her wiha medan wek qiralên aşûrîyan nekir, wan tu êrîşên qirkirinê li dijî xelkê Nînewa û bajarên din ên aşûrîyan pêk neanîn[59]. Berevajî vê yekê, wan ji kesên ku malên wan ji ber rewşa şer wêran bûbûn re mal peyda kirin û ew li gundên derdorê belav kirin û hemû samanên wan li wan vegerandin. Her wiha rê dan kesên revîyayî da ku dîsa li cih û warên xwe vegerin û rêûresmên olî, dab û nerîtên xwe û rêbazê xwe yê jîyanê, bidomînin. Jixwe ev yek nêrîna profîsor Dîyakov tekez dike[60]; ku nêrîna wanên dibêjin aşûrî rastî qirkirinê hatine, vala derdixe û dibêje ku ev nêrîn dûrî rastîyê ne. Berevajî aşûrîyan, medan bi gelên derdorê re têkilîyên baş danîn û piştî gelek şer û pevçûnên bêsûd, bi wan re peymanên li ser bingeha cîrantîyeke baş, mîna yên ku di roja îro de di navbera dewletan de têne çêkirin, girêdan. Li gor wê jî bi padîşahîya Lîdyayê ku dikeve rojavayê padîşahîya Medyayê re peymana Rojgirtinê girêdan û ji bo xurtkirina wê jî, padîşah Astîyag lawê padîşah Keyxusrew bi Arînis keça qiralê lîdî Ilyatis re zewicî[61]. Têkilîya hevaltîyê bi gelê babilî kildanî re dom kir û li gor wê jî qiralê Babilî-Kildanî Nebûxez Nesir bi keça qiralê medî Omîd\Amîtîs re zewicî û ji wê re bexçeyên Babilê yên daliqandî ava kirin. Her wiha keça qiral Astîyag bi yek ji mezintirîn mîrên farisan (Qembîzê yekem) re zewicî. Li kêleka wê jî têkilîyên wan bi gelê Ibranî re pir baş bûn.

[59] Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl; Padîşahîya Mîdyayê: çapa yekem 2011; weşan: Sazîya Mukriyanî ya lêkolîn weşanê; Hewlêr; R69.
[60] K. Mavîv û A. Sazonov; Şaristanîya dêrîn a di navbera her du çeman de; werger: Dr. Hena Adem; weşan: Wşanxaneya El-Mecid li Şamê 1991; bê nimre R198
[61] Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl; Padîşahîya Mîdyayê; Çapa yekem 2011; weşan: Sazîya Mukraiyanî ya lêkolîn û weşanê; Hewlêr' R72.







Şervanên Medî

Pêkolîya kurdan a ji bo azadîyê, bi rêya hilbijartina padîşahên xwe û pêbawerbûna bi ramanên wan, lidarxistina şoreş û şeran li dijî dijminên xwe û çêkirina têkilîyan di navbera xwe û miletên derdorê de, tê xuyakirin. Van xalan hişt ku medî ji bo birêvebirina miletên herêmê û xilaskirina wan ji stemkarî û koletîya ku qiralên - xwedawend - wê demê bi hezarên salan dabû sepandin, bibin pêşeng. Dîrokê şahidîya gelek rêberên mezin ên kurdan kiriye ku dikarîbûn miletên herêmê di bin sîya pergalên konfederal de bikin yek. Ji padîşahên medan ku li hember stemkarîya imperatorîya Aşûrî ya ku di bin navê olê de dabû sepandin, miletên herêmê kirin yek, heyanî Selaheddînê Eyyûbî yê ku dîsa li hemberî êrîşên xaçperestan ên li ser Rojhilata Navîn ku bi navê olê pêk dianîn, miletên herêmê kirin yek. Herî dawî jî hatina rêberê navneteweyî Ebdullah Ocalan ê ku tevaya gelan li hember stemkarên xwînmij ku dîsa bi navê olê kiryarên xwe didin meşandin, her wiha li hemberî êrîşên DAIŞ'a ku li hember civakên xwecihî bi kuştîn, şewitandin, êşkencekirin, komkujî, riswakirina jinan, kir yek. Jixwe DAIŞ'ê di van kiryarên xwe de stratejîya imperatorîya aşûrî dida meşandin ku der barê vê yekê lêkoler Nehîm Fereh[62] wiha tîne zimên: "Imperatorîyeke pir fireh da avakirin ku gelek miletên cihêreng di nava xwe de dihewandin. Wan miletên herêmê ber bi herêmên dûr ve dan

[62] Nehîm Fereh; Dîroka kevnar a Rojhilata Jêrîn\ siyasî, civakî, aborî û çandî; weşan: Weşanxaneya El-Fikir; bê nimre û dîroka weşanê; R171,177.

koçberkirin û li şûna wan hin miletên din ku ji welatin din anîbûn, bi cih kirin; da ku hestên neteweyî têk bibin, miletên herêm lawaz bikin û di navbera wan de kîn û nefretê belav dikin û di encamê de nikaribin li hemberî wan serî hildihn.. Paşayên aşûrîyan gelek xwîn rijand û stemkarî da meşandin. Wan çavên dijminên xwe derdixistin, zimanên wan jê dikrin, çermên wan bi saxî radikirin, gelek milet talan kirin û bi destekî ji agir û hesin hukimê xwe da meşandin. Artêşa wan bi ku ve çûba, tirs, talanî û wêranî li dûv xwe dihişt. Li gor wê jî Rojhilata Jêrîn heyanî nêzî hezar salî bûbû qurbanîya vê artêşa xwînmij."

Eger ne ji rêbertîya Ebdullah Ocalan a ramanî û manewî ya li cem Hêzên Sûrîyaya Demokratîk û Yekîneyên Parastina Jinê ba, dê DAIŞ têk neçûba. Wek çawa medan dikarîbû gelên herêmê ji bo berxwedana li dijî stemkarîyê bike yek, kurdan jî dikarîbû bi rêbertîya Ebdullah Ocalan li hember stemkarîya DAIŞ'ê û hewldanên hin rêjîmên herêmê yên ku dixwestin stemkarîya xwe li ser civakên xwecih bisepînin, gelên herêmê bi kurd, ereb, suryan, ermen û tirkmenan ve di bin ala Hêzên Sûrîyaya Demokratîk de, bikin yek. Şaristanîya mirovahîyê divê ku li gor dûrbûna ramanî û cih û demî ya ji civaka kole were pîvandin; an ku peydakirina baştirîn rêbazên jîyanê yên li ser bingeha sincên baş. Fêrbûna jîyankirina bi derdorê re, yekemîn gava ber bi pêkanîna şaristanîyê ve ye; jixwe em vê yekê hem li cem medan di serdema padîşahên damezirêner ên padîşahîya medî de û hem jî di paradîgmaya Neteweya Demokratîk a ku xwe dispêre çandeke dêrîn de, dibînin.

Piştî hilweşîna imperatorîya Medî ku li ser destê Kîros û di encama ixaneta Herpakos/Arpak ji padîşah Astîyag re di 550 bz de, koletî bi awayekî nû vegerîya. Êdî Kîros weke qiralê medan û qiralê Mîdya û Faris hat binavkirin û li gor wê jî qonaxeke sîyasî û çandî ya nû di herêmê de dest pê bû. Kîros êrîşî gelên herêmê kir[63], mîna kildan û lîdîyan, her wiha wî gelên herêmê kir, mîna kildan û lîdîyan, her wiha êrîşî padîşahîya Masacîtay jî kir û li wir li ser destê wan hat kuştin. Dibêjin ku padîşaha wan daxwaz kir ku termê Kîros jê re bînin, rabû serê wî jê kir û xist nava cereke tije xwîn; bi vê yekê xwest ku tinazên xwe pê bike da ku ji xwînmijîyê têr bibe. Her wiha

[63] F. Diyakoniv – S. Kovalîv; Şaristanîyên kevnar\beşa yekem; werger: Nesîm Wakî El-Yazicî; çapa yekem 2000; weşan: Weşanxaneya Elaedîn; Şam; R199

peyhatîyên wî di sala 525 bz de êrîşî Misir û Girîkê kir, Atîna dagir kir û Akropol a ku komelgeha Xwedawendên yewnanî bû, şewitand. Her wiha li bakurê Deryaya Reş êrîşî welatê iskîtan jî kir û şoreşên hundirîn bi xwînrijîyê têk birin.

**Newroz, têkelbûna efsane bi şoreşê re:**

Çîroka efsaneyê gava nekeve nav pîrozîyan, bi demê re winda dibe. Efsaneya Kawayê Hesinkar jî, bi tevî ku danerê wê yê destpêkê ne dîyar e, lê bi rêya têgeh û bûyerên wê nas dikin ku tê de bawerîyên olî hene û bi zordestîîyê re hevrûkirî ne. Pêşîyên kurdan mîna gûtî, îlamî, kaşî, sûbaro, lûlûbî, mîtanî, hûrî û medan, li ser destên paşayên Mezopotamyayê û bi pîrozkirina ji alîyê Xwedawendên wan ve, gelek zordestî dîtine. Ev yek bandoreke wê ya neyînî li ser kurdên kevnar hebû û li bal wî hestekî wiha çêkir; ku ev zordestîya li ser wan tê kirin bi rêbertîya Xwedawendê wan pêk tê. Lewre jî li beramberî van Xwedawendan helwesteke neyînî stand û bi tevî ku ev Xwedawend li cem bawermendên xwe pîroz bûn jî, lê belê wan bi çavê Xwedawendên şerxwaz nihêrî. Li kêleka wê jî ola wan dijberîya bawerîyên pêşîyên kurdan dikir[64]. Ji ber ku efsane pir kevn û kurt e; têgehên wê di nava xwe de gelek sembolan dihewînin û ji nifşek heyanî nifşekî bi devkî hatiye. Jixwe heya niha tu neqş an jî belgeyeke ku derbirîna vê efsaneyê dike nehatiye dîtin. Lê belê derbirîna cewherê çanda pêşîyên kurdan a kevnar dike û li ser vê yekê jî ramanwerê kurd Ebdullah Ocalan tekez dike û dibêje[65]:" Hilweşîna Nînewayê delîveyeke dîrokî bû ku li rojhilatê Zagrosê şaristanî bi pêş bikeve û geş bibe û ji bo ku qonaxeke nû dest pê dike, her wiha girîngtirîn pêşketin di dîrokê de bû. Darîçav e ku vê pêşketinê xwe spartiye bingeheke dîrokî ku li ser mîrateya berxwedana gelêrî xwe têr kiriye: Mîna Kawayê Hesinkar ku di berxwedana xwe de, xwe spartiye kevneşopîyên şaristanîya sumerî, piştre jî îlamî, gûtî, kaşî, hûrî, mîtanî û urartîyan. Lewre jî wek efsaneyekê di bîrdanka gelêrî de cihê xwe girtiye û pêkhatinek bi şoreşa vîn-sincê ya zeredeştî re çêkir. Hûrgilîyên mayî jî, karê lêkolînên dîrokî ne ku xwe dispêrin belgeyan…"

---

64 Ji bo bêhtir der barê bawerîyên kurdan de bizanî li vê veger: Dr. Xelîl Ebdilrehman, Avesta/Pirtûka pîroz a ola Zeredeştîyê, çapa duyem 2008, weşan: Rewafid a çand û hunerê-Şam

65 Ebdullah Ocalan, Ji Dewleta Rahibên Sûmerîyan Ber Bi Şaristanîya Demokratîk Ve, beşa yekem, bê weşan û nimreya çapê, R155 PDF

Em balê bidinê ku rêûresmên pîrozbahîyên cejna Ekîtoyê ya li Babil û Asûrê hinekî dişibin hin parçeyên efsaneya Kawayê Hesinkar û pê re jî hin sembolên kevnar ên ku vedigerin serdema sûmeran û berîya wan, tê de dibînin. An ku efsaneya Kawayê Hesinkar encama kombûna mîrateyên çandî û azarên ku ji ber destê paşayên zordest ên Mezopotamyayê ye. Her wiha derbirîna nêrîna civaka kurd a kevnar a li hember çanda imperatorîyên ku xaka wan dagir kiriye, bajarên wan wêran kirine, zarokên wan kirine kole û xêrûbêrên wan talan kirine, dike[66]; ku bi hezarên salan hestên stemkarî û zordestîyê li ser hev kom bûbûn. Her wiha dîmenên serjêkirinê û pêşkêşkirina qurbanîyan û qiralê mesixkirî, li gor nêrîna pêşîyên kurdan dîyar e ku ev hemû ji çanda Rahib-Qiral a di Mezopotamyayê de, hatine. Êdî hinek rengên arî jî bi rêya kesayeta Kawayê Hesinkar û xwespartina li çîyayan, her wiha rabûna şoreşê û serkeftina wê bi kuştina sembola şer (Dehak) lê zêde kirine; da ku piştre Newroza kurdî vegere û vejîneke nû ya gelê kurd çêbibe.

Cejna Ekîto ya ku dewletên rahib-qiral pîrozbahî pê dikirin, di nava xwe de gelek nîşaneyên wateyên efsaneya Kawayê Hesinkar ên mîna berteka li hember stemkaran, dihewîne. Em dikarin şîroveya lêkoler Margaret Rothin[67] ya der barê cejna Ekîtoyê de ku di pirtûka wê ya navdar "Dîroka Babilê" de hatiye, wiha bînin zimên: "Cejna Ekîtoyê cejneke kevnar e, vedigere serdema sûmerîyan ku ji bo pîrozkirin û xelatkirina Xwedawendên sûmerî yên xwecih pêk dihat. Lê belê babilîyan ev cejn kirin cejneke taybet bi Xwedawend Mardox ku di destpêka payîzê de çêbû û dihat wateya destpêka salê. Lê belê Hemûrabî sersal xist destpêka buharê, an ku di yekê nîsanê de û duazdeh rojan dirêj dikir. Di rêuresmên ayînî de Xwedawend Mardox û lawê wî Nabû dihatin bibîranîn û qiral bi xwe jî beşdarî rêûresman dibû. Di her sê rojên destpêkê de mezinê rahiban beşdar dibû

[66] Stratejîya qiralên aşûriyan a piştî dagirkirina her herêmekê ew bû ku çi kesê dizanin dê li dijî wan derkeve bikujin û tevaya gelê dagirkirî bikin kole û hemû çand û pîrozîyên wan ji xwe re bibin.. ji bo bêhtir binasî li beşa duyem/Derketina imperatorîya aşûrîyan a lêkoler Maspîro vegere:
G. MASPERO; HISTORY OF EGYPT CHALDEA, SYRIA, BABYLONIA, AND ASSYRIA/ CHAPTER II—THE RISE OF THE ASSYRIAN EMPIRE; THE GROLIER SOCIETY PUBLISHERS; LONDON; Release Date: December 16, 2005; Link: https://www.gutenberg.org/files/17326/17326-h/17326-h.htm

[67] Margaret Rothin, Dîroka Babil, Werger: Zêna Azar û Mîşêl Ebî Fadil, çapa duyem 1994, weşan: Weşanxaneya Iwêdat – Beyrût – Parîs, R 129 … 148

ku rêûresmên ayînî bi pakkirina bi ava Feratê û mûzîk û stranan pêk dihatin. Di roja sêyem de, qiral ferman dida ku du peyker werin çêkirin, yêk bi wêneyê mar û yê din jî wêneyê tûpişk; ku di cîhana jêrîn de nîşaneya şerî ne, piştre jî cil li wan dikirin da ku bibin mîna kesayetên rastî. Di roja çarem de, mezinê rahiban li ber peykerê Mardox Destana Afirînerîyê dixwend. Di roja pêncem de, mezinê rahiban serê berxekî yan jî kavirekî jê dike, dîwarê peyker bi xwîna wî ajalê serjêkirî dişo da ku pîsîtîya wî vexwe û pê re jî pend û şîretan dixwîne, piştî wê jî termê wî ajalî diavêjin nava çem. Jixwe ajal di şûna mirov de dikirin qurbanî, da ku ew şerê ku ajal dikare barê wî ragire, têk biçe. Di roja şeşem de, rêûresmên mirin û rabûna Mardox (Raza êşên Mardox) pêk tînin; li gor wê jî wiha tê xeyalkirin ku Xwedawend di nava goreke ku ne roj û ne jî ronahî derbasî wê nabin de, bi zincîran girêdayî ye û bi vî rengî êşa Xwedawendan tê wesifkirin. Piştre Xwedawend Nabû tê, da ku bavê xwe xilas bike û li ber Xwedawend Sin û Şemş lava dike da ku xweda vegerînin jîyanê. Xweda wiha tê xeyalkirin ku bi cilên mirinê ye û ji birînên wî yên ku pê bêhal bûye tê şûştin û piştre wî tînin goristanê û du cêwî li ber derîyê Îsacîl parastina goristanê dikin. Di nivîsara ku li ser tabloya di nivîsgeha Aşûr-Banîpal de hatiye dîtin de; di dema ku berê wî didin gorê de navê Stêrnasan (Mecûs) tên zimên. Piştre jî rêuresmên mayî didomînin û bi termê xweda re dimeşin -lêkoler vê dramaya pîroz wek qonaxên êşa Mardox dibîne- û di dawîyê de Mardox li ser destê Nabû xilas dibe. Heman bûyer li welatê Aşûrê jî heye; ku xwedayê neteweyî yê aşûrîyan heman taybetmendîyên Mardox û hin taybetmendîyin din dihewîne. Hin rêûresmin din ên cejan Ekîtoyê hene û dibe ku kesekî din rola qiral dilîze û di dawîyê de tê îdamkirin û nîşaneyên padîşahî ji qiralê rastî re vedigerin. Dibe ku ev yek li şûna rêûresmên kuştina komî ya ku li Ûr di demên kevnar de ku li goristana bi navê "Goristana Qiralan" pêk dihat de, dihatin meşandin. Li gor wê jî kesekî xwe dikir wek kesayeta qiral û bi awayekî sembolîk an jî rêûresmî rastî mirinê dihat û qiral jî sax dibû; çi ku cejn tê wateya jîyana nûbûyî. Di roja heftem de serê her du peykeran dihat jêkirin û dixistin nav agir de. Ji roja heştem heyanî roja yazdem, pirozbahî ji bo vegera Xwedawend Mardox dihat kirin û li tevaya Babilê (piştre jî li Aşûr) kêf û şahî dihatin lidarxistin, êdî kerwanê xelkên ku pîrozbahî pêk dianîn, berê xwe dida perestgeheke ku li kêleka çemê Feratê hatibû avakirin -ev yek çîroka Ibarhîm bi Nemrûd re tîne bîra me- û li wir nimêj, lava û karên sembolîk ku

derbirîna afirandina cîhanê ji alîyê Mardox ve dikin, dihatin kirin. Di roja yazdem de xelkên ku çûbûn pîrozbahîyan vedigerîyan Babilê û li wir, peykerê Xwedawend Mardox li Îsacîl dihat danîn. Êdî cejna Ekîto bi şûbûneke pîroz di çîna herî jor a perestgehê de, di navbera qiral an mezinê rahiban û rahibeke destnîşankirî de, bi dawî dibû; ku ev yek wek rêûresmeke sembolîk bû û amaje bi geşbûn û zayînê dikir. Di roja dwazdem de her kes vedigerîya li ser karê xwe."

Hevjiaynkirina pêşîyên kurdan ên ku ji alîyê qiralên Sûmer, Akad, Babil û Aşûr ve hatibûn çewisandin, çi yên ku li welatê wan dîl bûn an jî hatibûn kolekirin û çi jî yên ku li Aşûr û Babillê wek stêrnasan (Mecûsî)[68] dixebitîn ku berê hatibûn zimên, her wiha fêmnekirina wan bo zimanê babilî û aşûrî û dîtin û bihîstina wan ji van rêûresman re, roleke wan a mezin hebû ku hin dîmenên efsaneya Kawayê Hesinkar werin çêkirin û piştre veguhere destana serkeftina medan li ser imperatorîya aşûrî di roja Newrozê de yan jî dema destpêka buharê. Medan dikarîbû di derbaskirina sûrên nînewayê de, ji bilindbûna çemê Dicleyê ku piştî berf ji ser çîyayên kurdan ên ku çemên Dicle û Ferat jê diherikin, helîya û berê wê da sûrên bajêr, sûdê wergirin[69]. Ev hemû jî bandoreke mezin li ser hestên civaka kurd çêkir heyanî asta ku hîs bike ji nû ve vejîn bûye.

Ramanwer û rêberê kurd "Ebdullah Ocalan" wiha dibîne ku destana Kawayê Hesinkar ji berxwedaneke demdirêj a li dijî desthilata koletîyê, vejîn bûye[70]. Seba xwesteka qiralên aşûrî, babilî û kildanîyan a ji bo kole û samanan, êrîş li ser gelên Kurdistanê yên kevnar pêk dianîn û bi dehan nivîsarên mîxî hene ku vê yekê tekez dikin. Di nivîsarekê ji wan de hatiye gava ku qiral Eded-Nîrarî yê yekem wesif dike (1307 – 1275 bz) dibêje ku ew[71] "Damezirênerê bajêr û qirkerê tevaya kaşî, gûtî, lûlûbî û sûbarîyên hov

68 Mecûsî, gotineke xirabkirî ya navê qebîleyeke medan a bi navê Magan e. ev qebîle bi qebîleya rahiban (mazdekî û piştre zeredeştî) dihat nasîn. Peyva "Magic" a inglîzî ji vê yekê hatiye darîştin ku li gor Hîrodot ew bi sihirbazîyê dihatin nasîn

69 Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl, Padîşahîya Medyayê, Çapa Yekem – 2011 z, Sazîya Mukriyanî ya lêkolînan û weşanê, Hewlêr, R67

70 Ebdullah Ocalan, Ji Dewleta Rahibên Sûmeran Ber Bi Şaristanîya Demokratîk ve, Beşa Yekem, Bê weşan û jimara çapê, R74 PDF

71 Rafide Edbullah Ebdilsemed El-Qeredaxî, Kurdistana iqarê di dîroka kevnar de li gor nivîsarên mîxî ji hezarsalîya sêyem a beerî zayînê heyanî 612 bz – Teza derçûnê ya

e, ew e yê tevaya dijminan hem li bakur û hem li başûr (jor û jêr) têk birine û xaka wan ji Lûbûdû û Rabîqûm heyanî Îlûxat û tevaya gelan xistiye bin destê xwe… Qirkerê tevaya xakên Tûrûkkû û Nîkmîtî bi hemû paşdîşahên wan û çîya û xakên wan ên bilind heyanî sînorê welatê gûtîyan ên berfireh e". Her wiha di nivîsareke din de ku çîroka têkbirina Ûtûxîngal bo padîşahê dawî yê gûtîyan "Tîrîgan" vedibêje, wiha tê vegotin[72]: "Gûtî marên çîya û dijminên xweda ne, ew in ên ku padîşahîya welatê sûmeran birin çîyê". Jixwe pêşîyên kurdan (Gûtî, kaşî, mîtanî û hûrî) wiha bêdeng li beramberî vê yekê ranewestîyan, lê belê rêzeşer û şoreş li dijî wan pêk anîn û karîbûn hejmarek ji van dewletan biruxînin.

**Hêmanên sereke yên efsaneya Kawayê Hesinkar:**

Efsaneya Kawayê Hesinkar ji gelek hêmanên sereke pêk tê ku pev re dimenin ku derbirîna hest û bûyeran dikin, pêk tîne. Tê zanîn ku di efsaneyê de, qiralê mesixkirî rola sereke di efsanekirina çîrokê de dilîze û yên mayî jî bêhtir nêzîkî rastîyê ne. Dîyar e wêjevanên ku çîroka wê saz kirine û ji nifşekî heyanî nifşekî din anîne, hewl dane hestin hevpar di navbera civakên Kurdistanê de biafirînin. Hêmanên sereke di kesayeta qiralê mesixkirî yê stemkar "Ejdehak" û kesayeta kedkar û şerker "Kawayê Hesinkar", her wiha ciwan û rahib, çîya û agir de tên nimandin. Heyanî ku sembol û dîmenên efsaneyê baş werin têgihiştin, divê ku li koka wan û têkilîya wan bi koka gelê kurd re were lêkolînkirin.

**1.Qiralê Stemkar (Ejdeha)"**

Ejdeha navê ejdeha bi xwe ye di zimanê kurdî ku di kevneşopîya Aryenî ya kevnar de tê wateya şer. Tu efsaneyeke gelan tune ye ku ejdeha tê de nebe[73]; ku di destpêka afirandina cînahê de şerê di navbera afirîner û ejdeha de heye. Her wiha di efsaneyên "Şerê Lehengan" de; niv nîvxwedawend bi ejdeha re şer dikin ku piştre vediguherin dêwekî mesixkirî. Her wiha di navbera mirov û Xwedawendan de rol têne guhartin; mîna ku di efsaneya Hurcles û kuştina wî bo ejdeha de, tê dîyarkirin. Her

doktortîya dîroka kevnar li zanîngeha Silêmanîyê, fakulteya zanistên mirovî/beşa dîrokê – 2008, R47

[72] Heman çavkanî, R54

[73] Dr. Karim Mehmûd Eldilezîz, efsaneyên cîhana kevnar, çapa yekem 2007, weşan: Pirtûkxaneya El-Nafize-Misir, R215

wiha dibe ku koka wê vedigere ola totemîzmê jî. Froid di beşekê ji pirtûka xwe ya bi navê "Derûnnasîya Gelan" 1912'an de, palpiştîyê bi nêrîna Font dike; ku ew yek ji nûtirîn nêrînên der barê mijara totemîzmê de tê dîtin[74]: "Şaristanîya totemîzmê li her derê wek qonaxeke amadeyî ya ji bo pêşketina pîştwext û qonaxeke derbasker a ji mirovatîya destpêkê ber bi serdema leheng û Xwedawendan ve, hat avakirin. Em dizanin ku di navbera xweda û ajalê pîroz (totem, ajalê qurbanîyê) de têkilîyên piralî hene. **1.** Bi awayekî giştî ji bo her Xwedawendekî, ajalek tê terxankirin û carinan jî gelek ajal… **2.** Gelek caran di wêneyê ajalekî de tê pîrozkirin, lewre jî bi tevî ku demeke dirêj li ser totemîzmê re derbas bûye, lê belê gelek ajal heya niha tên pîrozkirin. **3.** Gelek caran di efsaneyan de xweda vediguherîn ajalan û bi piranî jî vediguherîn ajalên ku jê re hatibû terxankirin. Dîyar e ku tiştekî normal e gava em bêjin ku xweda bi xwe, ew ajalê totemî yê ku di asteke ji pêşketina hestên olî de hatiye dinê, ye…" Dibe ku ajal bi rengekî pirserî were dîtin û yekemîn ev rengê efsaneyan di hezarsalîya sêyem a berî zayînê de hatiye dîyarkirin û li ser mohreke lûleyî ya ku tê de pevçûna ejdehayekî heftserî heye û di dawîyê de cîhan diafire, hatiye dîtin.



*Efsaneya afirandina cîhanê piştî kuştina ejdeha*[75]

Ji alîyê din ve jî dibe ku Ejdehak bi wateya (Şeytanê Qiralê Welêt) jî were. Li gor wê; (AZ)[76] di ayînên kevnar ên herêmê de tê wateya (Şeytan) û

[74] Segmond Froid, Totem û Tabo, Werger: Bû Elî Yasîn, çapa yekem 1983, weşan: Weşanxaneya El-Hiwar-Laziqiyê, R132.193.

[75] https://tr.pinterest.com/pin/448319337884157897/

[76] Mersia Ilyad, Dîroka bawerî û ramanên ayînî/Beşa duyem, werger: Ebdilhadî Ebas, çapa yekem 1986/1987, weşan: Weşanxaneya Dimeşq-Şam, R351

Gernunt Fililhem, Hûrî/Dîrok û şaristanîya wan, werger: Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşan: Weşanxaneya Cedel-Heleb, R134

(Dehak) jî tê wateya qiralê welêt. Di hin çavkanîyan de dibêje[77] ku dibe navê "Dîyako" jî ji "Dehak" hatibe darištin ku tê wateya "Qiralê Welêt" û dibe ku nasnavê rahib be jî; ku di hin çavkanîyên fransizî de bi teşeyê "Dehqan" hatiye û tê wateya (Şeytanê Rahib). Di pirtûka pîroz a zeredeştîyê "Avesta" de, navê "Azdehak" bi wateya afirindeyê sêserî yê ku ji alîyê Ahrîmanê Xwedawendê şerî û şeşçav ve hatiye afirandin[78], tê; ku kuştina wî amaje bi serkeftina xêrê ya Ahoramazda û vejîna duyem a afirînerîyê dike. Kesayeta Ejdehak a di efsaneyê de wêneyekî efsaneyî jê re hatiye dayîn û li ser milên wî du mar hene; ji gelek alîyên xwe ve dişibe xwedawendên gelên ku bi pîrozkirina wan, qiralê wan pêşîyên kurdan dagir kirine. Mînak; di hin efsaneyên Mezopotamyayê de, Xwedawend Mardox -ku di serdema aşûrîyan de veguherî Xwedawendê aşûrîyan- bi wêneyê marekî biling dîyar dibe. Her wiha di hin efsaneyên din ên Mezopotamyayê de, Xwedawend Mardox bi wêneyê marekî biqiloç dîyar dibe[79]. Piranîya Xwedawendan di dewletên ku pergala wan a koledarîyê bû de, Xwedawendên ku berê bi teşeyê ajalan bûn veguherîn teşeyên mirovan. Hin nivîsarên aşûrî[80], qiral "Şilîmanserê sêyem" (Şelmanû Aşarîdû) (859 – 824 bz) ku lawê Aşûr-Banîpal e, wek marê pîs ê mezin (Ûşûm Gal) didin dîyarkirin; ku wê demê nasnavê marê pîs ê mezin li Xwedawendan dikirin, her wiha nasnavê Hemûrabî jî pê hat kirin û piştre qiralê aşûrîyan ji xwe re bi kar anî.

Qiral, Xwedawend bi xwe yan jî nûnerekî wî yê yekser bû; li gor wê jî têkilîya kole bi serdar re veguherî têkilîya kole bi Xwedawend re[81]. Di imperatprîya aşûrî de[82], qiral dihişt ku xelk wî wek Xwedawend bibînnin û bi piranî jî Xwedawend "Şemş" dinimand. Dema ku em di nava rûpelên dîroka qiralên ku bajarên Kurdistanê dagir kirine de digerin; em dibînin ku

---

77 Dr. Ehmed Mehmûd El-Xelîl, Padîşahîya Medyayê, çapa yekem – 2011, weşan: Sazîya Mukriyanî ya lêkolîn û weşanê, Hewlêr, R33.

78 Dr. Ebdilrehman, Avesta/Pirtûka pîroz a ola Zeredeştîyê, çapa duyem 2008, Rewafid a çand û hunerê-Şam, R132.

79 Muyeded Ehmed Seîd Xelef, Mîrateya efsaneyî di şîrovekirina Ibin Esîr de, mastername di zimanê erebî û wêjeyên wê de/Zanîngeha El-Necah Nabulis-Filestîn 2015; R181, R164.

80 Ebdilezîz Salih, Rojhilata Jêrîn /Misir û Iraq, weşan: Pirtûkxaneya Incilo ya Misirî 2012, bê nimreya çapê, R775.

81 Ebdullah Ocalan, Ji Dewleta Rahibên Sûmerî Ber Bi Şaristanîya Demokratîk Ve, beşa yekem, bê weşan û nimreya çapê, R29 PDF

82 Well Diwarnt, Çîroka Şariştanîyê/Rojhilata Jêrîn, werger: Mihemed Bedran, beşa duyem a berga yekem 1988, weşan: Weşanxaneya Cîl-Beyrût, R275

di navbera teşeyê wan ê ku li ser wêneyan hatine neqişandin û kesayeta Ejdehak de, şibihînek heye. Di hin wêneyên van qiralan de wiha tê dîyarkirin ku li ser milên wan serî yan jî mar hene. Her wiha sembol an jî mohrek bi navê "Serdarê Maran" li başûrê çîyayê Zagrosê (Loristan) ku navenda şaristanîya Îlamîyan bû, hatiye dîtin û dîroka wê vedigere hezarên salan. Ev yek tê wateya Xwedawendê serdarê mar an jî ejdehayan, her wiha ew vedigere destpêka şaristanîya sûmerî.



*Mohr an jî sembola serdarê ajalan li Loristanê*[83]



*Semboleke ayînî li Loristana Rojhilatê Kurdistanê hatiye dîtin*[84]



*Semboleke ayînî li Loristana rojhilatê Kurdistanê hat dîtin*[85]



*Xwedawendekî cîhana jêrîn li Mezopotamyayê*[86]

Di efsaneya sûmerî de, di destana Gilgamêş û Enkîdo û Cîhana Jêrîn[87] û hin efsaneyên din ên bi navê afirînerîyê de, behsa navê ejdehayê "Kûr"[88] tê kirin; an ku Xwedawendê cîhana jêrîn û Xwedawendê mirin û taritîyê. Ev Xwedawend her tim bi rêya vegerandina jîyanê bo bêgîyanîyê, ronahî bo

[83] Horse Bit Cheekpiece, c. 700 BC Luristan, Iran, c. 700 BC http://www.clevelandart.org/art/1961.33?collection

[84] Luristan Bronzes at the LACMA http://benedante.blogspot.com.tr/2013/04/luristan-bronzes-at-lacma.html

[85] Rod-holder Near Eastern, Iranian, Luristan, Iron Age https://collections.mfa.org/objects/244442

[86] Molded plaque: bearded underworld god, Old Babylonian, ca. 2000-1600 B.C., Mesopotamia. http://massarrah.tumblr.com/post/84946949647/ancient-mesopotamia-molded-plaque-bearded

[87] Dr. Usama Ednan Yehya, Xweda di nêrîna mirovî iraqî yên kevnar de,/lêkolînek der barê efsaneyan de,çapa yekem 2015, weşan: Aşûr-Banîpal a pirtûkan, Bexda, R172.

[88] Firas El-Sewah, Serpêhatîya Mêjî ya Yekem,/Lêkolîn der barê efsaneya Sûriya û Mezopotamyayê de, çapa yazdem 1996, bê weşan, weşanxaneya Elaedîn-Şam, R2015

tarîtîyê û tevgerînê bo rawestînê û bi alîkarîya (Asac) efrîtê cîhana jêrîn û Xwedawendê nexweşîyan, hewl dide ku cîhanê qir bike û her tiştî vegerîne mîna berîya afirînerîyê. Di sê efsaneyan de, Xwedawend Înana "xwedawenda hezkirin û jîyan û geşbûnê" (ku piştre bû Iştar) û Enkî " Xwedawendê avê" û Nînûrta "lawê Xwedawend Enlîlê çîyayî ku Xwedawendê ba û tevgerê ye, li dijî Asac şer dikin; ew jî piştî ku xwedawend Erşikcal direvîne û dibe cîhana jêrîn; ku piştre dibe xwedawenda cîhana jêrîn. Jixwe çarenûsa ejdeha "Kûr" nayê zanîn; çi ku hin nivîsar winda û wêran bûne, lê belê navê wî li cîhana jêrîn hatiye kirin. Her wiha navê wî di kurdîyê de tê beramberî navê "Gor"ê[89]. Lê belê Asac jî, Nînûrta lawê Xwedawend Enlîl şerê wî dike û dikare wî û Kûr jî têk bibe[90]. Di serdema sûmerî û akadîyan de, di wêneyên (1,2,3)[91] de Xwedawend-marê Nîn-gîş-zîda[92] ku piranî di efsaneyên sûmerî de wek parêzvanê text û dergevanê mala Xwedawend Anû ku Xwedawendê esman û serokê encumena Xwedawendan e, tê dîtin. Di vê yekê de, Xwedawendê geşbûnê "Dîmûzî" ku parêzvan û bergirê kesane yê qiral Gûdîya ye, pê re hevkarîyê dike. Wiha hatiye wesfkirin; ku hevrêzê Nîngîrsû (Xwedawendekî sûmerîyan e) ye, her wiha dergevanê cîhana jêrîn bû, navenda peristina wî li bajarê Çîş-Banda ku li herêmeke daristanî di navbera Ûr û Lagaşê de bû û sembola wî jî marê biqiloç ê bi navê (Başmû) bû; jixwe ev mar, marekî mezin û dirêj e û pir dev û zimanên wî hene. Her wiha di serdema Lagaş a duyem de, bi rengê Xwedawend û li pişt milên wî marên ber bi jor ve hene, derdikeve pêş (wêneyên 1,2,3). Ev mînandin heyanî serdema babilî ya kevnar hat domandin, lê belê di serdema hîtîtan de jî wiha hat dîyarkirin ku wî mar bi destê xwe girtine û li ber sînga xwe hembêz kirine û serê wan maran jî ber bi jêr ve ye. Jixwe hebûna maran li pişt milan tê wateya ku ew bi bêmirinîyê mehkûm e; çi ku di gelek efsaneyên kevnar de, mar sembola bêmirinîyê dihat dîtin. Xwedawendên îskîtan jî ji vê wesfê ne bêpar in û tê zanîn ku îskîtan di dema hevbendîya bi aşûrîyan re, li Kurdistanê bûn sedema gelek komkujî û wêranîyê.

[89] Murşid El-Yûsiv, Dûmûzî (Tawûsê Melek)/Lêkolîn der barê koka ayînên kurdî yên kevnar de, çapa yekem 1999, bê weşan, R32
[90] Heman çavkanîya berê, R122
[91] Ebdilemîr El-Hemedanî, Rola mar di bawerîyên Mezopotamyayê de, Kovara Wêjeyên Sûmerî, hejmara sêyem, sala yekem, 2008, R6.
[92] Heman çavkanîya berê, R5



*Wêne (1): Nexşeya dîmenekî ku li ser mohreke lûleyî hatiye neqişandin û tê de dîyar dibe ku Xwedawend -mar Nin-gîş-zîda paşayê Lagaşê qiral Gûdîya pêşkêşî Xwedawend Enkîyê ku li ser text rûniştî ye, dike*



*Wêne (2): Mohreke din e ku tê de heman dîmen heye û tê de Xwedawend (Lama) li pişt Gûdîya sekiniye; ku ew Xwedawendê dilovanîyê ye û her tim destên wê ji bo dua û lavayan bilind in.*



*Wêne (3): Neqşeke kevirî ye û hinekî berz e ku tê de qiralê Lagaşê Gûdîya (Neqşa rûyê wî ne bi wêneyekî temam derketiye) xuya dibe û Xwedawend Nin-gîş-zîda destê wî girtiye û wî dibe li cem Xwedawendekî ku li ser textê Enkî rûniştî ye ku ava zelal a ji bo zevîyên Lagaşê belav dike. Tê de dîyar dibe ku serê ejdeha-maran ji ser milên Nin-gîş-zîda derdikevin. Xwedawendê ku li pêşîya Nin-gîş-zîda rûniştî ye, nenas e. Lê belê Gûdîya di destê xwe de şitileke dara xurmê radike ku nîşana Xwedawend (BA'û) Xwedawendê zevî û daristanan e.*





*Hin Xwedawendên Iskîtan*[93]

Her wiha hinek lêkoler maran wiha dinirxînin ku nimandina çemên Dicle û Feratê dikin. Her wiha bûyîna sedema êşê ji qiral re jî, tê wateya bilindbûna van her du çeman gava ku zevîyên wan wêran dikin û dibin sedema gelek xisarê ji wan re. Lewre jî em dûr naxin ku pêşkêşkirina qurbanîyan ji wan re ji bo sivikkirina vê hêrsê ye. Di neqşeke sûmerîyan de wêneyek dîyar dibe ku derbirîna Eknî dike û li seranserî milên wî du herikîninên avê hene ku nimandina çemên Dicle û Feratê yên ku ji çîyayên Kurdistana bakur diherikin, dikin. Lêkolerê dîrokzan (Silwat Golîyamov) wiha dibîne ku[94] "Bilindbûna xwezayî ya çem bi mar-ejdeha "Ejdehak" ku mirovxwer û di ola kurdî ya kevnar de nîşana şerî ye, ve tê girêdan. Piştre jî di Avestayê de koka kurdan vedigerîne revîna 500 xortên ji qiraxên deryayê ber bi çîyê ve; ku ji ber şerê Ejdehakê mar revîyane û dest bi kedîkirina pez kirine…" Tê zanîn ku destpêka buharê ku di 21'ê adarê de ye û çemên Dicle û Ferat bilind dibin û gengaz e ku rahiban qurbanî pêşkêşî her du çeman kirine da ku hêrsa wan sivik bike. Dema ku ji cihekî bilind ve li her du çeman dinêrin, mîna du maran xuya dibin. Her wiha şibihandina maran li ser milên qiralan bi çemên Dicle û Feratê, tîne bîra me ku her du çem nêzî bajarên Hûrîyan in (Heran– Aran– Riha– Ruha li Urfayê) ku ew bi xwe dilê

[93] Aphrodite Ourania; Great Dragon Mother; 17/11/2015; Link: http://www.abovetopsecret.com/forum/thread1092953/pg1

[94] Silwat Goliyamov; Arîya kevnar û Kurdistana herdemî (Kurd kevntirîn gel in), weger: DR. Ismaîl Hesaf, çapa yekem 2011. Weşan: Sazîya Mukriyanî ya Lêkolîn û weşangerîyê

padîşahîya kurdî ya Hûrîyan bûn[95]. Di ola Hûrîyan de jî çem girêdayî bi çîyayan ve tên zimên[96].

Lewre jî rahibên Meopotamyayê mezinên Xwedawendên xwe (Enkî) wek (Marê mezin ê li ser Erîdû sekinî)[97] didan nasandin. Di nava berpirsîyarîyên wî de, rêveberîya karûbarên avê bû. Her wiha xelkê Iraqê yê kevnar jî çemên Dicle û Feratê wek maran dişibihandin. Di serdema babilîyan de jî ku hevdemî serdema kaşîyan (yek ji pêşîyên kurdan) de, mar bû girîngtirîn sembolên Xwedawend Mardox lawê Xwedawend Enkî. Di hin neqşan de hatiye dîyarkirin ku li kêleka wî marê bi navê (Mûşûşû) heye. Ev mar, ajalekî efsaneyî ye û wêneyê wî li ser dergeha Iştar li babilê hatiye neqişandin. Di vê dergehê de gelek leşker, dîl, kole, bazirgan û serdanker derbas bûne. Di hezarsalîya sêyem a berî zayîne de, Xwedawendekî nû ku mar ji bo xwe kiribû sembol, derket pêş; ev Xwedawend jî (Nîrah )[98] e ku erka wî parastina perestgeha Îkûr li Nîpûrê ye û ji bo peristina Enlîl Xwedawendê bayê ye. Her wiha di hin nîgarên sûmerî yên neqişandî û berz de derketiye ku du marên nêr û mê li derdora perdaxekê zîvirîne û ber bi devê perdaxê ve radibin, li pişt wan jî ejdehayê (Mûşxûşû) yê du bask li pişt wî hene û xwedî taybetmendîyên Xwedawendî ku di taca biqiloç a li ser serê wan de dîyar dibe, heye. Lêkoleran ev neqş wek semboleke Xwedawend Nin-gîş-zîda ku Xwedawendê derman û saxlemîyê ye, dibînin[99].

---

[95] Murşid El-Yûsiv, Dûmûzî (Tawûsê Melek)/ lêkolîn der barê koka olên kurdî yên kevnar de, çapa yekem 1999, bê weşan, R180

[96] Gernût Filîlhim; Hûrî/Dîrok û şaristanîya wan, werger: Dr. Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşan: Weşanxaneya Cedel-Heleb, R115

[97] Ji bo bêhtirî bizanî li vê vegere: Ebdilemîr El-Hemedanî, Rola mar di bawerîyên Mezopotamyayî de, weşan: Kovara wêjeyên sûmerî – hejmara sêyem – sala yekem, 2008

[98] Heman çavkanî.

[99] Heman çavkanî, R10



*Xwedawendê sûmerîyan Enkî an ku Xwedawendê ava paqij*[100]*. Li ser milên wî du xêzên avê yên xwar hene ku di nava wan de masî dilivin; ev yek nimandina çemên Dicle û Feratê dikin.*



*Xwedawend Nîrah*



*Sembola Xwedawendê berpirsê derman û saxlemîyê (Nin-giş-zîda) di dema qiralê Lagaşa sûmerî, Gûdîya de ye.*



*Nergal – Xwedawendê cîhana jêrîn*[101]



*Xwedayekî sûmerîyên kevnar – Ninhursag*[102]



*Şemş – Xwedawendê babilîyan*[103]

Lê belê di efsaneyên babilîyan de ejdehayê bi navê "Labû"[104] heye ku ji binê avê derketiye da jîyanê tune bike û piştre Xwedawendekî ku navê wî

[100] Enkî – Wîkîpedya, zanistnameya serbest
[101] Mesopotamian Gods & Kings; Link: http://www.mesopotamiangods.com/
[102] Ninhursag is the Sumerian Goddess of fertility - http://www.goddessaday.com
[103] Copper statue of the Sun God Shamash, dating back to 1700-1600 BCE. Shamash, the Babylonian god of justice, is depicted on the famous Code of Hammurabi. The sun is named after him in Arabic, Hebrew and Syriac. Brooklyn Museum, Brooklyn, NY

nehatiye zanîn wî tune dike. Lê belê roleke mezin a Xwedawend Enlîl di kuştina wî de heye. Wek ku me anîbû zimên, Xwedawend Enlîl nîşana çîyayan e, her wiha di efsaneyên Mezopotamyayê de ejdeha derbirîna hêza ku dê afirînerîyê bi rêya çêkirina tevlihevîyê vegerîne rewşa wê ya destpêkê, dike. Di efsaneyên babilîyan de wêneyên hin Xwedawendan derdikevin ku li ser milên wan du berzbûn an jî mar hene; mîna Xwedawend Nergal, Mardox an jî Şemş ê ku desthilat radestî Hemûrabî kir. Sebartî Xwedawend Nergal, di hezarsalîya sêyem a berî zayînê de, li cem Hûrîyan xwedî taybetîyeke pîroz bû[105]. Di efsaneya "Elê Kemê"[106] ya hûrî de behsa afirînerekî tirsnak tê kirin ku navê wî "Elê Kemê" ye, li ser milê Xwedawendekî çêbûye û dixwaze mirovahîyê qir bike û desthilatê vegerîne destê Xwedawendan. Di efsaneyê de lehengek derdikeve ku navê wî "Ebillerî" ye ku xwe davêje bextê Xwedawend "Eya" da ku dasika ku Xwedawendan pê erd û ezman ji hev veqetandin bi dest bixe, piştre bi wê dasikê "Elê Kemê" ji koka wî jê dike û gelek şer di navbera wan de çêdibin, di dawîyê de jî Xwedawend vî afirînerê mezin tune dikin.



*Serdarê padîşahîya tarîtîyê (Nergal) Xwedawendê cîhana jêrîn*



*Xwedawendê neteweyî yê babilîyan desthilatê radestî Hemûrabî dike ku mîna rewabûnekê dide hukimê wî*



*Xwedawend Mardox û li kêleka wî ejdeha Mûşûşû ye*


---

104 Firas El-Sewah, Serpêhatîya Hiş a Destpêkê/lêkolîn der barê efsaneya li Sûriya û Mezopotamyayê de, çapa yazdem 1996, weşan: Weşanxaneya Elaedîn-Şam, R225
Usama Ednan Yehya, Xweda di nêrîna mirovê iraqî yê kevnar de/lêkolîn der barê efsaneyan de, çapa yekem 2015, weşan: Aşûr-Banîpal a pirtûkan-Bexda, R196.

105 Ji bo bêhtir binasî li vê veger: Gernût Filîhilm, Hûrî/Dîrok û şaristanîya wan, werger: Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşan: Weşanxaneya Cede-Heleb, R105

106 Heman çavkanî, R114

Ji alîyekî din ve jî bawerîyên Êzdatîyê[107] tînin zimên ku gava Nûh dadikeve li ser çîyayê Şengalê û zîyanên ku maran pêk anîne dibîne, mar digire û wî dişewitîne; ji xwe berîya wê maran di bin çengê mirov de ji xwe re kiribû mal û di nava laşê wî de dijîya. Aniha jî em li ser derîyê perestgehên Êzdatîyê marekî yan du maran dibînin û di nava wan de derîyê perestgehê ye, ev teşe vê yekê tîne bîra me gava Kawayê Hesinkar derbeyê li serê Ejdehak ku du di nava du maran de bû dixe û civakê ji zordarî û stemkarîya wî rizgar dike.



*Dergehê perestgeha Laleşê ye*




*Cihekî pîroz ê êzdîyan e[108]*

Her wiha hin qiralên ku ji Xwedawendan re dikirin qurbanî, li ser koma mirovan bîyanî bûn, lewre Froid amaje bi vê yekê dike û dibêje[109]: "Li gor şîroveyên ku Frêzer anînê zimên û her çi qasî bi gotina wî ne pir nêzî rastîyê bin jî, lê belê qiralên destpêkê bîyanî bûn, demeke dirêj li ser qiralbûna wan derbas nedibû, êdî di şahîyên fermî de ji Xwedawendên ku nimandina wan dikirin re dibûn qurbanî. Li gor vê yekê jî em dîroka destpêkê ya qiralîyetê di efsaneyên xiristîyanîyê de dibînin…" tê zanîn ku Ejdehak ji gel re bîyanî bû.

---

107 Ismaîl beg Çol (Mîrê Êzdîyan li Şengalê), Êzdatî di navbera kevn û nû de, fakulteya zanistên wêjeyî-zanîngeha Amerîkayê li Beyrûtê-1934, R76.
108 Yılan Sembolünün Dinlerdeki Yeri ; Linke: https://bilimselateistler.blogspot.com/
109 Segmond Froid, Totem û Tabû, werger: Bû Elî Yasîn, çapa yekem 1983, weşanxaneya Hiwarê-Laziqîyê, R71

Der barê Ejdehak de, girêdaneke wî bi totemîzmê ve jî heye û li gor wê lêkoler Dîyakov[110] jî amaje bi bandora totemîzmê li ser olên gelên îranî û gelên din dike. Her wiha der barê totemîzmê de, Froid wiha destnîşan dike[111]: "Piranîya ajalên ku herî di nav ajalên totemîzmê de berbelav bûn, ew bûn ên mîna mar, balinde û mişkan…" Tê zanîn ku di nav çîyayên Kurdiatnê de mar gelek hebûn û bi çavekî pîroz û saw lê dihat nihêrîn. Her wiha li gor Froid navlêkirina mirovan li ser navên ajalên totemî ji çanda gelên kevnar bû "Gava em binêrin ku li cem mirovê destpêkê nav tiştekî bingehîn ê kesayetê bû, em vê rêzdarîya li beramber navan tiştekî normal dibînin.. mirovên destpêkê di navan de beşek ji kes didîtin..."[112] Lewre jî em dikarin şoreşa Kawayê Hesinkar û kuştina wî bo qiral, wek şoreşeke ramanî û destpêkeke derketina ji qonaxa totemîzmê bibînin.

**2. Qurbankirina d ciwanan û pêşkêşkirina mejîyên wan ji her du maran re:**

Piştî ku hemû hewldanên dîtina dermanekî ji bo sivikkirina êş û hêrsa qiral bi bin ketin, rahibekî wî pêşnîyar kir ku jê re du ciwanan bigurînin û mêjîyên wan ji maran re bikin xwarin; ev tê wê wateyê ku rahibek heye bawerîya qiral pir pê tê. Ev yek rahibên sûmerîyan û piştî wan jî yên babilî û aşûrîyan û rêûresmên raza êşên Mardox ku di cejna Ekîtoyê de dihatin lidarxistin, an jî herî kêm nîşaneyên olî yên vê çîroke tîne bîra me. Ji alîyekî din ve jî hinek girêdaneke sembolîk a mêjî bi hişmendîya ku dikeve jêr koletîyê ve, çêdikin. Mînak, ramanwer Ebdullah Ocalan wiha dinirxîne[113]: "Rêûresmên pêşkêşkirina mirovan wek qurbanîya peristinê û bi pileyên cihêreng û bawerîya pê li cem sûmerîyan, girêdaneke wê ya xurt bi îdolojîya koledarîyê re heye… Peydakirina rahibên sûmerî bo îdolojîyekê ji bo avakirina dewleta xwe bi vê zîrekîyê, avakirina hişmendîyeke civakî û bi vê hişmendîyê nihêrîna lê wek pergaleke Xwedawendî li ser erdê, tiştekî balkêş û çetin e…"

---


110 F. Diyakov – S.Kovalîv, Şaristanîyên kevnar/beşa yekem, weger: Nesîm Wakîm El-Yazicî, çapa yekem 2000, weşan: Weşanxaneya Elaedîn-Şam, R205.

111 Segmond Froid, Totem û Tabû, werger: Bû Elî Yasîn, çapa yekem 1983, weşan: Weşanxaneya Hiwarê-Laziqîyê, R152.156.

112 Heman çavkanî, R77

113 Ebdullah Ocalan, Ji Dewleta Rahibên Sûmeran Ber Bi Şaristanîya Demokratîk ve, beşa yekem, bê weşan û nimreya çapê, R26.34.

Ji alîyekî din ve jî kuştina du ciwanan bi awayekî rojane û pêşkêşkirina qurbanîyan ji wî Xwedawend-mirovî re da êş û hêrsa wî sivik bike, rêûresmên cejna Ekîtoyê tîne bîra me, gava du peykerên yek bi serê tûpişk û yê din bi serê mar dianîn û di dawîya şahîyê de serê wan jê dikin û diavêjin nav agir. Anîna du ciwanan û kuştina wan û derxistina mêjîyên wan, tê wateya ku çi qasî vîna gelê bindest jê hatiye standin û nikare nehêle zarokên wî bigihêjin kuştinê. Tê zanîn ku çanda serjêkirinê, qiralên Mezopotamyayê tîne bîra me. Sedema hilbijartina mêjî wek derman jî, di efsaneyê de vedigere sembolîya pîroz a li cem pêşîyên kurdan ên kevnar. Di Avestayê (pirtûka pîroz a Zeredeştîyê)[114] de wiha tê zimên ku gayê ku afirindeyê yekane ye, gava mir, mêjîyê wî wek 55 tovik û 12 cureyên riwekên bijîşkî rijîya û ji mêjî her afirindeyek çêdibe û her tişt jî cihê wî di mêjî de ye. Di çanda civakî ya kurdan de jî em gelek hevokên ku tê de girîngîya serî û mêjî tê derbirîn hene. Mînak; Gava kesek dibe sedema kuştina yekî din, bi vê biwêja kurdî tê gotin ***"Te serê wî xwar"*** an jî gava xizmê kesekî dimire, jê re dibêjin ***"Bila serê we sax be"***.



THE BRINGING OF HEADS AFTER A BATTLE.[2]

*Neqşeke ku tê de adeta belavkirina xenîmeyan li ser leşkerên aşûrîyan bi qasî serê jêkirî[115] ku piştî di şerên xwe de bi ser ketine yan jî şoreş têk birine, dîyar dibe.*

[114] Dr. Xelîl Ebdilrehman, Avesta/Pirtûka pîroz a ola Zeredeştîyê, çapa duyem 2008, weşan: Rewafid a çand û hunerê-Şam, R806.

[115] G. MASPERO; HISTORY OF EGYPT CHALDEA, SYRIA, BABYLONIA, AND ASSYRIA; THE GROLIER SOCIETY PUBLISHERS; LONDON; Release Date: December 16, 2005; Link: https://www.gutenberg.org/files/17326/17326-h/17326-h.htm

Ji alîyekî din ve jî, helwesta serbirê ku dilovanîyê qurbanîyan re dike û yekî ji wan bi berxekî diguhere, amaje bi veguherîneke ramanî di bawerîyên ayînî de dike; ew jî bi rêya nebawerbûna wî bi qurbankirina du ciwanan û yekî ji wan dide revandin. Bi vê yekê, di çarçoveyeke dijberî ramana qurbankirina mirovan û ola qiralê bîyanî de, hêmanên destpêkê yên şoreşê hatin danîn; ramyar Ebdullah Ocalan vê yekê wek helwesteke şoreşgerî detnîşan dike[116]… "Rêgirtina li ber qurbankirina zarokan di nava xwe de sazûmanîyeke şoreşgerî dihewîne. Ev ne dîyardeyeke hêsan û kesanî ye, lê belê proseseke hişyarbûna wijdanê mirovahîyê li dijî girîngtirîn nimûneyên olperestîya destpêkê ya bikok û belavbûyî ye û xwedî nirxekî mezin e. Her wiha wateyeke mezin li dijî vê kevneperestîyê distîne…" Tê zanîn ku di ola Zeredeştîyê de ku di dema xwe de şoreşeke ramanî çêkir û berîya wê jî di Mazdekîyê de, rahib bi erka serjêkirina qurbanîyên çelek û hespan[117] li şûna mirovan, radibûn. Hûrîyan di cejneke xwe ya pîroz de ku jê re digotin (Xîşwa)[118] du qurbanî pêşkêşî Xwedawendên xwe dikirin, yek ji wan balinde û ya din jî mih bû; ev tê wê wateyê ku serbir bi xwe jî rahibek bû lê serhildêrekî ramanî bû. Kesayeta serbirê dilovan, ji bo ku efsane bi rêya çûyîna ciwanên ku bi berx an jî beranekî hatine veguherandin, ber bi çîyayan ve bidome, pir girîng e; ev çespanek e ku redkirin li beramberî qurbanîyên mirovî hebûn da ku ber bi qurbanîyên ajalî ve herin. Em vê yekê di demên paşî yên şaristanîya sûmerîyan de dibînin. Sûmerîyan derdora 5262 b.z de, ji demên kevn ên şaristanîya xwe de bi rêya rahibên xwe qurbanîyên mirovî dane û ramana qiral- Xwedawend dîtine. Di qonaxin dîrokî yên paşî de, qurbanîyên mirovî bi yên ajalî hatin veguherandin; li gor wê jî lêkoler Well Diyûrant tekez dike[119]: "Li nişîngeheke sûmerî tabloyek hat dîtin ku li serê hin nimêj hebûn û tê de ev nidirên ayînî yên biaynî hebûn: (Kavir qubanî goştê mirovan be, bi wî mirovan jîyana xwe kir qurban)… ji vê yekê tê gihiştin ku di destpêkê de mirovan ji goştê mirovan

---

[116] Ebdullah Ocalan, Ji Dewleta Rahibên Sûmerîyan Ber Bi Şaristanîya Demokratîk Ve, beşa yekem, bê weşan û nimreya çapê, R67.

[117] Mersiya Ilyad, Dîroka bawerî û ramanên olî/beşa duyem, werger: Ebdilhadî Ebas, çapa yekem 1986/1987, weşan: weşanxaneya Dimeşq-Şam, R338.

[118] Gernût Filhîlm; Hûrî/Dîrok û şaristanîya wan, werger: Dr. Farûq Ismaîl, çapa yekem 2000, weşan: Weşanxaneya El-Cedel-Heleb, R119

[119] Well Diyûrant, Çîroka Şaristanîyê/Rojhilata Jêrîn, Werger: Mihemed Bedran, beşa duyem ji berga yekem 1988, weşan: Weşanxaneya El-Cîl-Beyrût, R29

hez dikir, lê belê piştî ku sincên mirovan li pêş ketin, dîtin ku divê bi goştê ajalan razî bibin…" wek em dizanin kavir jî cureyek ji pez e. Her wiha çavkanîyên ola Ibrahîmî jî amaje pê dikin ku pêxember Ibrahîm lawê xwe wek qurban pêşkêşî xwedê kir û piştre bi berxekî yan jî beranekî hat guhartin. Peyrewên ola Êzdatîyê jî cejna Qurbanê pîroz dikin (Cejna Edha li cem mislimanan); tê zanîn ku ola Êzdatîyê ji hezarên salan ve li herêmê belavbûyî ye[120]. Hin mohrên ji herîyê hatin dîtin[121] ku li serê wêneyên mirovên maskên bi serê ajalan li xwe kirine, hene; da ku rêûresmên qurbankirina sembolîk wek pîrozbahîya cejna sersalê, pêk bînin. Li bajarê Ûr jî peykerê gîşkekî bi darê ve girêdayî hat dîtin; dibe ku ev sembola guhartina qurbanîyên ajalan li şûna mirovan be û ev yek vedigere berîya zayînê bi 1500 salî. Qehremanîya serbir û nepêkanîna wî ji fermanên qiral re gelek nîşaneyên wê hene û derbirîna nebawerbûna wî bi dermanê ku rahib jê re pêşnîyar kiribû û ramana dayîna qurbanîyên mirovî, bi awayekî ku tê de zanîneke ramanî ya pêşketî heye, dike.

[120] Ji bo bêtir bizanî li vê vegere: Dr. Kazim Hebîb, Êzdatî/Oleke kevnar li hember demê li ber xwe daye, çapa yekem 2003, weşan: Weşanxaneya Aras, Hewlêr-Kurdistana Iraqê.

[121] Ebas Mehmûd El-Eqad, Ibrahîm bavê Pêxemberan e, weşan: Sazîya Hindawî ya hînkirin û çandê-Qahire, bê çapkirin, R162.

# Tundirewî di navbera Şoreş û Desthilatdarîyê de

**(1 ji 2)**

## Pêşgotin

Bi serketin û binketina bilez a Daişê li Rojhilata Navîn re, dîyardeya tundrewîyê bala gelek ramangêr, lêkolîner û sîyasetmedarên cîhanê kişand. Ev yek ji bo gelekan bûye rengek ji rengên şerekî tirsnak, û bûye têgehek birêxistinên ku kuştin û wêrankirinê di cîhanê de pêk tînin, her wiha bûye têgehek ku ji alîyê rejîmên zordar ve tê bikaraîn ji bo ku wêneya tevgerên şoreşger û rêxistinên ku li dijî wê serî hildidin reş bikin. Tundrewî dîyardeyeke mirovî ye ku di mejîyê mirov de weke bertekekê ye, wî dajo li hember dîyardeyên civakî, çandî û sîyasî yên ku nikare têbigihêje yan jî kontrol bike, ev dîyarde ji bo wî jî çilo dibin bila bibin. Ji ber vê yekê, dibe ku ev yek têkeve çarçoveya her du rêgezên xweparastin û xwepesendkirinê de.

Li gor rewşa heyî ya Sûrîyê tê re derbas dibe, zelalbûna karîgerên ku dibin sedema wê, xwendina çendîn lêvegeran li ser bûyerên dîrokî, û nerîna ramanwerên ku bi têgehên cuda yên tundrewîyê re têkildar in, dê di vê lêkolînê de dîyardeya tundrewîyê û arasteyên wê yên şoreşgerî û desthiladarî, pêwîstî bi şirovekirinê hebe, ew jî bi rêya cûrandina wê wekî alavekê ji bo xweparastinê û destdanîna li ser desthiladarîyê û destnîşankirina karîgerên ku di rehendên derûnî, çandî, sîyasî, aborî û yên din de bi kar tînê. Ji ber vê yekê, wê rêbaza danasînê ya analîzî, rêbaza berawirdî û înduktîf werin bikaranîn û hewl were dayîn ku ezmûna cîhanî ya bi tundrewîyê re li ser civakên sûrî were sepandin.

## Tundrewî wek dîyarde

Peyva tundrewî û sawkerî (terorîzm) piştî dawîya Şerê Cîhanê yê Duyemîn derket holê û bi awayekî berfireh belav bû û gelek lêkolînên sîyasî û ewlekarî derbarê wê de hatine kirin. Di salên 1990 û destpêka sedsala 21ê de, bi hezaran gotar û lêkolîn li ser vê mijara wê hatin weşandin û hewl

hat dayîn ku ji alîyên cuda ve bê analîzkirin, lê nekarîn nêrîneke zanistî ya yekgirtî ji vê dîyardeyê re pêşkêş bikin û cewherê wê bi awayekî objektîf rave bikin. Ji ber vê yekê di cudahî di boçûnê wê de hene û nakokî li ser pênaseya wê hene. Dibe ku ev cudahî ji ber gelek kes bi vê têgehê re mijûl bûn, yan jî ji ber cihêrengîya çand û nêrînên ku pê re mijûl bûne. Lêbelê, lihevhatinek rêjeyî li ser sedemên rûdana wê heye, ku girêdayî têkçûna rêjîmên desthiladar di çareserkirina pirsgirêkên civakên aborî û sîyasî, û encamên wê li ser têkilîyên civakî, tenduristî û derûnî ya kesan ku nakokîyên çandî diafirîne ku dihêle berfireh bibe û bibe sedema encamdana tundrewîya tund û şoreşekê li dij rêjîmên desthiladar yên heyî li dar bixin. Helbet civak wê nikaribe çanda xwe ji agirê teqîna vê şoreşê biparêze û ji ber ku di şoreşê de tundrewî amûr e ne armanc e, loma rijda serkirdeyên tundrew li ser îdyolojîkirina rêjîma sîyasî ya desthilatdar bi tundrewîya xwe, anko wê bike amûr ne armanc, ku dê di demek nêzîk de bibe sedema ji rêketina şoreşê û bibe sedema encamdana bobelateke sîyasî, civak, çandî û dibe sedema derketina serhildan û şoreşeke din. Dema mirov li şopên şoreşên ku berîya hezarê salan pêk hatine, bişopîne ku her şoreşeke ramanî ya li dijî pergaleke sîyasî-civakî ya stemkar a heyî, gelek caran dibe sedema derketina pergaleke sîyasî ya din a ku zordarîya xwe ferz dike. Ev yek dibe sedema şoreşeke din a ramanî li dijî wê û hwd, û mînakên ku hatine gotin gelek in, wek tevgerên mezhebî û yên ku olên yekxwedayî, îdeolojîyên lîberalîzm, komûnîzm, faşîzm û hwd. Ji ber vê yekê wê pir baş be ji bo ku nirxên sincî yên her şoreşekê werin parastin, rê li ber dyolojîya tundrewî ya sîstema sîyasî ya nû bi ramanên vê şoreşê were girtin. Pîrozkirina bîr û ramanên şoreşê ku bibe oleke din, tê wê wateyê ku destwerdana wê di hûrgilîyên jîyana kes û civakê de û ev yek bi hêsanî ji alîyê keysbazan ve tê bikaranîn. Weke mînak, lîberalîzm bi ramana şoreşgerî ya li dij olî ya bi dêrê re bandor bû, û wekî têgehekê di warê aborî de hate sînordarkirin heya ku bi rengekî hişk ji sîyaset, civak û çandê re hate giştîkirin. Ev yek bû sedem ku arîşe û pirsgirêkên civakî yên mezin derkevin holê; her wekî tişta bi navê şoreşa zayendî her wiha dîyardeya homosêksweliyê derkete pêş û rêxistinên tawana birêxistî û bragmatî bi pêş ketin; bragmatî ku bû enerjîyek ji bo zalîtîya li ser vîna gelên din. Li kêleka wê jî malbat ji hev ket û derz kete têkilîyên civakî de û hwd. Heman mijar bi rengekî din li ser olê pêk tê wekî şoreşekê di milê gîyanî de, komînîstî wekî

şoreşeke aborî – civakî û demokratî weke şoreşeke sîyasî … û hwd. Bê guman derketina îdîyolojîyan ji çarçoveyên wan yên pradîgmî yên sereke û pêkanîna wan bi rengekî tundirew li ser civakê dê bandorên neyînî bi xwe re bînin. Çimkî civak xwedî saykolojî û pradîgmayeke taybet e û endamên civakê xwedî gêwlên (mezac) cihêreng in ku bi rîyakisyona wan bi jîngeha derdor re bi rengekî xwezayî bi pêş dikevin. Lewra heke bi darê zorê civak bi yekê ji wan îdîyolojîyan bê rengkirin, dê gelek caran encamên xirab derkevin holê. Her wekî Ocelanê[1] remenger dibîne ne pêkan e ku hevkêşeyên zanistî li ser xwezaya civakî pêk werin; çimkî Ocelan wê wekî çandekê dibîne û zehmet e bipêşketina hişmendîyê li nik endamên wê bê kontrolkirin ji ber ku ew encama bipêşketineke gavbigav e ku bi milyonên salan dom kiriye û berhema cîhana aqil û atîfeyê ye. Lewma civak xwedî çand û peymaneke serbixwe ye û nimandina ji wê yekê re ku mirov bûnewerekî civakî ye; çimkî civak bersivdana xerîzeya mirov ya xweparastinê ye. Her takekesekî xwedî arezû ku ewlehîya xwe di civakekê de nebîne, dê jê veqete. Ev veqetandin yan dê bi koçbûnê be yan jî dê wekî bertek bi serpêçî û vebirînê û bixwegirtina tundirewîya selefî be. Lêkoler "Mistefa Hicazî"[2] jî vê yekê piştrast dike û dibêje: "… ji hêla derûnî ve, selefî bi her du şaxên xwe ve (xwe bi dest dabûnerîtan ve berdan û xweparastina bi rabirdûyê û destkeftîyên wê) belav dibe bi qasî radeya stemkarîya ku li ser mirovê cîhana paşketî pêk tê, her wiha bi qasî tibaba hestbûna wî bi bêçareyî, lawazbûn û binketinê. Lewra li cem wî ev yek parastin e… çimkî dema mirovê cîhana sêyem rastî êrîşekê tê ku nikare li pêş wê bisekine û êrîşkirina xak, statû, paşma û mal û mewdanê xwe raswetîne, selefî bi zelalî derdikeve pêş weke rêyeke parastinê ew jî bi lixwegirtinê û vegera li rabirdûya kevnar pêk tê …". Xelk bandorên berê wekî bermahî û paşmayên bîrdankî bê ku pê bihisin dihilînin, eynî wekî ku takekes wan dihilîne û dibe sedema durufkirinê (kebt). Dibe ku bûyerên ku bandorê li derdorê dikin bibin sedem ku bandor û nîşan werin afirandin ku meyldarîyên veşartî di

1 Ebdela Ocalan; Manifistoya Şaristanîya Demokratîk (Pirsa Kurdî û Çareya Neteweya Demokratîk; Parastina Kurdên li ber Qirkirina Çandî)/ cildê pêncem; werger: Zaxo Şîyar; çapa duyem 2014/pdf; bê weşanxane; r 57.

2 Dr. Mistefa Hicazî; Paşvemana Civakî/pêşeka saykolojîyaya mirovê raşikandî; çapa nehem 2005; weşanên el-Merkez el-Seqafî el-Erebî/ e-Dar el-Beydai-Mexrib/ Beyrût-Libnan; r 103.

mirov de şîyar bikin û hêza foksa derûnî ya dijber lawaz bike[3]. Ji alîyekî din ve gelek ramangerên rojavayî lîbralîzimê wekî misogerîyekê dibînin ji bo kontrolkirina tundirewîya olî û neteweyî di civakên wan de. Lê peristî di lîbralîzimê de ketwareke tundirew ji demokratîyê dadimezirîne. Bo nimûne dema ku ji jineke fransî, ku di jîngeheke lîbralî de dijîya, pirsîn ka çima piştî ku kete ola islamê tev li Daişê bûye. Bersiva wê ew bû ku li dervera ew dijîya parastina civakê nebû, lê belê standina hişbiran, tacîzkirina zayendî û xemsarîya civakî hebûn. Lewre wê îslam weke derîyekî ji xwe re dît ku ji jîngeha xwe ya xemgîn derkeve û bikeve nav civakê û hest bi germahîya civakê bike. Her wiha dema ku tev li Daişê bû, zêdetir tecrubeya xwe eciband; çimkî Daiş wêneyekî nimûneyî yê tundirew li dij vê ketwarê ye, lewra di nav de rehet bû. Lê tişta sosret ew e ku wê guh nedida wan binpêkirinan yên Daişê der heqê sivîl, dîl û bawermendên bawerîyên4 din de dikirin û ne xem bû ji wê re. Ev yek dihêle ku asta tendirustîya derûnî ji bo şîrovekirina vê rewşê bibe pîvan. Di heman demê de em dibînin ku bi dehan mislimanên afirîner hene dema ku ji jîngeha xwe ya radîkal derketine û berev civakên lîbralî ve çûne, bi ser ketine û nav û deng dane. Hevdemî rewşa wê jinê, em dibînin ku şepêla parêkerî (muhafiz) ya tundirew li welatên lîbralî bi pêş ve diçe. Dixuye ku tundirewîya rêxistina bi navê Rastgirên Parêzkerî bertekek e li hember lîbralîzima ku peyman û têkilîyên çandî, civakî û gîyanî yên tekekes bi civak û rabirdûya wî ve pûç dike. Lewra lîbralîzim wekî alîyê ku tundirewîyê lawaz dike dixuye, lê li alîyê din tundirewîya di lîbralîzimê de dikare bandorine ne kêmî bandorên tundirewîya olî bi xwe re bîne. Dixuye ku pêdivî bi hevsengîyeke aqilî û wijdanî di navbera wan de heye.

Bi rêya çavdêrkirina dîyardeya tundirewîyê di bûyerên ku ji qonaxên kevn yên dîrokê de û heta dîroka me ya hevdem qewimîne, du celebên

3 Sîgmond Firoyd; Mûsa we e-Tewhîd; werger: Corc Terabîşî; çapa çarem- 1986; weşanên Dar e-Telîa litîbaa we eneşir/Beyrût; r 131.

[4] Bawerî: Rêxistineke destnîşankirî ye ji bo raman, pêşbînî û agahîyên mirov li dor tiştekî destnîşankirî. Her wiha prosesên zanînê, nerîm û bawerîyê li xwe digire… hin bawerîyên hebûnî li dor xwezaya civakan hene û bawerîyên sedemî hene ku cudahîyên di navbera çînên civakî de şîrove dikin, her wiha bawerîyên nirxandinî hene û bawerînên fermanî hene… Dr Şakir Ebdilhemîd; şîrovekirina derûnî ya tundireweyî û terorê (Merasid – Kurasat Ilmîye 37); weşanên Mektebet el-Iskenderîye – Misir/2017; r 33.

tundirewîyê hene: Tundirewîya girêdayî hişmendîya xweser ya parêzkerî ya nasnameya etnîk-çandî; ya girêdayî liberxwedanê û serhildana li dij rêjîmên kolegêrî, zordest û dagiker. Ya duyem tundirewîya girêdayî çanda kîndarîyê û hizirandina komplogerî û berteka hovane li hember kesê dijberê bawerîyê. Ji ber vê yekê heke ev her du celeb di ber çavan re neyên derbaskirin, mirov nikare dîtineke ojektîv û tevgir ji tundirewîyê re deyne. Her wekî lêkolerek5 piştrast dike: "… divê em cudahîyê bixin di navbera tevgerên rizgarîyê yên ku kesên tundirew dikêşin û tevgerên tam tundirew de yên ku bi tenê kesên derûna wan birîndar li xwe digirin û hewl didin terorê ji bo terorê bisepînin da ku kesên din bitirsînin ji bo tiştê ku ew bi xwe dibînin û janê jê dikişînin, kesên din jî bibînin …". Bi giştî ev dîyarde weke wizeya razber tê dîtin ya ku bandorê li bawerîya şer ya piranîya gelan dike û ya ku wan rêgezan destnîşan dike yên ku şopa têkilîyan di navbera mirovan de destnîşan dikin, her wiha wê bendê pêk tîne ya ku hevgirtin û berdewamîya hebûna komê misoger dike û sedemek e ji bûyerên ku rastî wan tê. Di dîroka me ya hevdem de êdî têgîna tundirewî û terorê bi hev re tên gotin ew jî ji bo karên tund tên gotin yên ku rêxistinên radîkal yên îslamî û rêxistinên neteweyî yên nijadperist (rastgirên tundirew) dikin. Tundirewî wekî handera sereke ji bo reftara tund ya ku di encamê de kuştinê bi xwe re tîne tê dîtin. Çimkî raman û hizirên tundirew hestên tundirew bi xwe re tînin û heke hinek çirûskekê bidin ber dê li tundîyê were veguhastin. Ev sedema wê yekê ku divê mirov bi bihna fireh dîsa vê têgihê di ber çavan re derbas bike. Çimkî bi rastî jî bi milyonan kesên tundirew ji çandên cihê û cuda li cîhanê hene, lê ew jixweber xwe naspêrin tundirewîyê ku nerîna xwe bisepînin. Ev kes bi rengekî ecêb ji bawerîyên xwe razî ne û bi çavekî biçûk li bawermendên bawerîyên din dinêrin. Her dem ev kes di rewşa berevanîyê de ne ku rastbûn û duristîya bawerîya xwe piştrast bikin. Lê her dem karîger in hene rewşa aramîya rêjeyî ya heyî têk dibin; her wekî kesayetên xwedî aqilê dîmagocî, derûna baranawî û nerîna sîkopatî li hember kesên ne ji bawerîya wan. Her kesayeta dixwaze bigihe desthilatê û xweş dizane biaxive û jîr e, derdora xwe digihîne wê bawerîyê ku kes weke wî nîne û veşarteyên komplogeran dizane, her wiha ew fermanderê erkdarkirî ye ku xelkê ji tarîyê ber bi ronahîyê ve bibe. Lewra

[5] Andirê Haynal û yên din; Saykolojîyet e-Teesib; werger: Dr Xelîl Ehmed Xelîl; çapa yekem 1990; weşanên Dar e-Saqî/London; r 44.

biçekkirina leşkeran û tundîyê rêya herî baş û hêsan e ji bo bigihe armancên xwe û zalîtîya xwe li ser alîgiran bisepîne. Bi çavdêrîkirina çalakîya komikên tundirew, mirov dibîne ku bi rêya xutbeyên olî xelkê ber bi xwe bikêşin û wan qani bikin ku takeksê armanckirî ji pirsgirêkên jîyana wî dimiştuxilîne; bi rêya wê yekê ku berpirsyarîya jîyana wî ya nexweş dixe stuyê desthilat yan kom yan çandin din de û bibîranîna dîroka payebilind û dîtina bawerî û tundîyê wek rêya rizgarbûna ji nexweşîyê û ketina beheştê. Kesayeta serokê tîra (taîfe) heşaşînan[6] "el-Hesen bin e-Sebah" yê ku derdora sedsala 11em derkete holê, mînakek e ji van serokan. Çimkî zilm û stemkarîya ku alîgirên siltanên selçûqîyan li milet dikirin, atmosfera sîyasî ya giştî li cem wan ne aram kir. Her wiha hizir û ramanên wî yên olî ku bi rengekî şoreşgerî barkirî bûn, gelek alîgirên dilsoz kêşan. Çalakîyên kuştina bi xencera jehirkirî weke stratejîyekê ji bo tolhildanê dişopand da ku hevsengîya tirsê bi dijminên xwe re çêke; çi dijminê wî ji alîgirên sazîyên desthilatê, çi jî derbegên ku zalîtîya wî red dikirin. Meyla tohildanê bû ajoyek ji bo bixwegirtina mezheba îsmaîlî û damezrandina rêxistineke veşartî û radîkal ji bo ramanên "el-Hesen e-Sebah". Sebah alîgirên xwe gihandine wê qinyatê ku ew ne kujer lê rizgarker in û jîyana dinyayê li ber jîyana axretê bêqîmet e. Her wiha li gor nerîna wî heta ku doza wan ya dadmendane bi ser bikeve, divê canê xwe gorî bikin. Loma bi vê yekê karîbû bi dehan xwekujan bi çek bike û bi saya lehengî û bawerîya wan bi doza wan, gelek kesên ku wê demê di wê civakê de bêzar û nerazî bûn ber bi xwe ve kêşan. Di heman çarçoveyê de lêkolerek[7] dibîne: "… serokê desthilatdar, peristîyê bi xwe re tîne; ji ber ku reftara xweçemandinê di peyrewîya laş ji bo desthilata serok diçîne.. Hesen e-Sebah qalibê mirov yê berê dişkîne û ji nû ve wî saz dike, aqilê wî ji nav dibe da ku bibe amûr û alet di rajekirina doza wî de. Wiha dixuye ku jirêderxistina ayetên pîroz rêyeke guncav e ji bo vî karî û piştre çûna berev desthilatê ve…". Derûnnas "Îrîk From"[8] wiha dibîne: "… hêza bihanederxistinê yan ev sextekirina aqil,

---

[6] Bêrnard Lwîs; el-Heşaşûn/Firqe Sewrîye fî Tarîx el-Islam; werger: Mihemed el-Ezeb Mûsa; çapa duyem 2006; weşanên Pirtûkxaneya Medbûlî – Qahîre.

7 Bêrnar Şofîyê; el-Muteesîbûn – Cinûn el-Îman; werger: Dr Qasim el-Miqdad; çapa yekem 2017; weşanên Dar Neynewa – Şam; r 83-85.

[8] Îrîk Form- e-Dîn we e-Tehlîl e-Nefsî; weger: Fûad Kamil, weşanên Pirtûkxaneya Xerîb – Iskenderîya; bê jimara çapê û dîrok; r 54:

yek ji dîyardeyên mirovî ne yên ku mirov heyrî dihêlin. Heke em bi ser ve nebûba, dê keda mirov di bihanedîtinê wekî mezheba kesekekî ku bi dînbûna stemkarîyê (paranoid) ketîye bixuye; çimkî kesê ku bi vî derdî bikeve, dibe ku gelekî jîr be û dibe ku aqilê xwe di her biwarî de bi rengekî pir baş bi kar bîne. Kesê ku bihaneyan dibîne, vê yekê bi xwe dike...”. Dibe ku ajo li paş vê gavê prensîpên kesayetî bin da ku bawerîya ku her kes tundireweîyê jê ra dike, li gor berjewendîyên xwe û qinyata xwe di asta yekem de bisepîne. Lêkoler Neûm Çomiskî girêdayî lîstina bi têgîna terora cîhanî9 dibêje: “…her dem êrîşeke îdîyolojî heye ku dawî dibe sedema afirandina cinawerekî derewîn û piştre pêngavên xilasbûna ji wî cinawerî dest pê dikin; ev jî mijareke pir tirsnak e. Lê heke piştrast bû ku dê bişkin, dibe ku em vî cinawerî têk bibin û rihet rûnin..”. Bi gelemperî, jîngehên ku hêmanên ewlekarîya mirovî li wan nînin, rewşên guncav ji bo piştgirî û pêkanîna van armancan peyda dikin.

Li gor xalên navbirî, em dikarin du cureyên vê dîyardeyê destnîşan bikin: Tundirewî weke rêyeke xweparastinê û tundirewî weke rêyekê ji bo bihêzkirina desthilat û zalîtîyê.

Tundirewî weke rêyeke xweparastinê.

Dîyardeya tundirewîyê bi têgîna xwe ya giştî ya ku li dor radîkalîbûna di bixwegirtina hin bawerîyên destnîşankirî de, çarçoveyeke lêveger ji bo kirina hin reftarên girêdayî wê pêk tîne. Heke ev reftar bi wizeyeke tund yan meyleke parêzkerî barkirî bin yan na jî, dê ne gotineke ojektîf be ku em wan xirab binirxînin. Çimkî hin caran dibe ku ev reftar bertekeke xwezayî bin li hember metirsîyekê ku gefê li çand û exlaqên civakekê dixwin; bi taybet piştî pêşketina şerê derûnî yê ku li dij civakên cîhanê tê xebitandin û dezenformasyona ku li ser navgînên ragihandinê û torên medyaya civakî belav dibin. Bo nimûne, gelek caran demokratî û mafên mirovan bi erotîk û porongrafîkê ve tê girêdan û sekolerîzim bi gawirî û ateîzimêve tê girêdan. Her wiha pêşketina zanistî û teknolojî bi çavnebarîya kaptalîzimê ve tê girêdan û bawerîyên olî bi terorê ve tên girêdan û serhildan û şoreşên

---

[9] Neûm Çomiskî; el-Seytera ela el-Ilam/el-Incazat el-Haîle lilpropagana; werger: Umeyme Ebdiletîf; çapa duyem 2005; weşanên Pirtûkxaneya e-Şirûq e-Duwelîye- Qahîre; r 24.

gelêrî bi dîtaneya komplogerîyê[10] ve tên girêdan. Dibe ku hin civak neçar bibin di bawerîyên xwe de yên ku ji bav û kalên xwe girtine tundirew bin, ev jî mînanî awayekî parastina nasnameya çandî ye. Bo nimûne hozên îsraîlî koçbûn[11] ji asîmîlebûna di çanda dewletên ku xaka wan dagîr kiribûn çêtir dîtin; her wekî koçbûna Îbrahîm û Mûsa. Niha jî nevîyên van hozan li jêr sîwana dewleta Îsraîlê dijîn û tundirewîya bawerîyê wan digihîne hev. Li vir helwestên girêdayî tundirewîyê bi rêya reftara ku kom dişopîne derdikeve pêş. Çimkî komek dikare girtî be û bibe dîla dogmatîzmê û dibe ku koç bike yan li çîyayekî yan giravekê yan çolekê veder bibe. Yan jî bertekeke tund nîşan bide wekî derbirîna girêdana bi bawerîyan ve. Em vê yekê li nik piranîya hozan dibînin; bi taybet li erdnîgarîya Kurdistanê û erdnîgarîya ereban, erdnîgarîya ku li hember dagîrker û êrîşkeran û operasyonên asîmîlekirin û qirkirina çandî li ber xwe da. Her wiha em vê yekê li cem civakên Kevana Berdar (el-Hîlal el-Xesîb) jî dibînin; civakên ku hîn jî bawerîyê bi bawerîyên dêrîn tînin û tevî ku tûşî zalîtî û zilm û hovîtîya hêzên mezin hatine, lê hîn jî ziman û dabûnerît û çanda xwe parastine. Civakên wekî; zeredeştî, samirî, mendaî, êzdî, durzî û elewî û hwd.

Dixuye ku tundirewîyê, nola wizeyeke razber, ji bo rizgarkirina bi dehan çandên dêrîn ji windabûnê bûye alîkar û hêla ku çanda mirovahîyê berdewam bibe. Hin caran jî heke em xwe bispêrin têgiha dîyalektîkê, alîkarî di pêşveçûna têkilîyên civakî û cihêrengîya rêjîmên sîyasî û aborî kirîye. Li ser asta cîhanê, tecrubeya aborî û sîyasî ya Yaban û Almanyayê û tecrubeya bi dehan welatên din di vê biwarê de nimûne ne. Em dikarin bibêjin ku ne ji tundirewîyê ba di serdemên cuda cuda yên dîrokê de, niha

[10] Dîtaneya komplogerîyê li gor Ferhenga Oxford ya îngilîzî: "Dîtaneya ku qewmîna bûyereka destnîşankirî yan dîyardeyekê wekî encama kompleyekê li qelem dide". Ji bo pêzanînên bêhtir li dor dîtaneya komplogerîyê li vê berhemê vegere: Rpb Brazrton; Iqûl Muteşekîke/ Lîmaza Nusediq Nezerîyat el-Muamere; werger: Hanî Fethî Silêman; weşanên Mûeseset Hindawî – 2017 ; York House – Brîtanya; bê jimara çapê.

[11] Ji bo xwendina dahurandina derûnî li dor vê mijarê, baş e ku li vê berhemê bê vegerandin: Sîgmond Firoyd; Mûsa we e-Tewhîd; werger: Corc Terabîşî; çapa çarem – 1986; weşanên Dar e-Telîa ya çapkirin û belavkirinê/Beyrût.

ya dewletên rojavayê dewletên rojhilatê li ber xwe biribûn yan jî berevajî wê[12].

Heta ku em tundirewîyê weke amûreke xweparastinê û parastina hebûnê bihejmêrin, divê ji dogmatîzimê rizgar bibe û bibe karîgerekî hevrikî û xweîsbatkirinê, her wiha pêkvejîyana bi kesên din re yên ne ji bawerîya wê bipejirîne di çarçoveya peymaneke civakî de û ew peyman zordestîyê û tekbawerîyê di desthilatê de rake. Bi giştî heke bawerîya şer û bawerîya sîyasî û nirxên sincî yên çanda civakî ne radîkal bin, dê di şîyan de nebe li hember astengî û gefxwarinên dijminan rawestin. Di derûnnasîyê de vê mijarê wiha rave dikin13 "alîyên parastinê yên girêdana bi kevneşopîyan ve pir û cihêreng in; ya herî giring ji wan xweparastina bi wan kevneşopîyan ji bo rûbirûbûna êrîşeke jiderve ye. Evê desthilatdar gefeke statûyî ji wan kesan re ye ku erîşî wan dike, gefek e li nasnameya wan ya neteweyî, paşma, endamtî û dîtina wan ji hebûnê re… Heke liberxwedana çekdar bi kêr neyê, gelê bêçare xwe bi paşma û girêdana bi kevneşopîyan diparêze li dij êrîşa ramanî û derûnî… Asta girêdana bi kevneşopîyan ve wê demê kêm dibe dema ku bi hêza xwe dilnîya dibin û hest bi ewlehîyê dikin û gefên derve kêm dibin…" Lewra tundirewîya dogmatîk ya lêkdayî, heke derbirîn rast be, ya ku kesê din yê derveyî sînorên wî yên ramanî tawanbar dibîne, bobelateke mirovî ya rasteqîn e. Çimkî ev tundirewî xerîzeyên hov li hemeber dijminê ferkirî berdide. Heke kesê ku vê tundirewîyê bi xwe digire xwe bispêre dîyalektîkê jî ji bo bipêşxistina bawerîya xwe, dê gotegot, encam û rastî di qalibê hişmendîya wî ya teng û qinyatên wî de sînordar be. Wekî mînak dema ku ramangerên rêxistina Daişê, tundirewîya olî di îdîyolojîya el-Qaydê de bi pêş xistin.

Tundirewî weke rêyekê ji bo bihêzkirina desthilatê

Gelek caran tundirewî ji bo zalîtîya li ser hest û qinyatên hin kesan tê bikaranîn, da ku ji bo spandina desthilatekê werin arastekirin ku hêz û

[12] Ji bo xwendina nimûneya vê nerînê li vê vegere: Klûd Kahin; el-Şerq we l-Xerb Zemen el-Hirûb el-Selîbîye; weger: Ehmed el-Şêx; weşanên Sîna ji bo belavkirinê-Qahîre, çapa yekem 1995

[13] Dr Mistefa Hicazî; e-Texelûf el-Ictîmaî/Medxel île Sîkolojîye el-Însan el-Meqhûr; çapa Nehem 2005; weşanên el-Merkez e-Seqafî el-Erebî/Edar el-Beyda-Mexrib/Beyrût-Libnan. R107.

dewlemendî di destê wê deshilatê de bimînin. Bi rêya dîmgocîyê cîhangêrîya tundirewîyê bi dîtaneya komplogêrîyê ve tê girêdan. Bi giştî du alîyên vî celebê tundirewîyê hene: Alîyê yekem girêdayî veqetîna komekê ji peymana koma xwe ye û bixwegirtina rêbazeke tundirewtir; her wekî veqetîna Daişê ji el-Qaydê da ku dewleta xîlafeta îslamî ava bike. Dixuye ku nerazîbûna hin kesan ji kesên ku desthilata rêxistinê di destê wan de ye, hêla ku ew kes rêbazeke tundirewtir bişopînin da ku desthilateke tabybet bikeve destê wan û bi vî rengî bi dehan kesên tundirew yên ku ji bo tirsandina dijmin, bawerîya wan bi jêkirina serîyan tê ber bi xwe ve kêşan. Bi rastî jî heta astekê di vê mijarê de bi ser ketin û dewletek ava kirin û xelîfeyek jê ra danîn, lê vê dewletê zêde dom nekir, ji ber ku tundirewên Daişê lawaz bûn li pêş hêza tundirewîya civakên xwemalî ji çanda û nirxên xwe re. Loma ev dewlet hat rûxandin.

Alîyê duyem ew e ku kesên tundirew li hev kom dibin û komekê li hundirê welêt çêdikin da ku desthilata xwe li ser bisepînin û dijminatîya her kesê ne ji bawerîya wan bikin. Koma el-Ixwan el-Muslimîn nimûneya herî berz e di vê çarçoveyê de. Çimkî piştî bihara ronesansa erebî û berevanîya li dij dewletên dagîrker li Misirê û ragihandina temîma Qenat Swês û dewlemendîyên din yên niştimanî, ev kom li dij dewleta laîk ya erebî derket pêş û ev kom bû rêyek ji hêzên dagîrker re ku pê derbê li vîna gelê Misirê bixin ew jî di heyama Şerê e-Swês de sala 1958an. Dixuye ku dîrok careke din dubare dibe li Sûrîye, Misir, Lîbya, Tûnis û hwd, ew jî piştî ku piranîya serhildanên gelên ereb têk çû.

Rola tundirewên misilman di kirîzên Efxanistan, Îraq, Sûrîye, Libnan û Îranê de hebû û hîn jî heye ku piştî maytêkirina leşkerî ya hin hêzên mezin, kirîz hê bêhtir xirab bû. Ji ber ku ev tundirew bûn hincet û behane ji bo dorpêçkirin yan dagîrkirinê û dizîya dewlemendîyan û bikaranîna erdnîgarîya van welatan ji bo geşkirina hêza wan ya leşkerî li hember hevrikên wan.

Komikên tundirew yên ku cîhada tund bi xwe digirin, hêmanên sereke ne di kirîzên gelan de li nav û başûr û rojavayên Asyayê, her wiha li nav û bakur û rojhilatê Efrîkîyayê. Hin komikan karî tundîya xwe bibin Ewropa û Amerîkayê. Ev komik bûne kelemek li pêş pêkanîna demkratî, geşapêdan û aramîyê, nîşana wê yekê jî ew e ku raperînên gelên Îranê û dewletên ereb

nikarîbû armancên xwe pêk bînin; ji ber ku wan komikan bawerîya xwe ya sîyasî û olî li ser serhildêran sepand. Hin kes pêşketina hêza van rêxistinan li dîtaneya komplogerîyê vedigerînin, lê di rastîyê de ev rêxistin li ser erdê hene û encamên sîyaseta zordar in ya partî û olîgarîşîyên ku mîna şûrekî li ser gerdena gelan in. Çimkî banga wan ya radîkal ya hilweşandina pergala serwerîyê ya heyî û avakirina dewleteke îslamî yan dewleteke neteweyî-îslamî, dikare piştgirîya angaştên wan bike ku dibêjin ew hewl didin gelan ji rewşa wan ya trajîdî rizgar bikin û rûmetê û ewlekarîya mirovî ji wan re peyda bikin. Di vê mijarê de xwe dispêrin xîtabên gelêrî ku bi tenê alîyê ronîdar yê şaristanîya îslamî derdixin pêş; alîyên girêdayî hin doz û bûyerên dîrokî di çîrokên hin serkêş û dozgeran de û giştîkirina wan li seranserî heyama 1400 salî ji şer û pevçûnên di navbera misilmanan de ji alîyekî ve û di navbera misilman û xwedîyên bawerîyên din de ji alîyekî din ve. Piranîya bawermendên ola îslamî vê rabirdûyê mezin dikin ku gelek wesfên wê hene li gor şîroveyên taîfeya ku rabirdûyê tîne zimên. Ev jî derbirîna bertekekê ye ku nikare xwe bi bayê pêşketina mezin re berde; pêşketina ku li dehên bajarên nemisilman çêbûye û bi taybet li dewletên rojavayî. Ev yek ne tenê li cem misilmanan heye lê li cem bawermendên bawerîyên din jî heye. Çimkî heta ku mirov xwe ji gefa nebûna nirxa kesayeta xwe dûr bixe, ber bi xweparastina bi nirxên razber yên bav û kalên xwe ve di rabirdûyê de diçe. Tu dibê qey bazdaneke xeyalî ye ji ketwareke nehez ber bi rabirdûyekê ve ku xirabîyên wê hatine veşarin û başîyên wê zêde hatine mezinkirin. Xwe wekî berpirsekî di ber vegerandina wan mezinahîyan de di paşeroja nêzîk de dibîne. Dixuye ku peyrewîya mezinahîyên bav û kalan mirov geş dike û bawerîya wî pê lê vedigerîne[14]. Li vir meyla radîkal li nik rêxistinên tundirew gurtir dibe lê têkçûna tecrubeya Talîban, Qayide û Daişê, nerastbûna vê meylê di bicihanîna aştî û aramîyê li cîhanê bi giştî û ji misilmanan re bi taybet.

Ji alîyekî din ve radîkalîya mezhebî jî rêyek e ji bo bihêzkirina desthilatê. Ev yek li cem her du dewletên berz yên îslamî dîyar dibe; Îran û Siûdîyê. Çimkî hevrikîya mezhebî û tawanên gawerîyê yên alûgor, hestên alîgirên her du dewletan bi kîndarî û tundirewîyeke mezin ji bawrîyê re bar kir û

[14] Dr Mistefa Hicazî; e-Texeluf el-Ictîmaî/Medxel îla sîkilokîyet el-însan el-meqhûr; çapa nehem 2005; weşanên el-Merkez e-Seqafî el-erebî/e-Dar el-Beydai-Mexrib/Beyrût; r 109.

bandorên wê yên kirêt hebûn, her wekî di şerê Yemenê de û kirîza li Îraq, Sûrîye û Libnanê. Leşkerkirina civakên alîgir yên bawerîyekê her bi pêş ve diçe û civak dikeve rewşa amadebaşîya şer de. Her wiha ewlekarîya mirovî ya her alîyekî bi wê gavê ve hate girêdan ku nekeve bin zalîtîya alîyê din de û di heman demê de rêjîma heyî biparêzin da ku berdewamîya berevanîyê û lawazkirina bawerîya alîyê din misoger bike. Dixuye ku dewleta tirk halê hazir vê rêyê mîna stratejîyekê dişopîne; çimkî AKPê bi serkêşîya Erdogan hewl dide sîstemeke ewlekarî-aborî cîhanî bi hevbendîya li gel Ixwanan û şêxên Qeterê ava bike û hewl dide hin komikên selefî yên radîkal yên şîşanî, îgorî, daişî û sûrî bikêşe alîyê xwe.

Navenda "RAND"ê ya Lêkolînan di lêkolîneke xwe15 de piştrast dike ku mizgeft û husînî rola herî giring di propogandaya olî de û damezrandina bersiv û helwestên giştî yên şer û pevçûna li Sûrîye û Îraqê dilîzin ku ew pevçûn bûye şerekî olî di navbera sune û şîîyan de. Navend dibîne ku16 "hêza Hizbelah û cîhadîstên sunî li deverê û berfirehbûna wan li deverê ku bûne leheng û serkeftî, hest ber bi xwe ve kêşan û tundirewîya ji wan re zêde bû… û kirîzê valahîyek ji wan re peyda kir di rêya wê re alîgirîya hin niştecihên sûrî qezenc kirin ew jî bi rêya peydakirina rajeyên guhdana civakî. Her wiha destkeftîyên xwe yên herêmî jî ragirtin…". Dixuye ku ev mijar heta astekê mîna duberekirineke dîrokî ye ji şerê li Rojhilata Navîn re yê di navbera faris û feronîyan de, û di navbera sasanî û romanan de ye, her wiha di heyama di navbera avabûna dewleta Umewî heta maweya şerê xaçperistan de ye. Ewropa jî ne dûrî vê yekê bû, bi taybet di sedsala 16em de û pişter di Şerê Cîhanê yê Yekem de. Gelek bûyer hene ku em nikarin hemûyan rêz bikin. Di vê çarçoveyê de derûnnas Îrîk From17 dibêje: "… trajîdîyaya hemû olan ya mezin ew e ku prensîpên azadîyê binpê dikin û xirab dikin û dibine sazîyên cemawerî ku bîroqratîya olî di wan de zal e. Çimkî sazîya olî û olmendên ku nûnertîya wê dikin, heta radeyekê cihê malbat, hoz û dewletê digirin. Ji dêl ku mirov azad bihêlin, wî kole dikin. Li

[15] Wîlyem Yûng û yên din; Imtîdad e-Sîrai fî Sûrîya/Teqîyîm liliewamil eltî tusaid we temine intîşar el-unif; weşanên Navenda RANDê/2014; r42.

[16] Heman jêder; r53.

17 Îrîk From; e-Dîn we e-Tehlîl e-Nefsî; werger: Fûad Kamil, Weşanên Pirtûkxaneya Xerîb-Iskenderîya; bê jimara çapê û dîrol; r78.

vir êdî ne Xweda tê peristin, lê koma ku bi navê wî diaxive tê peristin. Ev yek di hemû olan de çêbû…”. Ev lêkoler dibîne ku radîkalîya hizirî û atifî ne tenê di olê de dimîne, lê belê têperî helwestên sîyasî dibe ku ev helwest dibine oleke din ku tundirewî jê re dibe. Lêkoler dibêje18: “Kesê ku xwe ji bo dewletê yan partîyê terxan dike û yê ku alê dikin sembola koma xwe û wê pîroz dibîne, weke wî weke wî kesî ye yê ku bawerîyê bi oleke hozî tîne yan peristina totemekî dike… tundirewîya ji welat û serokan re û amadebûna ji xwequrbanîkirina di rêya wan de, arazûyeke totemî û rengê olî derdibire yê ku alîgirtinên wan vedide, ev jî teşeyekî din ji teşeyên ola kesî ye… beşdarbûna gelek kesan li wê bawerîyê dihêle ku takekes hest bi yekbûna bi yên din re bike, her wiha ewlehî û aramîyê dide kesê nûrosis. Tiştekî nemirovî yan nebaş yan nemaqûl nîne ku rihetîyê nede heke komek tê de beşdar be…”. Bi vî awayî tundirewîya ji mezhebên olî û îdîyolojî re bi dehan ol û xweda afirandin; tevî ku xwe endamê olekê yan rêbazeke fikirî destnîşankirî didin xuyakirin. Çimkî pîrozkirina têgihan, wan li olekê vediguhêze ku bandora wê hemû alîyên jîyana mirovî tev digire. Her mezhebek ji yê din cuda ye anku Xwedayekî razber li cem her mezhebekî heye. Wate, ji bo her bawerîyeke tundirew, xwedayek heye, çi ew xweda mirovî be yan gîyanî be yan efsanewî be. Kesên tundirew jî di kesayeta wî de ya ku aqilê wan yê komî saz kirîye dihelin. Di vê çarçoveyê de kesê tundirew dibe amûrek ji bo rajekirina armanc û xwestekên kesên din anku ne ji bo xwe dijî û dixebite û nizane ku ew qurbanî ye, her wiha kesên ji derveyî bawerîya xwe bi tundîya şênber û razber dikuje. Di dîroka dêrîn de, li derdora sedsala sêyem bz, hin hewldan hebûn ji bo sîyasetkirina zanistê; heke ev derbirîn rast be. Rewşeke tundirewîyê derket, bi navê tundirewîya Fîsaxorsî19 hate naskirin; bi navê matmatîkzanê bi navû deng Fîsaxors yê ku komek damezrand ku bawerîya wê xwe dispêre mubalexkirina mezinkirina cihê aqil û mirovê ku bi aqilê xwe ne bi atîfeya xwe di bûyeran de tev digere û hewl dide civakeke bêderew di bin serwerîya aqil de ava bike. Alîgiran tundûtujî bi kar anî da ku bawerîya xwe li ser civakên grîkî-îtalî di wê heyamê de bisepînin. Asta tundirewîya vê komê gihişte wê radeyê ku Fîsaxors bigewdekirina Xwedayê Ronahîyê û nimînendeyê wî ji bo cîhana

---

[18] Heman jêder; r34.

[19] Birnar Şofîyê; el-Muteesîbûn-Cinûn el-Îman; werger: Dr Qasim el-Miqdad; çapa yekem 2017; weşanên Dar Neynewa-Şam; r59.

mirovan dîtin. "… ev teşeyek ji teşeyên tundirewîyê ye ku bi navê aqilê tevgir bi kar tê… kesê dijber alîgirê şaşîyê ye û divê bê avêtin…". Ji xalên navbirî em tundirewîyekê di bawerîyên gîyanî, zanistî û sîyasî de têbînî dikin, lewre pêdivî bi nirxandineke hûr ji bo pêkhata derûnî û sinirî ya takekes û civakê heye ji bo ku ev dîyarde bi hûrî were nasîn.

Bi pêşketina mezin ya zanistên leşkerî re û derketina hin têgihên nû ji bo stratejîyên şer û pevçûnê, weke stratejîya devera gewr, şerê dureg, şerê bi ajanan bi rêya rasthatina berjewendîyan bi leşkerkirina çeteyan re, ev komikên tundirew bûne karîgerên sereke di şerê navdewletî de. Çimkî vekişîna Amerîkayê ji Efxanistanê di sala 2021ê de, hevkêşeyên nû ji bo şer li Asyaya Navîn sepandin û derfeteke nû da dewletên rojavayî di rûbirûbûna hevrikên wan yên kevn de li rojhilatê; Çîn, Rûsya, Îran û komikên îslamî yên radîkal. Tê pêşbînîkirin ku ev welatê dewlemend yê xwedî samanên gazê û dewlemendîyê kanzayî û xwedî cihê cîyosîyasî yê giring, careke din bibe qada şer li ser zalîtîyê di navbera komikên tunirew da ku desthilata xwe bisepînin her wekî tevgera Talîbanê, Qayde, Daiş û hwd ji alîyekî ve û dewletên derdorê de ji alîyekî din ve; bi taybet Pakistan, Îran û Çîn ya ku ewlekarîya wê ya neteweyî tûşî gefên olî tê li ser sînorê wê bi Efxanistanê re. Her wiha Îran, Rûsya û hevbendên wê jî heman gefan dibînin. Dixuye ku tundirewîya van hêzan di bawerîya wan ya sîyasî de dê kaosa çêkirî geş bike, di encamê de dê dewleta bihêz zalîtîya xwe xurt bike û berjewendîyên xwe li ser hesabê gelên din misoger dikin. Dixuye ku gelê efxan dê bi dehên salên din di rewşeke xirab de bimîne.

Li gor xalên navbirî û ji ber ku tundirewî enerjîyeke razber e mirov dikare wê bi rengekî erênî hilsengîne ew jî heke ji bo parastina çanda civakî be, çanda çarçovekirî bi nirxên sincî ya ji hişmendîya kîndarîyê û biçûkkirina kesên din dûr dikeve û heke amûrek be ji bo parastina nasnameya itno-çandî ya takekes û bibe hendera milmilaneyîyê ji bo gihiştina asteke bilindtir di hemû biwarên aborî, sîyasî, civakî, zanistî û çandî de, bê ku xwe bispêre tundîyê ku divê bi tenê di rewşa xweparastinê de bê bikaranîn anku divê ewlekarîya mirovî ji bo civakê dabîn bike, ne ku bibe amûrek ji bo bicihanîna armancên hêzên din ku tu nîyazên wan yên xêrê ji bo wî mirovê bêzar û tundirew yê ku ew dixwazin wî leşker bikin nîne, ne ji bo wî ne jî ji bo gelên welatên din. Dema ku tundirewî dibe hovîtî, hingê zehmet mirov

xwe ji bandorên wê yên tirsnak li ser mirovan û jîngehê bide alî, di vê çarçoveyê de lêkoler "Mistefa el-Hicazî"[20] dibîne ku "… berjewendîya mirovê bêzar di bervenîya li hember tundirewîyê de ye, çimkî tundîya faşist û tundirew bi tenê derewa xelasê hildigire; ev çareyeke sihrî û xwekijî ye di heman demê de…".

Bi giştî, tundirewî weke wizeya ku şer û pevçûna li cîhanê ya di navbera dewlet û rêxistinên cihê de gur dike tê dîtin; çi ew tundirewî rêyek be ji bo bihêzkirina desthilatê çi jî rêyeke xweparastinê be li gor zagona kar û karvedanê. Dixuye ku rîaksyonê van her du celeban ji tundirewîyê bi çavê dîyalektîkê dê bibe sedema derketina hin pradîgmayên nû; weke pradîgmaya neteweya demokratîk ya ku ramanger Ebdela Ocelan pêşkêş kir ku heta astekê di mijara parastina deverê ji pevketina tundirewan yan zêdebûna tundirewîyê de bi ser ket. Li vir dibe ku mirov bi zehmetî vê mijarê şîrove bike, gelo ev mijar zagonek ji zagonên suriştê ye? Yan jî rewşeke kaosê ye ku mirovan di statuya suriştê de çêkiriye? Her wiha hin caran meseleya cudakirina xweparastinê ji bihêzkirina desthilatê di dîyardeya tundirewîyê de bi radeyeke mezin dimîne pirseke aloz. Bo nimûne siltan Ebdilhemîd, li gor rojnivîsên wî21, hewl da arazûya îslamî ya tundirew li nav misilmanan tev rake, ew jî ji bo parastina desthilata wî û berevanîya li hember çavnebarîyên ingilîz, rûs û fransîyan di wê heyamê de ya ku bandora masonîyan li xaka osmanîyan zêde bû, heta wê radeyê ku masonîyekî tirk "Midhet Paşa" gihişt cihê el-Sedir el-Ezem22 hevdemî pevçûneke olî tundirew di navbera rûsên ertozoks û ingilîzên inclîkanî û fransîyên katolîk û tirkên sune de. Li milê din lêkoler Memdûh Idwan di pirtûka xwe da "Heywenet el-Însan", xerîzeyên êrîşkarî yên hin hozên hindîyên çeremsor bi tundirewîya wan ji bawerîyên wan re girê dide; çimkî ew li ber gefa qirkirinê bûn, nexasim piştî ku dagîrkeran xaka wan ji wan stand û zagonên xwe û dabûnerîtên dûr ji kevneşopîyên wan li ser wan sepandin. Hindî mirovin dîlan dikirin û ji zar û cîran û sewalên xwe hez dikirin, lê dema ku dagîrker êrîşî wan kir, neçar man statuya xwe bi êrîşkarî

---

[20] Dr Mistefa Hicazî; e-Texeluf el-Ictîmaî/Medxel îla sîkilokîyet el-însan el-meqhûr; çapa nehem 2005; weşanên el-Merkez e-Seqafî el-erebî/e-Dar el-Beydai-Mexrib/Beyrût; r 109.
[21] Ji bo pêzanînê pirtit li vê berhemê vegere: Muzekerat e-Sultan Ebdilhemîd e-Sanî; pêşkêşkirin û werger: Dr Mihemed Herb; weşanên Dar el-Qelem-Şam; çapa sêyem/1991.
[22] Heman jêder; r107

û hovîtîyeke seyr biparêzin, da ku bi vî rengî di çavên dagîrkeran de bibin kesên hov û dirinde û serederîya kedîkirina lawiran li gor çanda dagîrkeran di gel wan hat meşandin ji bo wê mebestê ku ji xerîzeyên êrîşkarî xilas bibin "… lê em nizanin bê ka em ê çi navî li xerîzeyên dagîrkerên spî bikin yên ku bi zorê ketin erda hindîyan û ew qir kirin…"23. Di lêkolînekê de bi navê "Saykolojîyet el-Teesub" lêkoler24 van xalan nîşan dide: "… kesên tundirew wiha dihizirin ku wan ew rastî bi dest xistîye ya ku hemû zanîn, hêz, desthilatê û hemû teşeyên xwedîtina di ser mirovan re dide wan… her wiha hestê karîn û şîyana kirina her tiştî li nik wan peyda dibe û xwîngermîyeke xweperisî dijîn û ramana endamtîya vê komê pîroz dibînin ku dîrokê endamên wê neqandine. Ev niqandina payeberz dikare nearamîya hin kesên ku jîyanê tade li wan kirîye û bêşens in bi peydakirina ewlehîyê derman bike… çimkî êrîşkarî berev dijminekî tê arastekirin… kesê tundirew ewlehîyê weke navgîneke dilnîyayîyê di pergala tunidrew de dibîne ku weke bawerîyekê bi kar diîne. Di vê dilnîyayîyê de bêhişî û jihalçûn jî heye; çimkî ew pergala nirxan diguhêre û destûrê dide kesê tundirew ku xerîzeyên xwe (yên êrîşkarî û hin caran yên sêksî jî) serbest bike ew jî bi saya wê bawerîya wî ku ew xwedîyê şerîetê yan zagonê ye…". Em bi rêya van nêrînan dibînin ku dîyardeya tundirewîyê û di nav şerê di navbera çandên dijber de ji bo bihêzkirina desthilatê û zalîtîyê, her wiha hevrikîya di navbera hest û atîfeya mirov de çûye ta wê radeyê ku lêkolerê derûnnasîyê Birnar Şofîyê, mamosteyê derûnnasîya nexweşî li Zanîngeha Lîyonê, reftara terorîst bi tunirewîyê ve girê da; girêdaneke xurt û qayim25, Şofîyê dibîne ku "… kesê terorîst bi wateya destnîşankirî, tê wateya kesê tundirew yê ku gelekî ji rastîya ramanên xwe biqinyat e û amade ye ji bo wan ramanan veguhêze kesên din yan li ser wan bisepîne tundîyê bi kar bîne û di rêya armancan de amûran ji bîr dike… çimkî ew ne tenê li qurbanîya armanckirî weke hebûneke xirab ku kîndarîyê han dide dinêre, lê belê ew heyîn bi xwe bûye bûnewerekî zîyandar ji mirovbûna xwe ketîye û divê ji holê rabe; çimkî bûye kelemek li pêş avakirina projeyeke mezin…"

[23] Memdûh Idwan; Heywenet el-Însan; çapa şeşem 2016; weşanên Weşanxaneya Memdûh Idwan ya Çapkirin û Belavkirinê-Şam; r56.

[24] Andirê Haynal û yên din; Saykolojîyet el-Teesub; werger: Dr Xelîl Ehmed Xelîl; çapa yekem 1990; weşanên Dar el-Saqî/London; r9-10.

[25]Bêrnar Şofîyê; el-Muteesîbûn- Cinûn el-Îman; werger: Dr Qasim el-Miqdad; çapa yekem 2017; weşanên Dar Neynewayê-Şam; r99.

Xalên ku li jorê hatine rêzkirin, me ber bi wê yekê ve dehf didin ku em li karîger û amûrên ku tundirewîyê hildiberînin bigerin; karîgerên derûnî, civakî, aborî û sîyasî. Ev jî ji bo ku em pêwendîya wî bi tundîyê re û lêgerîna li ewlekarîya mirovî nas bikin; jixwe ev e tiştê ji me re giring ku em bigihinê. Çimkî bi rêya têgihiştina me ji şopa dîrokî ya pêşveçûna vê dîyardeyê, em têbînî dikin ku tundirewî di hin astên awarte ji zagonên suriştê de rê ji kuştinê re vedike anku ne tenê ji parastina hebûna şênber, lê belê ji bo parastina hebûna razber û şikandina moralên kesên din da ku li ser wan zal bin û wan bi her teşeyî kole bigirin. Çimkî çawa ku neteweyek bi kuştin, destdirêjî, bicêrîkirin û kolgiritinê li ser asta şênber tê qirkirin, heman tişt wiha jî li ser asta razber çêdibe. Çimkî girêdaneke xurt di navbera hebûna şênber û razber de di xerîzeya manê de li cem mirov heye û ev yek me ber bi wê yekê ve dehf dide ku em tundirewîyê wekî çekeke razber ji bo rûbirûbûna metirsîyên razber bibînin û bi rêya reftara tund tê rizgarkirin bi pêkanîna wê li ser kesên din ku kesên nebaş in li ser erdê. Li vir em li pêş dîyardeyekê ne ku rayên wê xwe digihînin dîroka dûndeyên mirovî; dema ku çandek destdirêjîyê li çandeke din dike da ku bi vî rengî dundeyeke çandî ji dayik bibe ku hilgira xwîna çanda êrîşkar bû. Her wiha kolgirtina çandê dihêle ku çand rajeya çanda êrîşkar bike; bo nimûne rê bi gelên binketî dayîn ku peristinê li hember cizyeyê û hin xizmetên leşkerî yan bixwegirtina beşî ya çanda êrîşkar bikin.

# Têkilîyên Bîrdozî û Sîyasî Yên Di Navbera Partîya AKP Û Komên Radîkal De

## (Ixwanûluslimî - Daiş – Elqaîde – Elnusra)

## (1 ji 2)

**D. Celal Zênatî**

### Pêşek

Xilafeta Osmanî di koka xwe de Farisî ye weke ku sîyasetmedarên wê di destpêka avakirina wê di destpêka sedsala çardan de jê re bangeşe kirine. Miletekî din bû ku li aliyekî nikarîbûn herêmên desthilatîya xwe biparêzin û ji aliyekî din ve jî destwerdan li ser hesabê gelên çewisandî kir. Di koka xwe de Osmanî Tirkî ye. Dîroknasên wê wiha nivîsandin ku ala Islamê hildaye, bi tevî ku di tevahîya dîroka xwe de sedema peydakirina nezanî, paşverûtî, windabûna welatên mîna Filestînê û sepandina desthilatîya imperatorî, mîrnişîn û dewletan ku bi armancên mêtîngerîyê yên taybet bû. Xilafeta wê di 1923'an de ket û ew sultanên bi nav bûn.

Kesên ku ew kirin zanistdarîya Ataturk e wiha bang kirin ku ya Tirkên faşîst tenê ye, piştre Erdogan derket holê yê ku kirasê faşîsta kesk a Osmanîya Mezin bi ebayê olî derket holê û projeya xwe ya olî di bin vî navî de bang kir da ku hêvîyên dewrêşên melayetî bi cih bîne. Lê belê ev yek pêk nehat û veguharî faşîsta spî da ku mirîdên xwe li xwe kom bike, lê dîsa pêk nehat piştî ku li ser destê hêzên hişyar di herêmê de mîna Misirê ku xewna wî di 30'ê hezîrana 2013'an de bi xistina koma Ixwanûlmuslimîn ku ew bi xwe endameke tê de, têk bir. Piştre veguharî faşîzma reş di dema darbeyê de ku ji bo têkbirina rikberên xwe pêk anî û pê re veguharî sitemkarekî zordest û tenê bû Osmanîya piçûk û armanca wî dagirkirina Kurdsitana

Sûriyeyê bi rîya Tirkkirin û sepandina desthilata xwe ya leşkerî ye. Ji Ataturk heyanî Erdogan yek sîyaset ji terorîzmê û qirkirina her kesên ku dijminatîya xewnên wî yên ku ti ravekirineke wê li ser nexşeya Rojhilata Navîn tune ji bilî leylanekê ku Erdogan her tim bê sûd li pey dikeve, ye.

Li ser rastîya terorê textor Ferec Fode wiha li ser terorê dibêje:" Teror ne di bin sîya dîmagociyekê de be û ne di dema ku çav nema karîbe ku cudahîyê bixe navbera terorîzm û şerî'etê de be, şîn nayê û jîyan nake. Her wiha ne di dema ku tê bangkirin ku terorîzmeke rewa û yeke ne rewa heye û terorîzmeke hezkirî û yeke nehezkirî heye be, nayê jiyîn. Mixabin ev yek di Misirê de çêbû, kujerê Sadat – çimkî hinek ji Sadat aciz in – şehîd e û kujerê polîsan li Esyûtê terorîst in. Ev bi xwe ji wan e, lê belê ev ew e.

Koma "Intel Center" a lêkolînan ku bi karûbarên terorîstê re mijûl dibe, di lîsteya xwe ya mehane de ya ku tê de "Mtirsîdartirîn deh komên terorîst an jî şoreşgerî di cîhanê de" li gorî çalakî û karên wan di dema di navbera sala 2014 û 2017'an de, derxist. Wek tê zanîn rêxistina dewleta Islamî ya ku herêmine mezin di Sûriye û Îraqê de kontrol dike, derket a herî pêş û cudahîya di navbera wê û yên li hemberî wê de pir mezin bû. Koma Intel Center di amadekirina tabloyên rêzkirina komên terorîst de mezinbûna kar û çalakîya van koman dide ber çavan, di nava wê de jî êrîşên ku kirine, hişyarîkirin, nameyên nivîskî, dîmen û wêneyên ku ji alîyê wan ve derketine, her wiha hejmara kuştî û birîndaran ên di dema sih rojan de ku mehane tê nûkirin hene.

Di rêzkirina metirsîdartirîn komên terorîst a Intel Center'ê de wiha hatiye: Dewleta Islamî li Iraq û Sûriyeyê (769 pile). Tevgera Ciwanên Cîhadîst (Somal û rojhilatê Afrîqayê – 409 pile). Boko Heram (Nîjerya 350 pile). Rêxistina El_Qa'ide li Girava Ereban (Navenda wê li Yemenê 224 pile). Taliban ( Afganistan 158 pile). Cebhet El_Nusra (Sûriye 125 pile). Cebhe El_Islamîyê (Sûriye 125 pile). Ensar El_Şerî'a (Lîbîya 121 pile). Yekîneyên Parastina Gel ên Kurdî (75 pile). Tevgera rizgarîya Gelêrî (Sûdan alîyê rikber 69 pile). Derketina rêxistina bi navê Daişê di destpêka lîsteyê de li gorî kiryarên ku pêk anîne, mîna serjêkirin û kuştinên meydanî ne tiştekî sosret e. Tişta herî balkêş ew e ku fermandîya giştî ya El_Qa'ide bi serokatîya Eymen El_Zewahirî ku herêma êlên Pakistanê ji xwe re navend dibîne, tê de nehat dîyarkirin. Her wiha di van mehên bûrî de tiştekî balkêş ji Eymen

El_Zewahirî dernetiye, taybet piştî şikandina El_Zewahirî ku rastî wê hatî di dema ku Dewleta Islamî ya bi serokatîya Ebû Umer El_Bexdadî fermanên wî nepejirandin ku xwe ji Sûriye vekişîne Iraqê û Sûrîyayê ji Cebhet El_Nusra re bihêle, çimkî El_Nusra baskekî fermî yê EL_Qa'idê li Welatên Şamê ye. Her wiha der barê ragihandina Dewleta Islamî ji El_Bexdadî re mîna xelîfeyê misilmanan de jî, Zewahirî ti axaftin nekir.

**Lêkolîna yekem têkilîya Tirkîyê bi koma Ixwanûlmuslimîn re:**

Têkilîya di navbera Tirkîyê û koma Ixwanûlmuslimîn de ne tenê li ser girêdanên xurt ên di navbera çîna sîyasî yên serdest li Tikriye bi komên islamî yên cihêreng li herêma Ereban û di destpêka wê de koma Ixwanan, xwe dide avakirin. Lê belê bi heman têkilîyê ku çarçoveya sîyasî derbas dike xwe li gorî çarçoveyeke îdolojî ku berê wan herduyan dide yek alî, ava dike. Ew vedigere dema ku Necmedîn Erbekan ku di salên şêstî yên sedsala bûrî de tevgera "Millî Corş" da avakirin ku ew bi xwe nûnertîya koma Ixwanûlmuslimîn dike. Ji malzaroka vê tevgerê gelek partîyên sîyasî derketin, ji wan jî partîya AKP'ê ye ku bi tevî nûnertîya alîyê nûbûyînê jî dikir ku darbe li ser alîyê Erbekan di nava partîya El_Fedîle de di 2001'ê de kir.

Rêveberîya vî alî bi destê Ebdulah Gul û Receb Teyib Erdogan (Serokê niha) dihat kirin ku bi demê re û gav bi gav dikarî xwe li ser hukmê di nava Tirkîyêyê de serdet bike û bibe partîya desthilat. Piştî karekî bi salan dikarî pasvanên pragmatîk ji bo alîyê îdolijîkar dûr bixe ku bawerîya wan bi ramana "Serokê Xelîfe" tê. Her wiha durûşmeyên nijadperestîyê wekî rêbazekî mezinkirina hebûna Tirkyayê li nava Asyayê û Qoqazê û rêbazên olî ji bo çêkirina têkilîyan bi dewletên Welatê Ereban re çêbike, ji xwe re kir bingeh. Ev hemû jî ji bo vegerandina mîrateya dewleta Osmanî ji Tirkîyê re, ne tenê di alîyê gîyanî de bi çarçovekirina wêneyê hişmendî yê Tirkîyê, lê belê ji bo ku herêmên piştî şerê cîhanî yê yekem winda kirine bi rîya wekîlên xwecihî yên ku koma Ixwanûlmuslimîn li kêlekên Tirkîyê yên nesax serdest e, vegerîne.

**Yek: Çarçoveyên têkilîyan û mekanîzmayên wan**

Pirsgirêka têkilîyan a di navbera koma Tirk a serdest û endamên koma Ixwanûlmuslimîn de vedigere ku ew bi xwe têkiliyeke dîrokî ye, ne tenê li

ser bingehên têkilîyan ku hin endamên herdu alîyan pev didin girêdan an jî têkilîyên kesayetî yên di navbera rêveberên herdu alîyan ên ku di dema amadebûna hin serikên koma Ixwanûlmuslimîn di kongreyên salane yên ku partîyên sîyasî yên ku Erbekan dabûn avakirin, hatiye avakirin. Lê belê li ser têkilîyên hevpar ên ku di dema hewaya zanistdarîyê ku tê de komên AKP'ê xurt bûn de pêş ketin, hatin avakirin.

Di nava hewaya zanistîtî de, koma Edalet û Geşedanê (AKP) çêbûneke sîyasî û olî di nava nivîsên mezinên Ixwanûlmuslimîn ên Misirî de pêk anîn. Di wê demê de li Tirkîyê nedihiştin ku pirtûkên olî werin weşandin, vê yekê têkilîyên di navbera herdu alîyan de aloz dikrin ku ji alîyê gelek mekanîzmayên pratîkî ku berjewendîyên hevpar pev ve girê dide, dihat kontrolkirin. Pê re mukurhatina koma Ixwanûlmuslimîn ku Tirkîyê nûnertîya cureyê ku tê jibergirtin dike, taybet di pêvajoya piştî şoreşên Erebî de. Ev nayê wê wateyê ku tenê ezmûna AKP'ê ji xwe re li ser asteke partîbûyînê bigirin dest, lê belê girêdayî bilindkirina têgîna Neteweyê li ser hesabê pênaseya dewletê re ye. Vê yekê di nava xwe mukurhatina ku navenda giranîya xilafeta Islamî – ku hin bi hin ji pergaleke demokratîk bû dewleteke desthilatdar ku tê de pergala baviksalarî serdest e û îdolojiyeke olî û neteweyî radîkal digire xwe - balê davêje li ser desthilatê û bicihkirina ramana "Serokê Xelîfe", dihewand. Di nava Ixwanûlmuslimîn de û bi rîya torên medyayê ku di bin destên wan de ne, ramana ku Erdogan xelîfe ye, hat belavkirin. Li gorî vê jî, mînak, Yûsiv El_Qeredawî ku li Dewhayê niştecih e û ew bi xwe serokê gîyanî yê Ixwanûlmuslimîn e, got ku Erdogan xelîfe û nûnerê nimûneya Islamê ya hemdem e, her wiha ew ê Islamê li tevahîya cîhanê belav bike. Her wiha yekîtîya feqeyên Islamê ragihand ku divê xilafet li Istenbolê çêbibe; çimkî ew paytexta Islamê ye... Tirkîya nû ew e ya ku dewlet û olê, kevin û nû û Ereb û ne Ereb dike yek, her wiha ew neteweyê Afrîka, Asîya, Ewropa, Amerîka û li her derê dike yek. Kesê ku di Tirkîyê de ev yek pêk aniye Receb Teyib Erdogan e, ew serokê ku xwedê nas dike, xwe nas dike, gel, netewe û tevahîya cîhanê nas dike. Divê ku hûn pê re bisekinin û alîyê wî bigirin, her wiha jê re bibêjin:" Pêş ve bimeşe ".

Bi tevî ku serokê Tirkîyê xwe wek rêberê koma Ixwanûlmuslimîn nade nîşandan jî, lê belê daxuyanîyên wî yên der barê hin pêşketinan de wiha dîyar dike ku xwe wek rêberê wan di herêmê de dibîne. Gelek raman û

nêrîn hene ku destnîşan dikin ku ev yek ne li gorî îdolojîya desthilata Tirkîyê ye, her wiha vê nêrînê pêş dixin ku ev kom di dehsalên dawî de bûye mîna alavekê di destê Tirkîyê de ku xwe wekî dewleta serok ji dewletên Islamî re bibîne. Bi tevî ku ev têkilî gelek pirsgirêkan bi têkilîyên Tirkîyê yên bi karmendên herêmê yên ku Tirkîyê wekî dewleteke piştevan ji terorê re dibînin jî, lê belê israkirina Tirkîyê li ser van têkilîyan ew e ku ev kom mîna alavekê ye ku Erdogan wê ji bo xurtkirina bingeha xwe ya gelêrî di qada xwecihî de bi kar tîne. Di encamê de ev yek nahêle ku Erdogan dest ji wan berde yan jî fişarê li ser endamên wê bike. Ev name bi rîya gelek helwestan di salên bûrî de fermandarîya Tirkî tekez kiriye, ji wan jî tekezkirina ku parîya desthilat a li Tirkîyê ne dûrî rêgezên Ixwanûlmuslimîn e ku herî dawî li Istanbolê bi beşdarbûna bi dehan ji fermandarên wan ên ji seranserî cîhanê salvegera wê ya notî pîroz kir.

**Du: Tirkîyê û Ixwan... Bandora mekanîzmaya derveyîn**

Ên ku di dîroka koma Ixwan El_Islimîn de derketine pêş ku ew bi xwe alîyê Islamî yê sîyasî ku di 1928'an de ji alîyê Hesen El_Bena ve hatiye avakirin, her wiha rayên xwe berda nava 82 dewletên Islamî û ne Islamî û di nava wan de jî Tirkî ku Partîya El_Fedîle ya Islamî ya bi serokatîya Necmedîn Erbekan ku ew bi xwe zarokekî koma Ixwanûlmuslimîn û nûnerê wê li Tirkîyê ye, piştî ku bi biryara dadgeha destûrî di sala 2001'ê de hat hilweşandin ji du partîyan e, yek jê AKP bi serokatîya Receb Teyib Erdogan e ku nûnerîya alîyê klasîk û çaksazîkirinê dike û di 22 hezîrana 2001'ê de hatiye damezirandin û ya din jî partîya El_Sehadê ya bi serokatîya Recayî Qotan ku di 20'ê tîrmeha 2001'ê de hatiye avakirin û nûnerîya alîyê klasîk dike.

Bi tevî ku Erdogan rêzgirtina xwe ji mîrateya Ataurk a çandî re dîyar dike, lê belê gelek sîyasetên wî helwestên dijî vê mîrateya çandî û sîyasî ya damezirênerê Tirkîya hemdemî ku di 1924'an e xilafet tune kir, derdixe pêş. Her wiha ew bêhtir nêzîkî ramanên Hesen El_Bena damezirênerê koma Ixwanûlmuslimîn 1928'an e. Ku ragihandibû dê ji bo vegerandina xilafeta Islamî ya ku Ataturk hilweşandibû, kar bike. Ev yek sîyasetên Tirkîyê yê derve şîrove dike, taybet ku sîyasetên firhkirinê yên Tikîyayê di qada herêmî de pala xwe dabû rolên ku vê komê ji bo xizmeta desthilata Erdogan pêk anîbûn. Ne tenê di qada herêmî de – Bi rîya artêşkirina hundirîn di

gotarbêjîyên gelêrî û berdewamkirina di destdayîna ser desthilatê de – lê belê di heman demê de bikaranîna wê di projeya xwe derveyîn de ku bi rîya wan xwe berdide nava herêma Erebî û bandorê li ser pakbûna çalakbûna wê dike, her wiha bikaranîna pirsgirêk û pevçûnên wan li gorî ku berjewendîyên Tirkîya cihêreng pêk bîne. Tirkîyê pirgirêkên koma Ixwanûlmuslimîn ji bo jibergirtina stratejîya Tehranê ya guhdana komê Şîhî bi kar tîne, çi partî û çi jî leşkerî be da ku xizmeta desthilatîyên wê yên di herêmê de û belavkirina hêzên wê yên leşkerî derveyî sînorên wê yên erdnîgarî, bike. Lewre berê hêza xwe ya madî û derfetên xwe yên çapemenî dan xizmetkirina koma Ixwanûlmuslimîn li Misirê ku desthilata Misirê armanc digirin; da ku nearamîyê di alîyê sîyasî, ewlekarî û aborî de li wir pêk bîne. Ew bi xwe projeyeke Tirkî ye û Ixwanan tê de bi kar tîne, taybet ji ber ku pêwîstîya wan bi stargeheke aram heye ku tê de ramanên xwe belav bikin û berê xwe bidin şerê çekdarî ku dewleta niştimanî armanc bigirin û têk bibin.

Em bala xwe bidinê teror çeka Ixwanan e, taybet ku hemû komên radîkal ji malzaroka koma Ixwanûlmuslimîn derketine, ji Koma Islamê bigire heyanî bi El_Qaide û Daişê ve derkeve. Eger El_Qaide tenê berê êrîşên xwe dida dijminê dûr bi taybetî berjewendîyên dewletên Rojava, komên din û bi taybetî Daişê stratejîya dijminê nêzîk bi xwe girt, ti cudahîyê naxe navbera gelan de û bi şêweyên cûr bi cûr pêk anî, mîna şerê komî yan jî gurên yekane û herî dawî jî artêşkirina jin û zarokan di çalakîyên xwe yên terorê de. Koma Ixwanan bi xwe jî amûreke di destên Tirkîyê de ku pê di nava herêmê de xwe berfireh bike û aramîya wan xirab bike. Lê belê cudahî ew e ku dewleta Tirk jî Terorê ji bo xwe dike bihane da ku bi awayekî leşkerî di qadên dewletên Erebî de berfireh bibe. Her wiha doza Fethulah Gulen ji xwe re bi kar tîne da ku êrîşî dewletên ku endamên wî radestî wan nakin, bike. Ji xwe dewleta Tirk wan tewanbar dike ku ew li dûv darbeya tîrmeha 2016'an in. Di heman demê de jî hembêza xwe ji hemû radîkalîyan ên ji hemû alîyên cîhanê re vedike.

### Sê: Bandorên hevbendîya têkilîya di navbera Tirkî û Ixwanan de

Bikaranîna têkilîya bi Ixwanan re ji bo piştgirîya projeya Tirkîyê ya herêmî bandora wê ne tenê li ser têkilîya bi Misirê re ye. Wêneyên vê yekê di nêzîkatîyên Tirkîyê di alozîya Sûrîyayê de ji 2011'an heyanî niha de pêk

hatin. Tişta ku ev yek bêhtir kir tirsa Tiakîyayê ji serkeftinên Kurdan ên bi destê QSD'ê bûn. Ji xwe berîya niha Tirkîyê xaka xwe kiriye navendek ji rikberîya Sûrîyayê re, bi taybetî jî koma Ixwanan. Piştre jî, ew di operasyonên xwe yên leşkerî di meydana Sûrîyayê de jî bi kar anîn. Ev jî stratejiyeke berîya niha li Iraqê bi rîya hêzên "El_Heşid El_Wetenî" pêk aniye ku têkilîyên xwe bi bihaneya mayîna di kampa Be'işîqayê de li Mûsilê misoger kiribûn. Tirkîyê heman rêbaz bi Ixwanên Lîbîyayê re, her wiha bi tevgera Hemas re ku ew baskê Filistînî yê Ixwanan e, bi kar anî. Tirkîyê bi zanebûn çarçoveya planên vê tevgerê li hemberî hemû komên din ên Filistînî, her wiha li hemberî Misirê berfireh kir. Enqereyê tenê helwestên vê tevgerê bi xwe girt û yên din berdan, her wiha piştgirîya doza Filistînî tenê di nûnertîya tevgera Hemas de li ser bingehekî Ixwanî pêk anî, ew jî bi tevî têkilîyên Tirkîyê yên aborî, sîyasî û leşkerî bi Israîlê re. Her wiha têkilîya wê bi partîya El_Islah a Yemenî re mîna sînordakirinekê ji helwestên wê yên li beramberî şerê Yemenê ye. Bi tevî ku koma Ixwanan bû mîna sînordakirinekê ji sîyasetên Tirkîyê yên derveyîn re der barê dewletên Erebî de, lê belê ne wisa hat dîyarkirin gava ku Tirkî têkilî bi Israîlê re girê dan. Li hemberî vê yekê Ixwanan hewl da ku rûyê vê bûyerê spî bikin, ew jî bi rîya bikaranîna dorpêçkirina Xezayê da ku têkilîya Tirkî – Israîl a hevkarî bi kiras bikn. Di daxuyanîyê de koma Ixwanan hewldanên Tirkîyê ji bo sivikirina dorpêçê li ser Xezayê silav kir û wiha anî ziman "çi hewldaneke ji bo rakirina dorpêça li ser Xezayê bê kirin, cihê spasîyê ye". Di daxuyanîyê de ji bîr nekirin ku ew li benda hewldanên bêhtir in ji bo bi temamî dorpêçê li ser Xezayê rakin û hemû mafên Filistînî vegerînin. Li aliyekî din jî têkilîyên Tirkî – Qeterê xwe spartine girêdanên hevpar ên bi Ixwanan re, bi taybetî ku herdu dewletan bi hev re gelek civîn bi endamên Ixwanan re pêk anîne da ku der barê pêşketinên di Misirê de hevrêzîyê bikin. Wan piştî ketina dethilata Ixwanan li Misirê bi hev re hevkarî kirin, çi bi rîya anîna serikên Ixwanan û yên li ser navê wan an jî peydakirina maseyên çapemenîyê ji bo belavkirina ramanên wan û kişandina alîgirên wan bi ser xwe de. Her wiha doza Filestînê (Serdanên Xezayê) ji bo desthilatîyên xwe yên herêmî û ji bo zextkirina li ser dewletên Erebî yên sereke bi kar anîn. Helwesta Trikî – Qeterî ya hevpar yek ji mekanîzmayên Tirkîyê di alozîya Kendavê – Qeterê de ku Enqere ji xwe bi kar anî da ku yekemîn serbazgeha xwe ji derveyî sînorên xwe yên erdnîgarî ava bike. Dîyar e ku ew jî mîna yek ji

mekanîzmayên helwesta mîrê Si'ûdîyê Mihemed Bin Selman e, dema ku behsa sêgoşeya şerî kir ku Tirkî, Tehran û Qeter di nava xwe de dihewîne. Gelek dewletên Erebî sîyaseta çapemenîyê mîna sîyaseta Misirê ji ber helwestên Tirkîyê bi koma Ixwanan re li xwe girtin. Dibe ku ev kom mîna sêgoşeya derfetê ye ji desthilata Tirkîyê re di pevçûnên derdor de. Li ser dewletê di çarçoveya têkilîyên wê yên bi hêzên herêmî yên sereke re, bargiraniyeke mezin çêkiriye.

Têkilîyên taybet di navbera serokên Daişê û malbata Erdogan de hene, Enqereyê hewl da ku gaz û petrolê li Sûriye û Iraqê di bin navê Daişê de bi kar bîne. Her wiha Erdogan rê ji çekdarên Daişê re vekir da ku rêxistin di alîyê mirovan ve xwe berfireh bike û di alîyê erdnîgarî de jî herêmên desthilata wî û Tirkîyê pev bide girêdan. Serbazgehên Daişê di bajarên Tirkîyê de mîna Istanbul, Enqere, Qonîya, Edene, Izmîr, Urfa û Gazî Entapê de hene. Têkilîya wê bi terorê re gelek pirsgirêkan derdixe, nezelalî û tevlîhevî di rewşa wê de derketiye û carinan ên ku dixwazin ku vê rastîyê derxin dikevin nava pirsgirêkan de. Berjewendîyên Tirkîyê yên hundirîn, herêmî û navdewletî û hene dixwaze li ser hesabê çi dewletê be jî, pêk bîne. Lewre Tirkîyê rewşa heyî ya hemû dewletên herêmê bi kar anî û Daiş a ku rêxistina terorîst e bi xwe girt; da ku mîna alavekê berjewendîyên xwe bi rîya wê pêk bîne.

Bi kurtayî, ev sîyaseta Tirkîyê Enqere wê venaşêre, şêwirmendê serokê Tirkîyê Yasîn Aktay eşkere got:" Ketina xilafetê dê valatiyekê di herêmê de çêbike, rêxistina Ixwanan hewl da ku bibe nûnerê sîyasî yê neteweyê di cîhanê de. Hinek ji me bi çavekî piçûk li Ixwanan dinêrin û dibêjin ku komeke piçûk e, lê hemû tevgerên Islamî ji malzaroka koma Ixwanan derketine...". Her wiha Aktay di hevpeyvîneke televizyonê de berîya mehekê da xuyakirin ku "Koma Ixwanan şaxên wê û feqetîya wê yên taybet hene, ew nûnertîya hêza nerm a Tirkîyê di cîhana Erebî de dike. Vê komê rola Tirkîyê di herêmê de silav kir... di encamê de ew wiha li rola Tirkîyê dinêrin ku ew cîgirê xilafeta Islamî ye ya ku berîya niha hilweşîyabû. Ji bo pêkanîna van rehendan, Tirkîyê ji xwe re Ixwan hevalbendekî baş dîtin, bi taybetî ku partîya desthilat ne dûrî rêgezên rêxistina Ixwanan e, ku salvegera wê ya notî li Istanbulê bi beşdarbûna bi dehan ji serikên wê li seranserî cîhanê pîroz kir, li gorî ku ajansa Anaolyayê ya hukûmetê pê xwe

paye kir. Dema ku desthilata Tirkîyê dest bi projeya xwe ya berfirhkirinê kir, koma Ixwanan bingehekî xurt bû ku xwe spartîyê da ku herdu bi têkilîyên berjewendî yên xurt ve werin girêdan. Serokê Tirkîyê pêwîstîya wî bi Ixwanan heye da ku artêşbûyîna hundriîn bi rîya xitabeta gelêrî û berdewamkirina li ser desthilatê, xurt bike, di heman demê de jî wan di projeya xwe ya derveyîn de bi kar bîne. Ji xwe Ixwan, hîn bêhtir pêwîstîya wan bi stargeheke biewle heye, taybet piştî ku gelên Ereb rastîya wan a ku li ser bingehên vala avakiribû û ew mîna qurbanîyên bi dehên salan ji çewisandinê didîtin, her wiha çareserîyên Ereban di dest wan de hene, lê belê piştî ku hatin ser desthilatê hîn bêhtir pirsgirêkên gel zêde kirin û ew çewisandin, tûrikê xwe yê mixabinîyê li ser milê xwe rakirin û revîyan û li şûna xwe mîrateyeke mezin ji terorê û paşverûtîyê hiştin, her wiha ew sedema binkeftinê bûn. Li Enqereyê ji bo xwe himbêzeke biewle dîtin ku li wir xwe komî hev bikin û bi ramanên xwe dîsa belav bibin û pêk bînin, her wiha êrîşên çekdarî pêk bînin da ku dewleta niştimanî bikin armanc û wê tune bikin.

Nexwe teror çeka Ixwanan e, ev kom jî di heman demê de çeka Tirkîyê ji bo berfirhkirina di herêmê de û lêdana aramîyê ye. Lê belê cudahîya mezin ew e ku teror bihaneya Tirkîyê ye jî ji bo berfirehkirina di rojhilat û rojava de, mîna ku em di doza Fethullah Gulen de dibînin, ê ku rojekê ji rojan hevalbendekî xurt ê Erdogan bû. Tirkî êrîşî wan dewletan dike yên ku napejirînin ku alîgirên wî radestî wan bikin ku Tirkî wan mîna terorîstan dibîne çimkî darbeya binkeftî ya di havîna 2016'an de wan pêk anîn. Di heman demê de jî Tirkî sînga xwe ji terorîstên ji hemû alîyên cîhanê re vedike, heya asta ku ragihandina Tirkîyê wiha xwe pê dibîne ku kesên ji dewletan mehkûm in, li cem xwe dike mêvan.

Piştevanîya Tirkîyê ya bi koma Ixwanan a terorîst re di vê asta bilind de ji ber gelek sedeman e, yek jê ew e ku AKP yek ji komên bihêz e ku di bin sîwana rêxistina Ixwanûlmuslimîn a navdewletî de dixebite. Tirkî li cem xwe Yekîtîya Ciwanan a navdewletî ku di nava xwe de ciwanên dewletên ku girêdayî rêxistinê ne dihewîne, himbêz dike. Her wiha civînên xwe yên eşkere û yên veşartî bi guhdana humûketa Tirkîyê çêdikin. Yekîtîya Xwendekaran a navdewletî ku navenda wê li Enqereyê ye, karê wê tevlîbûna xwendekaran ji dewletên Islamî yên cihêreng di nava rêxistinê de

ye. Li beramberî vê jî binketina Ixwanan li Misirê – Landika rêxistinê ji sala 1928’an ve – mîna derbeke xurt bû ji Tirkîyê re. Qahire bi giranîya xwe ya herêmî û navdewletî dergeha derbasbûna parzemîna reş, herêma Mexrib a Erebî û dilê parzemîna Asîyayê bû. Her wiha binketina koma Ixwanan tê wateya lwazbûna Tirkî di herêma Rojhilata Navîn de, bi taybetî ku di navbera Tirkîyê û gelek dewletên Erebî de ji ber destwerdana Enqereyê di karûbarên wan ên hundirîn de û derbaskirina sînorên xwe di têkilîyên bi dewletên herêmî re, nakokî derketine. Hinartina hewesa Erdogan û tirsa wî ji bandorîyên 30’ê Hezîranê ne tenê li ser binkeftina Ixwanan bû, lê belê derbirîna tirsên Erdogan e ku heman sînaryoya Misirê li Tirkîyê ya ku nakokî di têkilîyên wê yên Sivîl – Leşkerî de hene, pêk bê. Bi taybetî piştî ku gelek fermandarên leşkerî xistin dadgehê de, dibe ku ev yek bû hişt ku Erdogan madeya 35’an ji yasaya leşkerî ya sala 1960’î sererast bike, ku berê wiha digot:" Erka hêzên leşkerî yên Tirkîyê parastina welatê Tirkî û rêgezên komara Tirkîyê ye mîna ku çawa di destûrê de hatine ", lê belê forma wê ya nû ku di 13’ê tîrmeha 2013’an de ku li serê dengdayîn çêbû, wiha bûye:" Erka hêzên leşkerî ew e parastina welat û komara Tirkîyê ji êrîş û gefên derveyîn e, hewldana parastina hêza leşkerî ye ku hêzeke mezin karîbe dijminan têk bibe çêbike, her wiha pêkanîna erkên derve yên ku parlementoya Tirkî disipêre xwe û destekdayîna ji bo bicihanîna aşitîya cîhanî ye".

**Ixwanên Misirê û civînên Istanbulê:**

Liv û tevgera rêxistina Ixwanan di dehsalên dawî de pir xurt bû, bi taybetî di destpêka sala 2013’an de piştî ku desthilata Tirkîyê ket destê AKP’ê de. Piştî binketina Ixwanûlmuslimîn di Misirê de piştî 30’ê Hezîranê, Enqere bû xala destpêkirina çalakîyên rêxistina navdewletî ya Ixwanan, ew jî bi armanca ku li hemberî bandorîyên bûyerên 30’ê Heazîranê derkeve. Di vê çarçoveyê de rêxistina navdewletî gelek civînên xwe pêk anîn, hin ji wan veşartî û hinek jî bi alîkarîya AKP’ê çêbûn. Civîna yekem di 10’ê Tîrmeha 2013’an de bû, sê rojan dirêj kir û tê de plansazîya tevgerkirina li hemberî alozîya ku di Misirê de bi serê wan hat, hat guftûgokirin. Di civînê de gelek rêveberên rêxistina navdewletî ya Ixwanan beşdar bûn, mîna Yûsiv Neda, Raşid El_Xenûşî, Mihemed Rîyad El_Şeqfa û nûnerên tevgera Hemas’ê. Ev kongir di bin perdeya beşdarbûna kongira gelêrî ya cîhanî ku partîya

El_Se'adê ya Tirkî ji bo demokrasîyê pêk anîbû de pêk hat; da ku armanca bingehîn a civînê veşêre. Civînê xwe spart belgeya "Stratejîya bêhna fireh" ku navenda navdewletî ya lêkolîn û perwerdeyê " INTERNATIONAL CENTER FOR STUDIES AND TRAINING" ku ew baskê ramanî yê Ixwanan e, amade kiribû. Belgeyê gelek sînaryo û pêşnîyar danîn pêşîya xwe da ku bi rojevê re anûstandinê bikin, lê ya herî derket pêş berxwedanî û parastina rewatîyê bi bêhna fireh bû, her wiha nehiştina ku nêzî rewabûna serokê hilbijartî bibin ku çi qasî fişar û kar parçebûnê di artêşê de jî pêk bîne. Sînaryoyeke din hebû ku berê pevçûnan dide leşkertîyê, lê belê ev yek ji alîyê belgeyê ve mîna "Pêşnîyara malxirabûnê" hat binavkirin ku dê berê welat mîna Sûrîyayê bide wêranîyê. Belgeyê gelek pêşnîyar ji bo serkeftina berxwedana bi bêhna fireh pêşkêş kirn, mîna "pirkirina pêngavên propagandayê û hînkirina gel li ser tiştên ku çêbûn, her wiha sezakirina yasayî ya serikên di artêşê de". Di çarçoveyeke mîna wê de Istanbulê di 25 û 26'ê îlona 2013'an de civîneke din a rêxistina navdewletî ya di bin navê "Cîhan di dema darbeya leşkerî ya li ser vîna gel de" pêk anî ku cîgirê serokwezîrê Tirkîyê Bekîr Bozdag dest pê kir. Ji nava alîyên ku kongir bi rêxistin kirin, komcivîna "Ramyarên Islamî" û "Parlementoya ji bo zelalîyê" hebûn ku ew bi xwe rûyên dezgeha sîyasî ya rêxistina cîhanî ya Ixwanûlmuslimîn in. Bi tevî ku armanca kongirê berê hatibû amadekirin ku siberoja alîyê Islamî di şoreşên buhara Ereban de taybet li Misir, Tûnis û Lîbîyayê guftûgo bikin, lê belê endamên rêxistina Misirê destwerdan kirin û berê armancên kongirê veguhartin li dijî Qahirayê û desthilata nû ya Misir. Vê yekê hişt ku hinek rêveberên rêxistinê yên ji dewletên din ên Erebî ji kongirê vekişin çimkî "Ixwanên Misirê" li ser civînê bûn hakim û li gorî xwestekên xwe ew araste kirin.

Di kongirê de li kêleka koma Ixwanan Yekîtîya Cîhanî ya Zanyarên Misilmanan û komcivîna cîhanî ya parlementoyan bi serokatîya Hisên Ibrahîm ku endamê xuyayî ye di rêxistinê de beşdar bûn. Her wiha Yasîn Aktay rêveberê peymangeha hizirandinên stratejîk li Tirkîyê, Usama Rişdî şêwirmendê sîyasî yê partîya avakirin û geşedanê ku ew bi xwe baskê sîyasî yê koma Islamî li Misirê ye û Hesen El_Qezaz şêwirmendê aborî yê koma Ixwanan û li kêleka wan jî rêveberên mezin ên komê ji welatên Erebî û Ewropî jî beşdar bibûn.

Ev civîn ne yên yekem bûn ku mîna wê çêdibin, piştî wan gelek civînên rêxistina navdewletî ya Ixwanan li Tirkîyê çêbûn. Di dawîya tebaxa 2014’an de civîneke awarte çêbû û tê de guftûgoya biryara Qeterê ya derkirina heft rêveberên xuyayî yên komê, her wiha bandorîyên wê li ser siberoja komê û cihê wê, bikin. Her wiha civîna duyem jî di îlona 2014’an de çêbû da ku planekê amade bikin ku pê serdana serokê Misirê Ebdulfetah El_Sîsî ya li Neteweyên Yekbûyî ku di civînên komeleya Neteweyên Yekbûyî di 24 û 25’ê ilona 2014’an de beşdar bibe, bin bixin

Keda Tirkîyê ji bo lîstina rolekê di çareserîya pevçûnên lîbîyayê de ji ber metirsîyên wê ye ku têkilîyên wê bi hevalbendên wê yên rojavayî re xirab bibin; çimkî gumanên wan pir bûne ku ew di destekdayîna rehendên Islamî di herêmê de berdewam e. Di meha bûrî de Tirkîyê şandêrekî taybet li Lîbîyayê erkdar kir. Emirullah Işler bû şandêrê yekem ku eşkere bi hukûmeta Umer El_Hasî ya ku ji alîyê navdewletî ve hîn nehatiye danpêdankirin re dicive. Vê gavê hîn bêhtir da gumankirin ku serokê Tirkîyê Receb Teyib Erdogan di destekdayîna komên Islamî re li herêmê ji dema serhildanên "Buhara Ereban" di sala 2011’an ve berdewam e ku navûdengê Enqereyê di rojava de xirab kir û ew mîna navberçîyê herêmî daye dîyarkirin.

Piştgirîya Tirkîyê bi Islamîyan re li Lîbîyayê ne tenê pêşkêşkirina şêwirmendîyên sîyasî bûn, lê belê alîkarîyên leşkerî mîna moşekên erd – hewa, bobme û bermîlên teqemenîyê ji koma Ensar El_Şerî’a, milîsên Misrata û koma Ixwanan re şandin. Her wiha serokê komîteya guftûgoya civakî ya Lîbî Adil El_Qayidî eşkere kir ku hin alîyên derve bi ewlekarîya niştimanî ya Lîbîyayê dilîzin û dixwazin tevlîhevî û pevçûna çekdarî di welat de pêk bînin. Destnîşan kir ku Qeter, Sûdan û Tirkî piştgirîya milîsên çekdar ên li welat dikin, bi taybetî hêzên "Fecir Lîbîya" bi çek û pere dikin da ku pevçûn di welat de gurtir bibe û piştgirîya alîyên xwe ango Koma Ixwanan bikin.

Di heman çarçoveya piştgirîya koma Ixwanûlmuslimîn li Lîbîyayê de, Enqere hevrêzî bi Dewhayê re kir ku alîkarîyên wê yên leşkerî û pereyî serhildana Lîbîyayê bi ser xist, bi taybetî di pêkanîna hukûmeta demkî û encumena niştimanî ya veguhêzî de ku qedir wergirt. Di çarçoveyeke mîna wê de Qeter û pê re jî Enqere têkilîyên xurt bi milîsên Islamî yên sereke re

çêkirin, mîna tabûra "Terablus" bi fermandarîya Ebdilhekîm Bilhac û tabûra "Rafellah El_Sehatî" bi fermandarîya Ismail El_Selatî û birayê wî Elî El_Selatî ku li Qeterê ji berîya şoreşa 17 sibata 2011’an ve surgûnkirî dijîn.

Tirkî pêşketinên di Lîbîyayê de yên ji dema ketina Qedafî ve mîna ku karûbarên Tirkîyê yên hundirîn in, dinêre, yan jî pirsgirêkeke ewlekarî û sîyasî ye ku bandorîyên wê yên yekser li ser mijarên ewlekarî û berjewendîyên Tirkîyê yên herêmî hene. Bi awayekî ku xwe berda nava karûbarên Lîbî yên hindirîn, ew jî piştî ku xwe ji yek ji sînorîyên sîyaseta Tirkîyê ya derveyîn rizgar kir ku nedihişt destwerdanê di karûbarên hundirîn ên dewletên din neke. Ev yek li ser rêgeza Ataturkî "Aşitiyek li hundir aşitiyek li derve" pêk hat. Li ser vî bingehî Erdogan di merasîma serokatîya xwe de der barê encumena cîgirên Lîbî ya hilbijartî de wiha got:" Civandina parlementoya Lîbî li Tebreqê nayê pejirandin" û wiha dîyar kir ku ev şaştiyeke bi rastî ye. Her wiha got:" Çima parlemento li Tebreqê dicive û ne li paytextê Terablusê dicive, em vê yekê napejirînin. Li vir em li beramberî rewşeke şaş in, lewre tişta ku li Tebreqê çêbûye penaberkirina parlementoyê ye".

Daxuyanîyên Erdogan ji alîyê cihên fermî yên welat ve rastî gelek bertekan hat û bi taybetî Xelîfe Hefter ku destwerdana wî di karûbarên Lîbî yên hundirîn de şermezar kir. Alozîya ku serokê Tirkîyê Receb Teyib Erdogan çêkir ket pêvajoyeke nû di warê diplomasî de, encumena cîgirên Lîbî ji bo protestokirina daxuyanîyên Erdogan yên der barê parlementoyê de balyozê xwe yê li Enqereyê xwest vexwest.

Meylên Tirkîyê yên der barê pêşketinên li Lîbîyayê de û israrkirina wê di piştgirîya milîsên çekdar de hişt ku Xelîfe Hefter ê ku fermandarîya operasyona Rûmetê ya ji bo rizgarkirina Lîbîyayê dike, gefan li Enqere û Dewhayê bixwe ku dê bide dû welatîyên wan piştî ku wan di piştgirîya komên veqetîyayî û bi taybetî yên Islamî tundrew de rol lîstin. Bi rastî jî Tirkîyê bêhtirî 400 welatîyên xwe ji wir anîn. Tirkî der barê çareserîya alozîya Lîbîyayê de xwedî baweriyeke yekalî ye, ew jî nehiştina derbasbûna Terablusê û têkbirina hukûmeta Islamî ya li wir e. Ev yek di daxuyanîyên şandêrê Tirkî li Lîbîyayê de hat dîyarkirin dema ku got:" Islamîyên li Lîbîyayê ne terorîst in, ew rastiyeke sîyasî ne. Tunekirina wan tê wateya ku danûstandina bi wan re ne gengaz e". Lewre tiştekî normal e ku di têkilîyên

di navbera Tirkî û Lîbîyayê de nearamî hebe gava ku em li israra Erdogan di destwerdana di karûbarên Lîbî de binêrin. Ev yek serokê parlementoya Lîbîyayê Salih Iqêla di guftûgoya xwe ya bi rojnameya Rojhilata Navîn re di 25 cotmeha 2014'an de dabû dîyarkirin ku wî Tirkî, Qeter û Sûdan bi destekdayîna komine dîyarkirî tewanbar kir, her wiha spasîya serokê Misirê Ebdulfetah El_Sîsî ji bi piştgirîya wî bi Lîbîyayê re kir.

Iqêla di guftûgoya xwe got:" Tişta ku piranîya gelê Lîbîyayê dizanin ew e ku piştgiriyeke Tirkîyê ji komine dîyar re heye. Serokê Tirkîyê Receb Teyib Erdogan got ev fitneyeke rojnamevanî ye, min jê re dîyar kir ku divê dosyaya kevin were tewandin û li pêşîya me siberoj heye. Wî got ku dê ji me re nûnerê xwe yê taybet bişîne û bi rastî jî berîya du rojan nûnerê Tirkî gihişt û nêrîna xwe ji me re zelal kir. Lê belê wî dixwest xwe bigihîne komên tundrew ên li Lîbîyayê û me jê re got ku em nahêlin ev xwegihandin bi van komên derveyî rê re çêbibe".

**Tirkî û Ixwanên Yemenê: Rûbirûbûna li hember desthilatîyên Îranî**

Têkilîya Tirkîyê bi Yemenê re heyanî di dema Salih de bêguhdan mabû, lê belê di hin tewereyan de û bi awayekî veşartî bi beşeke ku girêdayî Ixwanûlmuslimîn re yên li Yemenê ne, hatin belgekirin. Şêx Hemîd El_Ehmer ku ew fermandarekî wan bi pere, şêwirmendî û rajeguzarîyên teknîkî piştgirî jê re hat kirin. Her wiha Tirkîyê cîgir dan Ixwanên Yemenê û berhemên Tirkî di nava bazarên Yemenê de bi awayekî balkêş tijî bûn. Ev hemû di çarçoveya piştgirîya Tirkîyê bi hevalbendên Enqereyê re pêk hatin. Di dema gurbûna alozîyê li Yemenê de Tirkîyê xwe ne livand heyanî ku Elî Ebdulah Salih ji ser desthilatê rabû. Di vê çarçoveyê de serokê Tirkîyê di çileya 2011'an de serdana Yemenê kir, di vê serdanê de hevpeymaneke hevpar di navbera hukûmeta herdu welatan de ji bo rakirina nîşankirinên derbasbûnê, hat wajokirin. Di çarçoveya hewldanên gihandina partîya Çakirinê (El_Islah) de Yemen bû qibleyek ji berpirsên Tirkîyê re da ku di kontrolikirina korîdorên deryayî li başûr û bakurê deryaya Sor de hebûna Tirkîyê di pêş de be. Plankirina Tirkîyê di Yemenê de bêdeng û di bin perdeyê de bû. Mînak, 800 kadroyên partîya El_Islah a Yemenê "Ixwan El_Msilimîn" di gelek mijaran de mîna geşedanên mirovî, plankirin, teknîkên nûjen di pêgihandin, plankirina leşkerî û rêvebirina tenduristî û perwerdeyî û hwd de, hatin perwerdekirin. Piştî ku rewşa Yemenê tevlîhev

bû û ket pêvajoyeke din de, her wiha kontrolkirina Hûsîyan ji paytextê re û karhêlana hukûmeta Basindûra û erkdarkirina hukûmeta Xalid Behah, serokê Tirkîyê Receb Teyib Erdogan parastina partîya El_Islah a Yemenê kir û got:" Partîya El_Islah partîya Islamî ye ku ji hemû alîyên din ên Islamî bi sîyaset û nermtir e" her wiha got:" Hin dewlet li dû ketina partîya El_Islah li Yemenê ne û tişta ku çêbû jî sînaryoyeke naskirî ji bo lêdana misilmanan e". da dîyarkirin ku "alternatîv dê ji Yemenîyan re xirabtir be". Rast e tişta di Yemenê de çêbû ya der barê paşdeçûna dewleta niştimanî û pêşketina alîyê êlî û nijadî de, gaveke ber bi paş ve bû, lê belê ji aliyekî din ve jî projeya Tirkîyê ya ji bo damezirandina statuyeke Islamî bi serokatîya Tirkîyê têk çû. Her wiha dê di nava Yemenê de hevbednîyên xurt ji bo destayîna tîreya Sinî ji hev re li dijî projeya Îranê ya ji bo bihêzkirina Şi'î di herêmê de çêbûba ku di encamê de dê Yemen bûba qadeke şerê herêmî û projeyên derveyîn.

**Tirkî û têkilîya wê bi Daişê re**

Tişta herî Tirkîyê jê ditirse têkilîya nebaş a di navbera AKP'ê ya desthilatdar û koma zanistdarîyên klasîk de ye. Tişta hîn bêhtir van metirsîyan di nava Tirkîyê de mezin dike jî ew e ku doza Kurdî hîn bêhtir nêzî serxwebûn an jî xweserîyê dibe, ji xwe doza Kurdî mîna sitriyekê ye di pişta hukûmeta Tirkî ya niha de. Tekezkirî ye ku Tirkîyê bi têkilîya xwe bi Daişê re di bikaranîna wê di şerê li dijî doza Kurdî de ku ji Tirkîyê re mîna birîneke bêkew e, sûdê digire. Pê re jî ji piştevanîya Îranî û Rûsî ji hukûmeta Beşar El_Esed re xilas bibe ku hêvî dike rêjîm hilweşe û di şûna wê de desthilateke Islamî li gorî nimûneya Ixwanî ya Tirkî û li gorî îdolojîya rêjîma desthilatdar a Tirkîyê ava bike. Her wiha Tirkîyê ji vê hevkarîyê di peydakirina petrol û gazê de ku qezencên mezin bi dest dixe gava ku hevrûkirinê di navbera wê û kirîna ji Rûsîya û dewletên Kendavê de dike. Nirxên kirîna petrolê ji Daişê ji nirxên wê ji çavkanîyên din bi gelekî kêmtir e û ev yek ji Tirkîyê re di warê pêkanîna bernameya wê ya geşedana aborî ya hundir de sûdê dide. Dibe ku têkilîya Tirkîyê bi Daişê re rewşa wê ya ewlekarî diparêze û nahêle ku Daiş ti çalakîyên xwekujî yan jî êrîşan li ser berjewendîyên Tirkîyê pêk bîne. Her wiha rêxistina Daişê eger sûdê negire nabe hevalbendê ti kesî, hebûna têkilîyan di navbera hukûmeta Tirkîyê û rêxistina Daişê de sûdê li Daişê jî dike. Tirkîyê di berfirehbûna Daişê ya erdnîgarî û mirovî de alîkarîyê dike û herêmên desthilata wê bi Tirkîyê ve di

alîyê erdnîgarî de girê dide ku bi rîya korîdorên qaçaxîyê ku ew bi xwe çavkaniyeke girîng a peredanê ye jê re, peyda dike. Ji xwe bi rîya wê petrola xav ji Sûrîyayê derbasî Tirkîyê dibe û di bazara reş de tê firotin. Her wiha tunebûna Trikîyayê mîna endamekî xurt di koalisyona navdewletî ya li dijî Daişê de xwedî bandoreke mezin e û sûdê li rêxistina Daişê dike; çi ku hevalbendîya Tirkîyê bi koalisyonê re dê hêz û derfeta Daişê kêm bike. Lewre rêxistina Daişê bi têkilîya bi Tirkîyê re xwedî sûd e û di encamê de têkilî hevpar in û berjewendîyên herdu alîyan diparêze. Li ber çavan e ku Tirkî palderê bingehîn e ji bo berdewamî û xurtbûna rêxistina Daişê û derbaskirina wê ji Ewropayê re. Her wiha torên taybet ên rêxistina Daişê ya terorîst bi awayekî xurt li Tirkîyê xwe bi cih dikin. Ev tor li Istanbul, Enqere, Edene, Izmîr, Urfa û Entapê têv belavkirin. Ev tor leşker û alîkarîyên madî ji rêxistina Daişê re li Sûrîyayê dişînin. Awayekî dîyarkirî ji tundrewîyê re tune ye, lê belê endamên rêxistina terorîst ên Tirk têkilîyên wan bi hin bîyanîyan re hene û dîyar e ku gelek ji wan di pêvajoya berîya 2015'an de derbasî Ewropayê bûne. Hemû tewanbarîyên dewletên cihêreng ne ji valatiyekê tên, lê belê xwe disipêrin belge, vîdyo, tomarên dengî, çespanên berçav û şahidîyên endamên rêxistinê bi xwe. Gelo çima Tirkî tewanbara yekem e di vê mijarê de û çima ew dewleta yekane ye ku rastî van tewanbarîyan tê? Ji bo bersivdayîna vê pirsê divê ku têkilîya di navbera Tirkîyê û Daişê de were nasîn. **Yek:** Têkilîya petrolî ya di navbera Tirkî û Daişê de. Mehane rêxistina Daişê 40 milyon dolar ji ber petrola ku difirote Tirkîyê werdigirt. Hin fermandarên rêxistina Daişê dan xuyakirin ku Tirkî çavên xwe ji ber çalakîyên rêxistinê yên petrolê digire û kêm caran pê re bi awayekî yekser dikeve pevçûnê. Hukûmeta Tirkîyê di encama lêpirsînên veşartî ku encumena ewlekarîya navdewletî ku li gorî agahîyên Amerîkî û Erebî pêk anîn, rastî fişarên rojavayî hat. Piştî wê Tirkîyê ragihand ku wê 18 hezar bermîlên petrolê yê Daişê desteser kirine. Wê çaxê dewletên rojava ji Tirkîyê zelalkirina vê yekê xwestibûn, piştî hat naskirin ku hatibûn amadekirin ku dê ji keştîgeheke Tirkî werin hinartin, vê yekê hişt ku Tirkî girêbesta ku bi kampanîyayeke Çînî re girêdabû ku dixwest hemûyî bikire, rawestîne û piştî ku desteser kir di nava bazarên Tirkîyê yên hundirîn de hat bikaranîn. Barhilgirên petrolê rojane sînor bi alîyê Tirkîyê de derbas dikin, li wir kargehên perizandinê û keştîgehên barkirina bazirganî hene. Torên medyaya Rûsî wêneyê kurê Erdogan ku bi fermandarên rêxistina Daişê re

sekiniye weşand û bi vî awayî destnîşan kir ku têkilîyên malbata Erdogan ên xurt bi rêxistina Daişê ya terorîst re hene. Serokê Rûsîyayê Putîn ragihand ku terorîst bi şev û roj petrolê ji Sûrîyayê bi qaçaxî derbasî Trikîyayê dikin û divê ku Tirkî kirîna petrolê ji Daişê rawestîne. Bi rîya tewanbarîyên Rûsîyayê ji Tirkîyê re ku bazriganîya petrolê bi rêxistina Daişê ya terorîst re dike, ew li beramberî hevalbendên wê, çi yên NATO'yê û çi jî yên Yekîtîya Ewropayê ku Tirkîyê pir hewl dida ku endamtîya xwe bi temamî werbigire, xiste rewşeke tengav de. Wezareta parastinê ya Rûsî bi rîya satelaytan hin wêne kişandin ku tê de kerwanek ji barhilgiran ku petrol bar kirine di nava kargehên petrolê yên ku di bin kontrola Daişê de ne li Iraq û Sûrîyayê, tên xuyakirin û berê wan li sînorên Tirkîyê bûn. Lewre Tirkî mezaxênerê sereke ye yê petrola ku Daişê ji bîrên di bin kontrola wê de ne, derdixe.

**Du:** Hundirê Tirkîyê têkilîya wê bi Daişê re belge dike. Piranîya rojnameyên Tirkîyê hevkarîya Tirkîyê ya kûr bi Daişê re eşkere dikin. Rojnameya Cemhûriyet dîyar kir ku balyozê Tirkî yê Musilê ji wezareta derveyîn re nivîsand ku rewş li bajêr ber bi nebaşîyê ve diçe ku di axaftinê de behsa pêşketina Daişê ya metirsîdar dikir, lê belê bersiva wezaretê suprîz bû gava got ku "Daiş ne neyarê me ye" û Bulend Arinc ev yek tekez kir gava da xuyakirin ku istixbaratên Tirkîyê dizanîbûn ku çi ji Mûsilê re tê amadekirin. Ji xwe berîya wê Daişê pênc milyon dolar ji Tirkîyê li hemberî berdana 31 ajokarên barhilgirên Tirkî yên ku ji alîyê wan ve li Nînewayê hatibûn girtin, wergirtin. Her wiha partîyên opozisyona Tirkîyê û AKP'ê alîkarîya bi Daişê re û pêşkêşkirina alîkarîyê ji bo derbasbûna şervanên rêxistinê ji sînorên Tirkîyê ber bi Sûriye û Îraqê ve, tekez kirin. Serokê partîya gel a komarî CHP "Kemal Kiliçdar Oglu" belgeyên ku dayîna Tirkîyê ya çekan û sê barhilgirên moşekan û cebilxaneyê ji Daişê re tekez dikin, ragihand. Daxuyanîyên wezîrê hundirîn ê Tirkîyê tekez kir ku dê piştgirîya lojistîkê ji komên terorîst re were kirin, her wiha dê cihên perwerdeyê û guhdana tenduristî û nexweşxaneyên taybet li herêma Hatay'ê ji wan re werin peydakirin. Ev yek li ser zimanê serokê rêxistinê Ebû Bekir El_Bexdadî ji rojnameya "Waşinton Post" a Amerîkî re hat tekezkirin ku hin fermandar û şervanên wan di nava nexweşxaneyên di nava Tirkîyê de tên dermankirin. Her wiha Partîya Gel a Komarî CHP dîyar kir ku nivîsgehên rêxistina Daişê ya terorîst li Istanbulê û gelek bajarên din ên Tirkîyê hene û şervanan tevlê dikin. Nivîskar û rojnamevanê Tirk "Aydogan Vatandaş" destnîşan kir ku

Tirkî rêxistina Daişê ya terorîst bi rîya komeleya “Desteya Alîkarîya Mirovî IHH” bi çek dike. Ew jî bi rîya şandina destekdayînên madî li ser hesabên wan ên di bakên El_Bereke û çandinîya Tirkîyê de. Rojnameya Tirkî ya rojane “Aydinlik” bi serenava “Leşkerên Tirk li kêleka Daişê şer dikin” ragihand, ango tê wateya ku leşkerên Tirk ên ku bi hêzên taybet re dixebitîn û niha li malê rûniştine, li kêleka radîkalên Daişê re li Iraqê şer dikin. Tê gumankirin ku ew ji bo mûçeyên bilind tevlê bûne. Her wiha lêpirsînan da xuyakirin ku rêxstina istixbaratên Tirkîyê MIT, leşkerên li malê rûniştî şandin Iraqê da ku destekê bidin terorê li herêmê. Wezîrê tenduristîyê Mihemed Mu’izin Oglu da xuyakirin ku “dermankirin û guhdana birîndarên rêxistina Daişê erkeke mirovî ye û divê ku em pêk bînin” û ji vê bêhtir jî fermandarekî xuyayî yê rêxistina Daişê li nexweşxaneyeke li bajarê Şanlî Urfayê ya li ser sînorên Sûrîyayê, hat dermankirin. Rojnameya CNN a Tirkî raporek der barê du herêmên di nava Istanbulê de ku veguherîne navenda kombûna terorîstan, derxistin. Her wiha hin dîmenên perwerdekirina endamên Daişê ji alîyê hêzên ewlekarîyê yên Tirkîyê ve li ser malperên rêxistinê hatin belavkirin. Nivîskar û rojnamevanê Tirk Mistefa Kiliç da xuyakirin ku dengin li cemê hene ku ew bi xwe çespanên herî girîng in ku piştgirîya hukûmeta AKP’ê bi rêxistina Daişê ya terorîst re eşkere dikin.

**Sê: Muhukrhatinên fermandarên Daişê yên der barê perekirin û piştgirîya Tirkîyê ji rêxistina Daişê re:** Berîya niha fermandarekî rêxistina Daişê ji rojnameya Waşinton Post re da xuyakirin û got:” Piranîya endamên ku di destpêkê de tevlî me bûn ji Tirkîyê hatin, her wiha çek û hemû pêdivîyên me jî ji wir bûn”. Daişiyekî Tunisî yê bi navê Kerîm Emara ku ew bi xwe fermandarek di nava komên tundrew ên rêxistina Daişê de bû û niha li cem hêzên Kurdî dîl hatiye girtin, mukur hat û got:” Tirkî alîkarîya Daişê dike, ji bo peydakirina endamên nû pir alîkar bû û di dema ku ez di nava Daişê de bûm min enbihist ku yek leşkerê Tirk carekê astengî ji bo tevlîbûna kesekî di nava rêxistina Daişê de çêkiriye, berevajî vê min bihist ku Tirkî nirx dide Daişê û alîkarîya wê dike.

Piştî binkeftina darbeya Hezîrana 2016’an Daişê li bajarê ku di bin kontrola wê de bûn şahî û meşên kêfxweşîyê li dar xistin. Ne tenê şahî, lê belê endamên wê yên di nava Tirkîyê de daketin kolanan û durûşmeyên “Alahû ekber” di nava xwepêşanderan de, mîna ku li bazarên Mûsil û

Reqayê ne, bilind kirin. Ev yek mukurhatineke ku Daiş bi hukûmeta Erdogan re ye û têkilîyên wê pê re hene.

Serokê rêxistina Daişê ya terorîst Ebû Bekir El_Bexdadî ragihand ku hin fermandar û şervanên wan weke ku berê jî me dabû dîyarkirin di nexweşxaneyên Tirkîyê de tên dermankirin ( Bi tevî ku di vîdyoya wî ya dawî de pê re pirtûkek bi navê Wilayeta Tirkîyê hat xuyakirin ). Piştî ku Tirkîyê nepejirand ku ti agahîyan der barê girêbesta di navbera Tirkîyê û Daişê de ya ji bo serbestberdana barimteyên wê (Rehîn) pêk anîbû, bide. Operasyoneke veşartî bû û nepejirand ku eşkere bike û Amerîka yan jî hevalbendên wê yên Ewropî tê de guftûgoyê bikin. Operasyon tenê pevguherandina dîlan bû û Tirkîyê 180 şervanên Daişê li hemberî serbestderdana 49 diplomatên wê radest kirin. Ew jî li gorî mukurhatina eşkere ya fermandarekî Daişê El_Muqdad El_Şurûrî ku ew jî ji alîyê desthilatên Tirkîyê ve hatibû binçavkirin, dîyar kir ku rêxistina Daişê ya terorîst barimteyên Tirk girtin da ku fişarê li ser hukûmeta Tirkîyê û Artêşa Sûrî ya Azad bikin da ku dîlên Daişê berdin. Şurûrî dîyar kir ku di dema pevguherandina dîlan de, artêşa Tirk bi awayekî baş bi wan re danûstandin kir. Endamê rêxistina Daişê Ebû Mensûr El_Mexribî yê terorîst jî di têkilîyên di navbera rêxistinê û rêjîma Tirkîyê de şahid bû û tekez kir ku wî hevrêzî bi Tirkan re kir da ku mihaciran tevlî nava refên Daişê bi rîya sûnorên Tirkîyê bike. Serkeftina Enqereyê di xwegihandina bi Daişê re bê ku bi wan re bikeve nava pevçûnan de, tenê yek wateyê dide, ew jî hebûna têkilîyên xurt di navbera Daişê û hukûmetê de ye ku nahêlin pevçûn di navbera wan de derkevin. Piştî pêşketina têkilîyan û piştî ku bû gefan li ewlekarîya herêmî û navdewletî dixwe, ev tewanabarî ji alîyê hêzên cîhanî û di çarçoveyeke fireh de lê hatin kirin.

**Çar: Tewanbarkirina navdewletî ji hukûmeta Tirkîyê re ji ber têkilîyên wê bi Daişê re:** Alanîzerên rojavayî wiha li têkilîyên Tirkîyê bi çekdarên li Sûriye û Iraqê re yên bi navê rêxistina Daişê ku rêxistineke terorsîst e dinêrin ew ne kêmî têkilîya wê bi rêxistina Ixwanûlmuslimîn re û rola wê di arastekirina vê rêxistina navdewletî de ne. Rojnameya Waşinton Post gotarek belav kir ku tê de behsa rola Tirkîyê di derbaskirina çekdarên El_Qaidê ji Sûrîyayê û Iraqê re û piştgirîya wê ji çekdarên cîhadîst re ji bo şerê li dijî Kurdan da ku rêjîma Sûrîyayê zû bikeve, kir. Endamekî rojnameya

New York tekez kir ku Tirkî hevalbendê rêxistina Dewleta Islamî ye û ew çekdarên Daişê bi tevî çekên wan bi hêsanî derbas dike, her wiha Tirkî bi Daişê re hevkarîyê dike; çi ku hevdijminê wêrankirina Kudan e.

Rêveberê bernameya Avakirina aşitî û huqûqê li peymangeha zanîngeha Kolonîyayê ya lêkolînên mafên mirovan David Philis da xuyakirin ku Tirkî hevkarîyê bi Daişê re dike û artêşa Tirkîyê Daişîyan bi rîya derîyên sînorî yên fermî yên Tirkîyê derbas dike; da ku êrîşan li ser gelê Kurd li Kurdistanê û Sûrîyayê pêk bîne. Kovara Foreign Policy a Amerîkî bal avête ser bikaranîna Daişê ji Tirkîyê re û sûdgirtina jê mîna navendeke rewakirina diravan de û perekirina operasyonên wê, her wiha hewldana hin fermandarên wê li Sûrî û Iraqê ji bo bikaranîna diravên ku bi xwe re anîbûn. Kovarê dîyar kir ku fermandarên rêxistinê nêzî 400 milyon dolar bi rîya kampanîyayên Tirkîyê rewa kirine, her wiha zêr kirîne û depo kirne ku têra wê dike ku mîna tevgereke terosît şerê komikan heyanî demeke dirêj li Iraq û Sûrîyayê pêk bîne. Kovara Economist a Birîtanî ji devê bazirganên diravan ên li bajarên li ser sînorên Tirkî - Sûrî girt û tekez kir ku rêxistinê ji sala 2017’an ve dest bi veguhastina hejmarên emzin ên diravan ber bi Tirkîyê ve kiriye, ew jî bi rîya torên qaçaxîyê yên zehmet mîna diravguhêrgehên ne fermî ku rêxistinkirina wan zehmet e û di sînoran de ji ber ku cihdaîst in bê astengî derbas dibûn, pêk hatin. Her wiha agahî hene ku kampeke ji bo perwedekirina cihadîstên Daişê li ser sînorên di navbera Tirkîyê û Sûrîyayê de heye. Leşkergehên perwerdeya endamên El_Qaidê û Selefîyên Tirk û yên xwe mîna cihadîstên Ereb bi nav dikin, hene. Her wiha bi sedan cihadîst di malên bi ewle de li başûrê Tirkîyê bi cih dibin û piştre derbasî Tirkîyê dibin.

**Di dawîyê de:** Di çarçoveya rola Tirkîyê bi terorê û peredana pê re de, em dibînin ku Tirkîyê parastina xetên peredana bi Daişê re dike û dihêle ku çekdarên wê derbas bibin. Her wiha rola Tirkîyê mîna xaleke derbaskirina “ Cihadîstan “ ji Ewropayê ber bi Sûrîyayê ve pêwîs bû. Bi vê yekê dayîna çekan ji çekdarên Daişê re hêsan bû. Tirkîyê ji komên tundrew re tranzît e û pê derbasî hem Sûriye û hem jî Iraqê bibin da ku perwerde bibin û şer bikin. Lewre Tirkîyê dewleta herî ku piştgirîya rêxistinên tundrew kiriye, ye. Derîyên xwe yên bi Sûrîyayê re hevpar li ser herdu alîyan ji tevgerên wê re vekir û piranîya bajarên li ser sînor ên Tirkîyê veguherîn herêmên bicihbûna têrorê.

**Tirkîyê û jevqetandina di navbera Daiş û el-qaidê:**

Tirkîyê stargeheke biewle ye ji endamên Daişê re yên ku ji ber hêzên QSD'ê revîyane ye. Tirkîyê di 2014'an de berê Daişê da veqetandina ji rêxistina El_Qaidê û piştgirtina Artêşa Azad û avakirina baragehên xwe yên sereke li ser xaka Sûriye û Tirkîyê. Her wiha li kesekî nayê veşartin ku têkilîyên hevkar ên xurt ên Tirkîyê bi Daişê û Ixwanan re hene da ku piştgirîyê bidê û weşana wan ên çapemenîyê ji ser xaka xwe ji wan re bike; da ku projeya bi navê " Avakirina Xilafetê " ya ku Tirkîyê wê weke riyekê ji bo desthilatdarîya xwe di tevahîya herêma Erebî de dibîne, pêk bîne. Hêzên Islamî û di destpêka wan de rêxistina Ixwanûlmuslimîna terorîst propaganda ji vê yekê re çêkirin û wiha dan dîyarkirin ku ew nimûneya herî baş a desthilatê ye di herêmê de û ya herî nêzîkî demokrasîya Islamî ye, her wiha projeya vegerandina Xilafeta Islamî ya ku di salên bîstan ên sedsala bûrî de hilweşîyabû, ye. Di pêvajoya piştî bûyerên bi navê "Buhara Ereban" de Sûriye, Iraq û Lîbîya veguherîn baragehên terorîstên çekdar û Tirkîyê lîstikvana bingehîn bû di piştgirîya statuyên tundrew û destekdayîna wan bi çek û diravan de, her wiha perwerdekirina wan li ser destên endamên ewlekarîyê yên Tirkîyê. Piştre sînorên xwe ji bo derbaskirina kesên ku dixwazin tevlî Daişê bibin re vekir da ku derbasî Sûrîyayê bibin. Rêxistinên tundrew guhdana Tirîyayê bi awayekî fermî qezenc kirin. Serokê Tirkîyê Receb Teyib Erdogan di tîrmeha 2012'an de (wê demê serokwezîr bû) da xuyakirin ku welatê wî dê bibe barageheke perwerdekirina "şervaanan" e, ew jî bi bihaneya hilweşandina rêjîma serokê Sûrîyayê Beşar El_Esed. Xewna Erdogan a ku bibe xelîfeyê Misilman û Ereban di axaftinên wî yên li ser çapemenîya Tirkîyê pir zelal dihat xuyakirin. Di îlona 2012'an de got:" Em li ser şopa bavûkalên xwe yên fetihkar dimeşin, ji Siltan Alp Erselan bigire heyanî Siltan Mihmed El_Fatih".

Li gorî rojnameya Foreign Policy tenê di sala 2013'an de bêhtirî 30 hezar şervan sînorên Tirkîyê – Sûrîyayê derbas kirine. Wezîrê karên Hundirîn ê Tirkîyê Mu'emer Çolar di hezîrana 2014'an de da xuyakirin ku Tirkîyê alîkarîya çekdarên Cebhet El_Nusrayê dike, her wiha bajarê Hatay ê li ser sînor bûye navenda derbasbûna çekdaran; da ku piştgirîya lojistî, perwerde û guhdana tenduristî ji wan re were peydakirin.

Çavdêran tekez kir ku rêxistina Daişê destê Tirkîyê yê terorîst ê çekdar e di herêma Rojhilata Navîn de û Enqere tewanbar kirin ku ji destpêka derketina Daişê ve di dawîya sala 2014'an de piştgirîyê dideyê. Berîya ragihandina fermî ya rêxistina Daişê Enqere piştgirîya madî pêşkêşî çekdarên ku di salên berê de piştevanî didan rêveberîya Tirkîyê. Dan zelalkirin ku istixbaratên Tirkîyê di destpêka 2014'an de berê Daişê dan veqetandina ji El_Qaidê û avakirina baragehên xwe di Sûriye û Iraqê de. Raporên istixbaratî yên rojavayî dîyar kirin ku serbazgehên Tirkî li ser sînorên bi Sûrîyayê û Iraqê re hatine avakirin; da ku çekdaran pêşwazî bikin û wan tevlî nava refên rêxistina Daişê ya terorîst bikin. Her wiha Enqereyê korîdorên bi ewle li kêlekên bajarên Sûrîyayê vekirin; da ku çekdarên Daişê derbasî xaka Sûrîyayê bike.

Li gorî ku Pîter Bafil (serkirdeyekîleşkerî yê berê di NATOyê de) eşkere kir, di daxuyanîyên rojnamegerî de wisa gotiye: Tirkî bi behaneya ku Erdogan di Daişê de metirsiyeke ji ya kurdan kêmtir dibîne, ew alîkarîyê rêxistina Daişê dike.

Di heman demê de hin raporên rojnamegerî dibêjin ku Tirkîyê balhilgirên ku bi çekan barkirî ne, ji bo Daişê bi rêya sînorê tirkî-sûrî, dişîne. Ev barhilgir ji hêla serkirdene leşkerî di artêşa Tirkîyêyê de hatin sekinandin û eşkerekirin, berî ku ev serkirde bibiryara serokwezîrê Tirkîyêyêyê wê demê Ehmed Dawûd Oxlo bi sûcê xîyanetê werin tewanbarkirin û darizandin. Jixwe weşandina darizandina wan li ser ragihandin qedexe kirin. Hêjayî gotinê ye ku serokê navenda rûsî ya Levkirinê (Sêrcî Koralîkov) di 2016an de ragihand ku kerwanên barhilgirên ku bi çekan barkirî ne, her saet ji Tirkîyêyê derbasî herêmên  Sûriyeyê yên di bin desteserîya Cebhetilnesre û Ehrar el- Şam de ne, dibin. Her wiha rojnamegerê ferensî Lorênt Rêtşard di bernameyeke televezyonî de got ku wî rêveberê rêveberîya dijterorê li bajarê Şanilî Orfa yê tirkî di 2014an de dît û vî rêveberî jê re eşkere kir ku çekdarên Sûriyeyê li nexweşxaneyên Tirkîyêyê tên dermankirin û parastin jî ji wan re hatiye terxandin.

Piştî xistina Tirkîyêyê ji balafira Rûsyeyê (Soxoyî) re di  24. 11. 2015an de, Rûsiye hin agahîyên saloxgerî yên têkildarî girêdana Tirkîyê û Daişê bi hev re bûn eşkere kirin. Di 30. 11. 2015an de ajansa ferensî gotina serokê rûsî potîn ragihand, ew jî wisa bû: ''Ji bo ku Tirkîyê rêyên ku Daiş wan bi kar tîne

biparêze û gelek petrolê bi qaçaxî derbasî Tirkîyêyê bike, balafira rûsî rûxand''. Di 2. 12. 2015an de wezareta Berevanîyê ya rûsî hin wêneyên ku bi setelaytisan hatine girtin dîyar kirin, di wan de siwareyên ku bi petrolê barkirî ne û ji Sûriyeyê derbasî Tirkîyêyê dibin, tên dîyarkirin û beramberî wê jî çek dihatin şandin. Di 7. 7. 2014an de rojnameya Aydinlika tirkî eşkere kir ku hin serbazên tirk beramberî buhayekî bilind, bi Daişê re li Sûriye û Îraqê şer dikin. Li gorî vê rojnameyê lêpirsînan  dîyar kir ku rêxistina saloxgerî ya tirkî (TIR), leşkerên ku leşkerî bi dawî kirine bo Îraqê şandin da bo ku pişgirîya terorê bikin. Raporê da dîyarkirinku hin serkirdeyên mezin di artêşa Tirkîyêyê de jî dizanin ku AKPê terorê li herêmê gur dike. Têkilîya Tirkîyêbi Daiş û komên terorsît re ne tenê di çarçoveya dewletên cîran Sûriye û Îraqê de ye, lê belê ev têkilî digihêjin Lîbîya û Misrê jî. Di meha yekê ji sala 2019an, artêşa lîbî hejmareke mezin a dermançeyên tirkî yên ku bi qaçaxî derbasî Lîbîyayê bûbûn, girtin. Ev dermançe di sindoqekê de bûn.

Hêzên artêşa lîbî got ku qaçaxkerên çekên tirkî bi rêya xistina hin madeyên xwarinê û hin pêlîstokên zarokan, van çekan veşêrin. Qasîya çekên tirkî yên ku hatibûn qaçaxkirin, 556 kerton bûn û di her kertonekê de 36 dermançe hebûn. Di meha 12an ji sala 2018an, hêzên beravî yên Yûnanê, keştiyeke tirkî ku bi çekan barkirî bû, girt. Ev keşte berê wê li Misrate li Lîbyayê bû. Bi vî awayî jî Tirkîyê biryara NY ya qedexekirina hinartina çekan bo Lîbîya, binpê dikir. Ajansa Yûnanê ya nêçeyan dîyar kir ku di keşteyê de 29 sindoq hebûn û di hundirê wan de madeyên ku ji bo çêkirina bumbeyan û karên terorî tên bikaranîn, hebûn.

Keştîya tirkî ya li Yûnanê ne bûyera yekem bû di piştgirîya rêjîma Erdogan ji teror û tevlîhevîya li Lîbyayê de, çimkî di îlona 2015an de jî keştîya Hedad1 li nav ava Yûnanê hat girtin û vê keşteyê jî du sindoqên mezin ku di wan de 5000 perçe çek û nîv melyon parçe gule û rext hebûn, dihwendin. Hat dîyarkirin ku ev çek li bazirganê çekan Letîf Aral Aîs vedigerin. Ev kes bi nêzîkbûna wî ji Erdogan re navdar e. Di meha 11an ji sala 2016an de, belgeyek di nav peyamên elektronîk ên zavayê Erdogan (Bîrat Beyreq/ serokê enerjîyê di wê demê de) de hat vedîtin. Di belgeyê de hat eşkerekirin ku hikûmeta Tirkîyêyê rê li pêşîya beşgeheke veguhestina avî vekiriye da ku çekan biguhêze Lîbîyayê. ev beşgeh a bazirganekî tirk bi navê Mumin Şahîn e.

Di reşemîya 2015an de Ebdulahê el- Sena (serokê wezîrên Lîbîyayê), Tirkîyê bi şandina çek û alavên şer bo girûp û mîlîsîyên terorîst yên ku Terablus desteser kirine, tewanbar kir. Ebdela eşkere dîyar kir ku Tirkîyê bi awayekî ne durist danûstandinê bi Lîbyayê re dike û çekan dişîne Lîbya da ku lîbî pê hev bikujin.

**Komploya Erdogan û Tirkîyê li dij Misrê:**

Piştî ketina hukmê Ixwan el Muslimîn di pûşbira 2013an de û heya vê kêlîyê, qebareya pêvajoyên ku komê li dijî sivîl, asayîş û serkirdeyên artêşê, pêk aanîn, jikesî ne dûr e. Ev pêvajo tev di hundirê Tirkîyêyê de hatin pilankirin û piştgirtin. Her wiha bi rêya hevkarîya salogerên tirkî-qeterî û rêveberîyên Ixwanan ên ku ber bi Stenbolê ve revîyabûn.

Ji navdartirîn statoyên çekdar ên ku Tirkîyê li Misrê pêk anîne bi armanca jevxistina ewlekarî û hedarîya wê, rêxistina Hesim û Liwaya Sewre ku Yehya Mûsa serkêşîya wê dike. Yehya Mûsa jî ixwaniyekî ku revîyaya Tirkîyê û di pêvajoya reşkuştina şêwermend Hişam Berekat, tewanbarkirî ye. Ev kuştin bi alîkarîya Tirkîyê pêk anî. Ji koma ixwanan başt nebû da ku bi rêya wê Tirkîyê cihê xwe di nav dewletên ereban de xurt bike, nemaze ji ber wekhevî û hevsengîya îdyolojîk di navbera AKPê û Ixwan el- Muslimîn de. Enqere dît ku têkilîya wê ya xurt bi ixwanan re dibe ku rola Tirkîyê ya cîhanî di herêmê de pêk bîne, nemaze dema têkilîyên xwe bi tevgera ixwanan a mak li Misrê xurt bike.

Piştî ketina Ixwanan li Misrê, Tirkî bû navneda wan a navneteweyî. Loma li Stenbolê hejmarek civînên ku armanca wan dijberîya rêjîma nû li Misrê bû, hatin lidarxistin. Ev civîn bi serpereştîya Tirkîyê û Qeterê bûn ku Qeter jî li roleke herêmî di bin sîwana tirkî de digire, nemaze ji ber ku ew nikare alavên pêkanîna dijberîyê (hêza mirovî û xaknîgarî) peyda bike. Dewha bi rêya kenala Cezîrê jîbi roleke berbiçav lîst di gurkirina hundirê Misrê. Tirkîyê xaka xwe ji bo ixwanan vekir û bû mîna maseyekê ji bo ku ixwan jê êrîşî rêjîma Misrê bikin. Ji Enqerayê televezyonên misrî yên ku hemû dema xwe ji bo spîkirina ixwanan û reşkirina rêjîma Misrê diqedînin, hatin avakirin. Hevpeymana tirkî-ixwanî, li ba Erdogan xwesteka wî ya vejînkirina projeya xîlafeta osmanî geş dike. Ev sîyaseta han ji hêla şêwirmendê Erdogan (Yasîn Aqtay) wisa hat eşkerekirin: Hilweşandina xilafetê, valahiyeke sîyasî li

herêmê pêk tîne. Di nîsana 2017an de vîdyoyeke Erdogan hat eşkerekirin ku tê de li xwe mukur tê ku ew komployan li dijî misrê dirêse. Ew jî bi rêya şandina teroran ji Reqayê ber bi Sînayê ve da ku karên terorîst pêk bînin.

Malpera ''Docroso Nêws'' a tirkî vidyoyek weşand, tê de Erdogan eşkere dike ku ew li dijî Misrê dixebite. Ew jî di dema ku li pêşberî endamên partîya xwe di 5ê kanûna pêşîn 2017an de diaxivî.

Berê jî lêkolînekê ku navneda Ol û Xaknîgarîya Sîyasî dîyar kiriye ku nîvê tundrewên navdar ên niha, têkiîyên wan bi tevgerên islamî yên ne tundrew re hebûn, berî ku tev li komên terorîst bibin. Piştî ku sed cîhadî di tevgerên cûr bi cûr de (Qaide û Daişe weke bingeh) hatin şopandin, ev encama han hat derxistin. Ji bo tekezkirina vê lêkolînê û hin lêkolînên din, Navneda Tonî Bilêr ku Navenda Ol û Xaknîgarîya Sîyasî beşek jê ye, paşkîtîya îdyolojîk ên ku kesayeta cîhadî pêk tînin, analîz kir pê re hat dîyarkirin ku Daiş û Qaide, beşek ji Ixwanan e. Li gorî lêkolîna Îman Bedewî seroka beşa lêkolînan di peymangeha Tonî Bilêr de û serpereşta lêkolîna ku vê dawîyê derket, di encama şopandina jîyana sed cîhadiyî ji tevgerên cihanî yên cûr bi cûr, hat dîyarkirin ku islama sîyasî ya ku komên mîna Ixwan el- Muslimîn bi kar tînin, ya herî nêzî îdyolojîya tundrewîya ku niha Daiş û Qaide pê radibin. Bedewî di rojnameya el- Ereb de tekez dike ku islama sîyasî ya ku Ixwan propogendaya wê dikinû dixwest li hin dewletên erebî pêk bîne, bi ramanên cîhadî re hemaheng e û ev jî berovajî ola islamî ye ku nêzî 1.8 milyar misilman bawerîyê pê tîin.

Li vir em dixwazin bidin xuyanîkirin ku, tevî ku misilmanên ne tundrew û cîhadî, di stratejî û pilanên xwe de jev cuda ne. Lê deqên quranê yên ku jê dibin hizir û ramanên ku di wan deqan de vedibînin gelekî  tevlî hev dibin. Loma pêwîstî heye ku îdyolojî û ramanên komên islamî yên tundrew û ne tundrew werin dîyarkirin û venihêrin. Her wiha gerek e desthilat jî li dengê misilmanên ku bawerî bi wan tê bikin û li dijî hizrên tundrewan rabin. Li kêleka Îman Bedewî, Mîlo Komir Ford (lêkolîner û endamekî ku beşdarî tîma peymangeha Tonî Bilêr bûe) jî beşdarî amadekirina lêkolînê bû. Ev lêkolîner di lêkolînên xwe de girîngîyê dide îdyolojîyên cîhadî û probogendayê. Ev lêkolîner beşdarî amadekirina lêkolînekê der barê fikira cîhadî bû. Yek ji lêkolînên wî bi navê Mejîyên Cîhadîyan e. Tê de îdyolojîya hevbeş a sê komên cîhadî dîyar dike. Her wiha beşdarî lêkolîna bi navê ''Di

rêya Şer de'' bûye. Tê de jîyana sed cîhadîyên di tevgerên cîhanî de dîyar dike. Mîlo bi hikûmet û rêxistinên navneteweyî re kar dike da ku stratejîyên aktîv ji bo qirkirina tundrewîyê werin damezirandin. Lêkolîn berê xwe dide rojava da ku biçesipîne ku fêmkirin û şîrovekirina tundrewan ji deqên Quranê re, berovajî rastîya ola islamî ye. Bedewî tekez dike ku piranîya misilmanan ne terorîst in û ne bi terorê re ne. Ev name tekez dike ku şîrovekirina tundrewan ji deqên Quranê re gelekî dûrî ola islamî ya berbelav e. Lê niha tê dîyarkirin ku tevlîhevbûneke mezin a îdyolojî di çawanîya bikaraîna deqên Quranê ji hêla Ixwan el- Muslimîn û cîhadîyên tundrew de heye. Lêkolînera me xaleke girîng di pêvajoya şerê li dijî terorê, dîyar dike. Ew jî ew e ku naskirina îdyolojîya misilmanên ne tundrew tu caran ne girîng bû, çimkî her tim bal li ser Ixwanan dihat kişandin. Di rastîyê de ev kesên han xwedî bandoreke mezin bûn di reşkirina wêneyê islamê de. Li gorî vê lêkolînê û encama ku ez gihaştimê, gerek e ev reşkirin were destgirtin û çareserkirin. Bi vî awayî du çûk bi kevirekî tên kuştin. Çimkî dema ku misilmanan tevan nekin yek xaneyê, sedema çûna wan ber bi van girûpan ve kêm dike û rastîya van kesên tundrew ji bo hem misilmanan hem tevahî cîhanê eşkere dike.

Lêkolîn bi hejmarek qewîtîyên ku bo sîyastetmedaran hatin hinartin, bi dawî bû. Ku gerek e ev sîyastmedar bi hêz li ser nirxên navneteweyî tekez bikin, her wekî pirrengî, serwerîya zagonê, azadîya olî û wekhevîya di navbera her du zayendan de. Ev nirx tevî ku ji nirxên ku islam li ser wan tekez dike jî,  tim rastî êrîşên tundrewan tên. Ev yek jî dê tekez bike ku ev şer li dijî ramanên tundrew e û ne li dijî bawerîyên olî ye. Lêkolîn şîretan li hikûmet û serkirdeyan dike bi rêya vekirina rê li pêşîya misilmanên xwedî bawerî û dijberîya tundrewan, şerê terorê bikin. Çimkî avakirina behreyên pêwendîya stratejîk bi gelên têgihiştî re, beşdarkirina ragihandinê û pêşkêşkirina behaneyên olî yên xurt, alîkarîyê  di xurtkirina dengê civaka misilman a ne tundrew de dike.

**Lêkolîna duyem - Tirkîyê û ''Ixwan, Qaide û Daiş''..cûdahiyeke ku xewna xilafetê wan digihîne hev:**

Tirkîyê koma ixwanan ku navenda hêza wê Misr e bi kar anî. Her wiha Lîbya jî ji bo perwerdekirina endamên ixwanan di leşkergehên girêdayî Qaide û Daişê de bi kar anîn. Li gorî raporên nûçeyî di 2016an de, endamên

ixwanan li Lîbyayê tev li leşkergehên perwerdeyê yên girêdayî Daiş û Qaidayê bûn û çekdarên ixwanan 150-250 dolarî rojane ji bo ku tev li perwerdeyan bibin, distînin.

Lêkolîneke di bin sernavê ''Pêwendîya Ixwanan bi Daiş û Qaidayê re'' ku projeya qirkirina tundrewîyê ew wşandiye,dibêje ku rola ixwanan weke pirekê ye ji bo rêxistinê cîhadîst. Ev yek di têkilîya ixwanan bi Qaidê re dîyar bû. Têkilîya ixwanan bi rêxistinên terorîst re ne tenê di warê pêşkêşkirina mirovar de bû, lê belê alîkarîyên darayî jî pêşkêş dikirin. Di sala 1988an de ixwanan bengek li giravên Behamayê vekirin. Li gorî hikûmeta Emerîkî beng ji bo piştgirîya komên terorîst e, her wekî Hemas, Cebha Islamî û Qaideyê. Li gorî tişta ku lêkolînê ji xezaneya emerîkî guhestiye, bengê alîkarî bi Usama bin Ladin re kir. Hikûmetê rêveberê beng (Yûsif Neda) bi pêşkêşkirina alîkarîyê ji bo Bin Ladin, tewanbar kir. Yûsif Neda jî mirovekî misrî ye lê nasnameya îtalî pê re heye û li Kambyona Îtalyayê ya ku dikeve Siwêsrayê bi cih e. Ev kes berê berpirsê têkilîyên navneteweyî yê koma ixwanan bû. Dadgeha misrî di 2008an de hukmê nehazir ê hebsa bi qasî 10 salan lê birîbû. Ew jî piştî ku serokê Misrê Hisnî Mubarek ew û 39 kesên din ên serkirde di koma ixwanan de li misrê veguhastibûn dadgeha leşkerî.

Lêkolîn dide dîyarkirin bê çawa gelek pêşewayên Qaidayê ji nav Ixwanan hatine. Her wiha lêkolînê bal kişande li ser xutbeya Mihemed Bedî (Rêzanê Ixwanan) ku di wê xutbeyê de ragihand ku ''berxwedana bi rêya cîhad û qurbanî û bi rêya avakirina nifşekî cîhadî ku li pey mirinê dikeve mîna ku çawa dijminê wî li pey jîyanê dikeve, çareserîya tekane ye li dij zordarîyê''. Di xutbeyê de tekez kir ku Emerîka ber bi tunebûna xwe ve diçe. Mînakên wisa hiştin ku zagonek bi navlêkirina Ixwanan weke teroran di meclisa Kongir de (2015) derkeve. Zagonê ji Emerîka xweset ku Ixwanan weke rêxistineke terorîst bihesibîne û endamên wê navê teroran li wan bike. Niha jî di sala 2019an de hewildaneke serokê emerîkî Trump bi erêkirina Misrê heye ku Ixwanan weke teroran bisenifîne. Ev yek jî ne bi dilê Erdogan û hikûmeta wî ye, çimkî dê guhertinekê di terazûya hêzê de li ba komên radîkal ên girêdayî Ixwanan çêke û hêzdarîya Erdogan a berferehbûnê ku xwe dispêre komên terorîst ji bo ku projeya xwe ya xilafetê pêk bîne, sînordar dike.

**Xilafet…xaleke ku Tirkîyê û komên radîkal digihîne hev:**

Destpêkê pêwîst e amaje bi gotina Pêxember were kirin ku dibêje: ''Xilafet di umeta min de sih sal e û paşê dibe mulk''. Li gorî vê gotinê, piştî ku Hesen kurê Elî kurê Talib mulk dev bi Muawîya de berda, xilafet bi dawî bû û Muawîya weke yekem şahî tê hesibandin. Kesên ku pişî wî re jî hatin û desthilatî li Rojhilata Navîn kirin, Şahên dewleta Umewî û Ebasî bûn û paşê jî sultanên osmanîbûn. Ên ku bazirganî bi vê têgehê kirin, armanca wan ne ol bû lê belê sîyaset bû. Loma xilafet xala destpêkirina tevahî rêxistinê cîhadî ye û ew xala ku li serê Ixwan, Qaide û Daiş kom bûn. Xilafet jî li gorî wan ew dewlet e ku bi şerîeta islamî hikum dike û ji hêla xelîfeyekê ku eslê wî digihêje Pêxember ve tê birêvebirin. Lê her çi qasî Ixwan, Qaide û Daiş li ser xilafetê li hev dikin, lê di çawanîya pêkanîna wê de ji hevcuda ne. Cara dawîn a ku xilafet  tê de hat ser ziman, sala 1924an bû. Ew jî dema hilweşîna dewleta osmanî bû ku di encamê hilweşîna wê de dewletên neteweyî yên ku niha Rojhilata Navîn pêk tînin, ava bûn. Lê damezrînerê Ixwanan (Hesen el- Bena) dewletên neteweyî yên ku piştî hilweşîna dewleta osmanî pêk hatin, qebûl nekirin û li şûna wê bi neteweya erebî û avakirina xilafeteke islamî ya tekane, bang kir

Ixwan hewil didin ku bingeheke gelêrî ku bawerîyê bi sîstema islamî tîne û hizirên wê yên sereke nas dike, ava bike. Ji bo pêkanîna wê jî, alavine sereke ji bo pêkanîna guhertinê bi kar tîne, ew jî dawet û beşdarîya sîyasî ye. Weke mînak, di hilbijartinên Misrê 2012an de, ixwanan sûd ji xizmetguzarîyên civakî yên ku hatibûn pêşkêşkirin ku hiştibûn baweriyek bi wan çêbe, girtin û karîbûn di wan hilbijartinan de bi ser bikevin. Lê Qaide dibîne ku xilafeta islamî ya cîhanî dê bihêle misilman karibin islama  ku misilmanên pêşîn dimeşandin, bi kar bînin. Qaide bi rêya cîhada berevanîyê gefan li desteserîya rojavayî dixwe û bi rêya wê ew ê xaka misilmanan ji operasyonên xaçperestî ya nû ku Emerîka serkêşa wê ye, biparêze. Tevî ku Bin Ladin dîyar kir ku armancên Qaide yekkirina misilmanan e, tunekirina hebûna emerîkî li nav xakên pîroz e, lê wî dizanî ku avakirina dewleteke islamî armanceke dûdirêj e û ne sereke ye li gorî armanca sereke ku ew jî tunekirina Emerîka ye. Li gorî belgeyên ku di komelgeha Bin Ladin li Pakistanê hatin dîtin, Bin Ladin dibîne ku şerê li dijî Emerîka ji Xilafeta Islamî girîngtir e. Bin Ladin nivîsiye ku gerek e destpêkê Qaide dewletekê desteser bike berî ku dewletekê ava bike, ji ber wê jî gerek e destpêkê Qaide dijminê xwe yê sereke têk bibe ku ew jî Emerîka ye.  Her wiha Bin Ladin wisa

nivîsiye: ''Tevî ku me ji alîyê leşkerî û aborî ve karîbû dijminê xwe berî û piştî bûyerên 11ê îlonê qels û lewaz bikin, lê hê dijmin dikare çi dewleta ku em ava bikin, têk bibe.'' Levkirineke hundirîn di navbera her sê rêxistinan de li ser projeya xilaetê derket, çimkî Qaide ragihandina Daiş aXilafetê şermezar kir çimkî şêwir bi misilmanan re nekir. Eymen el- Zewahirî (pêşewayê Qaide ê niha) şêwazê Daiş rexne kir, çimkî hevrêzî bi komên cîhadî yên din re nekir bi rêya dadgehên rewayî. Jixwe Daiş di xezîrana 2014an de xilafet ragihand.

**Meclisa Şêwirmedîyê ya hevbeş:**

Belgeyeke nehênî ku di rojnameya el- Şerq el- Ewset de di kanûna paşîn 2016an de hatiye niqaşkirin, dîyar kiriye ku Daiş, Ixwan û Qaide ji bo avakirina mecliseke şêwermendîyê ya hevbeş li Lîbyayê nîqaş dikin; civînên vê nîqaşê jî li Tirkîyê ne. Di îlona 2015an de jî Zewahirî daxuyaniyek derxist û tê de got ku Eger şerek ji hêla xaçperest, sefewî û zanistperestan ve li dijî komekê ji komên cîhadî – di nav de koma Bexdadî jî- pêk bînin, bijardeya wan a tekane jî dê alîkarîya van cîhadîyên misilman be. Di gotareke ku di adara 2016an de ji hêla têkilîyên derveyîn ve derket, tê de nivîskar Biros Hovman dibîne ku heye rêxistinên Daiş û Qaide bibin yek çimkî îdyolojîyên hevbeş û bawerîyên hevbeş di navberawan de hene û dibînin ku gerek e misilman di dema gefan de bibin yek. Lêkolînê got ku Qaide û Ixwanan di 2013an de hejmarek civîn li Ordinê li dar xistin da ku guhestina çekdarên Qaide ji Sûriye û Îraqê ber bi Misrê ve niqaş bikin da ku ev çekdar li dijî hikûmeta nû ya li Misrê rabin.

**Afeta Hesen el- Benda**

Her çandiniyek afeteke wê heye... Dibe ku Hesen el- Benda li ser vê têgehêserwext nebûbû dema koma Ixwanan ava kir. Tundîya ku komê girte xwe, her diçû tovê wê xurttir dibû li ba peyrewên wî heya gihaşte Qaide û Daişê. Di dema ku Ixwan kanîya hizra tundrew bû, robarên wê sedem bûn ku rêveberên komên cîhadî derkevin. Usama Bin Ladin (damezrînerê Qaide) navdartirîn endamê Ixwanan e. Li gorî Zewahirî Bin Ladin endamê Ixwanan li Erebistanê bû. Piştî mirina Bin Ladin, di 2011an de koma Ixwanan li Misrê daxuyaniyek derxistin tê de pesnê berxwedana li Efxansitan û Îraqê dide û nerazîbûna xwe ji ber kuştina Bin Ladin dide. Lêkolînê dîyar kir ku Zewahirî

(zilamê duyem di Qaide de û beşdarê avakirina wê bû di 1988an de) berî çend salan endamê koma Ixwanan bû û di 15 salîya xwe de hat girtin çimkî di wê demê de koma Ixwanan qedexe bû. Paşê çû ji bo ku tev li rêxistina Cîhada Islamî a Misrî di 1973yan de bibe. Di 1981ê de ji ber kuştina Enwer el- Sadat bi hejmarek endamên din re hat girtin. Her wiha koma Ixwanan xwedî bandoreke kûr bû li ser çalakvanên Qaide û pilankerê êrîşên 11ê îlonê Xalid Şêx Mihemed hebû. Ev kes ji temenê 16 salî ve tev li leşkergehên Ixwanan bû. Şêx Mihemed fêrî îdyolojîya komê bû û qewîtîyên Seyîd Qutb ên cîhadî û dijberê rojava girtin ser milê xwe. Tevî ku wî li Emerîka jî xwendiye lêwê qonaxê kîna wî ji rojava re xurt kir( çimkî ew ji bo Israîlê dijberîya ereban dikin).

Li gorî ku raporeke komîteya 11ê îlonê dîyar kir ku ji hêla rojnameya Cardîyan ve hat weşandin, Qutub xwedî hêzdariyeke ramanî ya xurt bû li ser Bin Ladin û piranîya bawerîyên wî di van çarçoveyan de ne; zanistperestîya rojavayî napejirîne, dewleta Misir a nûjen ne islamî ye, dêr cihê lîstik û siksê ne û çanda emerîkî xerabe ye... Qutub dibîne ku mirovahî li pêşberî du bijarteyan e; Islam û Cahiliyet û nabe rêyeke navîn hebe. Piştre bi hejmarek sal Bin Ladin hat û êrîşên Qaide yên tund pêk anîn û dît ku ev êrîş dijî dijminê islamê ne bi taybet Emerîka. Bi rêya qewîtîyên Qutub endamên Ixwanan hin kom çêkirin, her wekî Cîhada Islamî li Misrê. Lêkolîn dîyar dike ku hêzdarîya Qutub ne tenê di çarçoveya koma Ixwanan de ye lê belê bandor li her kesê ku girîngîyê dide cîhadê li her çar parçeyên cîhana islamî kiriye.

Ji ber karê wî yê demdirêj bi Bin Ladin re, di 2004an de Emerîka siza li ser şêx Ebdilmecîd Zindanî (serkêşê partîya sîyasî ya Islahê di Ixwanan de li Yemenê dikir) sepandin. Li gorî lêkolînê desthilatên Emerîkî di 1994an denMihemed Cemal Xelîfe ku pêşewayekî mezin ên Ixwanan bû, ji ber teqîna navenda bazirganîya cîhanî di 1993yan de girt. V kesî paşê hin karên din bi Bin Ladin re kirin û li gorî rojnameya Şeriq el- Ewset, di 2007an de hat kuştîn.

Ji ber ku Ebû Bekirê Bexdadî damezrînerekî din ên rêxistieke terorîst bû, ew jî weke xelekekê di zincîra rêveberên ku hizrinên Qaidaya ku ji bin sîwana Ixwanan derketiye, tê hesibandin. Bexdarî tev li koma Tewhîd û Cîhadê bû. Ebû Misebê Zerqawî ev rêxistin bi rê ve dibir û li parêzgeha

Embarê ya îraqî şer dikir. Bexdadî di bin fermandarîya Zerqawî de şerê Emerîka li Îraqê dikir heya ku Zerqawî di 2006an de hat kuştin û paşê xelîfa wî Ebû Umerê Bexdadî jî di 2010an de hat kuştin. Di vê salê de Ebû Bekirê Bexdadî serkêşîya Daişê kir. Riwêrtiz li ser zimanê çekdarekî Daiş ê ne sûrî got ku dema Bin Ladin hat kuştin, Bexdadî kesê tekane bû yê ku Zewahirî mubaye (hilnebijart) nekir. Vî çekdarî got ku Şêx Usame ew bi damezirandina Daişê erikdar kir. Ev pilana Bin Ladin bû berî ku were kuştin (çekdar wisa gotiye)

# Şam û Pirsgirêka Biryara Stratejîk

## (Fêmkirina cewher û çawanîya biryara stratejîk ya sûrî...)

**Hesan Qutub**

Şoreş û raperîna gelê Sûrîyê fermandarên Rêjîma sûrî têk dane û xuya bû ku Rêjîm nikare serderîyê bi encamên raperînê re bike ku sedeman fêm bike û çareserîyê bibîne û xwînê nerijîne û pergal û sazîyên xwe hevgirtî bihêle; bi taybet Artêşa Sûrîyê. Artêşa Sûrîyê ji ber tundîya ku li hember serhildêran û gelê Sûrîyê bi hemû pêkhateyan ve pêk hat, ji hev ket. Rêjîma ku xwe spartbû sîstemeke ewlekarîyê ya xweragir û qayim, xwe derveyî çarçoveya bipêşveçûnên ku sala 2011an li deverê rûdidan didît; derveyî şoreş û raperînên ku li pey hev rabûn û rêjîm û pergal anîne xwar ku bi "Bihara Gelan" hatin naskirin...

Rêjîma sûrî berî raperîn û şoreşê ji xwe re digot ku ew dikare stratejîya xwe bi xwe dane ku ew stratejî li ser parastin û aramîya Rêjîmê radibe. Stratejîya wê ew bû ku destwerdanê di karûbarên dewletên herêmê de bike bi taybet dewletên derdorê. Bi vî rengî destwerdana wê di dewletên derve de dê hêzên hundir bitirsîne û rê nede wan ku tenê bihizirin jî li hember wê derkevin, her wiha rê nade dewletên derve ku destwerdanê di karûbarên wê de bike yan piştgirîya hêzeke sûrî li hundirê statuya sûrî bike. Serokê berê Hafiz Esed gihişte desthilatê û ji hingê ve li ser wê yekê kar kir ku rêjîma wî rolekê di misogerkirina aramîya herêmê de ji bo dewletên mezin bilîze yan jî bibe karîgereke teqandinê heke îşê xwe jê bînin. Di vê yekê de jî sûd ji alavên xwe yên derve digirt yan jî gef dixwarin ku fiteneyeke nijadî yan olî li hundirê Sûrîyê çêke. Bi vî rengî Rêjîma sûrî bû pêdivîyeke herêmî û navdewletî ku divê bê parastin yan jî herî kêm pê re bê jîyandin...

Lê piştî şoreşa Sûrîyê û pêdivîya wê bi piştgirîya derveyî ji Îran û Rûsîyayê, Rêjîmê xwe di rewşeke nebaş de dît. Çimkî êdî pêdivîya wî ya cidî bi hevsengkirina helwest, kiryar û biryaran li gor stratejîya sîyasî û ewlekarî

ya Îran û Rûsyayê heye. Ew jî ji ber ku pêwîstîya wê bi piştgirî û palpiştîya wan ya leşkerî, darayî û mirovî heye; ji ber ku dizanî ku heke li rex wê nesekinin dê bi lez hilweşe û bikeve..

**Li vir divê em hizirandina stratejîk ya Rêjîma sûrî bixwînin..**

Carê stratejîya niştimanî li ser parastina berjewendîya welat û gel her wiha bipêşxistina aborîyê û başkirina rewşên jîyanê û civakî û veberhênana nifşê xortan û bipêşxistina binesazîyê û veberhênan di hemû beşan de di nav de beşên çandinî, pîşesazî û geştîyarîyê radibe..

Rewş li Sûrîyê  pir cuda ye çimkî stratejîya vê Rêjîmê ji wextê ku di sala 1970yî de desthilat ketîye destê wê de anku ji dema ku serokê berê hafiz el-Esed piştî derbeya leşkerî gihişt desthilatê û dema ku kurê wî Beşar el-Esed bi rêyeke dûr ji demokratîyê, serbestîya hilbijartinê û hevrikîya di navbera partî yan kesayetên sîyasî gihişte desthilatê, her wekî sîstema “komarên qiralî” gihişte desthilatê.. stratejîya vê Rêjîmê yan vê malbatê li ser wê yekê radibe ku dewletekê ava bike ku di bin destê desthilata malbetekê û pêkhateyekê anku pêkhateya elewî de be. Bi vî rengî stratejîya Rêjîmê ew e ku desthilat di vê çarçoveyê de bê parastin ne ku stratejîyek e ku li ser parastina welat, rêjîm, bipêşxistina dewletê û sazîyên wê radibe. Ji bo rajekirina vê stratejîê, Rêjîm du rêbaz şopandin: Bazarkirin û şantajkirin..

**Stratejîya sûrî yan stratejîya malbata hakim xwedîya gelek alîyan bû û em dikarin bi vî rengî dabeş bikin**

**Stratejîya girtina desthilatê:**

Ev stratejî li ser ragihandina dijminatîya Îsraîlê û piştrastkirina li ser xebata rizgarkirina bilindîyên Colana dagirkirî radibe, lê bi nav tenê. Bi vî rengî bihaneyên vê desthilatê çêdibûn ku her rikberîya sîyasî yan jî ragihandinî biçewisîne ew jî bi hênceta sîxûrîya ji Îsraîlê re yan bi tawana lawazkirina hestê niştimanî û neteweyî..

Her wiha leşkerîya neçar ji bo xortên Sûrîyê  hat rûnandin bi rengekî ku enerjîya xortên Sûrîyê  bê xerckirin ku hin caran maweyê leşkerîyê digihişt sê salan. Bi vî awayî xortê sûrî bêhêvî dibû û hew dikarî xwendina xwe bi dawî bike yan karekî baş bike. Kesê ku dixwest ji leşkerkirinê efû bibe jî

neçar dikirin ku gelek pereyan bide taximê desthilatdar ku bi vî rengî dewlemendî di destê komekê di desthilata sîyasî de kom dibûn..

Rêjîmê desthilata xwe bi hizira neteweyî ya erebî ve girê da, lewma pêkhateyên din yên sûrî yên ne xwedîyên nasnameya erebî weke endamekî xerîb di civaka sûrî de dihatin dîtin. Li gor vê jî zarên wan pêkhateyan nikarîbû bigihîjin cihên sereke di desthilata sîyasî, ewlekarî û îdarî de û ji mafên xwe bêpar man, loma her tim amade bûn serî li hember desthilatê hildin..

Her wiha Rêjîmê pêkhateyên sûrî ji hev xistin û veqetandin ew jî bi rêya rûnandina parçebûna nijadî û olî di navbera ereb û kurdan de û di navbera sune, elewî, xiristîyan û dirzîyan de… Di destpêka şoreşa Sûrîyê de Beşar el-Esed eşkere amaje bi vê yekê kir ku wê hingê got ku “ketina rêjîma wî dê Sûrîyê ber bi şerekî olî û mezhebî ve bibe”.. Hêjayî amajepêkirinê ye ku hiştina rewşa şer li Sûrîyê çi bi Îsraîlê re çi bi alîyekî din re hemû raye dan destê desthilatê ku hemwelatîyan biçewisîne û pêkhateyên din lawaz bike..

**<u>Statejîya hiştina desthilatê di dest xwe de:</u>**

Ev stratejî li ser jihevxistin û parçeparçekirina civak sûrî li pêkahateyên olî û nijadî û sîyasî ava dibû; bi rengekî ku ev parçebûn, dûrketin û nakokî di navbera van pêkhateyan de her lidar bin. Bi vî rengî Rêjîma ku di bingeh de xwe dispêre taîfeya elewî û bi nav xwe dispêre Partîya Beisê, dibe xwedîyê çareyê û neynîyên têkilîyê di navbera hêz û pêkhateyan de sivik dike.

Lewre Rêjîmê ji heyamên Hefiz el-Esed ve ew hêmanên bingehîn û sereke di destê xwe de hêlan ku aramîya wê misoger dikin û tawanan jê dûr dixin ku wê dev ji Colana dagirkirî yan jî Lîwa Îskenderon berdaye. Lîwa Îskenderon yan jî “Lîwaya Selîb” wekî Rêjîmê nav lê dikir, di heyamên dagirkerîya fransî de, piştî ku fermî dev jê berdan, tev li Tirkîyeyê bû. Rojnameya “el-Şerq el-Ewset” di hejimara 26an de meha kanûna duyema 2019an benda duyem weşand: “Dîmeşq êdî daxwaza mafên xwe di Lîwa Îskederon (herêma Hatay) de nake ku Tirkîyeyê di 1939an de li gor pêveka jimar /3/ ew Lîwa tev li xaka xwe kir.”

Rêjîmê bi dilê xwe û li ser kêfa xwe bi xak û serwerî her wiha bi gîyanên hemwelatîyan û paşeroja wan dilîst. Lewra vê rêbazê ji destpêka Rêjîmê ve

û heta weke niha bihaneya guncav dayê ku devê xelkê bigire û rikberan bixe zindanan de. Rêbaz jî ev in:

-“Pirsa Filstînê” pirsa navendî ya cîhana erebî ye.

-“Rizgarkirina Colana dagirkirî” pêşkîya karê sereke yê desthilata Şamê ye.

-“Yekîtîya Erebî” silogana Partîya Beisê û sernava tevgera wê ya sîyasî ye.

Di mijara pirsa Filistînê de her dem tevgera Rêjîma sûrî li dij alîgirtinên filistînî û armancên Munezemet Etehrîr el-Filistînîye (Rêxistina Rizgarkirinê ya Filistînî) bû, ne tenê wilo lê belê rola wê sînordar dikir û sala 1970yî şerê wê kir. Piştî şerekî giran di navbera Urdun û komên Munezemet Etehrîr el-Filistînîye de, Hafiz el-Esed piştgirîya filistînîyan nekir tenê bi nav hink alîkarî dan. Her wiha dema ku şervanên Munezemet Etehrîr ji Urdunê derktin, Rêjîma Dîmeşqê ew yekser ber bi Libnanê ve ajotin ku wê hingê Rêkeftina “Qahîreyê” di navbera Libnan û Munezemet Etehrîr el-Filistînîye de hatibû îmzekirin. Li gor rêkeftinê, Rêxistin dikare li devera “el-Erqûb” bi cih bibe; Erqûb li başûrê Libnanê û li ser sînorê Filistîna dagirkirî her wiha li ser sînorê Sûrîyê  hemberî bilindîyên Cebeli-Şêx cih digire. Ji ber vê yekê Libnan kete şerekî xwînî de ew jî piştî ku hêzên filistînî yên çekdar li Libnanê zêde bûn û çalakîyên filistînî ji Libnanê ber bi deverên degirkirî ve pêk dihatin, lewma Libnan bû qada şer û pevçûneke vekirî. Pirsa Filistînê û silogana “Rizgarkirina Filistînê û Vegerandina Mafên Filisînîyan” diruşmeya qonaxê bû da ku desthilata Rêjîmê bêhtir cih bigire.

Bi ser ve zêdetir, Rêjîma sûrî xortên filistînî ji bo şer û kuştinê bi kar tîne. Di 07.11.2022 de rojnameya “el-Şerq el-Ewset” nûçeyek belav kir, nûçe wiha bû: “Riwangeha Sûrî ya Mafên Mirovan roja duşemê da zanîn ku “Lîwa el-Quds” yê filistînî li rex rûsan şerê ukranîyan dike”. Wate, Rêjîma sûrî deynên dewleta Rûsyayê ya ku piştgirîya wê kir ji xwîna gelê Filistînê lê vedigerîne. Divê xortên filistînî û Lîwa el-Quds şerê dewleta Îsraîlê bikin û xaka xwe rizgar bikin, ew der qada şerê wan e ne ku herin cihekî din û ji dêl Rêjîma sûrî ve şer bikin!!

Piştî ku bê berevanî û liberxwedanî kete destê Îsraîlê de, rizgarkirina Colanê bû daxwaza gelê Sûrîyê . Ji ber ku daxwaza rizgarkirinê di ser her tiştî re bû û di ser hemû pêdivî û pêwîstîyên gelê sûrî re bû, şerê rizgarkirinê bû merceke sereke ji bo serkêşîya rêya sîyasî û ewlekarî li hundir û têkilîya

bi derve re. Vê yekê rê da Rêjîmê ku desthilatdarîya xwe li ser pêkhateyên Sûrîyê , li jêr dirûşmeya "Dengê Şer yê Herî bilind e", gurtir û asêtir bike.

"Yekîtîya Erebî" silogana Partîya Beisê ye. Rêjîmê pabendî bi vî sernav û zaravî kir "Yekîtî, Azadî, Sosyalîzim" da ku sîyasetên derveyî deyne ku sîyaseta wê ya derveyî ew bû ku roleke herêmî bilîze zêdeyî qebare û karînên wê be. Di vê yekê sûd ji nebûna pirojeyeke rasteqîne ya erebî û ji atîfeya neteweya erebî digirt. Maytêkirina Sûrîyeye bi serkêşîya Hafiz el-Esed di Îraq, Libnan, Filistîn, Urdun û hwd de û gefxwarina tevrakirina pirsgirêk û arîşeyan li dewletên erebî yên ku di milê sîyasî de ne li gor sîyaseta wî ne yan jî hevkarîya aborî pê re nakin, ji bo şantajkirina wan bû. Bo nimûne ev yek pêk hat dema ku Sûrîye bi serperiştîya ereban û daxwazeke navdewletî ji bo parastina xiristîyanan li Libnanê ji projeya bicihkirinê ya filisîtînî derbasî Libnanê bû. Her wiha li Tevgera Niştimanî ya Libnanî da bi bihaneya ku ew xwedî hizireke çapgir e û bawerîya wê bi yekîtîya erebî nayê. Her wiha Rêjîm di serdema Xumeynî de (di şerê Îraq û Îranê de) bû hevbenda Îrana neereb.. Esed erebbûna dewleta Îraqê bi bihaneya nakokî û dijminatîya di navbera wî û Sedam Hisên de serokê Îraqê wê demê, her wiha bi bihaneya cudahîya di navbera Partîya Beisê ya Sosyalîst ya Esed û Partîya Beisê ya Îraqî ya Sedem Hisên de piştguh avêt.. Pevçûna li qadên erebî, bi taybetî li Libnanê bandoreke neyînî li ser asta libnanî û filistînî kir ku her dewletek xwedî komeke filisîtnî be, kom girêdayî wê bû û şer li gor arasteyên wê dikir; "Tenzîm el-Saîqa" girêdayî Rêjîma Esed bû û "Cebhet Ethrîr el-Erebîye" girêdayî Rêjîma Sedam Husên bû.

**<u>Berehm yan bandorên van her sê sernavên strtajîk li hundirê Sûrîyê  çi bûn?</u>**

- Ji Rêjîmê re rê vekir ku bi azadî sîyaseta çewisandinê bike ku di vê yekê de sûd ji siloganên xwe dikir; "Rizgarkirina Colanê û Rizgarkirina Filistînê" û kar û xebata ji bo pêkanîna "yekîtîya erebî"

- Mezhebbûna xwe û xewnên xwe yên vederî li jêr dirûşmeya "yekîtîya erebî" veşartin û xwe weke rêjîmeke dijî dagirkerîyê û meyldara yekîtîyê ji cîhana erebî re pêşkêş kir.

- Rê ji alîgirên xwe re vekir ku tev li refên artêşê bibin û cihên sereke bigirin û mîlîs bi serkêşîya Rifet el-Esed bi navê “Seraya Edîfai” ji bo parastin û berdewamîya xwe ava kirin.

-Hêla ku pêkhateyên din di hemû beşan de kar bikin da ku hilberîn zêde bibe û pere di gencîneya dewletê zêde bibin.

-Armanc ji tekezkirina erebbûna Rêjîmê û yekîtîya neteweyê ew bû ku civaka sûrî vehewîne û nêzîkî neteweya erebî bibe. Lê vê diruşmeyê birînek li cem nijadên sûrî yên din yên neereb, bi taybet kurd ku ew piştî ereban pêkhateya herî mezin in li Sûrîyê , vekir. Bi vî rengî van pêkhateyan hîs kir ku ew ji derveyî welat in û hebûna wan li Sûrîyê cihê acizîyê ye yan jî zarên van pêkhateyan xwe weke hemwelatîyên radeya duyem bibînin ku bêmaf in lê erkê wan ji bo dewletê hene.

Bi şopandina sîyasetên vê Rêjîmê li seranserî 50 salên desthilatdarîya wê, xweş zelal bû ku ev Rêjîm ji bo parastina xwe û mana di desthilatê de kar dike û xwe dispêre cemawer û taîfeya xwe û sûdê ji wizeya pêkhateyên din werdigire. Rêjîmê pêkhate parçe parçe kirin û rola wan lawaz kir bi vî rengî nakokî da navbera pêkhateyên olî de gurtir kirin da ku desthilat di destê wê de bimîne û bikare karûbarên welat bi piştgirîyeke erebî û navdewletî bi rê ve bibe. Çimkî ew xwe wekî misogervanê aramî û ewlekarîya herêmî raber dike; bi taybet di pirsa filistînî de her wiha di karûbarên Libnanê de ku ji 1975an heta 2005an dosyeya Libnanê li jêr silogana parastina kêmaran û sivikirina nakokîyê di navbera pêkhateyên olî de bi rê ve dibir, paşê di 2005an de ji Libnanê derket. Pirsa filistînî ji bo têkilîyên xwe bi dewletên erebî re bi kar dianî ew jî li gor pêwîstî û pêdivîyê û ji bo ku rola xwe ya herêmî wekî misogervan qayimtir bike.

**<u>Naveroka stratejîya ku têkilîya Rêjîma sûrî bi pêkhateyan sûrî re bi taybet bi kurdan re xêz dike:</u>**

Rêjîma sûrî keysa xwe ji cudahîya di navbera pêkhateyên sûrî de anî û tirs di navbera wan de çand. Ji ber ku misilmanên sunî pêkhateya bingehîn ya sûrî ne ereb û kurd, Rêjîmê nakokîya nijadî di navbera wan de çand. Komara Ereb ya Sûrîyê tê wê wateyê ku bê guman ev dewlet bi sazî û miletê xwe ve ereb e anku rola her pêkhateyeke nereb dê pir sînordar be yan jî dê têkilîya dewleta ereb ya Sûrîyê û pêkhateya nereb (pêkhateya

kurd kêmara nereb ya herî mezin û giring e û 10% ji niştecîyên Sûrîyê pêk tîne) ne hevseng û ne zelal be. Bi ser ve zêdetir dê hemwelatîyê kurd hest bike ku ew hemwletîyê radeya duyem e. Serderî pê re tê kirin li ser wî esasî ku ew li dewleta Sûrîyê ya ereb rûniştîye û ne hemwelatîyekî sûrî ye ku nola her hemwelatîyekî din xwedîyê hemû mafan be; ev jî rewşeke dilsoj e û nayê pejirandin. Em piştguh navêjin jî ku maweyeke dirêj gelek zarên civaka kurd bêregezname bûn. Gava sereke di stratejîya Rêjîmê de ew bû ku civaka sûrî li pêkhateyên nijadî parçe bike. Loma pêkhateya nijadî derveyî sazîyên sîyasî, leşkerî û birêveberî bû, kesên ku hin cih di sazîyan de digirtin jî ji bo rajekirina Rêjîmê kar dikirin. Lewre ji hêla têgeh, rêbaz û reftarê ve hemwelatîbûn nîne û peyda nabe û kes nikare dabaşa wê bike.

Rêjîma sûrî sûd ji parçebûna kurdan li çar dewletan “Îran, Îraq, Tirkîye û Sûrîye” kir ku tu lêvegereke neteweyî ya kurdan nîne ku haj karûbarên kurdan li dewletên cihreng yên kurd li wan bi cih dibin hebe; her wiha kurdan li her çar dewletan jî jan ji heman pirsgirêkê (piştguhavêtin û dûrxistin) dikêşa. Raperînên kurdan li wan dewletan ji bo bidestxistina mafên wan bûn û parastina nasname û çanda kurdî wekî paşmayekî neteweyî û nasnameyeke nijadî. Lê serderîya fermî bi wan re her çewisandin bû. Li vir baş e ku em bi çavekî objektîf li ketwara zagonî û civakî ya kurdan li Sûrîyê bi rêya tiştên ku malpera “el-Mufekîre el-Qanûnîye” weşandîye binerin.

**<u>Tomareka Zagonî:</u>**

Serjimêrîya awarte di 5. 10 . 1962 de li parêzgeha hesekê pêk hat, di encamê de kurd li Sûrîyê bûn sê beş:

- Kurdên xwedî regeznameya sûrî

- Kurdên bê regeznameya sûrî û di tomarên fermî de wek bîyanî hatine tomarkirin.

- Kurdên bêregezname; di tomarên rewşên sivîl yên fermî de nehatine tomarkirin û navê “mektûm el-qeyd” li wan hate kirin. “Mektûm el-qeyd” têgeheke birêvebirinê ya sûrî ye tê wê wateyê ku ew kesê peywendîdar di sicilên fermî de nîne.

Li gor vê serjimêrîyê, nêzî /120/ hezar ji kurdên Sûrîyê ji regeznameya sûrî bêpar kirin û bi vî awayî mafê xwedîtîyê ji dest dan.

Di raporeke Rêxistina Lêborîna Navdewletî de ku di sala /2005/an de weşand hatiye ku "ji ber zêdebûna xwezayî ya niştecîyan, hejmara kurdên bêregezname li Sûrîyê gihişte nêzî /200-360/ hezarî.

Giringtirîn encamên vê serjimêrîyî ev bûn:

- Hemwelatîyên bêregezname ji hemû mafên sîyasî, çandî û civakî bêpar kirin.

- Damezrandina partîyên kurdî hat qedexekirin; çimkî partîyên neteweyî ne û kesê ku tevlî wan dibû wekî tewanbar dihat dîtin. Ev yek tevî wê yekê bû ku partîya ku hikim di destê wê de bû, partîyeke neteweyî bû ji neteweyeke din.

- Guhartina navên gundan; hikûmetên sûrî navên gelek gundên kurdan guhartin û navên erebî li şûnê li wan kirin ew jî bi armanca ku "nasnameya wan ya kurdî winda bikin".

- Dibistanên ku zimanê kurdî li wan bê fêrkirin hatine qedexkirin û axiftina bi kurdî li sazî û helkeftên fermî bû tawan û sûc.

Arîşeya bêregeznametîyê derdora 50 salî ma; ji sala /1962/yan ve heta sala /2011/an. Di 2011an de û ji ber zext û fişara raperîna gelêrî ya adarê, Serokê Komara Sûrîyê Beşar el-Esed sê komîte dane avakirin; komîteyek ji wan ji bo çareserkirina pirsgirêka serjimêrîya awarte ya sala /1962/yan. Piştî /24/ seetan ji hevdîtina Serokê Sûrîyê bi serokên êlên kurdî û kesayetên civakî re li Şamê, Serokê Sûrîyê fermana zagonsazî jimar /49/ ya sala /2011/yan derxist li gor fermanê regeznameya erebî ya sûrî bo bîyanîyên parêzgeha Hesekê hate dan. Tevî ku fermana zagonsazî rewşa kurdên sûrî yên ku di sicilên bîyanîyên Hesekê hatin tomarkirin sererast kir jî lê belê li gor madeya yekem ji fermanê, kurdên bêregezname yên navên wan di sicilên rewşên sivîl yên fermî de nehatine tomarkirin li ber nektin. Her wiha di prespektîfên cîbicîkirinê yên fermanê de hat ku divê "daxwazên malbatê bi tevayî bi navê malxweyê malê bên pêşkêşkirin", ev jî pêbarbûna jina sûrî ji mafê veguhastina regeznameyê bo zarokên xwe tîne bîra me. Di êlûna /2013/an de Encumena Wezîran ya sûrî di civîna heftane ya hikûmetê

de projeya zagonekê derxist; "li gor projeya zagonê her kesê ku li gor fermana zagonsazî ya jimar /49/ sala /2011/ ya taybet bi dana regeznameyê bo kurdan bi dest xist, ji mercê bihûrîna pênc salan di ser bidestxistina regeznameyê re ji bo bidestxistina mafan û bicihanîna pabendî û erkan efû dibe."

**Heman nerîna Rêjîma sûrî ji bo pêkhateya kurd li nik Tirkîye, Îran û îraqê jî hebû:**

Serderîya bi pêkateya kurd re di her çar dewletên ku kurd li wan dimînin de yan jî welatê kurdan li xwe par kirine (Sûrîye, Îraq, Tirîye û Îran) weke hev bû. Bê guman hin cudahîyên biçûk ji hêla awayê serderîyê ve yan jî bidestxistina hin mafên ku rê didin wan bibin beşek ji dewletê hebûn, lê serederîya bi kurdan re li van hemû dewletan li ser wî bingehî dimîne ku kurd pêkhateyeke nijadî ne û pêkan di her wextî de serî li hember dewleta navnedî hildin û wê lawaz bikin. Lewra em dibînin het niha bi tenê kurd li Îraqê ji vê rêzê der in û hikmekî nêzî serxwebûnê di destê wan de ye. Tevî vê yekê jî dema ku serokê kurd Mesûd Berzanî projeya serxwebûnê ji bo referandûmê pêşkêş kir, hemû dewletên mezin di nav de Amerîka li rex wî nesekinîn; tevî ku wî erêkirina melt jî bi dest xwe ve înabû. Di encamê de Berzanî ji jîyanî sîyasî vekişîya û rewşa bakurê Îraqê wekî xwe ma. Îro em reperîneke kurdî li herêma kurdî ya îranî dibînin wekî beşekê ji raperîna gelê îranî li dij desthilata melayên Îranê, ew jî piştî ku hemwelatîya kurd "Mehsa Emînî" li ser destê Polîsa Exlaqan hat kuştin. Piştî kuştina wê, eşkere bû ku navên kurdî li Îranê qedexe ne û navê wê yê rasteqîn "Jîna Emînî" ye. Li Tirkîyeyê, tevî ku rewşa civakî û sîyasî hindekî ji Sûrîye û Îranê baştir e, lê hîn jî guvaş û fişar li ser civaka kurd heye û her tevgereke sîyasî ya kurdî weke terorîst tê dîtin ku dixwaze ewlekarîya Tirkîyeyê têk bibe û gefê li yekîtîya wê û paşroja gelê wê dixwe.

Rêjîma sûrî rê neda partîyên kurdî ava bibin û ew weke gefekê li hember desthilata xwe didîtin. Her wiha ev partî di binavkirina xwe de bi hizira neteweyî ya erebî ya ku Rêjîma sûrî weke bingehekê ji bo desthilata xwe danîye li hev nake.

Helwesta Tirkîyeyê li hember pêkhateya kurd û tirsa Tirkîyeyê ji avabûna statûyeke kurd li Sûrîyê yan jî li Îraqê ku dibe ku bandoreke neyînî

li kurdên Tirkîyeyê bike û wan jî han bide ku doza statûyeke kurdî li Tirkîyeyê bikin, hêlan ku Tirkîye derbasî bakurê Sûrîyê bibe da ku şerê hêzên kurdî yên sûrî bike ew jî bi bihaneya wê yekê ku serderîyê bi "Partîya Karkerên Kurdistanê" re dikin yan heman ramanên wê bi xwe digirin ku li gor Tirkîyeyê ev hêz terorîst in; loma gefê li ewlehîya Tirkîyeyê dixwin. Rêjîma sûrî sûd ji vê rewşê girt, lewre li rêyekê gerîya ku têkilîyên xwe bi Tirkîyeyê re vegerîne ew jî bi serperiştîya Rûsyayê ya ku biryara Sûrîyê di dest wê û Îranê de ye; Îrana ku weke Tirkîyeyê ji heman tiştî ditirse. Rêjîma sûrî hewl dide xwe weke misogervana aramîyê li ser sînorên dewleta Sûrîye û Tirkîyeyê raber bike û dixwaze wê yekê bide pêş ku partî û mîlîsên kurd yên rikberê Rêjîma sûrî, yên ku doza wekhevîyê di hemwelatîbûn, maf û erkan dikin, metirsîyek in û dibe ku doza serxwebûnê bike û dê bandoreke neyînî li paşeroja Tirkîyeyê bike.

Rêjîma sûrî hewl dide sûdê ji guvaşa leşkerî û sîyasî ya Tirkîyeyê li ser kurdên Sûrîyê û gefên Tirkîyayê yên erişkirina bakurê Sûrîyê bigire, da ku xwe ji pêkhateya kurd re bi rengekî pêşkêş bike ku ew desthilata navendî ye ya ku hemû sûrîyan di nav de kurd diparêze. Û xwe dide jibîrkirin ku wê bi salan kurdên sûrî piştguh avêtine û ji mafên wan bêpar hiştine.

Mana Amerîkayê li bakurê Sûrîyê li rex Rêveberîya Xweser û gefên Rêxistina Daişê, sedemên sereke yên mana van hêzan in, lewre derfetê dide kurdan ku bi dengekî bilind danûstandinê bikin, yan jî dê Sûrîye, Rûsya û Tirkîye keysa xwe li van hêzan bînin û di encamê de dê dawîyê li rewşa sîyasî ya ku Rêveberîya Xweser tê de nimûne ye ji bo misogerîya aramîyê û rûnandina pêkvejîyanê di navbera pêkhateyên Sûrîyê de bînin.

Heta niha jî fermandarîya sûrî ya nihayî ya ku sûd ji piştgirîya Îran, Rûsya û bi dehan mîlîsên taîfî û mezhebî girtîye ku Îranê ew mîlîs ji bo piştgirîya Rêjîmê û mana desthilatê bi nav di destê wê de bi kar anîne, ku Sûrîye û gelê Sûrîyê janê ji kirîzên ewlekarî, sîyasî, aborî her wiha ji xizanîyê û koçkirin û penaberbûnê dibînin, heta niha jî ev fermandarî li ber neketîye ku wext e ku awayê serderîyê bi ketwara sûrî re bighuhêre û dest bi çareserkirineke rasteqîne bike ku bi vê çareserkirinê rê ji azadîya sîyasî û ragihandinê re veke û derfetê ji bo avakirina partîyên niştimanî ku hemû netewe, etnîk û nijadan di nav de yên olî bihewîne, veke. Her wiha hîn fermandarîyê nas nekirîye ku demokratî, dewleta sivîl, endamtîya welat û

geşkirina nasnameya niştimanî rê û çareya herî baş û rasteqîne ji bo aramîya Sûrîyê û girêdana sûrîyan bi hev ve ye.

**<u>Gelo derfet heye ku lihevkirinek di navbera Rêveberîya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê û Rêjîma Şamê de çêbe?</u>**

Mesele li vir hinekî di nav hev de ye; çimkî Rêjîma sûrî ku serderîyeke objektîv û rêz li civaka kurd û Rêveberîya Xweser nekiriye û bi dehên salan e tu mafên civaka kurd nedanê, lewre Rêveberîya Xweser nikare pişta xwe bispêrîyê û têkilîyê pê re vegirîne û li rex wî şerê piranîya gelê Sûrîyê bike. Li milê din Rêjîm bi çavekî wiha li Rêveberîya Xweser dimeyzîne ku cudaxwaz e û bi "Amerîkaya" dagirker re kar dike û piştguh diavêje bê ka berî raperînê rewşa civaka Rêveberîyê çawa bû û piştî raperîn û şoreşê û bi serperiştîya Rêveberîya Xweser çawa civak guheriye û bi pêş ketiye ku nirx û qîmet da çand, ziman, hebûn û dabûnerîtên hemû pêkhateyên sûrî yên ku li deverên Rêveberîya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê dimînin. Heke piştgirîyeke amerîkayî ji bo Rêveberîya Xweser hebe jî ya ku hemû hêzên çalak li deverê ji ereb û kurdan di nav xwe de dihêwirîne, sedema wê pişgirîyê jî serderîya tund ya hêzên Rêjîmê ye ku wiha rabûye ku bi devê tifingê hevrikê xwe bixe di bin destê xwe de.

Tirkîye li ser asta sîyasî û leşkerî guvaşê li Rêveberîya Xweser dike û wê weke rêxistineke terorîst li qelemê dide û dibêje ku ew beşek ji Partîya Karkerên Kurdistanê ye. Her wiha Tirkîye bi yekcarî derfeta dîyalog û danûstandinê bi Rêveberîya Xweser nade, lê belê wê diçewisîne û gefa êrîşê lê dixwe û binesazîya deverê dirûxîne ku gelek hemwelatîyên sûrî ji gund û bajarên Sûrîyê yên ku Tirkîyeyê êrîşî wan kiriye koç bûne ku piştî demekê ji ber guvaşa civaka navdewletî êrîş sekinand. Niha dîsa Tirkîye gefa êrîşeke leşkerî li dij Hêzên Sûrîya Demokratîk "QSD" dixwe; "QSD" şaxê leşkerî ya Rêveberîya Xweser e di şerê hêzên radîkal "Daiş" her wiha di rûbirûbûna hêzên Rêjîmê de ku dixwazin careke din niştecîyên deverê vegerînin jêr destê desthilata Şamê.

Rêjîma Şamê hewl dide sûdê ji guvaşa Tirkîyeyê bigire da ku bi navbeynkarîya Rûsyayê destekê bide Rêveberîya Xweser ku vegere jêr serwerîya Rêjîmê.

Naxwe têkilîya di navbara Rêjîma Şamê û Enqereyê de têkilîyeke pevguhêr e; çimkî Şam sûdê ji guvaşa Enqereyê werdigire û Enqere armancên xwe yên radestkirina bakurê rojhilatê Sûrîyê û deverên Rêveberîya Xweser bo Rêjîma Şamê bi cih tîne. Bi vî rengî jî Tirkîye xwe ji ber pêkanîna operasîyoneke leşkerî dide alî ku ne Amerîka ne jî hêzên Hevpeymana Navdewletî rê pê nadin.

Li vir divê Rêveberîya Xweser bîra wê yekê bibe ku vegera Rêjîma Şamê bi tenê rajeya desthilatê dike û bi bihaneya parastina ji êrîşa Tirkîyeyê dê Rêveberîya Xweser û hemwelatîyên wê rastî çewisandin û girtinê bibin û dê hemû destkeftîyên salên berê ji dest bidin. Rêveberîya Xweser dikare sûdê ji tecrûbeya Rikberîya sûrî li deverên bakur û başûrê Şamê bigire; dema ku di bin guvaşa topbarana Rûsyayê de û êrîşên mîlîsên îraqî, îranî û libnanî qîma xwe bi hedarkirina (teswîye) sîyasî anî û di encamê de pêngava koçkirinê û destdanîna li ser erdan û girtinê dest pê kir her wiha çalakvan hatine îşkencekirin û gelek ji wan hatine kuştin.

Biryara stratejîk ya fermî li Şamê li gor misogerîya berdewamîya Rêjîmê bi heman rengê xwe yê halê hazir û heman hizira desthilatdar û dîktatorî tê standin; hizira bicihkirin û qayimkirina desthilata malbatê (el-Esed) û kesê ku ji bo wê kar dike bê ku rêzê li taybetî û çandên pêkhateyên sûrî bigirin..

Rêkeftina "Adenayê" ya ku Rêjîma Hafiz el-Esed di sedsala bihûrî de bi Tirkîyeyê re îmze kir, piştrast dike ku Rêjîma Şamê ji bo parastin û berdewamîya xwe, ne ji bo pêkanîna berjewendîyên gelê sûrî, amade ye serê xwe ji her kesî re daxe. Bend û naveroka rêkeftinê bi taybet pêkhateya kurd armanc digirin; çimkî kurdên bakurê Sûrîyê û Îraq û Tirkîyeyê esasê pirsgirêkê ne. Lewma li ser wê yek li hev kirin ku rol û amadebûna pêkhateya kurd lawaz bikin. Wate armanca Rêjîmê ji sîyaseta destekdayînê, lawazkirina Rêveberîya Xweser e da ku li jêr guvaşa Tirkîyeyê bikeve destê Rêjîmê.

Ji bo ku sîyasetên berê û çewsandin dîsa careke din dubare nebin, pêdivî ye berî her têkilîyeke rêkeftinê di paşerojê de, lêkolîn, haydarbûn, şopandin û misogerîya dewletên herêmî û navdewletî hebe.

"Rojhilata Navîn" naveroka Rêkeftina Adenayê /10/ diweşîne, nihanên pevguhêr di navbera Enqere û Şamê de:

**<u>Nerîna hevbeş ji bo kurdan… sedema nêzîkbûna Tirkîye bi Rêjîma sûrî re ye:</u>**

Tevî cudahîyên di navbera her du rêjîmên sûrî û tirkî de lê her du jî bi heman çavî li pêkhateya kurd dinêrin; bi vî awayî ew cudahî û cihêtîya di navbera xwe de her wiha nakokî û daxuyanîyên berê û şerê sivik yê ku di navbera her du atêşan de ya sûrî û ya tirkî ji bîr dikin yan jî piştguh diavêjin. Heke Rêjîma Tirkî bibîne ku hîpoteza mana Rêjîmê li ser hikim heta radeyeke bilind pêkan e û civaka navdewletî, bi taybet Amerîka, êdî hew dixwazin Rêjîmê hilweşînin û bi rêjîmeke din biguhêrin, Rêjîma Tirkî di cih de dê li xalên hevbeş yan jî li çareyan bigere ji bo teswîyeyê bi Rêjîma nihayî re bi serperiştîya Rûsyayê û bi erêkirina Îranê çêke ku Îran dê sûdê ji teswîyeya di navbera Tirkîye û Sûrîyê de ya li ser hesabê kurdan bibîne, çimkî dê jê re bibe ajoyek ku êdî zêdetir gelê kurd li Îranê biçewisîne. Her wiha teswîyeya di navbera her du rêjîman de dê barên leşkerî û darayî yên li ser milên Îranê ku ji bo man û aramîya Rêjîma sûrî dimezêxe sivik bike; bi taybet ku Rûsya ketiye şerekî giran de li Ukraynayê ku çek û artêş û budceya wê xerc dike. Niha jî êdî Îran jî bi Rûsyayê re şemitî ku wê bi rokêt û dronan bar dike. Li alîyê din Îran bi xwe jî êdî tuşî raperîneke hundirîn tê ku gefê li aramî û berdewamîya Rêjîmê dixwe; ji ber ku xwestek û daxwazên serhildêran digihin endam û sembolên sereke yên rêjîmê anku ne xwestekên debara jîyanê ne ku di şîyana Îranê de hebe wan bi cih bîne. Ev yek jî Raperîna Gelêrî ya Îranî tîne bîra me ya ku sala /1978/an pê ket û Şahê Îranê ji ser hikim rakir û piştre Xumeynî hemû fermandeyên şoreşê dûr xistin û rêveberîya wê vegerit heta ku Îran giha vê rewşa ku niha lidar e.

Li vir êdî em bîr dibin ku berjewendîyên Sûrîye, Îran, Rûsya û Tirkîyeyê bi lihevkirinê bi cih dibin; heke ne niha be dibe ku di paşerojê de be da ku bighine teswîyeyeke sîyasî di navbera Rêjîma sûrî û Rêjîma tirkî de bi armanca ku ev teswîye dawîyê li hêvîyên kurdan bîne ku rewş û rol û amadbûna wan li qada sîyasî li Sûrîyê her wekî dewletên din yên bi pirsa kurdî ve peywendîdar baştir bibe. Li milê din em nikarin çavê xwe ji wê yekê bigirin ku mîlîsên Heşda Şeibî ya Îraqî gelekî ji nîvserxwebûna kurdên Îraqê bêzar bûye. Her wiha ev mîlîsên girêdayî Îranê berdewam zîyanê digihînin deverên kurdan û kurdan bi hevkarîya bi Îsraîlê re tawanbar dikin ku ev tawan êdî gelekî dubare dibe. Îran jî dibêje ku kurdên Îraqê şoreşgerê kurd

yên îranî dihewîne û sîyaseta guvaşa leşkerî û toparanê dem bi dem li ser Kurdistana Îraqê bi kar tîne ku ev bûye mijareke rotînî ku Tirkîye jî wê yekê li bakurê Îraqê dike li kêleka çalakîyên kuştine ji demekê bo demeke din.

Li vir divê em balê bikişînin li ser hevdîtinên di navbera istixbaratên Sûrîye û Tirkîyeyê de; hevdîtinên ji bo pevguhartina agahîyan û danîna şopeke sîyasî ku bikarin li gor wê têkilîyan di navbera her du rêjîman de vegerînin. Ev hevdîtin bi sedema wê yekê ne ku her du rêjîm ji tevgera kurdî û birêveçûna wan ber bi dewletên cîran û civaka navdewletî ve ditirsin ku civaka navdewletî êdî di rol, amadebûn û janên kurdan digihe. Her wiha rola partîyên kurd di rûbirûbûna radîkalbûnê de ku li pêş berfirehbûna radîkalan sekinîn û di ber wê yekê de gelek mal û can ji dest dan, vê yekê hêla ku partîyên kurd bibin cih rêz û bawerîyê. Em ji bîr nekin ku têkilîyên bijare di navbera kurdên Sûrîye û Îraqê û Amerîkayê de hene; ev têkilî rê li ber Heşda Şeibî ya Îraqî û Rêjîma Tirkîyeyê her wiha Rêjîma Sûrîyê digire ku civaka kurd qir bikin.

**Puxte**:

Tê têbînîkirin ku rêjîmên her çar dewletên ku kurd li wan dimînin, rêjîmên dîktatorî ne; tevî ku hin ji wan xwe bi dîmenê demokratîyê didine pêş. Wate, bi vî rengî dê derfeta rêdana damezrandina partîyîn sîyasî bi kurdan yan jî rêdana derbirîna çandê mijareke aloz bimîne.

Ev rêjîm, rêjîmine neteweyî ne, neteweya xwe bilind dibînin û rêzê li neteweyên din nagirin.

Ev dewlet xwe dispêrin desthilata çewisadinê û hêz û sazîyên leşkerî bi kar tînin ku bi tenê erkê wan sazîyan parastina rêjîmê ye.

Tişta di navbera van dewltan de hevbeş, bi taybet Rêjîma sûrî tê de jêhatî ye ku piştî dehsalên çewisandin û bindestîyê êdî ne cihê bawerîyê ye. Hin mafên ku vê dawîyê jî anu berî çend salan dayî pêkhateya kurd bi armanca wê yekê bû ku kurd tev li raperîna gelêrî ya sûrî nebin û doza cudahîyê yan jî birêveberina karûbarên xwe nekin.

Rêjîmên zordest li van dewletan li wê xalê digihine hev ku çi serhildaneke kurdan hebe ku doza mafên xwe bike vemirînin; wate çi

hevbendî di navbera kurdan û yekê ji van dewletan de çêbe, tu hêvî dê jê nebin û dê ne cihê bawerîyê be.

Mirov nikare tawanbarkirina partîyên kurdî bi ajanîyê yan jî bi cudaxwazîyê piştguh biavêje, lê divê bersiva wê ew be ku ketwara kurdî ya zehmet û redkirî ku ev demeke dirêj û bi taybet li Sûrîyê dom dike were şîrovekirin.

Regeznameya sûrî ne minetek e ku Rêjîma desthiltdar li Sûrîyê bi xêra xwe dabe kurdan, lê belê regezname mafê her hemwelatîyekî ye ku li Sûrîyê dijî di nav de kurd. Wate, dema ku Rêjîma sûrî dikeve tengasîyê, helwestên erênî nîşan dide, lê dîsa li hêvîya derfeteke nû ye ku bi ser hevrikên xwe de bigire; bi teybet kurd.

Rêveberîya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûrîyê têkilî di navbera pêkhateyên deverê de xweş kirin, her wiha çand, dab û nerît, cejin û ziman vejandin. Bi vî rengî jîyan li jîngehekê vegerîya ku mafê wê yê xwazyî di jîyana azadî û rûmetê de qedexe bû.

Tirsa Rêjîma Şamê û rêjîmên dewletên cîran ji biserkeftina tecrûbeya Rêveberîya Xweser ew e ku li Tirkîye û Îranê jî ev tecrûbe dubare bibe. Her wiha ditirse ku xweşik cihê xwe li bakurê rojhilatê Sûrîyê bigire ku êdî nema bikare dawîyê lê bîne û jê xilas bibe. Biserkeftina Rêveberîya Xweser di pêkanîna ewlekarîyê û rûbirûbûna radîkalîyê û rûnandina aştî û pêkvjîyanê di navbera hemû pêkhateyan de, dihêle ku Rêveberîya Xweser ji Rêjîma Şamê bêhtir cidî û rastgo xuya bike.

Divê mirov hisaban bike her wiha divê rêya ragirtina mafan berdewam be û danûstandina bi Rêjîma sûrî re divê li ser bingeha parastina mafên gelê kurd û rêzgirtina li çanad kurdî be, her wiha divê hemû mefên hemwelatîyê kurd yê sûrî bidîyê. Pêwîst e sîstem li Sûrîyê ji desthilata yek partîyê û malbata desthilatdar û taîfeya zal ber bi dewleta hemwelatîbûnê ve here û rêz li hemû pêkhateyan were girtin her wiha azadîya karê sîyasî û dirbirînê bi her kesî bê dan ku Sûrîye derbasî qonaxa ronesanza aborî û civakî bibe û ji newala lipeyçûn û malgirtina samanên niştimanî derkeve ku ew saman mafê gelê sûrî hemûyî ye.

Lewre divê bi baldarî biryara lihevkirin yan hevtêgihiştinê di navbera Rêveberîya Xweser û Rêjîma Şamê de were raçavkirin. Wate, divê ev biryar

ne di bin guvaşa êrîşên hewayî yên Tirkîyeyê de yan jî li jêr guvaşa Rûsyaya navbeynkar were girtin; Rûsyaya ku hewl dide sûdê ji guvaşên Tirkîyeyê bigire da ku dosyeya Rêveberîya Xweser, ya ku Rûsya bi xwe jî jê ditirse, bi dawî bike da ku ji nû ve Rêjîma sûrî vegerîne qadê.

# Îran


( 3 ji 4 )

## Rikberîya Îranê

Cihrengbûna nijadî, tîreyî (mezhbî) û olî; ji taybetmendîya Îranê ye[1]. Li tenişta Farisan weke pirnetewek, hin gelên din weke Kurd, Ereb, Bilûç, Tirkûmen û Azerî ku nêzî % 60 – %70 ji jimara şênîyê digirin jî, hene. Her wiha "Şîî û Sunî" bi hemû beşên xwe, "Xirsyan, Cihû û Zeredeştî" û hwd, lê peyda dibin. Ji hêleke din ve kûrahiyeke wê ya herêmî heye ku piranîya gelên Îranê li ser sînoran bi cih bûne û girêdaneke wan a malbatî bi gelên dervî sînor heye. Ji ber sedemên weke serwerîya "demokratîya tîreyê", tunebûna rêgezên bingehîn ên demokratîyê, pêhesîna gelan bi stemkarî û cudahîyê di warên karmendîtîyê, raje û pirojeyên geşedanê û tunebûna azadîyan û qedexekirina mafên çandî, sîyasî û azadîya ragihandinê; pefçûnên isnî li hundirê Îranê her demekê rû didin. Weke ku Hizirmendê Navneteweyî "Abdûllah Ocalan" di der barê Îranê de wilo dîyar dike:[2] **"...tê xuyakirin ku gelên Îranê ji gelên din bêtir sermayedarîya nûjen nas dikin û serê xwe jê re natewîne. Her çiqasî neteweperestîya Şîî bi derew û durûtîyê, dijminatîya Israîl, Emrîka û Rojavayîyê bi kar bîne; ew ê nikaribe lêgerîn û hêvîyên gelên Îranê ji bo nûjenîya guncaw bi demeke dirêj, rawestîne. Ne wilo tenê, ew çiqasî bazarganîyê bi Emrîka û Iraîlê bike jî, lê ew nikare helwestên xwe yên rûpoşkirî di der barê wan lêgerîn û hêvîyên wan gelan de biparêze. Ji ber ku lêgerîna rastîyê di çanda Îranî de, çespandî ye. Her wiha kevneşopiyeke jîyaneke komonal a Îranê, bi qasî kevinbûna dîrokê, kevnar e. Li gorî wê dibe ku di pêşeroja Îranê ya nêzîk de em şerkî nûjenîyê, bibînin. Jixwe di rastîya xwe de şoreşa Îranê ya sala 1979`an de, şerê nûjenîyê bû, lê hate zîvirandin. . .** "

[1] Hêzên Ramyarî yên Civaka Îranê – Navenda Misrî ya Lêkolînan

[2] Manîfisto Şaristaniya Demokratîk, bergê 5, Pirsgirêka Kurdî û Çareseriya Neteweya Demokratîk (Parastina Kurdên ku di nav qirqirên de mane), Abdullah Ocalan.




*[3]nexşeya belavbûna nijadî ya îranê. hin ragihandina wan herêman daxwaza ji îranê qut bibin an jî xweseriyekê*

Vê rewşa heyî gelek rêxistinên sîyasî û leşkerî yên rikberîyê, derxist holê, hin ji wan berî şoreşa Islamî bi serkêşîya Xumeynî, hebûn û weke tê xwestin piştgirîya wê girtin. Lê Pergala Wîlayetûlfeqîh ew pêşhuhê kirin. Ev rêxistin bi idyolojîyên xwe cur bi cur in ku çepgir, olî, neteweyî û zaistîtîyê hene. Ev jî dibe sedem ku yekîtî û hevsengî di navbera wae de çênebe, ji ber ku her yek ji wan dixwaze ser bi xwe be. Hin ji van rêxistinan ev in:

**1) Der barê Farisan de:**

**Rêxistina "Mucahidî Xelq":**

Rêxistina "Mucahidî Xelq": Xwedî hizreke Islamî û çepgirî ye. Çalakvana sîyasî "Meryem Recoyî" dijbera rêjîma "Şah", a niha serkêşîya wê dike. Di sala 1965an de hat avakirin. Ev rêxistin bi van tiştan bang dike: cudakirina olê ji dewletê ew jî di çarçoveya dewleta Îranî ya Şîî de, çakkirina têkilîyan bi dewletên Rojava re, hildana ala Îranî ya ku diruşmeya "Şêr û roj"ê li ser e. Vê rêxistinê alîkarî pêşkêş kir ji bo ku rêjîma şah hilweşîne, her wiha piştî ragihandina rîjîma Wîlayetûlfeqîh xwe ji şoreşa Islamî veqetand. Jixwe

[3] https://twitter. com/syria_gid/status/231176331893817344

encam ew bû ku dijberî li ser desthilatdarîyê derket û banga hilweşîna wê kirin, her wiha ji bo vê yekê jî xwepêşandanên gelêrî derketin û hatin binpêkirin. Çend operasyonên leşkerî yên gerîlayî li dijî hêzên leşkerî û ewlehî yên Îranî hatin pêkanîn, reşkujîyê der heqê çend zanyarên Îranî yên ku di warê wizeya navokî de û ji bo berjewendîyên rêjîma Îranê kar dikirin pêk anîn. Jixwe ji ber ku dijminatî di navbera rêjîma Îraqî ya berê û rêjîma Îranê de hebû vê rêxistinê hin baregeh li Îraqê di dema "Sedam Hisên" de ji xwe re ava kiribûn. Piştî hilweşîna rêjîma Sedam di 2003yan de hêzên Şîî hikûmeta Îraqî neçar kir ku wê rêxistinê ji erda xwe derêxe. Rêxistinê kongira xwe ya salane di 2017an de li paytexta Ferensa Parîsê li dar xist. Hin kesayetên sîyasî yên navdar yên weke "Con Bolton" balyozê Emerîkî yê berê li Neteweyên Yekbûyî, her wiha serdarê Niyoyorkê yê berê û berbijarê serokatîya Emerîka "Rodî Cûlîyanî" û mîrê siûdî "Tirkî Elfêsel" serokê "Navenda Melek Fêsel a Lêkolînên Islamî" di vê kongirê de amade bûbûn.

**2) Der barê Beloçîyan[4] de:**

Hin tevgerên Beloçî yên çekdar derketin, ji bo cudabûna herêma Beloçistanê ji Îranê xwe çalak kir. Her wiha ji bo ku alîgiran ber bi xwe ve bikişîne, xwe sparte bîrdozîya mezhebî (Sunî)û neteweyî, hin ji van tevgeran ev in: rêxistina "Artêşa dadwer[5]", tevgera "Alîgirên Îranê", tevgera "Alîgirên Elfurqan[6]" û tevgera "Cunulah".

[4] Beloçî: hin nijad in li Pakistan, Îran, Uman, Îmarat û hwd ji zû de li wir hene. Bi zimanê xwe yê ku ji hin zimanên weke Hindî û Farisî têkil bûye cuda dibin, her wiha bi hin dabûnerîtên taybet jî cuda dibin. Ew di nava civakên weke civakên Xelîcî û Umanî de ku koçberî wan bûbûn hatin pişaftin.
[5] Artêşa Dadwer. Dengê Beloç-
http://soutelbalosh. com/tag
https://marefa. org/%D8%A8%D9%84%D9%88%D8%B4
[6] "Alîgirên Elfurqan" rêxistineke nû ye ku metirsiyê li ser Îranê li herêma Beloçistanê çêdike. Dergeha Tevgera Islamî- بوابة الحركة الإسلامية http://www. Islamist-movements. com/30123



صلاح الدين فاروقي

*"Artêşa Dadwer" grûpeke beloçî, Sunî û dijber e. Erda Pakistanê weke penageheke ji xwe re bi kar tîne. "Ebdilrehîm Mela Zada" yê ku bi navê "Selah Eldîn Farûqî" tê naskirin, ev artêş ava kir, ew jî piştî ku serkêşê tevgera "Cindulah" "Ebdilmelek Rîgî" hat kuştin û piştî ku xwe ji wê tevgerê veqetand. Armanca wê ya sereke parastina kêmneteweya "Beloç" û suneyan li herêma "Sîsesitan û Beloçistan"ê ye.*

*Tevgera Alîgirên Îranê: tevgereke Sunî ye. Di sala 2012-2013an de li herêmên "Sîsesitan û Beloçistan"hatiye avakirin. "Hişam Ezîzî" yê ku bi navê "Ebû Hifs Elbeloçî" tê naskirin û yê ku paşê hat kuştin, pêşengtîya wê dikir. Di sala 2013an de bi "partîya Elfurqan" re bû yek û tevgera "Alîgirên Elfurqan" ava kirin. Armanca wê ew e ku desteserîya rêjîma Îranê li ser herêma "Beloçistanê" bi dawî bike.*

*Tevgera "Alîgirên Elfurqan": Di sala 1995an de li herêma "Beloçistan"ê li ser destê "Elmewlewî Selahedîn" ji bo ku şerê hêzên Îranî bike, hat avakirin. Navê wê "Koma Elfurqan" bû, piştî ku bi tevgera "Alîgirên Elfurqan" re bû yek navê "Alîgirên Elfurqan" li xwe kir. Çend operasyonên leşkerî yên serkeftî li dijî Pasvanê Şoreşêyên Îranî pêk anî. Ew tevgereke mezhebî ye, li ser bingeha bêolkirina mezheba Şîî şer dike.*

*Tevgera "Cindulah": Piranîya endamên wê ji kêmnetewya Belûçistanê ne ya ku li herêmên "Sîsetan- Beloçistan"niştecî dibe, jixwe ew herêm li başûrê rojhilatî Îranê li ser sêgoşeya sînorê Efxanistan û Pakistanê dikeve. Di sala 2002yan de li ser destê oldarê Sunî "Ebdilmelek Elrîgî[7]" yê ku vê dawîyê hate bidarvekirin, hate avakirin. Vê tevgerê çend operasyonên leşkerî li dijî artêşa Îranê pêk anî, doza maf û azadîyên gelê Beloçî li "Beloçistan[8]"ê dike, her wiha daxwaza parvekirina dewlemendîyên herêmê bi awayekî wek hev, dike. Li ser lîsteya terorê ji hêla Emerîkayê ve hat curandin, ew jî ji ber têkilîyên wê yên bi rêxistina "Elqayide" û tevgera "Talîban re, her wiha ji ber ku çend teqîn li bajarê "Zahidan", Pakistan û li bajarê "Kiratçî" ya payetext ku sivîl di hundirê Îranê de armanc girtin çêbûn û çend teqînên din jî di salên 2009-2010an de rû dan.*

**3)Der barê Erebên herêma Ehwazê de[9]:**

Dijberîyên di navbera Erebên Ehwazê û hikûmetên ku dest danîn ser Îranê de, vedigere sala 1925an. Çend êrîşên leşkerî di navbera her duyan de derket. Piştî belavbûna ramanên neteweya Erebî di destpêka salên pêncî de, çend rêxistinên çekdar derketin, weke "Enîya Rizgarkirina Erebistanê, Enîya Gelêrî ya Rizgarkirina Ehwazê û Enîya Erebî ya Rizgarkirina Ehwazê". Paşê Şah karîbû bi alîkarîya Israîl û dewletên rojavayî hin ji wan têk bibe.

Çend komên sîyasî û leşkerî hatin avakirin, ji bo ku dijatîya rêjîma Îranê û şerê Pasvanê Şoreşêbikin da serxwebûna herêma Ehwazê bi dest bixin. Îran bi tundî li dijî wan sekinî. Jixwe çend tevgerên Ehwazî yên dijber ku xwedî

[7] Dema hewla da ku ber bi Qeqîzistanê ve biçe hat binçavkirin, ew jî çaxê ku balafira rahiştibûyê neçar ma ku li "Bender Ebas" li başûrê welêt dakeve.

[8] Herêma "Beloçistan"ê di sala 1928an de hat dagirkirin. Wê hingê melekê "Beloçistana Rojava" li ser destên dagirkerên Farisî di dema "Rîda Behlewî" de hat bidarvekirin. Pakistan, Efxanistan û Îran erda Beloçistanê parve kirine- Wekîpîdiya.

[9] Ehwaz an jî Erebistan: Paytext û navenda parêzgeha Xozesitanê ye. Li başûrê rojavayê Îranê dikeve. Piraniya niştecîyên wê Erebên sune ne.

bîrdozîne nijadî Erebî Sunî ne, ava bûn. Di hundirê herêmê de çalak e lewre jî berovajî rêjîma Îranê ye, armanca wê serxwebûna Ehwazê ye. Hin ji wan rêxistinan ev in:

▪Tabûrên Bazên Ehwazê: ev tevger di sala 2005an de ava bû. Hin operasyonên leşkerî li dijî hêzên Îranê pêk anîn[10].

▪Tevgera Berxwedana Erebî ji bo Rizgarkirina Ehwazê: Ev tevger di sala 1999an ji hêla girûpek ji Erebên Ehwazê yên ku li Ewropayê bi cî dibin, hat avakirin. Armanca wê avKirina dewleteke Erebî li Ehwazê ye. Di sala 2005an de vê tevgerê êrîşî hêzên Îranî kir. Serkêşê wê "Ehmed Mewla" di sala 2017an de li pêşîya mala xwe li bajarê "Lahayî" yê Holendî, bi çekeke bêdeng[11] rastî reşkujîyê hat, li vir saloxgerên Îranê hatin tawankirin.

▪Tabûrên Mihiyedîn Al Nasir: Baskê leşkerê yê tevgera Berxwedana Erebî ya Rizgarkirina Ehwazê ye.

▪Enîya Erebî ya rizgarkirina Ehwazê[12]: Di sala 1980î de hat avakirin.

▪Enîya Demokratîk ya Gelêrî ya Gelê Erebî yê Ehwazê: Di hundirê Ehwazê di sala 1990î de hat avakirin.

### 4) Der barê Çepgiran de:

Geşedaneke ramanên çepgeran di nav rêjeyeke baş ji pêkhateyên civaka îranê de heye. li Îranê Komunîst rastî tundiyekê ji hêla rêjîma Şah ve ya alîgira dewletên Rojava hat, lewma kesên komunîst li alîyê "Xumeynî sekinîn. Jixwe partîya "Tode[13]"roleke wê ya girîng di avakirina saloxger û ewlehîya Îranê de hebû, her wiha bi dehan dijber û paşmayên rêjîma Şah ji hêla wê ve hatin kuştin û binçavkirin, tevî wilo jî hişmendîya dogmatîka olî bi tundî hizira komunîstî red dike. Ji ber vê yekê çend operasyonên taybet ji bo vê partîyê û tevahîya çepgirên komunîstî bi taybet şaneyên leşkerî yên

[10] http://www. almoqawoma. org/about. php
[11] http://www. alquds. co. uk/?p=823078
[12] http://www. alahwazvoice. com/795/796
[13] Rikberiya Îranî û projeya guhertinê- Dr. Kerîm Ebdiyan Benî Seîd-Çalakvanekî mafparêz e û baladariyê dide dozên Îranê- Malpera Rojnamegeriya Rojhilata Navîn.
Pasvanên Şoreşgerî… çêbûn, avabûn û rola wê- Nuvîsîn: Kînît Katizman- Weşanxane: Navenda Îmaratê ya lêkolîn û lêgerînan.

girêdayî wê, pêk hatin, jixwe bi dehan endamên wê ber bi derve ve revîyan. Tişta ku bala mirov dikişîne ew e ku çepgira Îranî mîna çepgira Erebî ya klasîkî ye, di şerên xwînrijîyê de li alîyê rêjîma Sûrî û li dijî rikberîyê sekinî, piştgirîya destwerdana Rûsî û Îranî di Sûriyeyê de kir, her wiha xwe ji ramana hilweşandina rêjîma îranê dûrxist û banga çaksazkirina wê kir. Ew jî ji ber ku her du li dijî dewletên Rojava yên bi serkêşîya Emerîkayê diseknin û pirî caran helwesteke nerênî li dijî hin hêzên din ên rikber ên Îranî didin, ew jî bi bihaneya ku hêz û yekîtîya welat biparêze û nehêle ku şerê nijadî û tîreyî (tayifî) derkeve.

**5) Der barê Azerîyan de:**

25% ji miletê Îranê ji "Azerîyan" e. Gelek ji wan rastî cudakirinê tên, tevî vê yekê jî hêj tu tevgerên Azerî yên çekdar li dijî rêjîma Wîlayetûlfeqîh derneketine. Lê belê rikberiyeke wê ya sîyasî heye ku Îran wê bi alîgirîya Ezrebîcana Rojhilat[14] bi serkêşîya "Ilham Heyder Elîf" tawan dike. Li vir têkilîyên nearam di navbera Îran û Ezrebîcana Rojhilat de derketine, ew jî piştî ku hin deng li Îranê banga tevlîkirina komara Ezrebîcanê ya ku piranîya xelkê wê li ser mezheba Dozdehîmamî ne, ber bi Îranê ve kir. Li aliyekî din hin deng banga tevlîkirina herêma Ezrebîcana Rojava ber bi Ezrebîcana Rojhilat ve dikin. Jixwe tevlî van jî Îran ji desthilatdarîya Emerîkî û Israîlî ya mezin li Ezrebîcanê hêrs bûye, her wiha Îran hewl dide ku borîyên veguhestina gaza Turkmenistanê di erda xwe re ber bi Ewropayê ve bibe.

**6) Der barê Kurdan de:**

Têkilîyên Kurdî Farisî rastî gelek astengîyên ku ji sedê salan ve hene, tê. Doza Kurdî li Îranê pirsgirêkeke herî mezin li hundirê çêdike. Tevî rola şaristanî ya Kurdan di dîroka Îranê de û piştgirîya wan ji Şoreşa Islamî ya li dijî Şah, rêjîma Îranê hewl dide ku bi şêweyê leşkerî û ewlehî wê pirsgirêkê çareser bike. Îran hewl dide ku çîna Borciwazî, fewdalî û olî ya Kurdî bi ber xwe ve bikşîne, ji bo ku doza Kurdî di rêya van çînan re dorpêç bike. Lê têgihiştina sîyasî ya tevahîya Kurdan nahêle ku ev yek pêk were. Di beşa çaremîn de dê li ser doza Kurdî li Îranê axaftin çêbe.

[14] Têkiliyên Tirkî Îranî li Rojhilata navîn hatine guhertin- F. Stephen Larrabee, Alireza Nader- peymangeha lêkoînan RAND a berevaniya niştimanî (Ji bo encûmena niştimanî ya saloxgeriyê hat amadekirin).

**Beşa Sêyemîn**

**Îran Û Mafên Mirovan**

**Tomara mafên mirovan li komara Îranê ya Islamê:**

Demokrasîya mezhebî, destgirtina biryara serwerîyê, çewisandina rikberîya sîyasî, girêdana azadîya ragihandin, nêrîn û weşanê, arastekirina budceya dewletê û dewlemendîyên niştimanî ber bi rajekirina (xizmet) pirojeyên leşkerî û planên firehbûn û belavkirinê, komploya li ser dewlet û civakên din; Ev hemû bandoreke neyînî li ser rewşa jîyanî ya hudirîn û azadîya giştî ya li Îranê kir, ji ber ku çi tevgera ku daxwaza çaksazî yan guhertina pergalaWîlayetûlfeqîh kir, tê çewisandin. Li kêleka wê jî gelek rewş hene ku zagona sizayî bi rengekî dogmayî û li gorî Misilmantîyê hatin pêkanîn. Li gorî wê gelek kes rastî recimandin, celidandin, destjêkirin û kuştina zarokan hatin. Tevî ku ev siza bi rengekî fermî hat rakirin, lê belê heya niha jî ev kiryar berdewam in, her wiha pênase bi mafên neteweyên din ên ne farisî (Kurd, Ereb, Bilûş, Turkmen û Azerî) nedihate kirin. Bi vî rengî her dem mafên mirovan û rêgezên demokratîk tên binpêkirin. Ev yek jî bandoreke mezin li ser hêzên nerm ên Îranê kir. Gelek rapor ji hêla rêxistinên navneteweyî yên mafên mirovan derketine ku pergala Îranê tawanbar dikin, ji ber binpêkirina rêzik û biryarên navneteweyî yên ku ji bo parastina mafên mirovan hatine nivîsandin. Îran bû sedema gurkirina kêferatên herêmê û bi sed hezaran kes zirar ji vê sîyasetê dît.





Di sala 2008'an de sekretêrê giştî yê Neteweyên Yekbûyî " Ban Kî Mon" bal kişand ser raporên berdewam yên girêdayî binçavkirinên nerewayî, desteserkirina mal û milkan, qedexekirina kar û takemafên hukûmî, bidetxistina perwerdeya bilind li Îranê û zêdebûna bidarvekirinan. Ji ber vê yekê nerazîbûna xwe ji bo mafên jin û gelên Îranê, recm û sizaya bidarvekirinê ya ku li ser zarokan pêk dihat, anî ziman.

Di roja 14-3-2014 "Ehmed Şehîd"[15] li ser rewşa Îranê rpora xwe radestî Komeleya Mafên Mirovan kir û ragihand ku hikûmeta Îranê pabendî ji bo sozên xwe der barê xurtkirina rêzgirtina mafên mirovan nekiriye, ji ber ku gelek binpêkirin mîna cîyawazî, tengavkirina azadîya derbirînê, kombûn, damezirandina partîyên sîyasî û komeleyan, hatine kirin. Ehmed Şehîd di komisyona mafên mirovan[16] de got**: "Tevî ku hewldanên biçûk li Îranê ber bi çaksazîyê ve hene, lê belê rewşa mafên mirovan hê di cihê metirsiyeke mezin de ye. Her wiha bi sedan girtî di zindanan de hene, piranîya sûcan ji ber sedemên azadîya derbirînê yan jî bawerîyê ne. Dîsa jî Kêmanîya regezî, olî û niştimanî rastî çewisandin û tengavîkirinê tên, ji ber parastina wan ji mafên komê, kelepora civakê û mafê perestinê re.** Ehmed Şehîd di rapora xwe ya 2012'an[17] de destnîşan kir ku di sala 2011'an de desthilata Îranê bêhtirî 600 kesî bê darizandineke dadmend bi dar ve kirine. Her wiha azadîya çapemanîyê tê tengavkirin û bêhtirî 42 rojnamevan hatin binçavkirin, girtî radestî êşkenceyê tên û girtin û sizakirina parêzvanên mafên mirovan li Îranê berdewam e.

Rêxistina "Human Rights Watch" di raporeke bi navê **"Îran û Bûyerên 2016'an"** [18] destnîşan kir ku serokê Îranê Hesen Rûhanî pabendî bi rêzgirtineke mezintir ji bo mafên sivîl û sîyasî nekir. Her wiha alîyên tunderew di desteserkirina ser dezgehên ewlehî û dozgerî ji bo çewisandina welatîyan hê berdewam in, her wiha bidarvekirin, êşkence û kiryarên

---

[15] Rayedarê taybet ê ku erkê rewşa mafên mirovan li Îranê radiibe û ji hêla netewên yekbûyî hatiye erkdarkirin.

[16] Pisporekî navneteweyî metirsiya xwe derbarê rewşa mafên mirovan li Îranê – malpera netewên yekbûyî.

[17] Pisporekî navnetweyî li ser binpêkirinên mafên mirovan yên li Îranê diaxive – malpera nerewên yekbûyî.

[18] Bûyerên Îranê yên 2016'an - https://www. hrw. org/ar/world-report/2017/country-chapters/298368.

bêsincî jî berdewam in. Rapor wiha dibêje: " **Tevî ku di mehên pêşîn ên sala 2016'an de der barê bidarvekirinan de kêmbûneke hindik hatiye dîtin, lê belê heya 25'ê cotmehê herî kêm 203 kes hatin bi darve kirin…. . Zagona Îranî bi sûcine ne tund mîna: heqaretkirina pêxember, terkedîn, hemzayendbazî û sûcên hişbirê, sizaya bidarvekirinê pêk tîne. Di 2'yê tebaxê de desthilata Îranê ragihand ku di bin sûcê tevlîbûna li girûpeke ku wê weke terorê dibîne ku " dijminatîya Xwedê dikin " 20 kes hatine bidarvekirin. Rêxistin mafên mirovan dibînin ku 33 Kurdên Sinî ku di salên 2009 – 2010 hatin girtin, piştî ku wan di zindanan êşkence kir, cezaya bidarvekirinê li wan birî. Di tebaxê de Îran 3 welatîyên Ereb ji Xûzistanê bi sûcên derewîn ku teror in bi darve kir. Îran di sala 2016'an de di kuştina zarokan de berdewam bû. . . Di adarê de " Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya Mafên Zarokan " dîyar kir ku heya niha celda zarokên sûcdar ên nêr û mê sizayeke zagonî ye. . . Hinek navgînên ragihandinê dîyar kir ku di 25'ê gulanê de desthilata Îranê 17 zarok ji Azerbîcanê piştî ku xwedanên karên wan ew kişandin dozgerîyê, celid kir. Ji ber şermezarkirina wan ji qewitandina hevkarên xwe di kar, ew zarok di encama dozgerîyê de hatin celdkirin".** Her wiha dadgeh ne dadmend in, nêzîkatîya ji girtîyan re ne baş e, pûtepêdana (ihtîmam) tenduristî têrê nake, tengavkirina mafê derbirînê û zexta li ser mafnas û girtîyên sîyasî berdewam e. Derbarê mafê jinê de, rapor destnîşan kir ku cudahîkirineke bi zanebûn dijî wan heye, di raporê de ev yek hate ser ziman: " **Jinên Îranê di warê rewşên kesayetî yên girêdayî zewac, berdan, mirasê û di mafê xwedîkirina zarokan de, rastî cudabûnê tên**. Ji bo zewacê pêwîstîya jina Îranî bi erêkirina xwedanê wê heye bêyî ku temenê wê di ber çavan re bê derbaskirin. Her wiha nabe regeznameya xwe bide hevjîn û zarokên xwe yên ku li derve ji dayîk bûne. Bêyî erêkirineke nivîskî ji hevjînê xwe nabe jin guzernameyê bi dest bixe yan jî biçe derveyî Îranê. Derbarê kêmjimaran de " **Hikûmet, Behaîyan ji mafê olî mehrûm dike û cudabûnê dijî wan pêk tîne. . . her wiha hîn jî hêzên ewlehîyê Misilmanên ku veguherîne ola xiristîyanî armanc digirin, dîsa heman tiştî dijî endamên Tevgera " Dêra Malê" yên ku li malên xwe kom dibin û nimêj dikin, pêk tînin. Di tebaxê de hinek rûspîyên herêmên Kurdî yên Sinî ji bo lêpirsînê hatin xwestin, ji ber ku bidarvekirina herî kêm 20 kesan di 2'yê tebaxê de, rexne kiribûn. Hikûmet çalakîyên kêmneteweyên Azerî, Kurd, Ereb û Bilûşan ên çandî û sîyasî, tengav kir. Lê belê di tebaxê**

**de rê dan ku xwendekarên beşdarên ezmûna girêdayî derbasbûna zanîngehên Îranê ku zimanê Kurdî yan jî tirkî weke beşên bakaloryosê, bibijêrin".**

Konseya Ewlehîya Navneteweyî di rapora xwe de " Îran 2016/2017 "[19] de destnîşan kir ku: **"Desthilata Îranê bi tundî mafê derbirînê, avakirin û tevlîbûna komeleyan, azadîya kombûna aştîyane û bawerîyên olî, çewisand. Kesên rexnedar ên aştîxwaz û yên di rêza wan de bêyî darizandinên dadmend û bi rîya "dadgehên şoreşgerî" re bin çav dikirin û digirtin. Êşkence û rêbazên din ji nêzkatîyên pîs ji gitîyan re bi rengekî berfireh belav bibûn, sûcdarên van kiryaran bê siza diman. Pêkanîn sizaya celd, pîjêkirin û hinek sizayên din ên tund, berdewam kir. Kêmanîya olî û rgezî rastî cudakirin û çewisandinê tên. Sizaya bidarvekirinê bi berfirehî belav bû. Di encamê de bi sedan hukmên bidarvekirinê pêk hatin, hink ji wan ber çavên girseya gel dihatin kirin. Herî kêm du sûcdarên zarok hatin bidarvekirin. . . "Komîteya Navneteweyî ya Mafên Zarokan" pêşandan xwe ya asayî ya sêyemîn û çaremîn ya girêdayî tomarnameya Îranê di warê mafên miroan de, pêk anî, tê de berdewamkirina kiryarên bidarvekirina sûcdarên zarok û bandorên wê li ser saxlemîya mêjîyê zarokên ku bidarvekirinan vekirî dibînin, rexne kir. Her wiha Komîte zayendperestîya dijî jin, zarokên kêmjimarên olî, regezî, zarokên hemzayenbaz, duzayend, zayendguhêr û ducureyan, rexne kir. . . Desthilat azadîya derbirînê, kombûnên aştîyane û sazkirin û tevlîbûna li komeleyan, çewisand. Her wiha bê bihane rexnedarên aştîperwer bin çav dikirin û bi tawanên veşartî ku girêdayî ewlehîya neteweyî dihatin girtin. . . Her wiha desthilat zext li ser derbirîna mûzîkê jî zêde kir. Hinek pêşandanên mûzîkê betal kirin û hineke din jî bi hêzê rawestandin, tevî ku hink ji wan pêşandanan rêdan ji hêla "Wezareta Çand û Rêdarîya Islamê ve" bi dest xistibûn. Hinek şahîyên taybet ên di nav hev de, ji ber "bandorên wê ên civakî yên bizîyan hene" yan jî "dijî olê ne" dihatin dîtin, hatin çewisandin. Di encamê de bi sedan kes hatin girtin û hikmê celdê li hinekan hate birîn. . . Desthilat çavdêrîya xwe li ser hemû navgînên ragihendinê berdewam kir, kenalên televîzyonê yên bîyanî tengav kir,**

[19] Îran 2016/2017 – Rêxistina lêborîna Navneteweyî
https://www. amnesty. org/ar/countries/middle-east-and-north-africa/iran/report-iran/

**hinek rojname weke "Bihar" û "Qanûn" hatin girtin û weşana wan hate rwestandin, her wiha kovara mafê jinê "Jinan Imroz" neçar ma ku weşana xwe rawestîne. . . Her wiha desthilat çewisandina xwepêşandanên aştîdar berdewam kir. Li xwepêşandêran dixe û bê ser û ber tên girtin. Gelek kes ji ber beşdarbûna nava xwepêşandanên aştîdar bi tawanên"komploçêkirina dijî ewlehîya neteweyî", dihatin tawanbarkirin. . . êşkence û nêzîkatîyên ne baş hîn jî belavkirî ye, bi taybet di dema lêpirsînê de. Aramanca êşkenceyê mikurhatin bû. Girtîyên di "Wezareta Saloxgêrîyê û Pasvanên Şoreşgerî" bi rengekî rotînî demeke dirêj derbasî zindanên kit dihatin kirin, ev yek digihêje asta êşkenceyê. . . Desthilatên dadê sizayên tund û ne mirovî ku digihêjin asta êşkenceyê berdewam dikir mîna celd, çavteqandin û pîjêkirinan. Hinek ji van sizayan li ber çavan pêk dihatin. Biryarên dadgehehan bi giştî ne dadmend bûn, ji ber ku desthilata dadê ne serbixwe bû. Hêzên ewlehîyê û saloxgêrî zext li ser "dadgehên girêdayî oldaran" "dadgehên şoreşê" dikirin, da ku sizayên giran li tawanbaran bibirin. . . Kêmjimarên olî mîna Behayî, Sofî, Yarsanî, ku veguherîn xirîstîyanîyê û li kêleka wa jî Misilmanên sinî, rastî cudakirineke zagonî û pratîkî hatin, bi taybetî di warê fêrkarî, peywir û mîrasê de cudahî dihat kirin. Her wiha ji ber pêkanîna rêûrismên xwe yên olî hatin çewisandin. . . Kêmjimarên weke Ereb, Ehwazî, Tirk, Azerî, Bilûş, Kurd û Tikmen, bi sedema cudakirina kûr, tengavkirina derfetên kar û niştecîbûna guncav, ne bidestxistina peywiran û ne pêkanîna mafên çandî, sivîlî û sîyasî, gelek êş kişandin. Guhnedana desthilatê ya li ser aborîya kêmjimaran, hişt ku xizanî û piştguhkirina kêmneteweyan zêde bibe. Desthilat pêngava xwe ya çewisandina dijî femenîstan nû kirin, pêşgevîyên komî yên girêdayî jinê weke çalakîyên gunehkarî dihatin nasîn. Pasvanê Şoreşêçalakvanên mafnas ên jinê ên ku kampanîya nûnertîya jinê di hilbijartinên perlemanî de sibatê de li dar xistin, lêpirsînên dirêj û çewsandin der heqê wan de hate kirin, her wiha bi zindankirinê dihatin gefkirin bi bihaneyên girêdayî ewlehîya neteweyî. Desthilata Îranê bikaranîna sizaya bidarvekirinê bi rengekî berfireh berdewam dikir û ev yek li ser zarokan jî pêk dihat. Ji ber vê yekê bi sedan sizayên bidarvekirinê yên bêbahane pêk hatin û hinek ji wan bi rengekî vekirî pêk hatin. Piranîya kesên ku hatine bidarvekirin, ji ber sûcên**

**girêdayî hişbiran bûn û li gorî zagona navneteweyî ya mafên mirovan, ew sûc ne digihiştin asta "sûcên herî dijwar".**

Di paneleke ku Navenda Cinêvê ya Navneteweyî ya Dadwerîyê hatibû organîzekirin de, beşdaran belge û lêkolînên ku mafên gelên ne faris[20] bi rengekî metirsîdar têne binpêkirin, pêşkş kirin. Her wiha bi sedan rewşine din wiha hene, ev zêdegavî riwê rast yê domokrasîya Îranê û pergalaWîlayetûlfeqîh , dîyar dike. Îran kesê din tune dike û ev yek dijî angaştên Îranê ye ku dibêje ew bindestên cîhanê diparêze li gorî benda 38'an ji makezagona Îranê: "**Hemû cureyên êşkencekirinê ji bo mikurhatinê an jî bidestxistina agahîyan qadexe ne. Nabe di bin zextê de guwahî yan jî sond xwarin werin kirin, di weke van rewşan de guwahî û sond nayên pejirandin. Kesê ku vê bendê pêk neyine li gorî zagona tê sizakirin.** Di benda 39'an de ev yek hatiye ziman **"Binpêkirina rûmet û şerefa kesê girtî, binçavkirî yan jî li gorî zagonê dûrxistî, qedexe ye, kesê ku vê yekê pêk neyine hêjayî sizakirinê ye. "**

Ji ber pergala etnîk û stemkar, civaka Îranê zehmetîyê di windabûna nasnameya niştimanî de dibîne. Wîlayetûlfeqîh bi gotinên xwe nake. Di benda 154'an de ev yek hatiye nîşankirin: **"Armanca sereke ya Komara Islamî ya Îranê, kêfxweşîya mirovan di civaka mirovahîyê de ye, her wiha azadî, avakirina hikûmeta maf û dadmendîyê mafê her kesên cîhanê ye. Ji ber vê yekê Komara Islamî ya Îranê di hemû cîhanê de, parastina berxwedana rewa ya bindestan ya dijî serdestan dike. Di heman demê de destwerdanê di karûbarên hundirîn ên gelên din de nake. "**

Lê belê rastî dûrî vê tezê ye, ji ber ku pergala Îranê piştgirîya pergal û heyînên zordest dike û ji ber destwerdanên di karûbarên gelên din de, gelek bobelat û felaketên bêjimar çêbûn. Ev jî li kiryarên pergalên serdest yên dijî gelê xwe tê zêdekirin.

---

[20] -Dewreya 36'an: Dozên mafên mirovan yên lezgîn, binpêkirinên mafên gelên ne Faris ji hêla Îranê ve -http://www. gicj. org

## Beşa Çaremîn

## Îran û Doza Kurdî

### Kurdên Îranê û Rojhilatê Kurdistanê[21]

Erdnîgarîya Kurdistanê bi giştî di navbera sê dewletan de tê belavkirin. Ew jî ev in: Iraq, Îran, Tirkî û Sûrîyê ne. Lê belê hejmareke Kurd li hinek welatên ku piştî hilweşandina Yekîtîya Sovyêtê ava bûne (Ermînîya, Azerbêcan), hene. Lê belê hejmara Kurdan li gorî texmîneke tam nayê dîyarkirin. Hejmara Kurdan di navbera 35 – 40 milyonan de ye. Li gorî hejmara giştî ya Kurdan, rêjeya belavbûna Kurdan wiha ye: %46 li Tirkîyê, %31 li Îranê, %18 li Iraqê û %5 li sûrîyê ne. Ev rêje li nexşeya li jêr dîyar e.

Ji alîyê mejara lêkolîna me ya Îranê, tevî ku amarên fermî tune ne jî, lê belê li gorî hejmara Kurdan piştî Faris û Azerîyan, pêkhateya sêyemîn e. Her wiha amarên tekûz a rêjeya Kurdan li Îranê nîn in, lê gelek jêder dibêjin ku rêjeya Kurdên Rojhilatê Kurdistanê – rojavayê Îranê li parêzgehên Azerbêcana rojava, Kurdistan, Loristan, Kirmanşah, Îlam û Hemedanê %16 ji hejmara giştî ya Îranê[22] ye, ango serjimêra Kurdan nêzê 12 800 000 kesî ye.

---

[21] Ismayîl Bişîkçî, Kurdistan mitîngeheke navneteweyî ye. Werger Zuhêr Ebdilmelik. Weşanxaneya APEC 1998 Z.
Mihemed Ihsan, Kurdistan û avgera şer, weşanxaneya El-Hikme, London, 2000 Z.
Kurd û riyên dîrokê yên bikelem, Sereraskirina hevdîtina Mekî, Tora El- Cezîra, 2006 Z.
Dêvêd Mekdiwêl, Dîroka Nûjen a Kurdan, werger Rajal Mehemed. Weşanxaneya El-Farabî, Beryrût, 2004 Z.
Serdana Kratçî, Îran şoreşeke di vejînê de ye, Pakistan, 2000 Z.
Wîkîpedya ferenamya cîhanî ya azad (Ingilîzî û Kurdî).
http://almezmaah. com/
www. moqatel. com
http://www. aljazeera. net

[22] IRAN: Human Rights Abuses Against The Kurdish Minority . https://www. crin. org/en/docs/mde130882008eng. pdf
The CIA World Factbook 2016
Iranian People: Iranian Ethnic GroupsVahidRashidvash Department of Iranian Studies. Yerevan State University
Yerevan, Armenia
Largest Ethnic Groups In Iran-https://www. worldatlas. com/articles/largest-ethnic-groups-in-iran. html
The Kurdish population-http://www. institutKurde. org

Hejmara giştî Kurdên Îranê digihîje 14 milyonan (tevî Kurdên herêmên dûrî herêmên Rojhilatê Kurdistanê weke Xurasana Bakur û Bextîyarî). Bi giştî Kurd li herêma Rojhilatê Rêzeçeîyayên Zagrosê ya li seranserî xeta sînorê bi Tirkî û Iraqê re bi cih dibin ku hemsîyên Kurdên her du dewletan in. .




*Herêmên Îranê yên ku piranîya wan Kurd in*

Piranîya Kurdên Îranê Sunî û Elewî (Yasranî, Elî Îlahî weke Kurdên Lor û Bextîyarî) ne, her wiha komên olî mîna Begdaşî, Qadirî û Neqişbendî) jî hene. Ji ber ku mezheba fermî ya desthilata Îranê Şîî ye, rêjeyeke mezin ji Kurdan bûn Şîî. Piranîya Kurdên Kirmanşahê tevlî mezheba Şîî ya Dozdehîmamî bûn, her wiha Kurdên Yarasî Yên Elewî tevlî wan bûn, bi hezaran Kurd beşdarî werzê Heca Şîen dibin û ji Rojhilatê Kurdistanê di rîya Xaniqîn û Qesrî Şêrîn re berê xwe didin Necef û Kerbelaya pîroz. Hinek ji Hecîyan darbestên mirîyên xwe jî bi xwe re tînin hecê. Ev yek hişkbûna olî li cem hinek Kurdan tekez dike, ev yek rê dide saloxgêrîya Îranê ku di bin bahaneyên sîyasî, olî yan jî bazirganî, derbasî nava civakên Kurdan ên dewletên din bibe. Ev pirsgirêk di derbarê pênasekirin û xurtkirina nasnameya neteweyî de, giranîyê li ser welatparêzan çêdike. Di Şerê Kendavê yê duyemîn ê di navbera Iraq û Îranê de, Ev Kurdên Şîî yên hişk ji bo parastina Îranê berxwedaneke mezin nîşan dan. Bîrdozîya Neteweya Demokratîk ji bo nermkirina hişmendîyên hişk, dogmatîk, olperest û şofînîst nimûneyeke pir baş e.

Di Şerê Çaldîranê yê di 23'yê Tebaxa 1514'an de piranîya Kurdên Sunî li dijî Artêşa Sefewî bi Osmanîyan şer kir, ji ber vê yekê Osmanî bi ser ketin. Ramangerê navneteweyî Ebdela Ocalan di vê derbarê de[23] wiha dibêje: "Di Şerê Çaldîranê (1514'an) yê li dijî berfirehbûna Şhinşahîya binemala Sefewî ya Îranê de, hejmara mîrnişîn û êlên Kurdan ji ya yenîçerîyên artêşa Sultan Yawoz Selîm gelektir bû. Di encamê de hevpeymana Osmanî – Kurdî bi ser ket. . . . ". Ji ber vê yekê Şah Ismayîl heya şenekirina peymana Qesra Şêrîn (1639Z, bi farisî Ehdnamehzab e), dijminayîya Kurdan dikir. Di Peymana Qesra Şêrîn de sînorê di navbera her du dewletan de dîyar bû. Di encamê de parçeyê Rojhilatê Kurdistanê ji parçeyên din hate qutkirin. Tevî vê peymanê û hewildana kontrolkirina sînoran jî, mîrên Kurdan pabendî bi vê peymanê re nedikirin û mîrnişînin ku sînor derbas, ava dikirin.

Dema ku Şoreşa Îranê ya Islamî (1979Z) rabû, Kurd jî beşdarî wê bûn. Ji ber ku dixwestin hin takemafan (herî kêm rêveberiyeke xweser) bi dest bixin, lê belê desthilata Îranê ev yek qet nepejirand, her wiha Îran nehişt ku Kurd beşdarî nivîsandina destûra komara avabûyî bibin û dît ku rengê olî ji bo komara Îranê ya Islamî armancên hemû neteweyên din jî pêk tîne.

Tevî ku bendê 15'an ji beşa duyemîn dibêje ku mafê her gelî heye ku di warên çand û perwerdeyê de zimanê xwe bi kar bîne, Kurdên Îranê li ser destê desthilata Îranê rastî zordestiyeke birêxistinkirî tên, ji ber ku perwerdeya bi zimanê Kurdî li dibistanan qedexe ye, Kurd astengîyê di belavkirina wêjeya Kurdî de dibînin û di bin serpereştîya saloxgêrîyê de tê weşandin. Her wiha tevî ku benda 19'em ji beşa sêyem ji destûra dibêje ku nabe cudahî di warê regezî de di navbera îranîyan de hebe, Kurd rastî cudahiyeke di warê derfetên kar û pejirandina di zanîngehan de dibin, kesên ku şûnkarên bilind di herêmên Kurdî de digirin ne Kurd in û ji kêmneteweyên din in û ji hêla geşedan, û amadekirinê ve herêmên Kurdî yên herî kêm in, lê bêkarî herî pir e.

[23] Manîfistoya Şaristaniya Dimokratîk, parêznameya 5'emîn, Doza Kurdî û çareseriya Neteweya Demokratîk (Parastina Kurdên di nava her du erzîngên qirkirina çandî de). R115 Ebdela Ocalan.
(protokola şanekirî ya di navbera Sultan Yawoz Selîm û bîst û heşt begên Kurd li Amasyayê), heman jêdera.

Pergala Îranî astengîyê li hemberî sazkirina patîyên Kurdî çêdike, her wiha ev pergal siyseta farisîkrinê li ser Kurdan dimeşand, lê belê ji ber ku faris xwe kêmnetewe dibînin û pirrengîya neteweyî ya civaka Îranî, ev sîyaset baş bi ser neket. Dewleta navendî ne pir xurt bû û nikarîbû sîyaseta farisîkirinê bide rûniştandin, ji ber vê yekê her dem Kurd çek ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî û demokrasî çek bi kar dianîn, di encamê de nepejrandina mafên Kurdan nepêkan bû.

Jêderên dîrokî destnîşan dikin ku Kurd gelek caran beşdarî dîroka Îranê ya sîyasî û leşkerî ya kevn û nû bûne. Tê zanîn ku neteweya Kurdî ji yekbûna êlên Arî û êlên ku di rêzeçîyayên rojavayê Zozana Îranê de dijîn, pêk tên. Di sedsala heftan a berî zayînê de Medî serwerîya herêma farisan dikir. Doktor Hesen Kerîm Caf[24] di derbarê gelê Kardox de wiha dibêje:

"...dibe ku gelê Kardox hatibe Kurdistanê û lê rûniştibe. Ew jî di dema hatina Medî û Farisan de yan jî piştî wê bû (Di nava sedsala heftan a berî zayînê de) piştre êlên Kurdistanê tevlî hev bûn. Dibetiyeke mezin heye ku beşek ji vî gelî berê xwe da Zozana Îranê û li wê derê bi cih bû. Hebûna êlên Kurdan mezin ya di serdema Sasanîyan de vê yekê piştrast dike. Sir Sedensmith jî di vê derbarê de dibêje ku ev êlên Kurdan xwedî zimanekî taybet û ji zimanê farisan tam cuda bû, ji ber ku ew ji farisan kevntir in. . . "

Tevî ku regeza Faris û Kurdî arî ne, lê belê gelek têkilîyên û nakokî di navbera wan de çêdibûne, ji ber Kurd di avakirina pergalên desthilatê yên li ser xaka Îranê de roleke mezin lîstiye. Weke; di sala 1750`î de Kerîm Xan ê Kurd ê ji êla Zendê serokê desthilata Îranê bû. Kerîm Xan di çespandina aramî û xweşguzarîyê de bi ser ket. Di dema serwerîya wî de çandinî, bazirganî û pîşesazî pêş ket, bacên ser milên şênîyan hatin kêmkirin, her wiha têkilîyên bazirganîyê yên di navbera dewleta Hind û Zendî de pêşketî bûn û Kerîm Xan dahata bacan kontrol kir û pergala avdanê jî pêş xist. Kerîm Xan di dema serwerîya xwe de guh da bi paytexta xwe Şîraz. Wî paytexta xwe parast û xemiland û kel, qesr, gulistan û cihên giştî li dora wê ava kir, her wiha paytexta xwe kir navendeke girîng a çandê. Kerîm Xan mezargeha her du helbestvanên navdar Sadî û Hafiz ên ku li gundewarên

[24] Insîklopedya dîroka siyasî ya Îranê (ji dîroka efsaneyî heya dawiya dewleta Tahirî) – pirtûka yekemîn. D. Hesen Kerîm El-Caf

Şîrazê hativbûn veşartin nû kirin. Serwerîya Kerîm Xan 28 salan dirêj kir. Kerîm Xan di sala 1779`an de çû ser dilovanîya xwe û li Bajarê Şîrazê hate veşartin. Piştre gelek alî li ser text pev ketin û tevlihevî çêbû. Şer di navbera Sadiq Xan (birayê Kerîm Xan) û Zekî Xan yê ku dest danî ser text, çêbû. Di encamê de Qacarî bi fermandarîya Axa Mihemed Xan di şerê 1794'an de Dawî li Dewleta Zendî anîn û Dewleta Qacarî di dehsala duyem a sedsala bîstan de hate avakirin, piştre serwerîya dewleta Behlewî hat.

Li hemberî wê jî helwesta Faris û pergalên heyî derbarê serhildanên Kurdan neyînî bû. Her wiha sîyaseta fariskirinê didan meşandin, çand û rola wan a dîrokî ya li herêmê wenda dikirin, destkeftîyên şaristanî û leşkerî yên Kurdan digirtin ser Farisan, ev yek weke dizîna dîroka gelekî kevnare tê nirxandin (Bi taybet di sedsala bîstan de û destpêka sedsala 21'an de ev kiryar li pêş bûn, ji ber ku lêkolînên cur bi cur di demê de pêş ketibûn). Ji ber ku Kurd xwe bi mesilmantîyê girtibûn û têkilîyên Şah bi Emerîka, Firansa, Birîtanyayê re xurt bûn; rojhilatnas şaristanîya Îranê kirin malê Farisan.

Gelek Şîe bi nerîneke nerênî li Kurdan dinêrin. Di çîrokên xwe de dibêjin ku Kurd bi Israyîlê ve girêdayî ne û pilanan li dijî Îranê çêdikin. Hinek çîrok ji oldarên wan li ser zimanê Îmam Elî Binebîtalib, Îmamê şeşemîn Cafer Elsadiq û Îmamê 12`em Mihdî derdikevin (Ev çîrok xwe naspêrin tu bingehê) ku divê têkilî bi Kurdan re were qutkirin, şû (zewac) û bazirganî bi wan re neyê kirin. Gelek hedîs[25] bi vê yekê hene, lê oldarên mezin ên Şîî ew

[25] Elkelbî di pirtûka (Elkafî) de li ser navê Ebî Rebî Elşamî dibêje: Min ji Ebû Ebdela pirsî: li ceme hin Kurd hene û bi me re kirîn û firotinê dikin, em bi wan re bidin û bistînin? Got: Ey Ebarebî, têkiliya wan nekin, Kurd beşeke ji cinan ne xwedê ew eşkere kirine. (Elkafî 158/5-Ryad Elmesail ya Elî Tebatebaî 520/1 – Cewhera gotinê 116/3 – Kesê ku feqîh nayê cem, Şêx Sidûq 164/3) (Tehzîb Elehkam, Şêx Tûsî – Bêhar elenwar, Elmeclisî 83/1 – Tefsîr Nûr Elseqelên, Şêx Hiweyzî 601/1)
Tosî got: " Divê dûrî mirovên pîs bibe û ne kesê baş be pê re nede û nestîne û têkiliya astengdaran neke. Her wiha têkiliya kesekî Kurd neke û kîrîn û firînûfirotin û şûya wan neke. " (Elnihayê, Şêx Tûsî 373)
Li ser navê Elsadiq hatiye gotin ku şû bi Kurdan re nekin, ji ber ku cinên veşartî bûn, hatine eşkerekirin. (Tezkiretûlfuqeha, Elhilî 569/2)
Îmamên Şîiyan. . . Kurd ji cinan e - http://www. nationalkuwait. com/forum/index. php?threads/257145

tekez nekirine û wan lawaz dibînin, lê belê piranîya şîîyan wan bi kar tînin û Kurdan weke zarokên cinên Pêxember Silêmanê cihû, dibînin.

Şîî bi awayeke nerînî li fermandarê Kurd Selahidînê Eyûbî dinêrin û wî pîs dibînin, ji ber ku dewleta Fatimî ya Şîî/Ismaîlî rûxand û Şîî tengav kirin, her wiha Kurdan di şerê Çaldîranê (1514, di navbera Osmanî û Sefewîyan de) de roleke sereke di têkçûna dewleta Sefewî de lîst. Wekî din divê em nêzîkatîya qiralên parsan yên pêşî ji Medan bavikên Kurdan re û şîreta "Qembîzê Duyem" jibîr mekin. Îran weke Rejîma Tirkîyê "Kurd fobîya" li cem çêbûye, ji ber vê yekê bi awayeke tûnd nêzî Kurdan dibe, bê ku tu rêzgirtina ji mafên mirovan bigire. Vê tûndê ji hêla Kurdan ve tûndeke dijber veda û gelek tevgerên leşkerî û sîyasî derketin holê ku nehiştin xew bi çavên Pergala Wîlayetûlfeqîhê bikeve. Ev tevgerana hêjî ser êşîyê ji vê rejîmê re çêdike, bi taybet hewildanên belavkirina "felsefeya neteweya demokratîk" li Rojhilata Navîn ku li Rojava-Bakurê Sûrîyê dest pê kir û li Bakurê Kurdistanê-Rojavayî Enatolê, pêk tê.

Weke me berê jî anî ziman, nakokîyên Kurd û persan kevn in, ji ber ku Kurdan her dem dixwestin heyîneke neteweyî ji xwe re çêkin. Xebata ber bi çav û giring a Kurdan, ji hêla Serkêşê Kurd "Simayîl Axa Şikakî" yê ku bi nasnavê "Simkoyê Şikakî" ye, lê şoreşa wî pir dom nekir (1920 - 1930). Îranê dikarîbûn bi dek û dolaban û bi behaneya ku hevpeyvînê li bajarê Aşnoyê di sala 1930`î de pê re çêke, ew girt û kuşt. Hewildana duyem, bi serkêşîya "Qazî Mihemed" di sala 1946`an li Rojhilatê Kurdistanê( bakurê rojavayê Îranê) "Komara Mahabatê" hate ragihandin. Berî wê "Qazî Mihemed" di sala 1945`an de Parîya Demokratîk ya Kurdistanê, damezirand. Ji ber lihevkirina hêzên navneteweyî, vê komarê salekê dom nekir ku hêzên Şah di Berfanbara 1945`an de desteser kir. Paşê gelek serhildan li dar ketin, lê armancên xwe bi cih nehatin. Şahê ku Rojavayîyê piştgirya wî dike, Kurdên Başûrê Kurdistanê bi kar anîn û ji bo êrîşî Atêşa Iraqê bikin piştgirîya wan ya leşkerî û diravî kir ku gelek serkeftin pêk anîn, lê ji ber kêmzanîna sîyasî ya Kurdan bi serkêşîya Partîya Demokratîk ya Kurdistanê ya Iraqê û pala xwe bitevayî dan hêzên mezin, tu encam bi dest nexistin û şoreşa wan têk çû. Ew jî piştî hevpeymana Cezaîr ya di navbera Komara Iraqî û Şahinşahîya Îranê de di sala 1975`an de hate şanenavkirin, bi navberîya Cezaîr ku serokê

wê "Hewarî Bûmidyen" bû. Ji encama vê peymanê de hevbeşîya serwerîya Şetûlerb û Îranê nema piştgirîya Kurdên Başûr bike.

Piştî serhildana giştî ya gelê Îranê li dijî pergala "Şah", Kurd bi awayeke çalak tê de beşdar bûn. Lê piştî hilweşandina Pergala Şah di sala 1979`an de, "Xumeynî" xwestekên Kurdan yên her heşt ên ku Sekretêrê Partîya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê "Ebdirehman Qasimlo" pêşkêş kiribû, nepejirand. Ev xwestek ev in[26]:

-Divê bi awayeke fermî xweserîya Kurdî bê pejirandin û di destorê de bê nivisîn.

-Herêma Kurdî ji Îlamê ta rojavayê Azirbeycanê, dikşe.

-Divê di dibistan û şandnameyan de Zimanê Kurdî, zimanê sereke be.

-Ji bo geşedankirina Kurdistanê, divê beşeke ji bodceya niştimanî (Îranî), jê re bê veqetandin.

-Divê nûnerên Kurdan di ferwerîya navendî de, bêne dîyar kirin.

-Sîyaseta derve, parastin û pilankirina aborî, erkên ferwerîya navendî ne.

-Divê azadîyên demokratîyê yên bingehîn û mafê kobûnê, axaftinê û pêkanîna nerîtên olî, li bitevahîya Îranê, hebin.

Ev xwestek ji hêla Xumeynî bi tevahî nehatin pejrandin, ji ber ku li dijî pirojeya wî ya tîreyî bû. Ev jî bû sedem ku şer di navbera her du alîyan de rû bide ku Xumeynî bi awayeke tûj Pasvanê Şoreşêji bo çewsandina Kurdan, bi hovane bi kar anî. Di encamê de bi dehan komkujî pêk hatin, bi hezaran Kurd hatin girtin û avêtine zindanan ku di her du salên pêşî yên serhildanê de, jimara gorîyên Kurdan gihiştiye nêzî 100 000 kesî[27], ew jî yan bi şer yan jî bi kuştinên komî û bi serpereştîya dadwerê darvekirinê "Ayetûlah Sadiq Xilxalî". Xumeynî berevajî durişmeyên xwe yên şoreşgerî heman rêbaza Şah li dijî Kurdan bi kar anî û nîyazên xwe yên bira eşkere kir. Ne wilo tenê lê stemkarîya Şah derbas kir dema ku cîhada pîroz li dijî Kurdan ragihand û nifir li "Ebdirehman Qasimlo" û serkêşê olî yê Kurd "Şêx Izedîn Huseynî" kir.

[26] ديفيد مكدويل (تاريخ الأكراد الحديث. ص 404. Dêvîd Makdiwêl -Dîroka Kurdan ya Nûjen 4 (R -04)

[27] Çavkaniya berê – R 402

Êdî piştî çewsandina serhildana Kurdî, Pasvanên Şoreşgerî"Ebdirehman Qasimlo" û hin yawerên wî kuştin. Ew jî bi dek û dûlaban di sala 1989`an li Viyenayê paytexta Nemsayê bi heman rêbaza kuştina "Simko Şikakî" ji hêla Şah ve. Paşê jî " D. Sadiq Şeref Kindî" li Berlînê hate bukuştin.

Fîlozofê Navneteweyî "Ebdûlah Ocelan" dibêje":. . **Her dem Kurdayetîya Îranê ya nûjen di despêka sedsala nozdehan de, li hemberî desthilatdarîyên Şîî xwe ava dikir. Serhildana Simko di sala 1920`an û hewildana Komara Mahabatê di sala 1946`an de, nîşana vê rastîyê ye. Kevneşûpî û rastîya vê berxwedanê xwe careke din çespand, dema ku li dijî Komara Islamî ya Îranî (desthilatdarîya Îranî ya stemkar) bi serkêşîya Xumeynî, derket. Êdî tê wê wateyê ku çandên Islamî yên stemkar, çi Sunî bin an jî Şîî bin; li gorî Kurdan bêtir weke cilên qirêj yên ne li gorî wê lê dinerîn ku bizorê li xwe kirine. Ji ber wilo dema ku derfta azadîyê bi dest wan dikeve, wan cilan davêjin û xwe bi cilên çanda xwe yên rast û taybet, xwe diparêzin. . .** "


Gelê Kurd weke gelên din, nasnameyeke wî sereke heye, ew jî nasnameya neteweya Kurdî ye, her wiha nasnameyeke şaxî heye, ew jî nasnameya olî, tê de tîreyî û nasnameya sîyasî, tê de jî nasnameya êlî û partîtî, hene. Ev cihrengbûn, tevî cihê niştîcihî, asta fêrbûnê, pîşe û girêdana wî bi gelê Kurd yên li perçeyên din, dibin sedem ku têkildarî serwerîya neteweyî ya Îranê bibe. Ji ber dema ku Sunî be wê li Komara Islamî ya Îranê, xerîb be. Ku Şîî be sofîtîya di ayînazaya wî de, wê ferwer dijminatîya wî bike û xebatkarên saloxgerîya Îranê wê bi dû wî û malbata wî bikeve, dema ku ne li gorî pirojeya wan ya Îdyolojî, tev bigere. Bi pirbûna êşkişandina Kurdan li Rojhilata Navîn de û sivî û şervanan canên xwe ji dest dan; hestên dijîtîyê yên Kurdan li hemberî serwerên neteweperstî. Bi taybet piştî pêşketina amûrên ragihandinê û têkilîyên civakî. Lê carnan jî tevlî hin tevgerên neteweyî û rikber, dibe[28].

[28] Kêmneteweyên nijadî, olî û êlî li Îranê – Liwîs Beg – Siyaseta tîreyî li herêma Kendavê/ Rapoeke kurtî Navenda lêkolînên navneteweyî û herêmî î Zankoya kar û barên navneteweyî li zanîngeha Corotawn li Qeter.
(الأقليات العرقية والدينية والقبلية في إيران- لويس بيك- السياسة الطائفية في منطقة الخليج | تقرير موجز - مركز الدراسات الدولية والإقليمية كلية الشؤون الدولية بجامعة جورجتاون في قطر. )

**Hêzên Sîyasî û Şoreşên Kurdan:**

Rewşa dijkarîyê a di navbera rejîmên desthilatdar ên Îranê û Kurdan de, rehên wê dikişin dîrokek kevn. Li Rojhilatê Kurdistanê gelek şoreş li dar ketin, em ê yên navdar û bi bandor, Ev in:

**Şoreşa Şêx Ibîdûlahê Nehrî (Esydên Nehrî )- 1888 Z**



Li gorî gelek dîroknasan, dîroka Kurdan ya nûjen bi vê şoreşê dest pê kiriye, her wiha dxuyanîya yekem a neteweya Kurdî ya nûjen e. Di sala 1877`an "Nehrî" dest bi amadekirina şoreşê li dijî Osmanî û Îranîyan, dest pê kir. Êdî li "Şemzînanê" ya Bakurê Kurdistanê konfiransek bi amadebûna 220 serkêşên Kurdan amade bûn, li dar xist. Di vê civînê de xwest ku êlên Kurdan xwe bikin yek  û xwe ji şoreşê re amade bikin. "Nehrî" berî wê ji balyozê Berîtanî "Wilyam Ebot"re gotibû ku neteweya Kurd, neteweyeke serbbixwe ye û bi rêgez û kevneşopîyên xwe cuda ye û serwerên Kurdan dibêjin ku êdî rewş bi  vî awayî bi Osmanîyan û Qacarîyan re nabe. Şoreş zû belav bû û hêzên Şêx Nehrî Kurdistan desteser kir û sazîyên Kurdî yên rêveberya xucehî yên fermî saz kir. Êdî Tirkîyê ji bo piştgirîya Artêûa Îranê bike arêşek şand. Ew jî ji ber peymanê wan berê hene. Lê hêzên Kurdî pêşketina xwe domandin, lê dema nêzî Tebrîzê bûn, Îranê piştgirî ji Berîtanya û Rûsyayê xwest. Rûsya ji bo şoreşa Kurdî bişkîne artêşek şand ji bo piştgirîya Îranîyan bike. Artêşên Îranî, Tirkî û Rûsî hêzên Kurdî ji her çar alîyan ve dorpêç kirin û "Ubêdûlahê Nehrî" dîl girtin û weke " girtiyekî binirx" ew şandin Istenbolê, paşê di sala 1883`an de ew koçberî Hîcazê kirin ku di sala 1888`an de li Taîfê jîyana xwe ji dest da. Fêlesûvê Navneteweyî " Abdullah Ocalan" (yê ku 15 dewlet ji girtina wî li hev kombûn di nav wan de dewletên ku li jor hatin binavkirin) li ser rola Berîtanyayê di şikandina vê

şoreşê wilo dibêje[29]". . . sazîya şêxitîyê ya ku li şûna xanedanan rûnişt, weke hêzeke rêveberîya civakî ya nûjen derket holê. Serhildana ku Şêx Ubêyd di sala 1878`an de li dijî şahinşahîya Osmanî û Îranî bi hev re, ku ne bi pişgirîya Berîtanyayê ji her du şahinşahîyan re, nedihat şikandin. . . . "



**Şoreşa Simko Axa Şikakî (1919/1920)**

Navê wî Smayîl Axa kurê Mihemed kurê Elî Xan Kurê Smayîl Xan e. Serkêşê Êla Şikakê ya Kurdî li Îranê ye. Şoreş di sala 1920`an de li Urmîyayê pêket, ew jî bi armanca çêkirina dewleteke Kurdî bi navê "Komara Azadistan"[30] (ango komara azadîyê), tevî ku ji bilî çend mehan nedomand jî; lê beşeke mezin ji Rojhilatê Kurdistanê rizgar kir. Şahê Îranê "rîda Behlewî" weke dafekê, daxwaza hevdîtinê bi fermandarê Artêşa Îranê yê Bajarê "Aşnoyê" kir û ew li wir kuştin. Ev rêbaza xapandinê bi serê kalkê wî "Smayîl Xan" û birayê wî yê mezin "Cewher Axa" hate kirin. Êdî serkêşên din ên şoreşê nema dikarîbûn şoreşê bidomînin û bi vî awayî ev şoreş hate şikandin.

**Komara "Mehabadê" di sala 1946`an de, bi serkêşa Qazî Mihemed serokê Partiya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê**



Ev qkomar şoreşeke di her warî de bû. Ji ber tevî kurtedema temenê wê, lê dikarîbû gelek derfetan bi dest bixe. Weke, zimanê Kurdî bû zimanê


[29] Manîfistoya Şaristaniya Dimokratîk, parêznameya 5'emîn, Doza Kurdî û çareseriya Neteweya Demokratîk (Parastina Kurdên di nava her du erzîngên qirkirina çandî de). R124 Ebdela Ocalan.

[30] Smayîl Axa Şikakî – Simko. Ewnî Daûdî (إسماعيل آغا الشكاكي – سمكو. عوني الداوودي). http://www. ahewar. org/debat/show. art. asp?aid=9867

fermî, aleke neteweyî hate dîyarkirin, rojname û pirtûkên bi zimanê Kurdî vpirtir bûn, ekem şanoya Kurdî hate damezrandin, Kurdan cihên farisan girt û hêzeke leşkerî ya Kurdî a rewa li şûna polîsa û artêşa Îranê hate saz kirin. Her wiha Komara Kurdistanê di waran weke çandinîyê, çand, û rêveberîyê de; gelek serkeftin bi dest xistin. "Qazî Mihemed" di nerîn û xwestekên xwe de, kesekî nerm bû. Her wiha xwedî baweriyeke xurt, werekiyeke bêhempa, fedekariyeke mezin û zanîneke berfirh bû. Ji ber guhertin û lihevkirinên ramyar di navbera dewletên mezin de, piştî 11 mehan hêzên Îranê êrîşî xaka Komara Mehabadê kirin û yekem dewleta Kurdî rûxand û "Qzaî Mihemed", birayê wî "Sedrî" endamê perlemanê Kurdistanê û pismamê wî "Seyfî Qazî" şareyarê parastinê, bi dar vekirin.

Êdî ji wê demê û pê ve li Rojhilatê Kurdistanê gelek rêxistin û partîyên sîyasî yên zanistgirî, neteweyî, çepgirî û Islamî; saz dibin.

Ji wan rêxistinên giring ev in:







**Partîya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê:**

Ev partî, li Rojhilatê Kurdistanê ji partîyên herî mezin û kevnar e û di wê demê de nûnertîya hemû Kurdan dikir. Ev partî ji bo Mafê çarenûsa Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê, li dijî bandorên çandî, aborî, leşkerî û empiryalîyê û avakirina civakeke hevbeş, tê dikoşe. Armnca wê di çarçûveya komareke Îranê ya demokratîk de, xweserîya Kurdan e. Ev partî di 16`ê Gelewêja sala 1945`an de li Bajarê "Mehabadê" hate damezirandin. Kongireya yekem a partîyê bi amadebûna 61 endamên  bazirgan, karmend û olnas, li dar ket. Serokê yekem yê partîyê "Qazî Mihemed" bû. Partîya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê li ser Komeleya Vejînê ya Kurdî "Komele" ya ku berî wê bi 3 salan hatibû damezirandin, hate avakirin ku endamên "komele" tevlî partîya nû bûn. Ew jî ji ber ku "Komele" ji hêla Berîtanyayê dihate piştgirîkirin.

Piştî 159 rojan ji damezrandina partîyê ji aliyekî ve, Komeleya Kurdistanê hate ragihandin. Partîyê Bajarê "Mehabadê" weke paytexta komarê pejirand. Komar 11 mehan domand. Piştî ku Yekîtîya Sovyêtê ji herêmê kişya; artêşa Şah pêşî Azerbêcana Îranê desteserkir, paşê jî di 15´ê Çileya 1946`an de "Mehabadê" dagiker kir. Êdî piştî hilweşandina komarê, bi armanca tunekirina wê;  piranîyên rêberên Partîya Demokratîk a Kurdistanê, hatin girtin û 20 jî li bajarên "Mehabat, Bokan û Siqizê" hatin bidarvekirin.


Piştî 2 salan partîyê xwe careke din bi rêxistin kirû bi Partîya "Toda" ya çepgir li dijî Şah " Mihemed Rîda", hevkarî kir. Partî di navbera salên (1959 – 1964´an) de beramberî êrîşên hovane yên ewlekarîya Îranê hat ku bêtirî 300 endamên wê hatin girtin, ji ber vê jî piranîya serkêşên patîyê li Başûrê Kurdistanê diman. Tevî wilo jî partîyê dikarîbû bidome, çekan hilgire û binekên xwe li gelek bajar û gundan saz kirin. Dema ku Partîya Demokratîk a Iraqê li dijî Rejîma Iraqê şer kir, Partîya Demokratîk a Îranê piştgirîya Kurdên Başûrê Kurdistanê kir. Her wiha Partîya Demokratîk a Iraqî piştgirîya binekên Partîya Demokratêk a Îanê yên li Başûrê Kurdistanê li dijî Rejîma Îranê, dikir.

Lê ev rewş hate guhertin dema ku Şah li dijî Rejîma Iraqê piştgirî da "Berzanî" ku Partîya Demokratêk a Kurdistanê ya Îranê, gelekî zîyan xwarin. Lê bi tevlîbûna kesên komonîst û neteweperwer, dikarîbû xwe careke din bide hev.  Ji van kesan "Ebdirehman Qasimlo" bû, ew jî ji endamên berê yên Partîya "Toda" (partîya Komonîst a Îranê) bû û komîteya şoreşgerî ya 18 mehan ji bo ku berxwedana li dijî Şah bidome, hate sazkirin. Di sala 1971`ê de kongireya sêyem hate li dar xistin û "D. Qasimlo" weke sekretêrê giştî hate hilbijartin. Partîyê bi hemû tevgerên Islamî û komonîst li dijî Şah, şer kir ku gihaşte asta herî bilind di şoreşa Îranê de û gelek dever ji Rojhilatê Kurdistanê, vegerand. Lê weke me berê jî da xuyakirin, rejîma Islamê ya nû xwestekên Kurdan nepejirand û Partîya Demokratîk a Kurdistanê û partîyên Kurdî yên din, çewisand, lê li beramberî berxwedaneke xurt ji hêla partîyê ve dihat. Di salên heştêyî de Partîya Demokratîk a Kurdistanê tekoşîna xwe domand û di ala 1989´an de, tekoşîna xwe ya leşkerî xurt kir ku di sala 1999`an de nêzî 300 leşkerê Îranî kuştin.

Hevdîtinên ku Îranê di dawîya salên heştê û despêka notî de dest pê kir, ji bo xweserîya Kurdî çareser bike; tev de lîsk bûn ku di yek ji van hevdîtinan de, di 13`ê Tîrmeha 1989´an de, Serkêş "Ebdirehman Qasimlo" li Viyenaê hate kuştoin. Her wiha di 18` Razbera 1992`an de sekretêrê nû yê Partîya Demokratîk a Kurdistanê "D. Sadiq Şerefkindî" û sê hevalên wî li xwaringehekê li Berlînê, dema ku beşdarî konfiransekê ya sosyalîya navneteweyî bû, hate kuştin. Piştî wî "Mistefa Hicrî" rêvebertîya partîyê kir û çalakîyên li dijî Rejîma Îranê domnd. Lê ji ber nakokîyên hundirîn yên partîyê hêza wê ya sîyasî lawaz bû û di encamê de baskê "Mele Ebdela Zada" jê perçe bû. Di 28`ê Razbera 1996`an de Hêzên Îranê navenda Partîya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê û wargeheke koçberên Kurdên Îranê, topbaran kirin, di encamê de gelek kadroên partîyê jîyana xwe ji dest dan. Her wiha di sala 1997`an de, Ferwerîya Îranê 13 Kurd piranîya wan endamên Partîya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê bûn, bi dar vekirin. Ji hêlekê din ve di navbera wê û Girêlaên (PJAK)`ê glek caran, şer pevçûn derketin. Yek ji wan, şêrê ku di sala 2015`an de, nêzî "Xinêze" rû da û zîyan gihaşte her du alîyan. Artêşa Îranê ev bûyer weke derfetekê dît û herêm topbebaran kir.

Piştî demeke rawistandinê, Sekretêrê Partîya Demokratîk a Kurdistanê ya Îranê "Mistefa Hicrî" ji nû ve destpêkirina xebata leşkerî li dijî Rejîma Îranê ragihand. Hicrî dîyar kir ku partîya wî û (PJAK)`ê ya ku bi bi awayeke xurtî li herêmên Kurdî şer dike, li hev hatine. Lê Danerê têkilîyên navneteweyî de ya Zanîngeha "Sussex" "Kamîran Metîn", di 2016`an de wilo got:" Partîya Demokratîk a Kurdistanê weke berê tu hêza wê nema ye ku erdê bi dest bixe û li dijî leşkerên Îranî şer bike, ta li ser asta perwerdeya leşkerî pir hêsan e. "

**"Komele" Komeleya Kedkarên Kurdistanê ya Şoreşgerî ya Îranê:**



Ev partiyeke sîyasî û çepgir e. Di sala 1967`an de hate damezrandin. Ew jî komeke markisî ye, li dijî Rejîm Şah 12 salan û paşê ji 1979`an ta 1983`an li dijî Rejîma Xumeynî tekoşîn kiriye. Her wiha tevgereke karkeran e, sekretêrê wê yê niha "Ebdela Muhtedî" ye. Hêzên wê yên leşkerî bi navê "Pêşmerga" tên naskirin. Di salên heştê û notî yên sedsala bîstan de çalak bû. Di sala 2007`an de hin endamên wê jê cuda bûn û partiyeke bi navê "Komeleya Kedkarên Kurdistanê ya Îranê", saz kirin.

Ev partî ji hêla komeke xwendekarên zanîngehê yên Kurd ku bi felsefeya markisî û sosîyalîyê bandor bibûn, hate damezirandin, paşê jî weke rêxistineke Kurdî û razeyî bi navê "Komeleyê" bi serkêşîya "Fûad Mistefa Siltanê" yê bi sernavê "Kak Fûad", hate naskirin. Piştî şoreşa Îranê, "Kak Fûad" dikarîbû ji nû ve partîyê bide hev ku li Rojhilatê Kurdistanê bû ji partîyên herî bi nav û deng. Di rewşa sîyasî ya piştî şoreşê, partîyê xwest ku pirsgirêka Kurdî bi aştîyane û hevdîtinan, çareser bike, lê Ferwerîya Îranê pê er êkilda nebû û ew piştguhê xwe kir. Her wiha dema dît  ku "Kak Fûad" û partia wî li ser Îrana piştî şoreşê metirsiyekê çêdike;  hewil da ku wî bikuje. Êdî piştî ku Xumeynî di derbarê rêxistinên Kurdî yên berxwedêr de fetwa"cîhadê" derxist; "Komele" neçar ma ku li dijî Xumeynî çekan rake. Berya wê partîyê ji xwe re hêzên"pêşmerga" ji jin (cara yekem li îranê şer dike) û zilaman, saz kiribûn û binekên xwe yên ji bo perwerdeya endamên xwe li Başûrê Kurdistanê ava kiribûn.

Piştî pêşmergên "Komeleyê" berxwedaneke xurt pêk anîn Artêşa Îranê ew li Bajarê "Mêrîwanê" ya Parêzgeha Kurdistanê, dorpêç kirin. Di encamê de hin kadroên partîyê hatin bidarvekirin, ji wan her du birayên "Kak Fûad "Hisên û Emîn" bûn. Dema ku Hêzên Îranê derbasî "Mêrîwanê" bûn "Kak Fûad" li Herêma "Bane" bi hin serkêşên Kurd re weke "Şêx Izedîn Huseynî", "Ebdirehman Qasimlo" serkêşê "Partîya Demokratîk a Kurdistanê" û "Celal Delebanî " serkêşê "Yekîtîya Niştimanî Kurdistan", beşdarî civînekê bibû. Lê dema bihîst ku her du birayê wî hatine kuştin, ji bo "Komele" bide hev vegerîya "Mêrêwanê". "Kak Fûad" bi gelek endamên "Komeleyê" re vegerîya "Bane" û li ser rîya "Mêrêwan-Siqizê" rastî komeke mezin ji leşkerên Pasvanê Şoreşêhatin. Piştî şerekî dijwar "Kak Fûad" û hin hevalên wî jîyana xwe ji dest dan. Bûyera kuştina "Kak Fûad" weke partî û tevgera Kurdî hejand ku nûçeya sereke ya medyaya Îranê bû. Tevî wilo partî xwe

domand û dikarîbû Rejîma Îranê li Rojavayê Kurdistanê 3 mehan pûç bike. Ji ber vê yekê Xumeynî neçar ma ku bi "Komeleyê" re hevdîtinan çêke. Lê Artêşa Îran ev hevdîtin weke derfetekê dît ta ku  xwe bide ser hev, wize û çekan peyda bike û agahîyên saloxgerîyê bide hev. Ji ber vê yekê Rejîma Îranê bi behana têkçûna hevdîtinan, bi awayekî berfireh êrîşî Kurdistanê kir û berxwedana Kurdî şikand û herêma Kurdî desteser kir. Tevî ku patîyê şer domand, lê ji ber kêmbûna çavkanîya çekan û li Başûrê Kurdistanê şerkirina bi hin partîyên Kurdî re; gelek ji hêz û germbûna xwe winda kir.

Partîyê ji sala 1990`î ve çalakîya xwe ya leşkerî rawestand. Paşê di sala 2015`an de li Başûrê Kurdistanê çend mehan, beşdarî şerê li dijî DAÎŞ`ê bû. Lê Ferwerîya Herêma Kurdistanê di bin bandora Îranê de, ew vegerandin Rojhilatê Kurdistanê. Di 21`ê Pûşbera 2016`an de, partîyê tekoşîna xwe ya çekdarî careke ragihand û jimareke baş ji şervanan komkir.

**Rêxistina Xebat a Şoreşger a Kurdên Îranê:**

Rêxistina Xebat a Şoreşger a Kurdên Îranê

Piştî şoreşa Îranê û rûxandina Rejîma "Mihemed Rida Behlewî", Kurdan hêvî dikirin ku bi Şîîyên Îranê re bi aştîyana jîyan bikin û dema encamên xebat û hêvînên wan hatin. Di wê demê de rêxistinên Kurdî gotûbêj bi Xumeynî re dikirin û soz didan ku wê pergaleke nû ava bike, tê de bi awayekî aştîyane doza Kurdî çareser bike. Lê Xumeynî pirsgirêka Kurdî û gelên din yên di erdnîgarîya Îranê, ne weke ku gelên dixwazin xweseriyekê di hundirê dewleta Îranê de çêkin ku bi nasna xwe ya çandî û ziman bên naskirin, girte dest. Lê weke pilaneke rêxstinên çepgirin ên van gelan li dijî felsefaya wî ya Islamî girte dest.

Êdî nakokîyên hundirîn pirbûn û şer di navbera alêgirên Xumeynî û dijberîyê bi hemû beşên xwe yên ku hemû rêbazan ta  gihişte şerê kolanan bi kae anîn, rû da. Her wiha hewil dihate kirin ku Encumena Pisporan destûrekê hişk ji komara Islamê re saz bikin ku ji bilî Gelê farisî, weke Kurd, Ereb û hwd tu mafan nedin wan. Ji hêleke di ve dijberîya hindik ya lebral di

hundirê encumenê de nikarîbû mafên van gelan tekez bike yan jî destûrekê demoratîk saz bikin, ew a  ku hemû piştgirên şoreşê despîkî dixwestin, .

Di van rewşan de, li Rojhilatê Kurdistanê gelek rêxistinên sîyasî derketin holê. Yeke ji van ku kpmeke olnasên Kurd rêxistineke sîyasî li gorî felsefrya Islamê û idîolojîya neteweya Kurdî, saz kirin. Ji Bajarî "Mehabadê" Kurdan xwe bi rêve dibirin bî ku li Teheranê vegerin. Di derbarê vê de Şêx"Izedînê Huseynî" got:"Ne ji bo bawerîya me ya olî, lê ji bo em xweserya xwe bi dest bixin, perlemanekî ava bikin, fêrî zimanê xwe bibin û çanda xwe belav bikin, me li kêleka Xumeynî şer kir. Şoreşê stemkarî hilanî, lê cudakirina li dijî kêmneteweyan hilnanî. Îran welatekî mezin e têra hemû neteweyan dike. Çima Îran nabe welatekî fedral ku ji xweserîya gelan, pêk tê. . . "

Di encama vê rewşê de "Rêxistina Xebat a Neteweyî û Islamî ya Kurdistana Îranê" di 27`ê Gelewêja sala 1980`ê, hate sazkirin. "Celaledînê Huseynî" birayê "Izedînê Huseynî", "Xalî Şerîvan" û "Ebdela Aram" ji damezrînerên wê bûn. Di destpêkê de mislmanên Kurd ev rêxistin ji bo tîreya Sunî biparêz, bi kar anîn.  Lê paşê armancine eşkere yên neteweyî danîn. Ew jî ji bo pergaleke demokratîk û zanistgir (sakûler) ku Kurd mafê çarenûsê bi dest bixin, ava bikin. Ev rêxistin xwe wilo pênase dike; tevgereke neteweyî û niştimanî ye ku ji bo azadîyê û bidestxistina mafên welatîyên Kurdistanê yên Îranê, tê dikoşe.

Hin ji bendên rêziknameya vê rêxistinê ev in:" xweserîya Gelê Kurd bê pejrandin, zimanê Kurdî li dibistan, zanîngeh û weke zimanê dayikê bê bikaranîn, hemû herêmên Kurdan ên Rojhilatê Kurdistanê bibin yek, Gelê Kurd nûnerên xwe weke zimanê berjewendîyên gelê Kurd hilbijêrin, misogirkirina azadîya hemû ol û Îdîolojîyan, ol weke rêbazeke ku nakokîyan bixe navbera gelekî de; divê neyê bikaranîn, . . . "

**Partîya Jîyana Azad a Kurdistanê "PJAK"**



Ev partî di sala 2004`an de hate damezrandin. Ew jî endamê Koma Civaka Kurdistanê (KCK)`ê ya ku sîwana sîyasî û şoreşgerî ya tevger û partîyên Kurdistanî yên li Tirkî, Îran, Sûrî, Iraq û cîhanê ye. Ev partî bi fedralîya demokratîk weke çareseriyeke ji pirsgirêka Kurdî re ya ku rêber û Fêlesûvê navneteweyî "Abdullah Qcalan" bijartiye, bawer e. Rêbertîya (PJAK)`ê dîyar dike ku armanca wê ya sereke ew e ku Îranê pergala xwe ya olîtî bi "Îraneke demokratîk a xwedî ferweriyeke fedralîyê" biguhere, her wiha divê xweseriyeke ji Ereb, Azetî, Kurd û hemû kîmneteweyê din, hebe. Ev partîyê hew li Rojhilatê Kurdistanê tê dikoşe. Di sala 2009`an de Emrîkayê ew xiste doseya **sawekarîyê**, ew jî ji ber têkilîyên Emrîkî – Tirkîyê. Di vê partîyê de rêjeya jinan bilind e ku ew şervanên herî xurtî di partîyê de ne. Beşên partîyê ev in:

Çengê Çekdar: (Ew jî Yekîneyên Rojhilatê Kurdistana ne)

Şaxê Jinê: (Hêzên Parastina Jinê, HPJ)

Şaxên Ciwan û xwendekaran

Ji despêka sazkirina partîyê tekoşîna xwe li dijî Rejîma Îranê domandiye û gelek zîyan gihande hêzên Îranî û Pasvanên Şoreşgerî. Her wiha li dijî navendên ewlkarîyê yên Îranê, êrîşên balkêş pêk anîn û di sala 2007´an de helîkoptereke leşkerî anî xwar, îranê birsiva wê gundên Kurdî yên li ser sînorê Başûrê Kurdistanê bombebaran kirin ta sînorên bi Iraqê re derbaskir ku gelek Kurd ji ber vê êrîşê dev ji malên xwe berdan. Hêzên partîyê li beramberî êrîşên Îranê bi hevkarîya Tevgera"EnsarûlIslam" ya tekfîrî û sawker, li ber xwe dida, ta ku gelek serhengên Îranê kuştin, weke Serheng "Ebas Asimî" serkêşekî mezin yê Pasvanê Şoreşêû "Ebas Elî Cansarî ". tevî wilo jî partîyê amade bû ku hevdîtinan bi Îranê re bike, ji ber bawere dike ku divê pirsgirêka Kurdî bi rêbazên aştyane bê çaresekirin, lê her dem Îranê li beraanberî vê helwestê bi tûndê û nepejrandina gotûbêjê, bersiv dida.

Ji hêleke din ve, tevî ku piştgirîya Artêşa Tirkîyê ji Îranê re li dijî peymana NATO`ê ye, lê Rejîma Îranê bi hevkarîya Artêşa Tirk şerê hêzên (PJAK)`ê dike. Çavkanîyên partîyê dîyar dikin ku Artêşa Tirkîyê û Pasvanê Şoreşêbi hev re li Bajarê "Ormyayê" baregehên hevbeş bi rêve dibin û pisporên leşkerî yên tirk şîretên leşkerî yên li dijî Kurdan li Hêzên Pasvanê Şoreşêdikin.

Gelek caran ragihandinê û endamên ferwerîya Îranê, angaşt kirin ku Emrîka û hevbevdên wê bi dizî (PJAK)`ê peredan dikin, ew jî bi armanca rûxandina dewleta Îranê ye. Lê ev tişt ne rast e, ji ber ku ev tevger di xişteka sewkarîyê ya Emrîkî de ye û felsefeya wê navneteweyî ye. Lê Îranî her kes û tevgerên ku li dijî felsefeya wê ya dogmatîk tev digere û doza mafên xwe dikin, wan tewanbar dike. Bi rastî jî Emrîka û (PJAK) her dem dîyar dikin ku bi tu awayî hevkarî di navbera wan de tune ye. Nîşaneya vê jî ew e ku Emrîka navê (PJAK)`ê xistiye xişteka sawkerîyê, hemû jêderkên diravî yên (PJAK)`ê di diravgehên Emrîkî de pûç kir û xebatên bazirganî bi (PJAK)`ê re li ser welatîyên Emrîkî qedexe kir. Her wiha berpirsên Emrîkî anîn ziman ku têkilîyên (PJAK)`ê bi Partîya Karkerê Kurdistanê (PKK), re hene. Jixwe ji sala 1997`an de Emrîka (PKK) weke "rêxistineke sawker a bîyanî" bi nav kiribû. Ew jî ji bo piştgirîya Tirkîyê ya ku hevbenda wê ya herêmî ya NATO´yê ye, bike.

Her wiha Endamê Rêveberîya PKK`ê "Cemîl Bayik" di hevpvînekê de bi Ajansa France Prince wilo dîyar kir: "Emrîka tu piştgirî nedaye PJAK`ê, ev gotin ne rast e". Bayik wilo domand:"PJAK ta niha bi piştgirîya Gelê Kurd û PKK`ê, tekoşîna xwe didomîne"

PJAK`ê di 18`ê Cotmehê sala 2008`an de Emrîka tewanbar kir ku wê agahîyên saloxgerîyê ji Hêzên Tirkî û Îranî re şandin, ew jî dema van her du dewletan êrşên giran li dijî wê û PKK`ê kirin.

**Anîya Yekîtîya Kurdî**

Aniya Yekîtiya Kurdî

"Anîya Yekîtîya Kurdî ", partiyeke sîyasî bi rengekî birciwa û lebralî ye. Armanca wê pêşxistina geşdana aborî û civakî li Îranê bi taybet li herêmên Kurdî ye. Ew jî ji bo guhdana mirovan û cudahiy li ser netewe û tîreyî ji holê rake, tê dikoşe. Di sala 2005`an de "Behaûdîn Edeb" ev anî damezirand, ew jî bi hevkarîya hin çalakvanên sîyasî û rewşenbîrên Kurd. "Behaûdîn Edeb"

siysetmedarekî Kurd ji Bajarê "Sinê" ye. Di sala 2007`an de jîyana xwe ji dest da. " Behaûdîn" du caran li ser hev di perlmanê Îranê de cihê xwe girt, lê ji ber pişgirîya vesazîparêzan digirt û gotinên wî yên di hilbijartinên 2004`an de, nehiştin ku cara sîyan xwe pêşnîyar bike.

"Anîya Yekîtîya Kurdî " ji ber bandorên sîyasî yên rewşa Iraqê, piştî di sala 2003`an de Rejîma"Sedam Hisên" hate hilweşandin û Kurd beşdarî biryardayîn bûn, hate sazkirin. Ev anî li gorî zagonên Îranê dixebite. Armanca wê mafên Kurdan û parastina daxwazên wan, bi rêbazên sîyasî û aştyane. Ev yek di rêzginameya vê anîyê de zelal.

Ev anî ji encumeneke rêveberîyê ku ji 25 endaman ji 5 parêzgehan "Tehran, Kuristan, Kermenşah, Îlam û Azirbêcana Rojava", pêk tê. Navenda sereke ya Anîyê li Tehranê ye.

"Anîya Yekîtîya Kurdî " li gorî rêziknameya wê, xwe pênase dike ku ew ne hêzeke dijberîyê ye, lê belê ew hêzekî civakî ye. Li dijî tu netewe, gel, çand û bawerîyan naxebite, lê ew nirxên bilind ên şoreşa Islamî û xwestek û armancên hemû gelên Îranê bi awayekî aştîyane û zagonî, diparêze. Anî nûnerîya hemû Îranîyên ku ji bo pêkanîna demokratî, wekhevîya civakî û geşedana hevseng têdikpşin, dike. Li gorî wê divê anî ji xurtkirina yekîtîya niştimanî û hevjîyaneke aştîyane, bêyî ku nakokîyan bi welat û neteweyên din çêke, ji ber ku Îran li gorî Anîyê, bi çandên xwe yên cihreng û rind; bexçeyeke geş û bedewe, .

Li gorî nerîna damezrînerên Anîyê ji bo pirsgirêkên heyî bi van xalan çareser dibin: Xurtkirina hişmendîya civakî û sîyasî ya gel, şîreta bi hev re xebat kirin, beşdarkirina çalak di rêvebirina welêt û hewildana pêkanîna bendên destûrê yên nehatine pêkanîn; ji bo nakokî û pirsgirêk kêm bibin û rê li ber çaksazîyên demkratîyê bi taybet li herêmên Kurdî vebe, ji bo li hev kirin, hevşêwirkirin û têkilîyan; bi dewletê re bi domdarî, danûstandin. Anî bawer dike ku endamên perleman navmalîyên gel, nûnerên şoreşê û pêwîstîyên welêt pêk tînin ne, êdî divê berpirsên dewletê li gel guhdar bikin.

Ji tevgerên giring ên ku li qada Kurdî ya Îranê dixebitin û Îranê wan bi Wehabiyetê û sîxurîya ji Siûdîyê re, tewan bar dike; ev in[31]:

| | |
|---|---|
| | *Rêxistina Xebat a Şoreşgerî ya Islamî ya Kurdistana Îranê:[32]*<br>*Ev tevger, rêxistineke Islamî, selefî û rikber e. Di sala 1980`ê de ji hêla Şêx "Xidir Ebasî" û komeke ji olnasên Sunî ve, hate damezrandin. Ji bo pirsgirêka Gelê Kurd ê Misilman çareser bike, hewil dide ku heyîneke Kurdî li ser rêbaza Ehlûsunawelcemaa, ava bike. Her wiha dixebite ku mafên Ehlûsuna biparêze û wan ji siyemkarîyê rizgar bike. Navendên veşartî yên vê rêxistinê li Başûrê Kurdistanê û hin welatîyên Ewrûpî hene û li Kurdistan, Bilûcistanê çalak e.* |
| | *Koma Dawa û Islah (IxwanMuslîmûn), bi farisî( جماعت دعوت واصلاح):*<br>*Di sala 1970`an de ji hêla va her du olnasên Sunî yên Kurd hate damezrandin: "Ehmed Miftî Zada" yê ku di bin işkenceya hêzên ewlekarîya Îranê de di sala 1993`an de kor bû û hate kuştin û "Nasir Subhanî" Lêvegerê olî yê Ixwanên Îranê ye, di sala 1990`î de hate bidarvekirin, ji ber ku beşdarî konfiransa damezrandina Rêxistina "Hevgirtina Islamî ya Kurdî" bû. Di sala 1991`ê de "Ebdirehman Pîranî" bû sekretêrê wê.* |
| | *Koma Yekîtîxwazên Azad:*<br>*Di sala 1992`an de bi serkêşîya "Mûsa Umran" hate damezrandin. Ev jî tevgereke cîhadî ye, ji bo hilweşîna Pergala Wîlayetûlfeqîh, têdikoşe.* |

[31] الحركات السنية في إيران . Tevgerên Sunî li Îranê - https://www. assakina. com/center/parties/7581. html

[32] Kom û Tevgerên olî li Îranê - https://www. assakina. com/center/parties/7530. html